**ABDULAH OCALAN**

# EM RAST NÊZÎKÎ RASTIYA KONGREYA 5. BIBIN

**Dahûrînên Cotmeha 1994**
**Berga 2.**

*Weşanên Komîteya Rêbertî*

**Werger:** Ayten Amed

**Cihê Çapê:** Çapxaneya AZADÎ
**Dîroka Çapê:** Gulan 2019

# NAVEROK

**Qonaxa Ku Em Berê Xwe Didinê Bandorker Fêm Bikin, Rêyên Pirsgirêk, Çareseriyan Teqez Bibînin û Bi Ser Peywirên Xwe De Biçin!**

**Em Rastıya Daraza PKK'ê Baş Fêm Bikin û Pêwistiyên Wê Pêk Bînin!**

**Ji Bo Şervanan Hişyarî û Pêşniyar**

**Di 71. Saliya Xwe De Rastiya Komarê**

**Nirxandinên Rêbertî Di Derbarê Eyaletên Amed Û Garzanê De**

## Qonaxa Ku Em Berê Xwe Didinê Bandorker Fêm Bikin, Rêyên Pirsgirêk, Çareseriyan Teqez Bibînin Û Bi Ser Peywirên Xwe De Biçin!

***Pîlan û perspektîfên sereke ên di derbarê sala 1995'an de***

***A-Rewşa eniya şerê taybet ê faşîst û pirsgirêkên şerê me yê şoreşgerî ku dijî.***

Dema ku em hewl didin şerê taybet ê topyekûn di wateya serkeftinê de vala derxin, di nava refê me de aliyên nebes, xelet jî ewqas tên dîtin; derfeta serkeftina şerê şoreşgerî ku tê ferzkirin fêmkirina van waneyên girîng û dîrokî û ji niha şûnde encax bi serdeçûnê de bên bidestxistin û dîsa em dibêjin bi amadekarî û pêkanîn dikare gengaz bibe. Eniya faşîst a dij-şoreşê, di şerê taybet de û bi taybet jî di sal û nîveka dawî de, li derdora Tansû Çîller, Karayalçin û Gureş de şerê topyekûn ku tê pêşxistin, em bi asanî dikarin bêjin ku qonaxeke wê ya herî girîng a encamgir me derbas kiriye. Pêwîste em bizanin pir alî li ser vê pêwajoyê rawestin. Ji bo ji nêz ve dîtina vê pêvajoyê, divê ku mirov pêvajoyên beriya niha bîne berçav û lêbinêre.

***Şerê ku ji aliye Komara Tirkiyê ve li ser şerê me yê şoreşgerî hat ferzkirin çibû?***

Beriya her tiştî, pêşwext KT'yê xwe ji îsyaneke klasîk a rastiya îsyana Kurd re amade kiribû, hema bêje ya ku bi damezrîneriya wê despê kiribû û çewsandina heta despêkirina PKK'ê jî dewam kir, bi vê rêbazê encamgirtin mijara gotinê ye. Dema ku di her herêmekê de îsyaneke Kurdan derket pêş, ji holê rakirin; bi qasî ku dikare bikuje kuştin, bi qasî dikare radest bigre radest girtin, yê li şûn ve dimîne jî bi sêdarê temamkirin û bi vî rengî îsyana tê zanîn tepisandin hatibû ceribandin. Ji bilî vê ti corên din ên islahkirin, tawiz dan yan ji reformxwaz nîne. Bi tarzê ku heta dawî em dikarin tabîr bikin nêzîkatiyeke serdehatinê mijara gotinê ye.

Ji bo rêbaza ji holê rakirinê pêk were, çawaniya îsyana klasîk girînge. Hemû bingehê civakî yê ku xwe dispêrê, feraseta siyasî, Rêbertî, rêxistina wê wisa ye ku; ya rast îsyan teqez şansê serkeftina hemû îsyanan dide.

KT'yê, di derketina me ya holê de jî, hinekî vê kevneşopiyê li berçav digire, hinekî jî tevgera Komînîst a Tirkiyê yan jî ew kevneşopiya ku em weke a çepgiran pênase dikin li gorî pêşketineke wisa xwe eyarkirina wan mijara gotinê ye. Li gorî tevgerên Komînîst xwe rêxistinkirin; bi taybet bi rêbazên îstîxbarat, polîs ji damezrandina Komarê heta niha bi provakasyonê û bi bermahiyên rêxistinan ber bi encam girtinê ve diçin û divê de jî gelikî serkeftî ne. Di vê wateyê de ji tevgerên çepgir re naskirina ti şansî ne mijara gotinê ye.

Ji du aliyan ve nîtelîka tevgera me heye; hem bûna tevgera çepgir, hem jî tevgerek Kurd şênber bû. Dijminê ku di despêkê de hinekî du dilî jiyan kir; weke ku nêzîkatiyeke serdeçûna ji tevgereke çepgir re raber kir, nêzîkatiyeke dibe ku tevgereke Kurd be jî xwe ferz kir. Her weha 12'ê Îlonê, weke mînaka dawî ya rêveberiya klasîk, di salên 1970-80'ê de teşîs kir li dijberî îsyana Kurdan bi heman mantiqê bersiv dayîn, bi rêbazên klasîk nêzîkatiya pêşî girtinê bû.

Cûntaya 12'ê Îlonê hat nehat, bi çend operasyona wisa zanî ku xwe serkeftî kiriye. Weke ku hûn dizanin, hem çewsandina çepgiran, hem jî mewziyên tevgera me yên gelik sînordar ji holê rakirin, demeke pir kurt domî. Piştî wê zagonên xwe bi cih kirin, li gorî xwe pergalek ava kir. Tam jî di vê xalê de, me pêngava nû ya tevgerê da despêkirin. Weke tê zanîn, bi giranî yên ku li vê sahê hatin amadekirin, lê ya ku dixwest xwe bigihîne wan dînamîkên germ ên li welat heyî, mantiqa îsyan hinekî derbas kiriye, amadekeriyeke komîserhevkirî û bi tarzê gêrîla gaveke taxtîkê ya ku dixwaze hebûna xwe bidomîne ye.

Ya rast pêngeva 15'ê Tebaxê, me xwest em wisa binirxînin. Çiqas hat pêkanîn mijareke din a nîqaşê ye, lê tevgera me mantiqê şerê gel esas digirt. Bi xwe cihkirinê bi wan destnîşankirinên ku hatin diyarkirin me pêvajo da despêkirin. Nêzîkatiya ji eniya KT'yê hat raberkirin, "*ev jî îsyaneke, em ê bitepisînin"* bi vî tarzî bû. Operasyonên giran ên artêşa klasîk pêş diketin. Lê yekîneyên me ji ber ku xwedî qadên xwe bicihkirinê bûn û rewşa

berpirsyariyê, li gorî beriya 1980’ê şansê li ser piya mayînê zêde dikir.

Nêzîkatiyên KT’yê, bi taybetî jî hedef girtina gel, “*qanûna cerdevaniyê”* ya ku dixwestin pêş bixin, xwedî pêkanîneke sînordar bûn, heta wê demê jî armanceke wan a şer topyekûnkirinê nebû. Texmîn dikirin ku dê bikaribin bi asta heyî tevgera me derbas bikin.

Weke tê zanîn, ev heta sala 1987’an ragihandina, “*Rêveberiya Rewşa awarte”* wisa bû. Dema Rewşa awarte, bi taybet heta piştî dahûrandinê me yên kongreya 3’mîn û bi teysîna hinek amadekariyan li welat jî wisa pêş ket. Çalakiyên ku deng vedidan hebûn û hinekî jî kapasîteya çalakiyan pêş diket. Dubare bi serdeçûyîna hinek yekîneyan, gaveke pêş îfade dikir. Ji vê re weke persiv ragihandina Rêveberiya Awarte bû. Polîtîkaya cerdevaniyê ya pêşketî, dîsa di vê navberê de yekîneyên taybet, tîmên taybet xistina meriyetê mijara gotinê bûn. Lê dîsa jî şerê topyekûn rewşeke wisa negirtibû. Bi taybet MHP yan jî yên ku mîna yekîneyên parastina sîvîl pênase dikirin nexistibûn dewrê. Armanc; di sala 1988-89’an de li tevgerê rêgirtin bû.

Şerê taybet hebû, lê ne di asta jor de bû. Hişmendiya provakasyonê gelikî pêk di anîn, “*zagona poşmaniyê”* bi berfirehî dixistin dewrê. Polîtîkayên tawîz, di asta takekesî de bi taybet di nava girtîgehê de ferzkirina wan, ji aliyê hinek provakatoran ve jî dixwestin me û gel rûbirûyê hev bikin û her ku diçû pêş diket. Tevî vê jî, bi taybetî di salên 1988-89’an de dahûrînên pir alî ku me pêş dixistin û bi amadekariyên pratîkî ve ev rewş dihatin derbaskirin.

Wateya wan salan girînge; binxistina pêvajoya Rewşa Awarte di nava xwe de dihewîne. Herweha dema ku em gîştin 1990’î, şerê ku çarenûsa sereke ya Ozal diyar kir, bi wê rewşa heyî eşkere bû ku dê nikaribe serkeftî be. Ozal kêm be jî xwest guhertinekê bike, rêbazê reformxwaz bixe dewrê. Ev di nav KT’yê de rê li ber nîqaşên kûr û qeyranan vekir. Heta ya ku çûyîna Ozal jî amade kir ev bi xwe bû.

Li şûna vê, bi şêwazekî klasîk, mîna ku di 1925’an de, ji aliyê bav Înunu rexne û nêzîkatiyên ku arasteyî kabîneya Fethî Okyar kiribû, heman nêzîkatî Înunuyê kur jî xwest dubare bike. Dîsa weke Demîrel, yekî heta dawî muhafazakar û ji meyla faşîst

re vekirî pê re îtîfaq kirin û rêveberiya dûrxistinê, ango bi esas girtina rêbazên ku li ser îsyanên ji sala 1925'an heta 1940'lî bi nêzîkatiyeke esas girtibûn salên 1991-92-93'ê kirin hedef.

Pîlansaziya kabîneya Demîrel-Înunu, îhtîmaleke mezin hinekî din bilindkirina şerê taybet bû, em dikarin bêjin gihandina asta şerê topyekûn jî bû. Ya rast gavên vê yên yekem davêjin. Di asteke berfirehtir de gel hedef girtin, bi gotina ji "*gel re dilovanî"* di her astê de gelê ku eleqeya xwe li beramberî PKK'ê hebû ew hedef girtin, yên ku li gel dewletê cih digrin mafê jiyanê ji wan re nasîn berê xwe dan polîtîkayeke wisa ya teqez. Eşkereye ku ev tê wateya şerê topyekûn û ev polîtîka piştî sala 1991'an û şûnde bi awayekî belav hatiye bikaranîn. Di vê navberê de jî MHP xistin dewrê, yekîneyên parastina sîvîl yan jî yên herêmî, yekîneyên eniya paş jî li ser zêde kirin peywira qetilkirina gel girtin ser milê xwe. Ji bilî gêrîla çiqas welatparêz hene, derdorên dost hene, bi ser yên paş eniyê de çûyîn pêk anîn.

Di heman pêvajoyê de di gêrîla de nebesiyên cidî ku dihatin jiyankirin hebûn. Fermandariya erzan û heta weke ku bûne dewlet xwedana jiyankirin mijara gotinê bû. Rikeberiyeke pir zêde ya karîyerê, xwe tenê hiştin pêk dihat. Lê peywirên gelik vekirî yên artêşbûnê hebûn; perwerde, rêxistin dema ku rojên zehmet dihatin bi awayekî pir baş xwe bicihkirin pêk anîn, şerekî demdirêj meşandin pêşditin pêwîstbû. Lê wisa nehat nirxandin. Jiyana xwe ya rojane serbirin jiyankirin, li ser pêşketinên heyî xwe razandin, dema ku bi fermandariya hinek şervanên me yên kevn re jî bû yek, dema pêşketina dîrokî hat pûçkirin.

Dijmin xwedî pêşbînî ye û ezmûnên xwe yên dîrokî hene. Me ev pêvajoya pêşketinê ferq kir û bêriya ku belavî artêşbûneke dîrokî û şerekî berfireh bibe me xwest em belav bikin. Pîlana 92'an a dijmin ku tê zanîn hebû; ji hemû aliyan ve Başûr ji qada artêşbûnê derxistin û her ku diçe bi ser Botanê, Amedê de çûyîn û herêmên din ên ku dimînin bi vî rengî dixwest temam bike. Em zanin ku wisa bi ser de hat. Herweha me ev xeterî wisa jiyan kir. Ber bi dawiya salên 1992'yan ve dema ku em hatin, hindik mabû şerê dijmin ê di derbarê Başûr de ser bikeve.

Bi ferasetên sekterîzma-çepgir, bi ferasetên tasfiyegeriya-rastgir hema bêje hevdû xwedî dikirin, xeteriya tevger ber bi tasfiyê ve birin, bi awayekî vekirî jiyankirina wan mijara gotinê

bû. Yekîneyên ku mabûn jî, ya rast dê çiqas bikarin xwe bighînin artêşbûnê ne diyar bû. Dema ku em li mînaka Amedê dinerin, ya rast hinekî şerê jiyana erzan hebû. Yên ku raye bi dest xwe dixistin mîna pozbilindiya burjuvaziya biçûk yan jî mîna pêşnûmeya axayên har rewşa xwe dayîna jiyankirinê mijara gotinê bû. Kesên ku pê bifikire û bêje, "*dê rojên zahmet werin*" nebûn. Dema ku windahiyên pir balkêş çêdibûn jî, li şûna sedemên wê lêkolînkirin û tevdîr girtinê, di ferasetên kevn de israrkirin û hema bêje giştina asta tasfiyeyê dihat jiyankirin. Hema bêje fermandar mahkûmî jiyanake ketîbûn û yek bi yek nekarîn xwe ji îmhabûnê rizgar bikin. Gelik berpirsyarên qadan, di kesayetiya xwe de bi dîrokê dilîstin.

Bi rastî jî xeterî gelik mezin bû û ya herî xeter jî di şerê Başûr de derket holê. Ev li hevkirina bi hêzên noker re hat pêşxistin, ji aliyekî ve li beramberî şerê taybet binketin bû. Ger tevdîr nehatiba girtin, bi serê xwe dikarî dawî li şerê çekdarî bi aniya, yekîneyên hundirîn jî çend mehan li ber xwe dabana jî, eşkerebû ku dê li navçûn nehatiba astengkirin.

Me li beramberî vê tabloyê dîsa bi spartina ezmûnên xwe ve, qada xwe ya tevgerînê kûrtir bikaranînê, ya ku tê ferzkirin û ti mecbûriyeta xwe nîne, rawestandina pêvajoya tasfiyeger ya ku nehatiye heqkirin yan jî bêy ku em tempoya xwe ya pêşketinê qut bikin, me arasteyeke wisa ya zirara wê herî kêm esas girt. Bi tarzê gunditiyê yê xental, xetimî, ji bo derbaskirina nêzîkatiyên fermandar ên tasfiyeger-rastgir me hewlda em awarte ser de biçin.

Hûn çiqas di ferqa van rastiyan de ne, we çiqas tahlîl kir? Dikare bê gotin ku di dîroka me ya partiyê, têkoşîna çekdarî de, dibe ku xirabiya herî mezin a ji aliyê şervanê bêberpirsyar, hêza fermandarê bêberpirsyar ve hatî kirin bû. Ez hîn jî bi hêrseke mezin li ser radiwestim. Ger baweriya min bi perpirsyariya li beramberî dîrokê, şadiya tevgerê û şansê jiyanê nebûya, ew bi xwe jî pir baş zanin ku, diviya bû bi cezayê herî giran bihatana cezakirin.

Hîn jî hinek fermandarên ku dev ji xwe berdane, rewşa xwe ber bi hemû corê bênamûsêyê ve berdane tê dîtin. Niyeta wan li vir nayê nîqaşkirin. Mesele, tevgerîn bersiv dide pêvajoyek dîrokî yan nade, şêwazê xebatê û tempo vê pêk tîne yan nayîne ye. Ne di ferqa vê jî de ne. Weke ku min got, ji aliyekî ve jî rewşa

serxweşbûnê heye, yanî kesên ku fêrî şorbekê bûne, ji nişkê ve dema ku raye û bandorê dibînin matmayî dimînin.

De ka em li tiştên ku li Amedê hatine jiyîn binêrin; ji aliyekî ve devê wan şêrîn bûye, xwe ber bi hewesên desthilatiyê xistine, li aliyê din jî peywirên şer ên pir giran hene, lê li beramberî wê jî qet eleqe nîne. Keda partiyê ya bêhempa heye, bi taybetî jî alikariyên ku em pêşkêş dikin hene. Li aliyekî jî vê îstîsmar dikin. Rewşa ku tam jî jê re tê gotin kadroyekî bela, şervanekî bela derdikeve holê. Ya rast, di nava xwe de jî çawaniya komplo û provakasyon vekiriye. Hejî bi zorî û zehmet meyla ku em dixwazin we ji nav derxin jî ev e. Ji ber fêrbûnên heyî em serê hinekan jî jêkin, em nikarin hineka rizgar bikin. Em bi xeteriyeke wisa re rastî hev hatin. Li oxira paşatiya rojekê, her tişt girtina berçav heye. Di pêvajoya dawî de rewşa herî zêde li ser radiwestim ev xisûse.

Hûn bi asta şer a niha heyî wisa texmîn dikin ku hûn ê bijîn. Hema diyar bikim ku ev xwe xapandine. Temam hevsengî hene û ev şer jî li gorî hevsengiyan tê meşandin. Lê ne hevsengiyên ku we avakirine, ne hevsengiyên we bi ked û şerê xwe pêk anîne. Aliyê herî xeter ê xwe xapandinê di vir de ye. Her yek li qadekê tê jiyîn, lê bi kîja hevsengiyê tê jiyîn, di nav kîja hevgirtina partiyê de, di nav kîja pêvajoya dîrokî de, di çavçoveya kîja pêwendiya navnetewî de, ne di ferqê de ye ku xwe dispêre çi. Tevî van hemûyan jî dibe paşayek. Tiştekî neyê bawerkirine û weke nexweşiyekê di hemû kesî de xwe dide der.

Taybetmendiyên civaka me yên tên zanîn û çanda pergalê ya ku girtine heye. Rewşa herkesi/ê xwe fermandar ragihandinê, mîna nexweşiyê ji jêr heta jor diteyîse. Ji dîsîplîna sereke ya partiyê xwe qutkirine, ji xwe zêde behremendiyeke wan a leşkerî jî nîne. Ji ber ku derdekî wan ê dîtina pirsgirêkên leşkerî nîne, ya ku jiyan dikin ya tasfiyegeriya rast yan jî ya çepgire. Dixwaze bila bimre, dixwaze bila bîjî ne di xema wan de ye, bi erzanî bi herdukan jî qayil dibe.

Ya rast jiyankirina van ne mecbûrî bû, lê xeta giştî ya tê zanîn, lewaziya nêzîkatiyê, taybetmendiyên gundîtî, kesayetiyên nîv rewşenbîr ên ku pir ji pergalê bandor bûne û ya herî girîng kesayetên ji şerê me re bêberpirsyarî xwe nêzîkî şerê me dikin, kesayetên di asta navendî de dibin sedema vê. Bi kedên xwe

nejiyane. Bi giranî hewldanên min ên xweser hene. Li ser vê erzan jiyankirin ji xwe re kirine pîşe. Li şûna ku xwedî li rista navendî, fermandariyê derkevin; li ser derfetên heyî, li gorî xwe dibêjin; "*derfet derketin holê, bi qasî ku em ê bikarin pê bijîn jiyan bikin*" yan jî; "*Pergal hinekî şansê jiyanê pêşkêş dike, bi qasî ku em dikarin xwe ber bixin, em berkevin*" Xeteriyeke wisa heye. Ya rast ya herî bênamûs, nêzîkatiya herî xirab ji dîrokê re; derfetê azadiyê, derfetekî serkeftinê, bi darêzên kûr ên kesayetiyên wisa, bêterbiyetiya wan, bi nêzîkatiyên berhevdanên bi vî rengî hewl didin vala derxin.

Ez ê zêde li ser vê ranewestim, ji ber ku dahûrînên sala dawî di derbarê derbaskirina van de ye. Tegez divê ku em rê lê bigirin. Hûn bi van pir zêde hatin perwerdekirin û em bi encamên wan re mijûl dibin. Diyarkirina vê jî sûdmende; ger pêwîst bike di derbarê pêvajoya borî de em ê darizandineke kûr di dema pêş de bikin.

Wêke tê dîtin dema şerê giştî, bi vê ferasetê re hevgirtinê pêk tîne, wê bi temamî xwe bigihîne serkeftinê, ango xeteriyeke wisa heye. Jixwe di pêşketina stratejiya şerê giştî de, cihekî diyarker a vê ferasetê heye. Rewşa min stratejiya şerê taybet dinirxîne û li gorî wê bilind dibe. Ji ber ku asta fermandar a tasfiyegeriya rast dibîne, baş zane ku zêde ne xwedî pêşbînî û tevdîre. Dizane ne bi tevdîre û li gorî xwe şansê serkeftinê teqez dibîne. Tevdîrên awarte yên ku ez pêş dixim, nêzîkatiyên ku ez li beramberî jirêderketinên rast û çep pêş dixim û li beramberî fêrbûnên jiyana rojane taxtîkê qad girtinê yê ku ez ferz dikim nebe; dê nêzîkatiyê erzan yên fermandariyê ku hûn zanin û şêwazê şer, bi asanî rê li ber herêm girtina dijmin vekin.

Hinek ji wan sengerên amade jî nikarin li gorî şer vesaz bikin. Ya ku ez li vir dibinim " *Li vî çiyayî wisa bi cih bibe*" bûyera ku ez dibêjim, ew naxwaze di şeş mehan de bibîne. Ji ber ku rehete, zahmetiyên xwe nîne di geliyekî de xwe bi cih dike û heta ku linav diçe radiweste. Vesaziyeke pir sînordar bike, teqez wê giran bi dijmin bide windakirin, herêmek dê qet dijmin nekevê bi şêwazekî bêberpirsyar dihêle û dikare radestî dijmin bike. Yan jî dema ku dixwaze li ber xwe bide tam jî dikeve şerê sengerê, dikeve şerê eniyê, ji nişkê ve windahiyên ku qet gêrîla nade dide, lojîktîka ku divê bi baldarî bikar bîne bi asanî dixe destê dijmin.

Nêzîkbûnek xental, zêde xwe tengav nake, nexasim naxwaze peywirên demê yên kûrkirina gêrîla û şerê bi liv û tevger derbasî hinek qadan bike, her wiha girtina van qadan berdêlên giran bi dijmin dayînê ve xwedî lêderbikeve.

Ev xeteriyeke girînge û em naçarin ser de biçin. Hema bejê ev sal û nîva dawî bi pevçûnek wisa derbas bû. Tenê ne bi dijmin re, bi xentaliya yê me re, yên ku nayên qayde-qûralê, yên ku qet ne li gorî rastiya şerin, heta dawî hoveber, evîndarê xwe, asoyê şer nîne; çiqas karî rojê rizgar bike, bi hesabê wisa erzan ên gundî, heta dawî ferdî, heta bila hertişt linav biçe tenê ew bimîne li beramberî nêzîkatiyên wisa yên bêberpirsyar bi şerkirinê me xwest em vê pêvajoyê qezenc bikin. Ya rast a ku me fersend nedayê ev bû.

Di vê wateyê de serdeçûnên sala dawî şayanî lêkolînkirinê ye. Ger ji xwediyê van ferasetan re bê hiştin, ya rast dê zûde pêngava şerê taybet serketiba. Ev tê çi wateyê dema ku em liberçav digirin divê ku mirov ji van camêran bipirse. Bawerim hem ev arasteya pratîkî, hem jî asta dahûrînê di dema pêşiya me de bêteyisandin, em ê vê rastiyê bi bandor bibînin. Me li vir hinekî dît, niha dor hatiye ji hemû çêkerê û kesayetan re nîşandanê.

***B- Di Dema Pêşiya Me De Pêşketinên Ku Dê Bên Jiyîn Û Peywirên Me Yên Şoreşerî Teqez Divê Ku Em Ser Bixin.***

Di dema pêşiya me de li nav welat, dervî welat di hemû qadan de û ji aliyê siyasî û leşkerî ve em ji hemû aliyan ve serde diçin. Divê ku ji van hemû aliyan ve bi fêmkirinê em bikarin ser bixin.

Me bi têgehên giştî dest bi vî karî kir. Em ji jiyana azad yê çi wateyê bigrin wê veguhere şerekî çawa min di çîroka jiyana xwe de bi awayekî zelal nîşan da. Wekî din me dahûrînên berfireh ên taxtîkî jî kirin. Me ev ji bo çi kirin? Ji ber van ferasetên ku tên ferzkirin, ji ber ferasetên ku li ser we serwerin me kirin.

Me ev pirs pir zêde ji we kirin; bi rastî jî hûn berxwedêrin, bi rastî jî hûn şoreşgerin? Bi rastî hûn weke endamê partiyê dixwazin şer bikin, hûn alîgirê şerê çekdarî ne, hûn dixwazin di nav de cihê xwe bigirin? Ger hûn bi sebrin pirsên ku hatin pirsîn hene, hûn ê bibersivînin? Em ji fîzîka we bigirin heta ruh hûn ê xwe bigihînin tevgerîna pêwîst, hûn ê hêza hizirinadinê dest

bixin? Peywirên şoreşgeran ên giyangir hene, hûn ê durist nêzîkî wan bibin? Hûn ê dev ji nêzîkatiyên xwe yên berê ku dibêjin; "*Çawa be jî pêşketin hene*" berdin?

Civakê îflas kiriye, tiştek bi navê jiyana birûmet nemaye. Piraniya we dibêjim; "*Em biçin bila partî me bide jiyîn*" Ma hûn ê dev ji vê jiyana bê anûr bernedin, hûn ê dev ji bûyîna bar bernedin? Li gorî we hinek pêşketin hene, asoyê we naxwaze ji vê wêdetir bibîne. Mesele pêşketineke sînordar heye, hûn amadene ku deh salan li ser vê razên. Hûn amadene dev ji vê berdin? Ji ber ku şerê dijberî şoreşê cih ji vê ferasetê re nahêle. Hûn ê dev ji serxweşiya bi çend serkeftina yan jî bandora pêşketinên giştî berdin, li beramberî peywirên pir giran rast nêzîk bibin? Piraniya wan dibêjin; "*Ez ê bimrim, lê nêzîk nabim*" ev feraseta kêye? Ev feraseta ku dibêje; *"Ez ê bi dengbûna xwe şer bikim, pêwîstî bi xwe tengavkirinê nabînim, ez çawa dixwazim ez ê wisa şer bikim, çawa dixwazim ez ê wisa bikim"* bi serê xwe ji bo şer hereşe ye, hûn ê bikarin devjêberdin?

Em pir zêde bi van pirsgirêkan re mijûl bûn. Heta niha jî nebesiya kûr a kesayetiya Kurd di vir de ye. Naxwaze ji bûnewereke îsyanger wirdetir biçe. Ger hûn şer bi pergal, tam mîna hunerekî, hem jî di şert û mercên me de hûn bînin berçavê xwe ev afirîneriyekê dixwaze, bi qasî ku hûn dixwazin îsyan bikin, di bin navê gêrîla de bi qasî hûn dixwazin xwe bidin axaftin, hûn ê nikaribin tiştekî rizgar bikin. Me dît ku çiqas girîngiyê didin derbaskirina vê. Ger hûn bînin berçavê xwe hejmara yên ku naxwazin fêm bikin zede ye, di rewşa heyî de li ser bingehê ku me şer vegot, hûn çiqas amade ne ji vê re?

Ev rastî derket holê, yan hûn ê rast nêzîkî şer bibin, yan jî hûn ê bicehimin biçin. Bi taybet di dema pêşiya me de em ê lêpirsînê pêş bixin. Dixwaze bila yên nû tevlî şer bûne yan jî tevlîbûnên kevn bin, tevlîbûn asta jêr, ango jor bin pirsên bingehîn ku em ji hemûyan bipirsin hene. Berî hertiştî, hûn xwedî ferasetek rast a dîroka partiyê û artêşê ne? Hûn çiqasî amade ne ji pênasekirinek rast a xwe li beramberî vê pêvajoya dîrokî, rast dahûrandinê û li gorî rewşê ji darizînê re? Bifikirin, dixwaze yekser, dixwaze neyekser, di bin bandora ferasetên curbecur de kî çiqas bare? Yên ku di asta herî kêm de nikarin pêwistiya şer pêk bînin dikarin kîja şerî pêş bixin? Yên ku nikarin derfetên amade

ên şer jî bihevgihînin, ji çar-çûr kirinê xwe rizgar nakin çawa dikarin bibin pêşeng?

Ez van mijaran zêde venakim, ji ber ku axaftinên Îlonê yên ku me kirin û li hemû welat belav bûn de, hemû axaftin gelikî vekirî bûn û perspektîfeke baş pêşkêş kirin. Li wir çi çiye, bi qasî ku hûn di eynê de xwe zelal bibînin de ne û hûn naçarin bibînin jî. Me pêwendiyên provakatîf ên dema borî ji hemû aliyan ve dahûrandin. Me ji hemû kesên ku ne rast nêzîkî jiyanê dibûn re jî nîşan da. Hûn ê vê fêm bikin; em ne mecbûrin we li ser pişta xwe bigerînin. Li ser navê hevaltiyê, li ser navê nêzîkatiyên kevneşop, li ser navê ehbab-çawîşiyê jiyana artêşê nabe.

Ez dubare ji we re bejim; ger di dema pêşiya me de jî hûn nêzîkatiyên teng bidomînin, niyeta we ya baş jî di nav de, herî zêde hûn ê bi vê reşwa xwe nikaribin bidomînin bibînin. Ti artêş, ti rêber, nikare vê nêzîkatiya we bipejirîne. Jixwe jiyana we li beramberî dijmin ne tişteke. Ger we xwe ji mirinê re nerazandiye û hûn naxwazin vî rêberî bidin kuştin – Jixwe namerdek hebû digot; "*bi hesasî kuştin*- hûn ê xwedî li erkên xwe derkevin. Bi hesasî kuştin çiye? Weke pêwîst persiv ji erk û peywirên xwe re nedayînê. Ji vê re digot bi hesasî kuştin. Ma ev erka te ye? Ger tu bixwazî bi hesasî bikujî, tê bê kuştin. Rêberek xwe nade kuştin. Hûn ê van bizanin.

Rêbertî îsyane, Rêbertî şere; rastiya ku dikare hemû ziraviyên jiyana raber bike ye. Di bin paşverûtiyên we de ev çawa pêk were? Hûn hîn di bîst saliya xwe de ne hûn nikarin xwe bigihînin asta komeke gêrîla. Çima wê giraniyên te rake? Xentalî, zexelî, serê xwe neşixulandin, weke tê xwestin xwe eyarnekirin heye. Wê demê dê ev Rêbertî te belav bike, tê ber bi dijmin ve bireve, ew ê jî te belav bike. Ev, dişibe rewşa çêkera kalantorên ku nekarî henase bigirin. Bêgûman tê henase negrî, yan wê şoreşa dijber we têk bibe, yan jî şoreş. Vebijêrkeke vê ya din nîne. Ji bo vê jî pêwîstî bi firmêskên çavan, libergerînê nîne. Tu nikare bi ketina nav nêzîkatiyeke provakatîf, ziravkirinê û bi xwe pêşandinên sexte yên hêz xwe ji vê rizgar bikî. Bawerim me ev baş dahûrand û hemû çêkera partiyê ev fêm kir.

Hûn dixwazin bibin artêş û bi gîştî jî milîtan. Di serî de ev tê çi wateyê hûn ê vê bi ruh û mejiyê xwe bidin qebûlkirin. Hûn ê fêm bikin xala ku herî zêde jê tengav dibim ev e, nexasim çîroka

xwe jî ji bo vê vedikim. Hemû çêkera partî û artêşê naçare vê fêm bike. Wekî din kiyê we bide şerkirin, kiyê çek bide destê we? Hûn li cihê ku lê rûniştîne nikarin rabin ser xwe, ma şerkeriya gel wisa dibe? Hûn bi rêk û pêkî nikarin du gotinan rêz bikin, ji bilî mirinê tiştekî din ji deste we nayê, em ê çawa we bidin jiyîn?

Hûn dixwazin bibin artêş, lê yê ku dixwaze artêşê ava bike ji min zêdetir divê ku xwe bide pêdiviya vî karî. Ji min zêdetir bi îdeabûn, bûyîna hêza çareseriyê karê we ye. Ji ber ku hûn zêde newestiyane û we zêde kar jî nekiriye. Berî hertiştî xwe di rewşeke tendurist de hiştin pir girînge.

Em hîn jî li beramberî ferzkirina hinek pêwendiyan di nav îsyanê de ne. Ji şervanên ku tên qadan re dibêjin; “*Hûn kêr nayên”* û ber bi rast û çep ve dişînin. Jixwe di wê dema borî ya tasfiyegeriyê de, bi sedan kes ji wargehan şandin malê wan. Li gorî min ger destê wî/ê çek digire, çav hinekî dibîne, dikare li ser piyan raweste, ji bo şerkirina wî/ê bese. Ya din ruh dayîne û ev jî peywira me ye. Raman û bawerî dayîne, ev jî karê fermandarê gêrîla ye, ger hebe berpirsyarê partiyê karê wî/ê ye. Dibêje; “*Di tengezariyê de ye, bila biçe mala xwe”* Tu tawanbarî, beriya ku ez wî bişînim ez ê te bişînim, ez ê te parçe parçe bikim. Ji niha û şûn ve zagona ku bê karanîn ev e. Ger tu gelê xwe, mirovê xwe jî ji şer re amade neke, em ê çi navî li te bikin?

De ka binêrin li gel min, gelo kes dibêje ez nexweşim? Ger bêje jî piştî mijûlbûneke kurt çar çar ji şer re nehat amadekirin, hûn çi ji min dikin bikin. Min ev jî ji we re got; ez neyekser bi ser we de têm. Ger ez fermandariya yekîneyeke pratîkî bikim, ez ê wê bikim yekîneya agir, bikim yekîneya bahozê erk ev e. Hûn ê yekîneyên amade jî sist bikin, ber bi rast û çepê ve belav bikin û paşê jî derkevin pêşberî me. Ez ê bipirsim, ez ê hemû corên pêwendiyên wisa yek bi yek sibê lêpirsîn bikim, derxim holê, wê çi bersivê bidin? Li gel vê pêwîst nake bigirim hemberî xwe jî. Dîrok heye, wijdan heye, mirov ji xwe re rêz digire. Ma nabêje; “*Min çi kir”*

Di qonaxa pêşiya me de em ê berfireh darizandina vê bikin. Jixwe wekî din dayîna jiyankirina we ne gengaze. Paşverûtî ne çarenûse. Ma qet rêzdariya we li beramberî jiyanê nîne? Ger heye hinek derfetên partiyê, hûn dibînin ev ji aliyê min ve jî çawa tê karanîn. Ez hêza axaftinê ya partiyê çawa bikar tînim, ez çawa

hinek derfetên partiyê seferber dikim, hûn ê çima vê nebînin û bikar neyînin? Çiye, derfet zêdene. Biçe ji dê û bavê xwe bipirse; derfet zêdene yan na? Ji yê ku di nav şerê dijwar de ye, îşkence lêhatiye kirin bipirse; bê ka derfet zêdene yan na? Em di rewşa avakirina gelik biryargehan de ne. Bi mehan xwe nade perwerdeyekê, dibêjin pêwîst nake, çek dirize, dibêje pêwîst nake em belav bikin. Pêwîste camêrê ku vê dibêje mirov bixe girtîgehê. Em pêvajoya mirinê dijîn, em ê vê darizînin, em ê di dema pêşiya me de vê hesabxwestinê temam bikin.

Hîn jî tê bîra min; şerker zêde ye lê zêde perwerde nîne, çek zêdene lê em nikarin rê li rizîna wan bigirin, çiyayên gelik baş ên ku tu dikarî ji dijmin re bike goristan hene, lê senger girtin û xwe bicihkirin nîne. Başe, tu çiyî? Dibeje; "*Ez bela me.*" Divê ku hûn qet jibîrnekin bi gotinên herî giran ez bersiv didim vana. Di vê wateyê de merhemeta min nîne. Jixwe hesta merhemetê yê beramberî xwe pir zêde biçûk dîtine.

Yê ku bi rêk û pêkî binkeyan nagire, rast li çekê nanêre, rast li hevalên xwe nanêrê bênamûsê herî mezine û em nikarin wî/ê di nav xwe de bihewînin. Ger ez jî weke tê xwestin Rêbertiyê nekim, ev ji bo min jî derbasdare. Hûn ê vê fêm bikin. Ne fêmkirin çiye? Xwedî li çekê derneketin çiye, girîngî nedayîna binkegirtinê di çiyê de, çiya rast bikarnanîn çiye? Şervan heye, ji hemû aliyan ve ew perwerdenekirin çiye? Hêceta vê heye, bê van ma mirov dikare bijî? Encam linavçûne, hûn ê hemû bimrin. Hûn dixwazin bangewazî ji bo mirin û binketinê bikin? Kî vê dike? Ma ev ne talîmata rojane ya waliyê şerê taybete, çiye? Çiye, dibêje; "*Ez zexelim, dixwere nabînim*" Rezîl! Pêwîste kesên wisa di serî de em ji jêr heta jor di nav xwe de rast bikin.

Taybetmendiyên ketî yên kesayetiya Kurd, bi gelemperî jî taybetmendiyên gelên hatine xistinin. Azadî yan jî feraset ji van re nayê nasîn. Çiqas xirabî hatibe serê me, ji ber vê ferasetê ye. Me dikarî em serkeftinê dest bixin, me hemû derfetên wê bi dest xistibûn. Heta niha jî gelik biryargehên me, berpirsyarên me yên herêman pêdivî bi binkegirtinê, nexasim lojîstîkê, sengergirtinê, bi taybet di ruh û mêjî de ji amadekirinê re naxwaze eleqe jî nîşan bide. Weke ku pirsgirêkên sereke ne ev in, dixwaze rêveberiyeke erzan, bi erzanî hêz bixe bin venerîna xwe û nizane bi rêk û pêkî jî karbîne.

Ev corek nexweşiyê ye! Tenê bila vê rêveberiyê desteser bike, bila fermandariya mangê bi dest bixe û her ku diçe di fermandariyê de pileya wî bilind bibe, lê ji bo çi? Ger bêjim; " *Beriya vê pêwîste tu binke ava bikî, perwerde pêwîste."* Ew ê jî bêjin; "*Karê partiyê ye, karê Rêbertî ye, karê min rêveberiya erzane, bidestxistina karê erzane, yan jî bidestxistina fermandarî û kariyera erzane."* Tê devji vê berde. Ez vekirî daxivim; ger tu devjê bernedî ez ê çi bikim min di dahûrînan de anî ziman. Dubare naxwazin gotinên giran bikim. Li benda rehmê û rexnedayînê nebin. Ez ji bêsînor xizmetkirinê kêfxweş dibim, lê yên ku di neyêniyên wisa de israr dikin ya rast kuştina wan jî dê kêm be, divê ku mirov ji vê xirabtir bîne serê wan. Yên ku ewqas bêrêziyê şayanî xwe dibînin, şayanî taybetmendiyên şervanên tevgera me, taybetmendiya fermandariya tevgera me dibîne, wê pêşî dijmin bêhalkirin.

Vekirî daxivim, paşê nebêjin me fêm nekir. Ger hûn fêm nakin ez dikarim careke din bibersivînim. Te kîderê fêm nekir? Dîtina stratejiya çiyayekî gelik zahmete? Ma di ruh û raman de qezenckirina şervanekî gelik zahmete? Ger tu ruhê wî/ê qezenc neke tê çawa bide şerkirin? Şervênê ku rik li beramberî te girt dê biçe gel dijmin yan jî wê bireve şer neke. Binkegirtineke rast nebe, sengergirtineke rast nebe tê çawa dijmin pêşwazî bike? Çiya ji te re teng tên? Pêşwazîkirina pêdiviyên lojîstîkê nîne, tê gelik koman linav bibe, tê hertim xwe bispêre gundan? Her roj ji bo pêşwazîkirina pêdiviyên lojîstîkî, tê koman linav bibe? Ev komkujîye. Yên ku heman tawanî du-sê caran dike divê ku mirina xwe jî bigire berçav. Hêjî hûn ê vê fêm nekin? Ger ev hêz bi te re nîne, dernekeve çiyê ango tevlî rêfên gêrîla nebe.

Li gel vê, ma ji mirovan re bi dilekî xweş gotina; "*Hûn bi xêr hatin"* pir zahemete? Bi mehan rewşa şervanekî/ê pirsnekirin, pêdiviya fermandariyê ye? Di kîja pirtûkê de fermandariya wisa hatiye dîtin, we li kîderê dît? Şervanek tê bi mehan tê sekinandin. Ev tiştekî neyê bawerkirine, ewqas bêedebî çawa tê kirin? Yekîneya xwe ya şer heye, bi mehan civînekê çênake. Sosret! Dibêje; "*Em wisa fêr bûne"* Na, ger tu wisa fêr bibî ti xilasiya te nîne. Yan tê bibe camêr yan camêr, wekî din çareya xwe nîne. Tu bi çi dilîzî? Çiye dibêje; "*Ez mirovekî hovim, gundiyekî hovim, Burjuwayekî biçûk ê şiyar û sexteme, ez fêrî wisa îdarekirinê*

*bûme"* Tu derewa dikî, dixapînî, tu ji bêrêziyê re pesindayînê dixwazî yan jî tu ji wê re derketinê dixwazî. Ev ne gengaze. Bese!

Karên ku ez dikim hene, min çîrok bi berfirehî ji we re vekir. Dema ku ez çûm malbatekê min serxist, xwe gihand gelekî bi mîlyonan. Ez jî dikevim gelik qadan. Ez bi qezenckirina mirovekî dest bi kar dikim. Despêkê hewl didim bi qasî qebrekê cih bibînim. Ma dema ku hûn jî diçin cihekî, ji xwe re nabêjin de despêkê ez bi qasî qebrekê cih vekim, pêwendiya dostekî pêwîst nake, ji bo van divê ku mirov gelik zanabe? Ger hûn şervanên cidî ne, hûn dixwazin darbeyeke baş lêdin, ma ji bo vê hewce nake tu despêkê yekîneyên saxlem ava bikî? Ma rêya vê di çareserkirina hemû corê pirsgirêkan re derbas nabe, ma dîtina van gelik zahmete? Li kîderê ma şêwazê hov ê gundîtiyê, li kîderê ma pozbilindî, bi kîja sedemê dikare bêparastin?

Eşkereye ku tu kes nikare bi hêcetan nêzîkî rastiya şerê me bibe. Ji ber ku em ê nepejirînin. Ma niha ez we biqewitînim? Hûn serkeftinê dixwazin, lê rêya serkeftinê di xwe gihandina vê re derbas dibe. Aliyekî vê ya neyê fêmkirin nîne. Çima zexelî? Hûn dibêjin; "*Bila kes ferz neke"* Ez vekirî dibêjim; ez ji we re dibêjim ger ez jiyaneke ji hemû aliyan ve şer gengaz dike ferz nekim dijberî min derkevin. Tu kesê ji we re dibêje; "*Ez dixwazin li ser pişta we axatiyê bikim, bi erzanî min li ser pişta xwe bidin jiyîn"* jî nîne. Ez amade me hemû karê xwe bi xwe bikim. Ji ber ku şêwazê şerê me vê pêwîst dike, naxwazim ji kesî/ê re bibim bar.

Ez bi behremendiyên xwe yên taybet dijîm. Li beramberî vê ez xwe weke kesekî tiştek nekirî hesab dikim. Rojane kedên xwe yên dema borî ji kedê nahesibînim, ew yên gelin. Ji min re Weke ku min tiştek nekiribe tê. Li beramberî vê yekî tiştek nekiriye radibe û ji min serweriya partiyê dixwaze, dixwaze herkesî mîna koleyan di bin fermana xwe de bigire. Tu harî, ma ev gengaze? Heta ferasetên wisa yên ji rêderketî neyên derbaskirin, bi erdê re nebin yek, hûn nikarin weke ku dixwazin xwe tevlî şer bikin, rêveberiya şer nayê avakirin, taxtîkên şer nayên bikaranîn. Heta dawî zanîn ji bo herkesî ye, heta dawî bikaranîna qûralan, her dem û ji bo herkesî ye.

Hinek ji wan dibêjin; "*Ez xwe nawestînim"* Ger tu xwe newestînî, qûralan bikarneyînî, dema ku tu karneyîne jî tê winda bikî. Di gel vê mejîyê te heye, dilê te heye, tê çima bi kar neyîne?

Dijmin şerê gelemperî ferz kiriye, rizgarkirina we jî mûcîzeye. Di vê rewşê de tê çima behremendiyên xwe karneyîne, ma hemû nakevin gorê? Gelik ecêbe! Teqez ev ji jiyanê reve. Yên ku mirinê şayanî xwe dibînin, ber bi mirinê ve dibezin, hem jî bi bêrûmetî. Ji ber vê jî min îsyana xwe ya di temenê deh salî de vegot. Ger dixwazim bijîm, ji bêmafîyeke herî biçûk re naxwazin serî bitewînim, naçarim wisa bidest bigirim.

Hûn îsyana herî berfireh a dîrokê, şerê gel, bi kesayetiya xwe ya kêr nayê, ya herî paşketî dixwazin bijîn. Divê ku dilê we bi rewşa we bişewite. Bi qasî ku bi rewşa min a deh saliyê ve neyê berawirdkirin, hûn paşketîne. Wê demê ez ê çi li we bikim? Di vir de hûn ê hinekî bizanin lêpirsîna xwe bikin. Hêvîdarim ku hûn baş lêpirsîna xwe bikin. Min ji niha ve dest bi lêpirsînê kiriye. Hûn ê nefsa xwe terbiye bikin, xwe bigihînin kesayeta artêşê, bibin kesên ku ji hemû erkan re amade û bi qasî vê xwe amade bikin. Ez ti hêcetên din nas nakim. Ewqas sebir, derfet û îmkan besin. Ezmûna min a jiyanê heye. Êdî ez derfet nadim xirexavbûnê. Teqez tawîz nadim ji van rewşên we yên kelogirî, ya ku mirov jê şerm dike, lanetkirî û reftarên we. Ma ez bi dîrokê û jiyana azad bilîzim? Jixwe egîdî raveya herî mezin a jiyanê ye, ma em ê bi wê bilîzin? Ger di vê wateyê de hinekê rêzdariya we hebe, hinekê egîdiya we hebe, kî daxwaze em bi wê/wî bilîzin?

Hûn ê van teva fêm bikin. Bêy ku hûn fêm bikin hûn nikarin bijîn, mirina herî xirab li benda we ye. Ji we re rêzgirtin, bi dayîna mafê jiyana azad ji we re gengaze, em hewl didin wê nîşan bidin. Tu kesê li dijî vê derdikeve nîne. Ji ber ku berî hemû tiştî pêwîstiya me ji nan û avê zêdetir bi jiyana azad heye.

Ya rast hûn jî dixwazin koletiya hezaran sal a dijmin bijîn. Hûn ji hemû taybetmendiyên mirov ên ji rê derketine –ya rast ne taybetmendiyên mirove jî, taybetmendiyên paşverû yên ku ne hêjayî mirovin- re azadiyê dixwazin. Nabe! Paşverûtî çiye, zexelî çiye, nehizirandin çiye? Ev taybetmendiyên lawirî ne. Lawir jî ne wisa ne. Ev taybetmendiyên herî xirab ên bela serê mirovin. Çima em heta dawî nehizirin, çima heta dawî em tevgerînên xwe yên li gorî taxtîk rast nedin avakirin, çima em gotina rast nebêjin? Rêveberiyek ber bi mirinê ve diçe heye, em ê çima li dijberî ranewestin? Bi zanabûn ji bêtedbîr ber bi linavçûnê dibe, çima tê jiyanê emanetî wî bike? Kîne ev? Ji kî hêz digirin?

Tenê yek ji van bi hezaran nirx birin. Hûn hemû jî dikarin van bibînin, tevdîran pêş bixin. Ez vê bi taybet destnîşan dikim; nebêjin me fêm nekir, em bergorin û xwe nexapînin. Ger hûn xwe ferz bikin û bimrin ez ê tenê bêjim; "*Dawiya xwe bi xwe amade kir*" Wê dilê min jî li ser we ne êşe. Jiber ku pêwîste mirov bizane rast bimre. Bêy ku tu tevdîran bigirî ger tê bimre, em ê ji wan re wesfa şehîdbûnê jî zêde bibînin.

Di qonaxa pêşiya me de di van ferasetên sereke de baldarî bê raberkirin, feraseteke rast û teqez a ber bi çareseriyê ve dibe ye. Encamê ezmûneke mezine. Teqez pêdiviya jiyanê ye û jiyaneke hesan û sade ye. Herkes dikare xwe bigihîne vê jiyanê. Tenê bila berpirs li beramberî berpirsyarî, şervanek jî li beramberî şervaniya xwe rêzdar tevbigere. Ger tevnegere wê çi bibe? Tevnegere wê bê cezakirin û em kêlî bi kêlî di nav sepandinê de ne. Dubare dibêjim; hem jî wê pergala ceza weke berê nebe. Wê kes nebêje; "*Ez ê xwe wisa ferz bikim, veşêrim.*" Rêxistinê tevdîrên xwe pêş xistiye. Camêrê ku vê bêje, her hal ez jî dê zanibim tevdîra xwe pêş bixim. Nebêjin; "*Me fêm nekir, nebihîst*" zelale. Herweha ev ji bo jiyana we xalên teqez divê bên kirin û nîşandanin.

Heta niha me bi zahmetî we da jiyankirin. Lê ji niha û şûn de ez dixwazim ber bi serkeftinê ve bibim. Şerê taybet ewqas ser me de hat, ewqas îşkence ferz kirin, qet nebe em tola xwe hinekî di cih de bigirin. Ma ya gelê me û erka me ye jî ne ev e? Çiqas îşkence dike, çiqas linav dibe, gel ji destê wan çiqas êş dijî, ma tu nabîne cihan jî çiqasî napejirîne? Ma şervanên pêşeng wê vê fêm nekin? Ma gengaze mirov tola vê raneke, wekî din we çikir?

Ya rast helwesta tê hêvîkirin ev e; ya ji we tê hêvîkirin rakirina tola sedên sale, tenê ne tola ya ku li we hatiye kirin. Di gel vê de hûn pir hatine xistin û hûn ê tola wê rakin. Wekî din tu kes bi rêzdarî nêzîkî we nabe. Heta min ev jî got; yên ku hesabê camêran jî ji we re bikin wê nebin. Min îspatkir ku ji wê ferqa we ji pîrejinekê jî nebe. Ji bo ku hûn ji vê derkevin hûn ê di şer de xwe îspat bikin. Ger ev raste, wê demê sernexistin nayê hizirîn. Divê ku bi ser hemû erkan de çûyîn hebe û ew erk bêqezenckirin.

Ger hûn baldar bin, bi vê nêzîkatiyê xwe amadekirin, bersiva herî mezin a ku hûn ê bidin şerê taybete. Ji vê şûnde şerê taybet perpût bûye, di pêvajoya paşketinê de ye. Ji ber vê jî wê bi

asanî ji ser dikê danekeve û wê hîn bêtir har bibe. Lê hêza wî ji lûtke ber bi hilweşînê ve diçe. Em vê pir baş bibînin, di sala pêşiya me de, ev şerê taybet wê bêtir perpût bibe, hilweşîn lez bibe. Lê ev nayê vê wayetê ku wê xweber bê derbaskirin. Em ê hişk lêdin, ji bo lêdaneke bandorker em xwe amade dikin, ya rast em ê dema bagerê ferz bikin. Em ê gêrîlatiyeke rast, bi yekîneyên rast ên bagerê şer ferz bikin û em ê lezê bidin karê hilweşînê. Perspektîfa dema pêşiya me ev e!

Di derbarê sala borî de yên ku bên gotin; dijmin bi hemû hêza xwe ve serde hat, lê ser nexist, ya ku di derbarê sala pêşiya me de bê gotin; ketine pêvajoya perpûtbûnê, lê bi qasî ku yekîneyên me bi şereke serdest lêdin, dibe ku karê hilweşînê bikeve pêvajoyeke lez. Weke ku wê nikaribe bi asanî xwe komîserhev bike, ji holê rakirina sengerên me li aliyekî, berfirehkirina sengeran wê pêşkeve. Hemû qadên ku bên valakirin wê bibin cihên ku artêşên me xwe tê de bi cih dikin û herêmên ku bi asanî dijmin nikare bikevê. Dijmin bi valakirina van herêman dibêje; "*Me ew ji lojîstîkê û gel qut kirin.*" Em ê jî jê re bêjin; "*Berevajî te ji me re herêm vekirin.*"

Em baş bizanin ku ev jî tê çi wateyê? Armancê wî yê valakirinê cuda ye, yê me jî armanca serdeçûyînê cuda ye. Şoreşe dijber hildiweşîne, şoreşger jî bi hilweşandina şoreşa dijber re ava dikin. Cihê ku ew diruxîne jî em ê çêkin. Cihê ku em ê ji dijmin jî biruxînin, em zanin em ê çawa çêkin. Valakirina van çiyayan ne windahiyeke. Heta tu zêde bi ser gêrîla de biçî destkefteke, ger na tê bifetise. Ji ber ku dibêjin taxtîkê masî ji avê qutkirinê. Tê bi çi bibersivîne? Berevajî, tê li vir bi taxtîkê gol veguhertina behrê, qada ku gêrîla lê xwe bi cih dike bikûrkirin û berfirehkirinê bibersivîne. Li beramberî taxtîkê masî ji avê qutkirinê, gengaze ku mirov qadeke berfireh ji bo avjeniyê ji masî re veke û niha jî tam dema vê ye. Dijmin vala kir, qada golê fireh bû.

Wekî din ne gengaze. Wekî din serkeftina taxtîkê şerê taybete. Wê çawa gengaz bibe? Lojîstîka ewqas qadên berfireh dikare cuda bê amadekirin. Sengergirtin dikare bê firehkirin, hejmareke zêde şervan dikarin bên perwerdekirin. Êdî tê wisa mezin bihizire, mezin perwerde bike û hêrêmên rizgarkirî bafirîne.

Qonaxa pêşiya me ji niha ve rastiya ku dijmin amadekiriye û dibêje; “*bigire û ya pêwîst bike”* ev e. Lê ev jî tam li gorî rastiya artêş û şervan ketinê ve gengaze. Di vê qonaxê de ger ya pêwîst tu nekî, di demên borî de dijmin çi kir, wê dîsa wê bike. Dema borî mîna bagerê ket nav, teknîka di destê xwe de baş karanî, serdestiya hejmarê bikaranî û ez baş dizanim ku yekîne çiqas tengav bûn.

Ji bo ku nebe çi pêwîste? Tê bizane artêşê mezin bike, tê kûrbûnê pêk bîne. Divê ku em weke yekîneyên baş hatine perwerdekirin, gêrîlatiya ku bagerê bibîrtine dijîn û weke yekîneyên şer dikin binirxînin. Gêrîlatiya dema borî zexel, li gorî dihat xwestin senger nedigirt, ji dolekê jî nedihat derxistin nayê hizirîn. Gelo ev gengazin? Bêgûman gengazin. Ji xwe armanca gêrîla jî ev e. Gêrîla wê li kîderê çawa lêde, bêy ku dijmin pêbihesîne tevdigere. Qada tevgerê, ger pêwîst be nihîniya xwe, li kîderê û wê çawa lê de tenê ew bi xwe dizane. Divê ku hemû yekîne xwe bigihînin vê astê. Ji bo vê ger pêwîst be perwerda fîzîkî, ger pêwîst be heta dawî perwerda moral wê bêdayîn, perwerda teknîk wê heta dawî bêdayîn.

Piştî ku te ew qad girtin û şûnde, gundên stratejîk ên ku dijmin ava bikin jî depoya me ya mirovane, metrepol depoya me ya mirova ye. Em bi Amedê bifikirin; herêmên li wir zêde dibin hene, depoyê, mirovane, ber bi wan deran ve çûyîn vesaziyeke teknîkî ye. Lê eşkereye ku xweber çûyîn jî nabe. Hûn ê bizanin cuda û rêxistinên xweser pêş bixin, hûn ê qenalên xweser bihevgînin. Bi yên ku nikarin xwe bigihînin mîlyonan re ti carî şoreş çênabe. Her tim rêxistinkirina mîlyonan esase. Gêrîlayê li çiyê divê ku girseya xwe rêxistin bike. Ev bi asanî dikare bê kirin.

Em ewqas we perwerde dikin, lê hûn, di wan çiyan de ji gel çil-pêncî kesî perwerde nakin. Çil-pêncî mirovên ku ji Amedê bên girtin bi asanî dikare li wan çiyayan bên perwerdekirin û şandin. Hûn her mehê pêncî kesî jî perwerde bikin bese. Herweha bi sedan kes dikarin bên perwerdekirin. Çawa ku em bi rêyên cuda gel perwerde dikin, tu di eyaletekê de bi asanî dikare vê bikî. Lê tu îlehî du gêrîlayên bi narincok bişînî, ew ê jî li ber xwe nede û bikeve xefka polîsan. Di vir de rêveberî xwedî kêmasiye, şêwaz xelete. Weke min got, mirovên ji gel bigire, di nav xwe de perwerde bike, heta biçe malên wan veguherîne hêlîna perwerdê,

sivîl perwerde bike, berî her tiştî jî ji aliyê siyasî ve birêxistin bike. Lê ji ber çekdar ango du çekdaran tu her roj sed kesî bide dest, rêxistin û gel nikare li beramberî vê xwe ragire.

Li vir pêwîste şêwazê xebateke rast bê esasgirtin. Dema ku bi vî rengî bû jî her qadeke gelê me lê kom dibe wê ji bo me bibe qadeke rêxistinê ya amade û helbet hûn ê vê behremendiyê raber bikin. Yên din gêrîla ye, herêmên ku hatine valakirin jî herêmên gêrîla ne. Wisa dizirim ku fêmnekirina vê ne gengaze.

Yek-du tiştên din jî pêwîste. Hûn ciwan jî ji vê şoreşê, bi taybet jî ji vê berxwedaniya çiyê re rast nêzîk nabin. Şoreş, hinekî jî karê azwerî û baweriyê ye. Teqez bi feraseta xwe dayîna jiyankirinê, ferasetên ku di nav civakê de îflas kirine, "*Ez ê biçim, wê partî min rizgar bike*" qet şoreş nayê kirin. De îca çiya encax bi azweriyeke azadiya mezin dikarin watedar bibin. Yên ku xwedî ferasetên; "*Li wir xwarin nîne, rehetî nîne*" bila nêzîkî çiya nebin. Li wir encax tu dikarî şans bide azweriyên azadiya bêdawî. Derfetê bi şans jiyankirina tiştekî din nîne.

Berî hertiştî wê azweriya te mezin be. Dema ku tu çû wir tê li ser bingehê; " *Qada sereke ya ji dijmin hesab xwestinê, qada şerê demdirêj û qada ku bi asanî nayê venerîn kirine. Ji ber vê jî ez ê hemû hesabên xwe baş bikim, lewra qada ku ez ê şerê demdirêj tê de baş pîlan bikime*" û wisa nêzîk bibe. Ger na nêzîkatiya; "*Min li çiyê ya hêvî dikir nedît*" nêzîkatiyeke kerîtiye. Bi feraseteke wisa kes nikare nêzîkî çiya û çoltaran bibe. Ji bo hesab pirsîneke dîrokî ya mezin, serxistina asoya mezin, ji bo derfetê şerekî demdirêj derdikeve çiyê, ji bo hesab pirsîneke bingehî, heta dawî şerkirinê, heta serkeftinê şerkirinê derketina çiyê çêdibe, ne ji bo rizgarkirina jiyana rojane. Lewra divê ku derketin di ferasetê de rast bê kirin.

Ez bi xwe jî hema bêje di çiyayekî biçûk de asê mam. Çima? Ji ber ku her tiştê min, hemû hêviyên min, hemû asoyê min ê azadiyê, encax dikarî di vir de pêk bihata ji bo wê. Ji ber ku min ev hîs kir di asteke neyê bawerkirin de deh salan ji wî çiyayî derneketim. Yan jî li cihekî niştecîh dibim, heta ku ji wir encama tê xwestin negrim dernakevin. De bihizirin, di warê bêgane de cihekî wisa çima bikar bînim? Ji ber tiştên ku dîrok ferman dike mezinin, azweriya azadiyê mezine û ev jî şerekî demdirêj

dixwazin. Ji ber vê jî em bênhfirehîyeke mezin, hemû corê derfetên jiyanê nîşan didin, dest dixin.

Feraset û ruh hinekî wisa hat amadekirin. Ger na tiştên weke; “ *Di demeke kurt de çima serkeftin çênebû, weke ku min dixwest xwarin dest min neket”* û hwd nayên gotin. Na! Di gel vê de, di çiya de şêwazê rast yê dest xistina xwarinê jî heye. Eşkereye ku razan jî dê di çadirên naylon de nebe. Ji her alî ve, hem ji aliyê manewî, hem jî ji aliyê fîzîkî ve rêyên di çiya de xweşik jiyankirinê dikarin bên dîtin. Ma çadira naylon çarenûse? Dîsa di her derfetê de dadikevin gundan û diçin xwarinê tînin. Ev îşkenceyeke. Jixwe divê gêrîlayek jiyaneke cuda jî bixe serê xwe. Ev hinekî karê afirêneriyê ye. Mirov li wir heta dawî li gorî aboriya şer, li gorî şêwazê şer dikare jiyanekê pîlansaz bike. Bin erdê baş amade bike, çend meh berê di her noxtê de pêdiviyên xwe depo bike, li gorî şêwazê parastina xwe ya îhtîmal pêş bixe. Ma tê çima xwe di dorpêçiya dijmin de birçî bihêlî? Hemûyan amade bike, hem jî bi pêşbînî amade bike.

Ev ne erkên min in. Dema ku derketinekê dikim, ez van hemûyan kêlî bi kêlî dişopînim, li kîderê ji min re çi pêwîste, li kîderê razan, li kîderê nobet û wê li kîderê tevgerîn hebe diyar dikim. Jixwe vana hemû sedemên hebûna we ne. Ma wekî din rêbertiya taxtîkî tê kirin? Xala ku em jê re dibêjin rêbertiya taxtîkî ev in. Çiyayek di nav hevpariya wî de ne nirxandin çawa dibe, çiqas gêrîla dikarin di çiyayekî de bimînin, di wî çiyayî de çi dikare bê kirin? Rêbertiya taxtîkî kesê ku hesab û kîtabê van hemûyan dike ye. Di gel vê de jî, ewqas ne zahmete.

Yên ku rewşên em nikarin ji nav derkevin ava dikin, ya ku em rexne dikin feraseta şer û kesayetin. Her tim dixwaze ber bi gund ve biçe, her dixwaze erzan bijî, dixwaze şervanan mîna hemalekî bixebitîne. Heta dawî zexel, ew bi xwe bi çiyê û gêrîlayên çiyê re ketine nav nakokiyane. Karekî sûdmend ku ev bike nîne. Nemaze gelik rêveberiyê biryargehên me wisa ne. Beriya hertiştî divê ku mirov rêveberiya vê biryargehê û vê ferasetê bi erdê re bike yek.

Pêwîst nake ku ez van zêde vekim. Şervanekî hinekî li beramberî xwe rêzdar divê ku vana bi rehetî bibîne, ji dîtinê wêdetir, divê ku berpirsyariya vê rake. Di roje yekem de wisa dihat kirin, di roja dawî de jî wisa tê kirin. Ev ne karekî dehayeke

mezin jê re bê xwestine. Hinekî berpirsyarî, hinekî wijdan, hinekî girêdan bi doza xwe ve têr dike. Heta niha yên karî xirakin, xirakirin, lê ji niha û şûnde wê fersend neyê dayîn. Ya rast jî di astek dijwar de bi morelê herî bilind bê kirin. Ya ku bê kirin jî ev e. Nîqaşkirina van bi serê xwe îşkenceyeke û pêwîste mafê tu kesî jî ji vê re nebe.

Em ê bi vê feraset û ruhê bingehîn bi ser dema pêşiya xwe de biçin. Xalên sereke yên taxtîkî vekirîne, heta dawî cesaret û fedakariya bi çêkera me re heye. Çêkera me ya şervan bi her awayî bi me re ye. Mînak em çûyîna çiyê bigirin dest. Mînak em xwe ji Gabarê re amade dikin yan jî ji Zapê re amade dikin. Gelik çiyayên me yên wisa hene. Weke em dixwazin em dikarin di van deran de xwe bi cih bikin, em dikarin binê erdê amade bikin, çekên xwe bi cih bikin. Şervan jî ji hemû şerî re amade ne. Kîja yekîneya dijmin bikeve wan deran, wê bi hezaran windahiyan bide û naçarî paşvekêşanê bibe. Bikaranîna vê jî erka fermandare. Tê çiya li gorî vê amade bikî, yekîneyên xwe li gorî vê bi cih bikî. Ev erka te ya sereke ye.

Ji gelî dernexe, bi hemû awayî moral têk bide, nebûna xwedî ti amadekariyan ferz bikî, paşê jî bêjî; "*Ez şervanim, fermandarim.*" Jixwe ya ku belengaz dike jî ev nêzîkatiye. Şerekî sînordar hat meşandin, hema bêje dijmin nema karî bikeve ti cihî, heta nekarî bikeve Cûdî jî. Ger şer bihata kûrkirin wê qet nikarîba biketayê. Vaye di dema pêşiya me de em ê karê kûrbûnên wisa bikin. Fersenda me heye, hema bêje di hemû herêmên stratejîk de yekîneyên me hene. Ji despêka zivistanê ve me ew wisa amade kirin û li demê belav kir.

Dubare bêjim; di salên borî de ya ku dijmin nekarî bike wê di sala pêşiya me de bixwaze bike. Lê pêkanîna vê em li vir bihêlin, ji paş ve xistinê wê rizgar nebe. Ger tu wisa xwe bidî şer, tu bi şer nelîzî, derfetên heta niha tu pir bi başî bikar bînî, bi şêwazê şayanî rêbertiya taxtîkî tu li demê û pêvajoyê belav bikî, dê şer bê serxistin. Di vê erdnîgariyê de, di pêşengatiya PKK'ê de, ev ê bibe destkefteke şayanî gêrîla. Bi vî awayî encama xwezayî serkeftineke girînge. Dibe ku em serxwebûnekê bi tamamî dest nexin, lê ev ê di asteke girîng de dijmin ber bi çareseriya siyasî ve bîne. Ger neyîne çareseriya leşkerî em ê ferz

bikin û ji sedî heftê-heştê em ê ser bixin. Ger hûn mîna camêran şer bikin ev wisa ye.

Bawer dikim ku em di salên 1983'an de wisa nêzîkî şer bibûna, herkes bi kûrahî, bi feraseta berpirsyariyê, gêrîlatî wisa şayan ditiba, ew tişta ku dijmin gelikî jê ditirsiya dê hatiba serê wî. Ev asta ku deh sal şûnde em gihîştinê, me yê di sala 1984-85'an de dest xistiba. Deh sal dirêjkirin. Çima dirêjkirin? Vaye şervan jî fermandar jî şûna ku çêkara xwe, xwe li gorî pêdiviyên şer belav bike, bi pozbilindiya gunditiya erzan, ya rewşenbîrên erzan ji ber ku dan jiyîn ev pêk nehat. Nêzîkatiyên rastgir, di ser de derbasbûn, pêlîstin, bi kurtî bi hezaran windahiyên bêwate û di encamê de bi zorê rizgarkirina pêvajoyê derket holê. Dîroka dijminê lanetkirî ya hezaran salî ye, ya din jî nêzîkatiya PKK ber bi serkeftinê ve birine. Ma ev kêm xeternake?

Ev tê wateya ji netewbûnê derketin, heta ji mirovbûnê derketinê. Çawa wijdana we vê nabîne, asoya we xwe nagihîne vê? Ger xwe digihînê hûn çawa nabin şerkerên mezin? Em hewl didin vê jî fêrî we bikin. Ya min dike min, çiye? Hinekî ev xeterî dîtin, ger gengaz be li beramberî vê hinekî derfetê berxwadaniyê nirxandina min e. Ya ku ez dikim ev e. Ma pêkanîna vê gelikî zahmete? Vexwarina cixarê, bûyîna evîndarê jiyaneke ketî xweşiya we diçe? Çima bûyîna xwedî jiyaneke şayanî dîrokê, jiyanake berpirsyar a ku dibêje; "*ez ê wir winda nekim, heta dawî şansê xwe yên jiyanê bikar bînim*" zora we biçe, himêzkirin, hinekî hatina ser xwe, ma li ser vî bingehî gelik zahmete, tabûyên we hildiweşin? Bila hilweşin. Sefseteyên we hildiweşin? Bila hilweşin. Ev salana dê wisa bên destgirtin.

Weke min got me berê wisa girtiba dest, em ê seketibana. Ev ferasetên we yên nebes sê caran ez bi îmhayê re rûbirû hiştim. Dema ku em ber bi sala 1980'ê ve hatin, ji ber peywirên di nav gêrîla de di asta dihat xwestin de nehatin pêkanîn, min bi zorê xwe rizgar kir. Piştî sala 1984'an xebatên ku me bi fedakariyeke mezin amade kiribûn bi tasfiyeyeke giran encam bû, hema bêja salên piştî wê jî wisa hat ferzkirin. Ji ber ku ez xwedî ezmûn bûm min fersend neda. Kî ev kirin? Hema bêje hûn hemû di astekê de jê re bûn amûr, we lihevkir. We pir bi erzanî bikaranî. We got; "*Min bi xeletiya re lihev kir, bi meylên întîharwarî re lihev kir.*"

Ev bi dîrokê lîstine, erêkirina tinekirina netewekî ye, ji mirovbûnê derketine.

Êdî ji niha û şûn de, weke ku we dît avakirina herêmên rizgarkirî, li wan deran rêxistinkirina jiyana azad û divê diyarkirina çarenûsa xwe be. Ma ev ne xweşike? Ma hûn ji hemû aliyan ve ji bo vê ranabin ser piyan, ji bo vê her tiştê xwe danaynin holê? Vaye jiyana ku divê hûn jê re rêzdar bin ev e.

Divê ku ev çawa bê pêkanîn ez ne di wê rewşê de me ku di asta her herêmekê de vebêjim. Yek bi yek rayedarê her qadê, berpirsyar, heta şervan jî wê bizane pêk bîne. Ya rast zêde ne zahmete jî. Hinek qadên sereke yên stratejîk hene, girse heye, metrepol hene, derveyî welat heye. Xebata ku pêwîst di hemû qadan de bêrûnişkandin diyare. Ji niha ve di van xebatên ku em dimeşînin de jî, hûn dibînin ku destkeftên heyî ez çawa dixwazim ber bi welat ve veguhezînim. Hema bêje her herêm wê çawa bikare para xwe ji vê bigire, xebatên di parçeyên din de wê çawa bikarin para xwe bigirin, bi şêwazê ku herêmên sereke wê çawa rojane para xwe bigirin ez belav dikim.

Hûn ê çi bikin? Hûn dikarin çiqasî bikin, divê ku hûn bêjin; "*Para min ev e, ya ku ji min tê hêvîkirin ev e"* bi awayekî sînordar bi xwedayîna jiyankirinê mîna şervanekî bi tendurist xwe di bin ewlehiyê de girtin tê serxistin. Ji wir girtin ger fermandarê qadekê ye, fermandarê yekîneyekê bi nêzîkbûna "*Ez ê çawa bikarim baş pêk bînim"* ve xwe gihandina van encaman zêde ne zahmete. Şerê ku divê di Botanê de bê meşandin ji niha ve pir vekiriye. Ez dikarim yek bi yek rêz bikim bê ka mirov çawa dikare xwe bigihîne Xerzanê, Amedê, Dêrsimê û hemû qadên ku girse tê de kom dibin. Tenê tişta ku em dikarin bixwazin, bi tenduristî henase dayîn û sitendina we ye. Dema ku hûn gihîştin ger hûn henase didin û distînin, ya li şûn ve dimîne dê bê kirin û karên bên serxistinin. Ji ber ku feraset pir vekiriye, şêwazê perwerdekirina we ji bo bi ziravî girtina dest a kar û serxistinê têr dike.

Ger ez bêjim li Amedê mirov çawa dikare xwe bigihîne qadên çoltar, ya rast ev karê we ye. Li kîderê mirov çawa dikare mewzî bigire, ji pêşwazîkirina roja yekem ya tevlîbûnan em bigirin, heta kirina gêrîlayekê baş çawa tê destgirtin, ger hûn hinekî li ser van serê xwe bêşînin, hûn ê bersivê bidin hemûyan. Dîsa operasyonên dijmin hene û ji hemû aliyan ve tên zanîn. Ev

çawa tên pêşwazîkirin, ma şerte hûn yekîneyekê bixin dorpêça dijmin? Dema ku tê parastinê bike diyare, dema tê senger bigire diyare. Şêweyên pêncî, sed carî darbe xwariye hene, ji wan encamê pêwîst derxistin gengaze. Çima tê her tim komê bide îmhakirin? Ez nabêjim windahî nabin, lê bizanebûn qet pêwîst nake di cihekî naverastê de hûn bikevin şerê senger yan jî cihên ku dijmin bi asanî dikare dorpêç bike qet pêwîst nake hûn ji xwe re bikin goristan. Ji ber ku tevdîra gêrîla ya ku me pêş xistiye dikare van hemûyan vala derxîne.

Em li cihekî wisa li dijmin bidin, da ku ew tiştên beriya niha min got bên sepandin. Ev çine? Heta dawî me di binê erdê de xwe bi cih kiriye, qamuflajeke pir baş heye, serê dijmin tevlîhev kirin heye. Dema ku ket qadê jî, wê sed kuştiyan bide û paşve bikişe. Çiya wisa tê bikaranîn. Ger vî derfetî pêşkêş dike, amadekariyên te temamin, tu şev û roj li pêy vê beziye, tê li ser yekîneyan serwer bî, venerîn bikî, tê hemû corê amadekariyên binesaziyê pêk bînî, amade bî û dema ku dijmin jî hatê tê lêdî. Bila hemû qad amadekariyên xwe wisa bikin, lêde, de ka em binêrin bê dijminê careke din were, yan neyê?

Çiya biryargehên we yên artêşê ne. Dema ku êrîşên firokeyan pêşket jixwe tevdîrên te hene, dema êrîşê topan bû li beramberî wan tevdîrên te hene û xwe gihandina van tevdîran jî zêde ne zahamete. Piştî te van amadekariyên xwe kir, li şûnve ya ku dimîne pêşxistin û belavkirina artêşê ye û êdî ji aliyê stratejîk ve ji çiyayan hêdî hêdî ber bi deştê ve lêde, ji wir jî ber bi lêdana bajaran ve biçe. Jixwe tu salekê wisa lêbidî, tê bîbîne ku te dijmin ji hev de xistiye.

Hişmendiya çûyîna yên me ya çiyê jî zêde ne zelale. Mantiqê yên me ji çiyê daketina bajar, gund jî ne zelale. Ez dubare ji we re bêjim; tenê ji bo xwarinê mirov danakeve gund, tenê ji bo qelebalixî çêkirinê mirov nakeve nav bajêr. De îca bi feraseta tacîzê mirov qet naçe. Ji bo fetihkirina gundekî mirov dadikeve gund; yan jî ji bo tevlîkirina îsyanê çûyîn çêdibe, yan jî ger hebe ji bo xayîn û nokeran û kuştina wan çûyîn çêdibe. Di her derfetê de dibêjin em ji bo lojîstîkê çûn. Fermandarê ku ji bo parçeyekî nan jiyana yekîneyekê dixe xeteriyê divê ku mirov bi cezayê herî mezin darizîne. Tu nikare yekîneyeke gêrîla ya ewqas mezin wisa bişîne gundekî begê min! Birçî bimîne, pincar bixwe,

dê bê pejirandin, lê tu nikare yekîneyeke gêrîla xistina xeteriyê bigre berçav. Ev rêgezeke. Ger tu hinekî binamûsî, tê ji niha ve vê rêgezê mîna amentû jiber bikî.

Tenê ji bo pêkanîna vê rêgezê me bi sedan şervan windakirin. Ji bo cixara çend fermandarên kêr nayên, ketî ji bo zikê xwe tijî bike me bi sedan şervan windakirin. Ma şert bû, bila hinekî li ser nefsa xwe serwerba, hinekî şêwazê jiyanê rast pêkbaniya qiyametê raba? Hûn ê bi baldarî nêzîkî vê bibin! Mirov dadikeve gundan, lê weke ku min got bi armancê fetihkirinê. Mirov diçe bajaran, lê ji ber ku hedefên di wir de bên ruxandin hene. Tu nikare ji bo çalakiyeke tacîzê ewqas gêrîla bixe xeteriyê.

Çend roj beriya niha li Amedê ketine gundekî, ji bo ku hesab ji hinek kesên ku du hezar marqê me dizîne bixwazin. Bi sê-çar cerdevanan re ketine pevçûnê, sê windahiyên wan hene, paşê jî 17 windahî; bi giştî 20 windahî dane. Ji bo hedefeke wisa mirov ewqas windahiyan nagire berçav. Ez weke mînak didim, ji bo ku hûn fêm bikin diyar dikim. Dibe ku zêdetir jî windahî çêbibûna. Tu nikarî ji bo sê cerdevanan ewqas windahiyan bidî.

Li gel vê bi sedema tolgirtinê jî tu nikare çalakî li dar bixî. Mantiqê çalakiyê cudatire. Bi giştî ev tê kirin; “*Ez ê pênc kesan ji çav derxim, lê bajar bixim”* Fermandarekî baş hesabên xwe wisa dike. Şêwazê ku nehatiye hesabkirin, şêwazê şerê ku hema bêje cihekî hemû tasfiye bike ne şêwazê me yê şere. Min du-sê cerdevan kuştine kêr çi tê? Li gel vê bi şêweyên din, li cihekî din jî tu dikarî bikujî, bi segvanekî ceza bike. Çima tu jiyana yekîneyeke ewqas mezin dixe xeteriyê? Bi vî re mantiq nîne, pîlansazî bê mantiqe.

Jiyana gelik kesan dixin xeteriyê, hem jî ji bo mala cerdevanekî. Roketê davêjin bînayên vala, heta ya ku davêjin jî lênakeve. Bidestxistina roketekê gelik zahmete. Dibe ku tesadufî erzan ketibe destê me, lê di demê pêş de ger ji bo armanceke stratejîk te lêda, herî kêm bi şêwazê tê gelikan bixî bikarbînî. Lê belê yên me berbelav dikin. Hewce dikir rojên zehmet bihatan fikirîn. Ger bê dîqatkirin, di vê ferasetê de mantiq nîne. Me her tim got, divê tenê fîşekek jî di cih de bêkaranîn. Gelik roket, ji sedî pêncî li hedefê neketine. Çima tu lêdide?

Ya herî girîng jî yekîneyeke mezin dibe, li wir belav dike û dibê, serdebigrin. Xeterî heye. Ez nabêjim çalakiyan li dar nexin,

lê tê hemû tiştî hesab bikî, xeterî çiqase, li gorî wê xwe amade bikî û li hedefê bidî. Lê ne di xema camêr de ye. Ji bo kuştina cerdevanekî yan jî çend hedefên biçûk, jiyana yekîneyeke mezin dixe xeteriyê. Bê mantiqe û we di nav refên me de ev jiyan kir. Herweha rast bikar bîne, tu 5 kesan ji çav derxî, tê 500 endamê dijmin li nav bibî. Lêkolîn bike, lêhûrbûn bike wê vê bibîne. Serê fermandar divê ku wisa bişixule. Lê bi yê me re çawa pêş dikeve? Dibêjin; *hejmar di destê me de zêde ye em kar bînin,* heta hinek ji wan dibêjin; " *Bila biçe ez jê xilas bûm."* Ev mantiq, mantiqê xayîna ye, teqez şansê serkeftinê nade.

Ez naxwazim van mijaran zêde vekim. Li pratîkên xwe yên qadan, li pratîkên xwe yên jiyanê binêrin hûn dikarin bi dehan mînak rêz bikin. Jixwe hûn ji xwe bawerin. Ger hûn dixwazin şansekî bidin girêdana soza şer û pêşketinê, teqez dibê ku hûn xwe bigihînin vê hêza nirxandinê. Ma çima hûn nenirxînin, ya ku ji we bigire û bibe çiye, çima hesabê wê neyê kirin? Bersiva li her derê xwe bicihkirin û senger girtinê heye û hûn ê vê hesab bikin. Dibe ku kêm ango zêde be. Wê ti astar ji rû girantir nekirî.

Fermandar, camêrê ku rojane lehûrbûn dike ye û serokatiya taxtîkî jî wisa ye. Hûn dibêjin; "*Em naxwazin bihizirin, naxwazin biwestin."* Wê demê tu xwe nezanî? Madem tu dixwazî fermandariyê bikî, tê ji min jî zêdetir bifikirî. Ji ber ku rêbertiya taxtîkî roja xwe bi hizirîn û lêhûrbûnan derbas dike. Nêzîkatiya min ji we re dibe teşwîqkirin. Ez hevsengiyên giştî hesab dikim, lê tu nikarî ketina gundekî jî hesab bikî, tu nizane tê yekeyekê çawa binirxînî, alvêra wê yan jî wê çi bîne, çi bibe tu hesabê vê jî nake. Tê çawa bibe rêber?

Nêzîkatiya hûn ji xwe re bingeh bigirin ev e û nêzîkatiya şervan jî divê ku xwe bigihînê ev e. Hûn ji xwedê rêveberiyê dixwazin, ji xwedê serkeftinê dixwazin, ma gelo ev genganze? Hûn gelikî xweberin, bê pîlanin, ger tesadufî we lê da kare. Lê piranî hûn erzan winda dikin. Bi pîlanbûn di vê çarçovê de gengaze, bi vê ferasetê hûn dikarin bi pîlan bin û ev jî merce. Heta ku pîlan nebe nayê şerkirin. Gêrîlayekî bê pîlan dê rê ji felaketan re veke. Cewherê pîlan jî yê di dest de heyî berhemdar bikaranîne, zemîn, pêvajo li ser vî bingehî nirxandine. Şoreşgerê bi pîlan bi her tişta xwe ve wisa ye. Ev jî xwe komkirine,

bipergalkirine, berî hertiştî xwedî li xwe derketine. Di şoreşgerekî/ê de ji bilî vê mirov dikare li çi bigere?

Şoreşgerên wek we dev ji xwe berdayî li kîderê hatine dîtin? Li rewşa gelikan ji we dinêrim; beriya bikeve şer, şer winda kiriye, bêy ku baxive dawiya wê aniye, berî gav bavêje serberjêr ketiye. Rewşa we wisa ye. Ev ji min re gelikî ecêb tê, hûn çawa nikarin xwe binasin? Camêrê dixwaze biçe şer, vê di gava yekem de dide diyarkirin. Ev taybetmendiyeke xwezayî ye, ez nabêjim ev taybetmendiyeke pir jîriyê dixwaze. Dema ku min cara yekem dest bi kar kir, min zanî dê çi bê serê min û li gorî wê hemû tiştê xwe sererast kir. Rêbertî jî ev e û ez vê jî pir baş nîşanî we didim. Wekî din feraseta we ya; “ *Em ji xwedê reîsê eşîretê ava bikine.”* Biçin vê bi bavê xwe bidin kirin, bi melê gund bidin kirin, lê hûn nikarin bi min bidin kirin. Bila ew bibin rêberên we, ez nikarim bibim. Vekirî daxivim, tu kes nikare wisa bibe rizgarvan, gêrîla, endamê partiyê, de îca qet nikare artêşbûnê pêk bîne.

Hûn dibînin, derbaskirina dema pêşiya me hem ji aliyê me ve, hem ji aliyê dijmin ve çi rave dike. Hûn vekirî hem rewşa îhtîmal ên dijmin, hem nêzîkatiya me ya îhtîmal divê ku çawa pêş bikeve dibînin û hûn li ser vî bingehî jî hatin amadekirin. Ger hûn naxwazin berevajî xwe bikevin, hûn ê wisa bi ser peywirên xwe de biçin.

Peywir di her qadê de peywire, em cudabûna mezin û biçûk qet nekin. Baldar bin, ma ez li vir qet mezin ango biçûk ji hev cuda dikim? Ev der ne çiyaye, lê ma veneguheriye qadek ji çiya jî xedartir, em rê li ber pêşketinên herî baldar venakin? Ger ev li Ewrûpa bim jî, ez ê heman tempo û derfetên serkeftina wê bidomînim, pêk bînim. Ger biçim çiyê ez ê zêdetir bikim. Ev şêwazeke, mijara tempoye; cudahiya cih, zemîn, zeman divê ku liberçav bê girtin, lê cewher diyar nake.

Ez li vir di nav xebata herî cidî de me û wisa dikim. Ger biçim hinek qadên din jî xalên ku ez ê tê de baldar bim hene; ez ê rewşa objektîf ya pêşketina binirxînim, li gorî wê pîlanên pêşveçûnê xêz bikim û wisa serde biçim. Ez ê biçim cihekî din jî, cudatir, lê bi nêzîkatiyên dişibin vê ser de biçim. Heta niha min hertim wisa kir. Ez roj bi roj weke rêberekî srtatejîk vê dikim jî, ma hûn ê nikaribin karekî ji rêzê bikin?

Bêgûman ev şêwazê Rêbertiya proleterya ye, şêwazê Rêbertiya kedê ye. Em ji bermahiyên axayên di nava xwe de bigirin, heta hemû corê bermahiyên bujiwaziya biçûk her tişt heye, ew ê jî bi asanî nekevin nav vî şêwazî, lê wê bixwazin karîyer bikin, gav bi gav bigirin. Endamên proleter pêwîste divê mijarê de pir baldar bin. Mîlîtanê partiyê yê sereke, kesayetên sosyalîst, hêmanên dervî çîn di rewşa henase negirtinê de ne û ya herî girîng jî, wê di fermana xetê de bên karkirin. Ev jî pêdiviya xwezayî ya şerê çînî yê navxweyî ye. Weke ku wê çi bizanebûn, çi bê zanebûn bersiv bidin hemû corê hewldanên provakatîf, wê dayîna xebitandina wan esas bigirin. Şêwazê serweriya rêbertiya proleter, şêwazê serweriya rêbertiya taxtîkî wisa ye.

Dema ku ev hemû hatin pêkanîn, wê pêşengatiya partiyê, xalên bingehîn yên artêşê, xalên bingehîn ên pêkanînê saxlem bibin, ya ku dimîne êdî serkeftine. Kî dikare ji serkeftinê bigire? Yên ku li gorî xalên bingehîn ên pêşengatiyê tevlî nabin dikarin rawestînin. Tenê yek kes jî di pêşengatiyê de bi îdea be, wê hemûyan derbas bike. Ger tu bi xalên bingehîn ên pêşengatiyê re lihev nakî, tu şaşî, nebesî û tê derbas bikî. Ger tu derbas nekî ez ê bi te re şer bikim. Ez çawa şer dikim, cîhanê xwest min rawestîne ma karî rawestîne, xayînên mezin ji nav me derketin karîn bisekinînin? Ya we di asteke sînordar de nûnertiya partiyê kirine, çima hûn ê nekin, ma hûn ditirsin? Na, hûn şêwaz nizanin, rojane rêbertiya taxtîkî çawa tê raberkirin hûn nizanin. Hûn ê wê bizanin, ji ber ku hûn xwe endamên partiyê dibînin.

Hûn ê rojane li beramberî hemû corê nebesî û şaşiyan helwest pêş bixin, ya din jî serkeftine. Heta dawî şêwaz, tempo, şêwe, heta dawî uslûbekî xweşik, rave û qanihkirine. Tu dibînî kesekî neyê îflahkirin heye; nediyare ku sîxurek sûbjektîfe, yan jî sîxurekî objektîfe. Wê tu yek-du ceribandina qanekirinê bikî, ger nebû tê hişk bi ser de biçe. Ev jî rêyeke. Ma provakatîfek dikare şoreşgerekî rawestîne? Tê şiyar bî, lê teqez wê lihevkirin û hevbeşî hebe. Dema ku tu bi yekî re mijûl dibî, tê çil kesên din bi xwe re nexe zahmetiyê yan jî tê bi xwe jî linav neçî.

Di şêwazê proleter de şêwazê feodal nîne. Niha rêxistina PKK'ê piştevanê kesên proleter, sosyalîst û bi rastî jî yên bi partiyê ve girêdayîne. Li beramberî hêzeke wisa cîhan jî nikare raweste. Provakatorekî navxweyî, kêrnehatekî navxweyî, nebesek

wê çawa raweste.? Wê demê hêmanê me yê proleter belayê xwedê ye, pêşnûmeya gundî ye, hêmanekî burjuwaziya biçûke. Ji bo ku li beramberî van serkeftî be, merce ku heta dawî xalên bingehîn ên rêbertiyê bisepîne. Ger nesepand, teqez bi pêşengatiyê lîstiye û berevajî artêşbûnê ketiye. Hemû tiştên ku min gotî, çend nûnerên partiyê di herêmekê de bi qasî dixwaze dikare gundî û yên burjuwaziya biçûk bide karkirin.

Ez hemû gelê Kurdistanê çawa dixebitînim di holê de ye. Ma hûn nikarin qadeke biçûk bikin? Hûn ê bêjin; "*Şêwaz, tempo û uslûbê min ji bo Rêbertî çi rave dike"* û hûn ê wê rave bikin. Wekî din pêşengiya proleterya, rêbertiya kedê ser nakeve. Ji ber vê pêşengatiya partiyê esase. Bêy ku pêşengatiya partiyê hebe, tu nikare roja xwe jî rizgar bikî. Mehîna pêşengatiya partiyê, ji dest dayîna hemû şere. Nemehandina pêşengatiyê, di girêdana bi taybetmendiyên mîlîtanî, ji hemû aliyan ve bi girêdana feraseta peywirê û pêdiviyên wê pêkanînê re derdas dibe. Pêşengatiyeke din nayê kirin û bêpeşengatî jî artêş nayê damezrandin. Ger tu pêşengatiyê li gorî artêşê ava nekî, wê îsyangerên gundî naveroka artêşê vala bikin û wê çend axayên peşmergeyan jî ji nav me derkevin, ber bi xiyanetê ve bibin û tine bikin. Ji bo ku ev pêk neyê ya pêwîst, pêşengatiyeke têqûz a ku di nav artêşê de jî hatine pêkanîne.

Bila îro di her qadek me de pêşengekî partiyê yê baş hebe, wê destkeft di şer de deh qat, sed qat zêdetir bibe û artêşbûn pêş keve. Bûyîna xwedî wesfên pêşeng jiyanî ye. Di dema pêşiya me de ji hemû aliyan ve bi van wesfên pêşeng, bi fêmkirina wê, bi nûnertiya wê dê bêserxistin. Divê tu aqilmendên partiyê vê paşguh nekin û ger ev jî bê temsîlkirin tu kesê nikaribe li beramberî raweste. Ji ber ku bi aqile, rojane li ser peywiran serwere, wê çi lî kîderê û çawa raber bike, bêje û divê bike zane û ev jî serkeftine. Dîroka PKK'ê hemû wisa ye. Bila tu kes ji ber xwe ve li benda serkeftinê nebe. Yên ku bersiveke rast û mafdar bide xalên sereke yên pêşengatiyê wê teqez serkeftinê bibîne.

***C- Asta serkeftina pêşketina şoreşgerî ya ku wê pêngava me yan nû bigihînê.***

Tê dîtin, li ser vê bingehê kûrbûn, pêvajoya pêşiya me rêxistinkirin, hem gengaze, hem jî li beramberî şerê taybet ê ku jirûmet ketiye, bi qasî ku serkeftinên girîng ên şerê şoreşgerî pêş

bixe bi derfet dike û serkeftinê bi xwe re tîne. Em şerê xwe yê heta niha, dişibînin rewşa çend metre mayîna ji gihîştina serê çiyayê Agirî re û di pêşbirka boksê de çend kulmên dijwar li rakîbê xwe xistinê. Di vê zoranbaziyê de, di lîstokekê de rewşa beriya tu rakîbê xwe bin bixe mijara gotinê ye. Dibe ku bi me re jî westandinek hebe, lê lêdan û encam girtin jî hîn zêde mafê me ye, hem jî gihîştiye qonaxeke peywirên me. Ji aliyê dîrokî ve jî, ji aliye siyasî ve jî ev wisa ye.

Ya rast em di pêvajoyeke kulma dawî lêdan û encam girtinê de ne. Di hemû dîrokê şeran de pêvajoyên mîna vê hatine jiyîn. Di despêkê de kulm li yê bi hêz tê xistin. Ger hûn baldar bin, kulmên me yên despêkê dişibe şêwaza moriyek ku fîlekê gez bike. Lê niha bi rastî jî hingî me lî fîl daye, ji aliyê rast û çepê ve ew gez kiriye me wî li erdê daye. Em dikarin bejin cinawir giyan dide. Rewş wisa ye. Ji ber ku dîrokek dirêj a şerê me heye. Ev darbeyên ku me lêdane vala neçûne. Me cinawir gelikî westand. Di encam de dema ku giyan dide, bê rehmbûna wî encamê naguhere.

Jixwe ewqas harbûna şerê taybet, dişibe perpitîna cinawirekî. Çawa ku marekî birîndar xedar êrîş dike û hema pê ve dide, dijwarbûna dijmin, qetilkirina wî bi vê sedemê ve girêdayî ye û teqez divê mirov dijmin wisa pênase bike. Lê birîndare, darbeya kujer jî di her kêliyê de divê ku lêkeve. Ger gelik qad êdî vê fêm nekin, dibe ku tu bi rewşa her heywanê dirinde yê birîndar çawa dixwe, weke vî tu jî bi binketinê re rûbirû bimînî. Hizirîna; “*Ez ne li bendê bûm, min wisa dizanî ku dijmin miriye”* xwe xapandine. Dijmin nemiriye, birîndare û dema ku te bibîne bi şêwazê berê ve neyê qeyaskirin dê bi te ve de û qut bike.

Tê pênase û rastiya dijmin binase. Jixwe yên ku pênaseya dijmin rast nakin, nikarin şer jî rast bimeşînin. Weke min got ez xwe jî di şer de pêdigihînim. Vaye damezrandina artêşê, pêşengatiya partiyê, li gorî darbeya dawî lêdanê tê amadekirin. Dema ku dibêjin darbeya dawî, bila tu kes li benda serkeftina nîhayî nebe. Serkeftina nîhayî piştî rizgariya bi temamî jî didome û diçe. Em behsa qonaxeke girîng dikin. Ev qonax herî kêm bi qasî serkeftina nihayî girînge. Wateya herî girîng a şerê me yê demdirêj bi serxistina vê demê ve girêdayî ye. Ger em vê qonaxê ser bixin, em ê mafê bîst salan bidinê. Berevajî, nêzîkî bîst salan

tenê ne partiya me, dê bê wateya valaderxistina keda hemû derdorên berxwedêr ên çepgir ji aliyê faşîzmê ve. Jixwe niha armanca sereke ya faşîzmê jî ev e. PKK'ê, tenê ne dîroka xwe, naçare nûneratiya mirateya dîroka demdirêj a hemû gelan bike. Serkeftin jî tenê ne ji bo xwe, divê ku ji bo pir gelan ser bixe. Nûneratiya van derfetan jî dike.

Serxistina vê qonaxê, bi xetên sereke herêmên rizgarkirî, ji aliyê leşkerî ve di hevsengiyê de mayîn, ji bo dijmin xwe naçarî çareseriya siyasî bibîne, di pêwendiyên navnetewî de qonaxeke nû jiyîn, jixwe pêkanîna venerîna gel, ger em bi temamî jê re nebêjin dewlet jî perçe perçe, ne hevseng be jî, bingehê desthilatiya gel û di vê wateyê de nûnertiyên gel, konseya gel, pêşxistina hêzê rêveberiya gel, heta xwe gihandina hikumeta demkî ya şoreşê çûyîne.

Ger em bi hinek mînakên navnetewî re rûbirû bikin –rewşa me hinekî cuda ye, ez tenê ji bo rû bi rûkirinê dibêjim- li Başûrê Efrîqa Konseyên Gel ên Netewî çawa rol lîstin, dîsa hinek çareseriyên Fîlîstiniyan ên cuda hene. Di çareseriya Ereb-Îsraîl de hinek şibandin dikare bê kirin. Wekî din rewşa Îrlanda heye. Vaye hinek qonaxên wisa yên derbasbûnê tên jiyîn. Dubare dibêjim, ya me heman naşibe ya wan, lê ketina qonaxa derbasbûyînê mijara gotinê ye. Ango ji gelik aliyan ve dewr girtina desthilatiyê û ketina pêvajoya parvekirinê ye. Serkeftî derbaskirina dema pêşiya me teqez wê van encaman bi xwe re derxîne holê.

Ger bê dîqatkirin, ev heta dawî encamên dîrokî û di asta serkeftina qonaxeke encamgir de ne. Weke ku pir vekiriye ez ê bi vê nelîzim, em ê pêdiviya wê jî pêk bînin. Ya ku bi hezaran sale tê hêvîkirin, xeyal kirin jî êdî di qonaxa pêkanînê de ye. Em ê bi ser dema pêş de biçin, bi coşa pêkhatina hêviyên me yên dîrokî, azwerî û afirêneriya awarte û şêwazê kar bidawî dike em ê ser de biçin û pêvajoya ku em ê ser bixine. Ma gengaze pêvajoyek ewqas ji nêz ve hatibe destxistin mirov ne bi coş, afirêner be û bi çar destan xwedî li peywirên xwe dernekeve? Ji ber ku bingehê jiyana herî esîle, pêkhatina hêviyên hezaran sale. Berevajîkirina wan rewşên ketî yên ku we jiyan dikir bû. Ji her aliyan ve dawî lêhatina jiyana mirî ku me jiyan dikire. Ma gengaze ku mirov coşeke mezin ji vê negire?

Ma hûn dikarin bihizirin xwe ji şerma sedsalan rizgarkirin, derbaskirina laneta wê çiqas şadî, zindîbûn û meziniyê ji mirov re dibexşe? Bi şêweyeke azad bi serxistina dîrokek dûr û dirêj, tê wateya tevgerînkirina hêza gel û afirêneriya gel. Çavkaniyên dewlemend ên welatekî, girtina bin venerîna gel û seferberkirina wizeya we ya ku hûn vala serf dikin û tê de hatine perîşankirine. Encam, xwe nêzîk kirina mirov a ji armanca şoreşê re ye, rêgirtin li rewşa rawestiyayî û xwe derxistina rastê ye, bêrê xwe dayîna jiyanê, xwe nêzîkirina anûr û rûmetê ye. Behremendiyên xwe yên ciwan û afirêner tevgerînkirin û bi vî rengî ne tenê malbata ku weke netew tê pênasekirin, yê ku di rizgariya gelên herêmê de jî rist dilîze, xwedî derketine li azadiya gel û welatê ku di cihanê de herî zêde hêjayî nirxdayînê ye.

Xeyaleke wisa jî xebateke şoreşê ya ku mirov bi coş dike, bi pratîk di demeke kurt de, di dema temenê ciwantiya jiyana şoreşê de serdeneçûn, xwe negihanina ruh û zanîna vê ya mezin dikare bêhizirîn? Ger ew ruh bi we re heye, hûn behsa bilinbûnê dikin, dixwazin ji wê lanet û şermê rizgar bibin, dixwazin xwe bigihînin hinek armancên azadiyê ku hûn şayanî xwe dibînin, ji xwe yê din wê bên destxistin.

Ez bi kelecana vê derketim rê. Tenêbûm û heta îro jî pêk tînim. Hûn di vî temenê ciwan de, bi ewqas derfetên amade, ger we bi asanî ev derfetê serxistinê bi destxistiye bikar neyînin gelo hûn ê xirabiya mezin bi xwe nekin? Tenê ne bi xwe gelo hûn bi xirabiya ku bînin serê vê qonaxa dîrokî, derfetê serkeftinê dihizirin? Ger hûn nahizirin; yan hûn xayînekin, ya jî kesayetiyên ketî ku îflah nabine. Ji herdukan re jî mafê jiyanê nîne.

Ger hûn baldar bin, ev tev piştî vê qonaxê me ber bi serxistinê ve dibin. Hema bêje ji hemû tiştên ku me ber bi serxistinê ve bibin re em heta dawî amadene. Ji ber vê çi neyêniyên ku derkevin holê, wan jî ber bi gotina na ve dibe. Ji bo vê çi pêwîste ez dibêjim belê. Çi tişta ku astengî ava dike em dijberî wê ne. Çiqas karê ku divê bê kirin, em xwe bigîhînin ê hene em ê ji dil pêk bînin. Em ji şêwazê wê yê xebatê re, tempo, uslûb û ziraviya re heta dawî amadene. Tempoya wê bi qasî ku em bi ti demên din re qeyas nekin bi lezgîniya rastiya jiyanê re jê re bersiv dayîne.

Em dibêjin; em xwediyê nêzîkatiyeke dema pêwîst kir bi qasî pembo nerm, dema pêwîst kir bi qasî şûr tûjin. Em dibêjin demeke bi hemû corê ziraviyan, di gel wê de jî nêzîkatiyên dewlemend, aqil û demek em ji dil tevlî dibine. Gelo vebijêrkek we ya din heye? Nîne! Hûn ê kêr karekî din bên? Ne gengaze! Karê ku hemû kar pê ve hatine girêdan, jiyana ku hemû jiyan pê ve hatine girêdan ev e. Ango hûn şoreşgerê dij şoreşê bin jî hûn bi vê jiyanê ve girêdayîne.

Ez her tim dibêjim; ev karekî dibê beriya nan û avê bê destgirtine. Ya rast diviya bû hûn demek dirêje wisa nêzîk bibûna. Ji niha û şûn de hûn ê fêmkirineke wisa ji partiyê û şerê wê yê çekdarî ku rojane xwe nûjen dike re bikin. Hûn ê heta dawî nirxên sereke fêm bikin. Bi qasî neyêniyan, bi ser erêniyan de jî çûyîn, ji bo şansê serkeftinê dayîna van peywiran hostatiya pêwîst, bi taybet jî şêwazê xebatê, tempoya wê di cih de hûn ê di hemû pêvajoyê de raber bikin.

Em jî bi îdea ne. Em ê li ser vî bingehî helw bidin bi ser qonaxa ji niha û şûn de biçin. Em bawerin ku me taybetmendiyên wê yên sereke, armanc û şêwaza we pir baş zelal kiriye. Bila tu kes ji bilî vê tiştekî din ji me hêvî neke. Berevajî, em ê bibin pêkhênerên xedar yê vê rastiyê. Ger wê tevkariyek xwe hebe bila li ser vî bingehî girîngî bidin temamkirina me. Bila ber bi xwedî li soza xwe derketine digihîne serkeftina hevbeş ve bibe. Li ser vê bingehê hûn di darêz û lêpirsîneke giran de jî derbas bibin, ger hûn bi rexnedayîneke baş dubare dest bi pêvajoyê bikin dîsa jî me qebûle. Tenê bila hûn di pêşwazîkirina pêdiviyên bi vî rengî de bin. Şêwazê serkeftinê di nav xwe de dihewîne esas bigirin û hûn di keda vê de têrker bin. Yên ku di nav nebesiya herî giran de ne jî, yên bi şaşîtî zirar dane jî di nav de hemû jî dikarin ser de biçin û xwe bigihînin serkeftinê. Bi raberkirina nêzîkatiyeke wisa ji vê fersanda ku weke şansekî dîrokî li pêşiya me ye nêzîkbûn, bawerim wê ji xwe re jî rêzdariya herî mezin raber bike.

Weke her demê, em ji hemû partiyê, hemû şervan û fermandarên wê re vê nêzîkatiyê bi girîngî careke din nîşan didin. Li gorî vê helîn bi serê xwe destkefteke. Windakirin jî tenê bi zirardayîna xwe re gengaz dibe. Ji bilî vê dê ti tevlîbûnên din serkeftinê pêş nexin. Dîsa ger windahî hebin jî em bi asanî dikarin bêjin wê ev windahî dê me ji serxistinê dûr nexin. Em dikarin bi

hesanî vê bêjin. Dîsa bi qasî ku bi ti demên din re neyê qeyaskirin bi perpirsyariyeke kûr, heta dawî cidî, têrker û kedek aqilane, li gorî cih û demê bi helwestê ku bê raberkirin wê rêya vê serkeftinê bê vekirin. Divê ku ev tenê kêliyekê jî neyê başguhxistin û serkeftinê bi vê gengaz bibe, dixwazin careke din jî vê bi gîrîngî destnîşan bikim.

Li gorî ku me ev şêwaz zelal kir, ya ku divê hûn raber bikin bi vê re lihevkirin, di serî de jî tevlîbûneke kûr a ruhî û moral, bi hemû ziraviyan ve xwe tevlîkirine. Derketin ev e. Her tim dem wisa tên pêşwazîkirin û bi vî şêwazî tên dest xistin.

Careke din ya herî watedar, encamgir, yên ku di nav partiyê û di her asta şer de cihê xwe digirin, welat û dervî welat jî di nav de, peywirên hemû qadên me yên xebatê wisa destnîşan dikim û li ser wî esasî bangewaziya xwedî derketina li peywiran, dîsa li ser vî esasî xwedî li xwe derketinê, kedên xwe, ango rêzdariya jiyanê, rastiya jiyan bi şer tê qezenckirinê û xwedî raveya serkeftina rast û yekane û teqez serxistinê dikim.

**22 Cotmeh 1994**

## EM RASTIYA DARAZA PKK’Ê BAŞ FÊM BIKIN Û PÊWISTIYÊN WÊ PÊK BÎNIN!

Talîmata di derbarê xebatên zivistana 1994-95’an de

### *A- Bi Giştî Hiqûq Û Asta Pêşketina Hiqûqê Ku Di Nav PKK’ê De Pêş dikeve.*

Hiqûq; yê ku digihêje hêz, di meşa xwe ya girêdayî armancên xwe de, yên ku di jiyanê û şer de hêza pêkanîna qûralan raber nakin, yên ku li gorî pêwîst qûralan pêk nayînin weke helwestê ku li beramberî wan tê pêşxistin dikare bê pênasekirin.

Ger em kûrtir bikin; êdî hêzeke diyarker qezenckiriye, pergala xwe ya hêz ava kiriye, li beramberî xeletî û nebesiyên xwe bi qasî ji derve û hundir kes û kiryarên ku pêşkevin dibîne, dinirxîne û dema xwe gihandina asta hesab xwestinê, li wir hiqûqa dewletê û ya rêxistinên cuda bû mijara gotinê, hiqûqê rêxistinê jî derdikeve holê.

Di vir de ya ku bê dîtin têkiliya di navbera hiqûq û hêz de ye. Ji bo ku tu qala hiqûq bikî divê ku hêza te hebe. Hêz, dê xwedî pergaleke qûralên diyar be. Dema ku ev qûral hatin derbaskirin dê helwest pêş bikeve. Vaye hiqûq ev e. Çima pêwîste qûralên hiqûq bên bikaranîn? Pêwîstiyeke parastinê ye. Rêxistinek ji yên ku qûralê pergalê dimehînin, qûralan bingeh û şêwaz de ji pêkneanînê re çav digire, dewletek, tê wateya ketiye pêvajoya belavbûn, xirabûnê û pêvajoya hilweşînê. Dîsa ger rêxistinek li ser qûralên xwe serwer nebe, pêkneyîne, hertim qûrala bimehîne dê rê li ber belavbûna xwe veke.

Hêza rêxistinekê di heman demê de bi qûralên xwe ve girêdanmayînê re tê pîvan. Ev, dibe ku partiyek be, artêşek be, dewletek be ferq nake. Heta dikare yekîneyek be jî, hêzeke bi qasî mangeyekê be, dibe ku komîteyek rêxistinê be jî. Di bingeh û şêwe de çiqas li ser qûralên xwe serwer be,

şansê serkeftina vê rêxistinê ewqas bilinde, binketina wê nayê fikirandin. Nexwe hiqûq yan jî daraz, hema bêje mîna cilê bedenekê yan jî mîna zirxekî ye. Ger ew nebe dê ev beden belav bibe û nikaribe xwe biparêze.

Ger em hîn şênber bikin; hiqûq, navê ku di nav qûralan de meşandina li jiyanê hatiye kirine. Heta qala hiqûqê şer tê kirin. Hiqûqê şer çiye? Li gorî hinek qûralan meşandina şere. Lê şer di bingeh de di navbera du hêzan de yan jî di demên aloziyên awarte yên navxweyî hatine derbaskirin de, dema ku bi pergal bûye jiyana vê ya bi qûrale. Ger em rêxistinekê bikin mijara gotinê, damezrandina rêxistinê yan jî bi giştî jiyana bi qûralan ve girêdayî hêza hiqûqa wê nîşan dide.

Di qonaxa derketina despêkê de em zêde nikarin bahsa hiqûq bikin. Amatore, jiberxwe ve ye, li gorî kêfê, pêşketinek ji dile, hîn fermiyet pêk nehatiye. Dîsa di demeke giran a hilweşînê de ye yan di nav mercên giran ên şer de qûralên nû dibe ku pêwîst bikin, yan jî hiqûq ji hemû aliyan ve derbaskirin jênerev dibe. Wê demê zêde wateya hiqûqa kevn jî namîne. Ev, ji bo deweletekê jî, ji bo partiyekê û ji bo artêşekê jî wisa ye. Pirsgirêkên qonaxên belavbûn ango ji nûve damezrînê derdikevin holê. Damezrandineke nû, hiqûqekî nû pêwîst dike. Nemaze wateya himêzkirina ya kevn namîne.

Ger rêxistinek hatibe damezrandin, êdî xwe gihandibe pîvan, di nav wê rêxistinê de nedîtina hiqûq, qûral û asta pêkanînê esas negirtin ne gengaze. Xirabiya herî mezin li wê rêxistinê bêkirin, li wir kêyfîyet, ezezî û ferdîyet li şûna qûralan danîne; ji hemû aliyan ve ferd xwe dixe şûna qûralan. Ferd hîsên xwe bêy ku li berçav derbas bike dema ku ferz kir, li wir dijbertiyeke cidî ya rêxistinê derdikeve holê. Zirara mudaxeleyên hêzê derve nikarin bidin, ji hundir ve ev kesayet didin.

Qûralan li gorî daxwaza xwe şîrove dikin, biryaran li gorî berjewendiyên xwe yên ferdî bikartînin. Pîvanên giştî yên rêxistinê bi taybet bêy ku aliyên stratejîk-taxtîkî û dîsa aliyên siyasî-leşkerî liber çav bigirin, kesayetiyên hertiştî li derdora xwe dizivirînin zirara herî mezin didin. Mînak, sazî, dezge û komîteyên rêxistinê hene û bendên rêzikname,

rêvebirname hene. Yên ku hertim van didin aliyekî, hertim xwe ferz dikin divê bizanin ku, niyeta wan çiqas baş dibe bila bibe, dê zirara herî mezin bidin rêxistinê.

Di ronahiya vê pênaseyê de, ger em li rastiya xwe ya civakî û netewî, piştî wê li rastiya xwe ya Partî û artêşê binêrin çi dikare bê dîtin. Hiqûqê xwe dispêre mercên me yên netewî û civakî, em dizanin ku hiqûqê dijmine. Hiqûqa ku di çarçoveya armancên dijmin de tê ferzkirin, belavkirina civakî û linavbirina netewî bi armanca di nav rastiya xwe ya serwer a netewî û civakî de helandinê ye. Qûralên guncaw ên li gorî vê armancê hatine diyarkirin. Di zagona bingehîn de, rêgezek di bin navê, "*yekîtiya netew, bi niştîman û welatê xwe, yekîtiya dewletê ya ku nayê dabeşkirin*" rêgezek hatiye bicihkirin. Piştî wê jî li gorî vê hiqûqa ceza û bi hemû corê cezayan hewl didin vê armancê saz bikin. Girêdayî linavbirina netewekî mezin, wî netewî bi qûralên linavbirinê ve gire didin.

Hiqûqa mêtinger, hiqûqa linavbirinê ye.

Bi rastî jî di damezrandina Komarê de weke " *Zagona Takrîr-î Sukûn*" despê dike û hiqûqa linavbirinê ya ku heta roja me ya îro didome bi vî rengî ye. Di hiqûqa Tirkan de rastiya Kurdan tine hesab dikin, her tişta ku vê rastiyê vedibêje dijqanûnî tê destgirtin û bi cezayê dardekirinê bi encam dibe.

Ger bê dîqatkirin ev hiqûq, hiqûqa bi gelemperî mahkumkirina netewekî ye. Kêm an zêde yên ku berevajî vê dikeve û dibêje; "*Netewek din jî heye*" û bahsa mafên wî bike, jixwe cezayê wî/ê teqez dibe û yekser xwe bi hêzên dewletê re rûbirû dibîne. Yan tê girtin, yan tê şopandin, yan jî linav dibin. Piraniya xwe jî înfazên bê darêz jî di nav de bi encamên gelik xirab re rûbirû dimîne. Bi şêwazekî qûralên xwe jî li berçav nagire –Jixwe ev di rastiya Tirkiyê de şênbere- bi rêbazekî ji hiqûqa xwe re jî rêz nagire dest bi linavbirinê dike.

Ya rast li gorî zagonên navnetewî ji vê re tu nikarî bêjî zagonên hiqûqî. Di hiqûqa ku di nav Netewên Yekgirtî de serwere ev nîne. Dîsa di çarçoveya gelik hiqûqên ku li ser pêwendiyên navnetewî de serwerin ev ne mijara gotinê ye jî.

Ev hiqûqa wahşetê – ger ji vê re bêgotin hiqûq- mijara gotinê ye. Ger em ji vê re nebêjin hiqûq, bêjin wahşeta bêhiqûqiyê wê rast be. Bawerim ya derbasdar ev e. Hemû zagonên civakî, aborî li ser esasê vê zagon û makezagonê tên vesazkirin.

Di encama vê de ji netewbûnê derketin, ji aliyê civakî ve helandin û dema ku em dadixin asta kesayet tiştekî tu bikarî di dest xwe de bigire namîne. Weke tê xwestin nikare baxive, nikare bihizire, bi rêk û pêkî nikare nîşaneya mirovbûnê raber bike. Bi rastî jî ya ku pir zêde tê jiyîn ev e. Lê dikare dijmin bijî; azadî, hiqûq piştî wê despê dike. Dema ku got; "*Ez Tirk im"* xiyanet li xwe kirin, xwe înkarkirin û heqaret li xwe kirin despê dike. Ev jî tinebûna mirove. Em bi çarçoveyeke maf û hiqûqeke wisa re rûbirû ne. Kesekî hinekî zanabûna wî/ê hebe bawerim wê vê rastiyê bipejirîne.

Zagonên artêşê dijwartirin. Helbet qûralên leşkerên Tirkan dijwartirin û ya ku xwe dispêre rastiya Kurd jî, li ser tê ferzkirin jî zagonên artêşa Tirk in. Di heman demê de em dikarin ji vê re bêjin hiqûqa leşkerî ya mêtinger. Em bi hiqûqekî hîn hişk, bêrehm, li gorî qûralên leşkerî tê meşandin re rûbirû ne. Jixwe me ji vê bêhiqûqî û wahşetê re bi derketina PKK'ê got, raweste!

Derketina PKK'ê, di heman demê de tê wateya binpêkirina hiqûqa mêtinger, siyaseta linavbirinê û hemû corên xebatên makezagonî û zagonî. Dikare bêgotin ku, PKK di vê wateyê de dibe tevgera ji bingeh ve redkirina hiqûqa mêtinger, hemû hukmên zagonî û makezagonî û di vê wateyê de îsyane, derbaskirina hiqûqa mêtingeriyê û avêtina gava yekem a pêkanîna hiqûqa xwe ya civakî û netewî ye.

Di heman demê de dibe tevgera li beramberî wahşetê mirovatiyê esas digire, li beramberî linavbirina netawî Rizgariya Netewî esas digire, li beramberî belavbûna civakî ji nû ve damezrandina civakê rojev dike û çalakiya xwe jî li gorî vê armancê pêk tîne. Dîsa dibe tevgera ne tenê siyasî, tevgera ji hemû aliyan ve siyasî, leşkerî, hiqûqî, aborî yanî hiqûqekî civakî ya ku li ser hemû qadan tê ferzkirin û parastina mafê gel. Jixwe di vê wateyê de xeteke Rizgariya Netewî ye. Bi gelemperî bi Danezana Mafê Mirov a Gerdûnî ve girêdayî ye. Zagonên navnetewî û mafê mirovan heta dawî li berçav

digire. Di vê mijarê de pîvanên ku PKK xwedî wane, bi gelemperî gerdûnî ne.

Di gel vê de li beramberî siyaseta linavbirina metingeriyê rizgarîxwaza netewî ye. Dîsa li beramberî belavbûna civakî heta dawî bi rizgariya civakî ve girêdayî dimîne. Bi derketina xwe ve jî dibe rêxistineke berfireh û mezin. Dema ku bi baldarî bê şopandin, rastiyeke bêgûmane. Hebûna mirov dixwaze bila di asta eşîret, kabîle de pêşkeve, dixwaze bila netewekî pêşketî be mafê hemûyan esas girtin, taybetmendiyên netewî yê ku ji xwe re dibêje, "*Ez mirovim*" pêşketina civakî pêkanîn, bi şêwazê bersivdayîn ji pêwendiyeke asayî re rêgezeke sereke ya mirovî esas digire. Jixwe wateya rast ya hiqûq jî ev e.

Ji bo ev derketina rêgezî watedar be, divê ku bi hêz pêşkeve. Ji bo ku em bikarin qala hiqûqekî cuda bikin, divê ku Partî xwe bi hêz bike. Herweha biqasî bi hêz dibe em dikarin qala cezakirinan bikin. Vaye bi hedefgirtina hêzên mêtinger û nokeran re ev cezadayîn dikare pêk were. Ev jî di wateyekê de hiqûqe, hiqûqa dijber, hiqûqa azadiyê, dadperweriya herî raste. Hem jî bêy ku dudiliyekê bijî ji bo ku em bi ser van armancên xwe de biçin, li dijberî hêza zordest a dijmin yan jî qaşo li dijberî hêza di navbera hiqûqa Tirk de ye, dibe pêkanîna hêza hiqûqa di wateya rast de ya hêza dadê.

Di vê wateyê de şerê me yê herî hiqûqî û maf esas digire ye. Şerekî teqez ji bo pêşxistina hiqûqa gel, bi destxistina maf divê ku bê dayîne. Jixwe di nav hemû dîroka partiya me de bi armanca Rizgariya Netewî ve girêdayî li beramberî hemû core hêzên mêtinger û noker şerek hatiye meşandin. Yan jî di vê wateyê de ji bo bûyîna pergaleke hiqûq hewldan hatine dayîn.

Ger em jê re nebêjin hevgirtina qûralên bi hêz jî, ya rast pergaleke qûralan a PKK'ê di nava gel de derketiye, qûralên li gorî rastiya netewî û civakî guncaw heye. Dibe ku ji hêza pêkanîna vê dûrbe, lê weke berê bêhiqûqû yan jî rewşeke wahşetê jî ne mijara gotinê ye. Kêm an zêde dikare bibersivîne, didarîzîne û pêk tîne û sînordar be jî mirov dikare behsa hiqûqa netewekî bike. Ev çiye? Girêdan bi armanca

Rizgariya Netewî, girêdan bi rêgeza têkoşînê, girêdan bi xeta rêxistin û çalakiyê ye. Ev dibin qûralên sereke.

Ger di vê qonaxê de behsa hiqûqa netewî bê kirin, tê aligirê Rizgariya Netewî be; di Têkoşîna Rizgariya Netewî de, tê alîgirê rêxistin û çalakiya wê be. Ger te ev kir, kêm an zêde tu pêdiviya hiqûqa gel pêk tînî yan jî tu li gorî wî hiqûqî tevdigerî. Dixwaze bila ji derve, dixwaze bila ji hundir be dema ku bi van armancan ve negirêdayî be yan jî bi Rizgariya Netewî ve girêdayî be, lê bi xeta wê ya çalakiyê ve ne girêdayî be, yan jî bi xeta çalakiyê ve girêdayî be, lê bi rêxistina wê ve negirêdayî be, wê demê tu bi hiqûq re rû bi rû yî. Ango her ku diçe tu dijberiya hiqûqê netewî, gel û heta mafê kes dikî. Di vê wateyê de hem li derve hem di hundir de xebatên dijberî partiyê derdikevin û li dijberî xebatên wî/ê dayîna axaftin a hêza xwe, ango darizandin mijara gotinê ye.

Di vê wateyê de darêz çiye?

Dema hiqûq hat derbaskirin, dema ku girêdana bi rêgez ên Partiyê hat derbaskirin helwesta ku tê raberkirin darizandine. Ji bo darêzê weke tê zanîn divê ku lêpirsîn bê kirin. Yanî asta tawan derxistina holê lêpirsînkirine.

Rizgariya Netewî ya sereke, raveya wê ya rêxistinî, xeta çalakiya rêxistinê, di nav rastiyên xetê de, ango destnîşankirina rêzîkname û bi xalên sereke yên rêvebirname ve girêdayî mayînê ye. Em dikarin ji vê re bêjin hiqûqa rêziknamê. Mînak ger tevgerên kesekî vê derbas dike, yan jî yê komekê û heta dewletekê, bi van qûralan re ketina nav nakokiyan a rêxistinekê heye, di vir de mafê me yê lêpirsîn û darizandinê derdikeve holê.

Hêza çekdarî ya PKK'ê niha heyî, weke hêz têr dike ku vî hiqûqî ava bike. Em li qûralan binêrin zelalin. Niha hemû cîhan dizane ku şerekî Rizgariya Netewî tê meşandin. Dîsa herkes dizane ku ev bi şer tê avakirin, rêxistineke xwe heye û vê jî fêm dike. Dîsa şêwaza şereke wê ya ku bi taxtîkê rojane tê meşandin heye. Herkes vê zane û bi xetên giştî taxtîk diyarin. Yêkî ku bi vê re bikeve nakokiyê, dema ku dewletek be mafê darizandinê derdikeve holê.

Jixwe em bi dewleta Tirk re şer dikin, em bi şerê xwe yê ku her roj pê re dimeşînin hewl didin hiqûqa xwe dest

bixin. Rêxistinên din êrîş dikin, noker êrîş dikin, bi wan re jî şer tê kirin. Li beramberî wan jî em hewl didin hiqûqa gel, hiqûqa Rizgariya Netewî ava bikin. Dîsa di navxweyî de provakator êrîş dikin. Yên ku herî xeter û qûralên navxweyî yên rêxistinê xira dikin jî ev beşin. Em dikarin ji van re bêjin yên hiqûqê rêxistinê di nav me de xira dikin, provakator, sîxurên objektîf ango sûbjektîfin. Bi awayekî cidî qûralan binpê dikin. Lêpirsîna van jî berfireh meşandin zahmet dibe. Ji ber ku noker eşkere êrîş dikin, dewlet eşkere êrîş dike, xayîn eşkere êrîş dikin û radigihînin, lê dijminê herî xeter, yên ku xwe weke endamên partiyê didin nîşandan, heta weke rayedar û bandorkerê herî sereke xwe nîşan dide, lê yên ku qûralan pêknayîne û qûralan di kesayetiya xwe de dixetîmine.

Di vê pêvajoyê de çima em naçarin vê berfireh bigirin dest? Dahûrînên dawî bi awayekî pir berfireh derxistin holê ku, zêde hewce nake tu li derve li dijminê PKK'ê bigerî. Hîn duh min raporek xwend, hevalekî bi însaf vê dinivîse û dibêje; "*Pêdiviya Rêbertî ya partiyê bi dijminan nîne, dijminên navxweyî têr dikin û zêdene jî"* wisa dibêje û heyfa xwe bi me tîne. Êdî ev kesekî çiqas duriste ez nizanim, lê herî kêm ew bi xwe bi çalakiya xwe çiqas berevajî ketiye ji ber ku dibîne dikare vê bêje û ya girîng jî ev e.

Me jî ev gelikî baş derxist holê ku, di asteke zêde de bi pîvana lîstin heye. Bi kîdera qûralan dilîzin? Herkes bi armanca sereke ve girêdayî ye, hema bêje bi milyonan pê ve girêdayî ne, em ê dijbertiya vê nekin. Tê gotin ku; "*Ez aligirê Rizgariya Netewî me, alîgirê azadiya gel im, alîgirê PKK'ê me, xeta çalakiyê dipejirînim"* Başe, dijraberî û dervî qûrala mayîn li kîderê ye? Weke tê zanîn di vê mijarê de di şer de nehatina taxtîk, nexasim pêk ne anîna xalên sereke yên partîbûnê û pêk ne anîna xalên sereke yên artêşê, şerê rojane, di vê mijarê de em bi binpêkirinên pir cîdî yên rêziknamê re rûbirû ne.

Ger em şênber bikin; êdî ev dibe rêgezek exlaqî. Dibe ku ev dervî hiqûq be, ji aliyê ruhî ve tevlî rêxistinê nabe, ji aliyê ruhî ve weke endamekî/ê partiyê û artêşê najî. Ji aliyê exlaqî ve tevgerînên jiyanê, bi destgirtina jiyanê ne weke endamekî/e partî û artêşê ye. Gelo em dikarin yên ku ji aliyê

exlaqî ve ne guncawin darizînin? Li dijberî bê exlaqiyê, parastina exlaqê şoreşgerî û jê re bersiv dayîn a guncawe. Li gorî pêdiviyên Rizgariya Netewî eşkereye ku em jiyanekê pêş dixin. Ew jî di taybetmendiyên ku ji KT'yê, çanda kevnar a feodal girtiye de israr dike. Wê demê em ê jî bi saxlemî bi pîvanên xwe yên jiyanê ve girêdayî bimînin û bi exlaqê şoreşgerî em ê exlaqê wî vala derxin. Di nav rewşeke wisa bê exlaqî de mayîn, tenê nehatina hinek qûralên jiyanê îfade nake, di heman demê de tê wayeta têkdana moral û nepêkanîna moralê. Li beramberî vê em ê ruhê şoreşgerî, zindîbûna ruhê şoreşger, zindîbûna wê li ser ferz bikin û bi vî rengî vala derxin.

Weke hûn dibînin, em li vir hinekî hiqûq û exlaq ji hev cuda dikin. Exlaq rewşeke ji hiqûq wêdetir îfade dike. Li gorî xuya dike bi qûralan ve girêdayî ye, lê bi jiyana xwe, ruhê xwe vê bi yên ku dijberin re em ê şerekî dijwar ê exlaqî bimeşînin. Nayê li hevkirinê, li gorî xuya dibe zêde binpêkirina qûralan jî ne mijara gotinê ye, lê fesade, xirabkarê ku nakeve nav astengiyên hiqûqe. Hinek kesên ku ji aliyê şerê taybet ve hatine perwerdekirin hene, ji wan re dibêjin; "*Biçe xirabkariyê pêş bixe, bi şêwazê ku ji aliyê qûralan ve zêde neyê ditîn wisa bi sivikî pê bilîze"* sîxurên ku wisa perwerde kirine hene. Van dişîne û dibêje; "*Biçe mîna mişkan bikeritîne, ger tu vekirî êrîş bikî tê bê darizandin, lê te mîna mişkan keritand, jehrî kir dibe."* Ya rast ev êrîşeke exlaqî ye. Şêwazekî pir zirav ê xebata sîxurên dewletê yê neyeksere.

Wisa texmîn dikim ku, ji aliyê exlaqî ve êrîş dikin, ruh difetisînin, jiyanê difetisînin, alozî û xirabkariyê pêş dixin. Di asteke mezin de bi van re bi exlaqê şoreşgerî şerkirin pêwîste. Ger tu hinekî binê vê rastiyê bikole, dê ji binê vê, dervî qûraliyê, pêk ne anîna rêxistinê û pêk ne anîna taxtîk derkeve holê. Hinek bi ser yê bê exlaq de biçin, bi hinekî kolana ser tiştên tên jiyîn hûn ê bibînin di asteke zêde de dervî qûrala ye, heta li beramberî qûralan di nav şer de ye. Jixwe lêpirsîn jî li ser vî bingehî pêş dikeve.

Dema ku ez li raporên ku hatî dinerim tê de tê gotin; "*fetisînere, qûralên jiyanê pêknayîne"* Tu hinekî din ser de diçe, bi awayekî vekirî derdikeve holê ku binpêkirina qûralan

heye. Di vir de li mercê niyet xirabiyê tu nikarî bigerî, ne di hêza pêkanîna qûralan de ye. Hêza xwe ya pêkanîna exlaqê şoreşgerî û encamê wê yê xwezayî li gorî hiqûqa şoreşgerî tevgerînê jî nîne. Dibe ku kesek nezanekî tolaz be jî. Dibe ku kesayeta ji pergalê hatibe, kesayeta dervî pergalê be jî. Dibe ku endamê çînek dijber ango çînek cuda be jî, ev jî hiqûqê binpê dikin. Teqez ev yekî kêrnehatiye, koleyeke û ji ber ku koleye jî nikare li gorî qûrala tevbigere, hêza wî ya pêkanînê nîne, hiqûqa şoreşgerî binpê dike û nemaze rêya darêzê vedibe.

Wê demê darêz, di rewşên bi awayekî cidî binpêkirina qûralan, cihê ku nîşaneyên zêde ên xirabkariyê tê de derdikevin holê dikeve meriyetê. Pêvajoya lêpirsîn û lêkolînê ye. Kêm an zêde dema ku tawanbar hat dîtin pişre derdikeve pêşiya darêzê. Tawanên wî/ê li pêşberî tê dayîn. Ji bo vê dadgeha darêzê tê damezrandin. Ev hûrkarî an jî teşeye. Tawanên wî/ê li pêşiyê tê danîn, ev tawan di zagonên rêxistinê de hinek cezayan guncaw dibîne. Ew tên gotin û biryar tê girtin. Di nav me de ev zêde pêş neketiye. Hinekî paşketî dimîne. Pergala jûriye, pergala şandê ye, hîn weke tê xwestin nerûniştiye. Em hin zêde derdixin holê, vedibêjin û bi erêkirina hemû endamên ku tevlî civînê bû, bi erêkirina komeke biçûk em hukim didin. Hinek caran jî em hukmê hatiye dayîn baş de didin, hinek caran pêk tînin. Eşkereye ku divê em pergaleke baştir pêş bixin. Lê em ê zêdetir hewl bidin bi beşê din ve lêkolîn bikin.

### *B- Ji aliyê dîrokî ve pêşketina hiqûqa PKK'ê û derfetên pêkanînê*

Piştî ku me di asta têgîn de pêşketina hiqûqî di nav PKK'ê de vegot, bi taybet di nav me de bi zagonên rêxistinê re ketina nakokiyê, bi zagonên şerê çekdarî re ketina nakokiyê, bi xetên sereke pêşketineke çawa raber kiriye, destnîşankirin wê sûdmend be.

Me di qonaxa damezrandina PKK'ê de, zêde bi qûrale yan jî ne bi qûrale em ber bi cudabûneke wisa ve neçûn. Dema ku em gihiştî salên 1980'ê, rêxistina me pirsgirêkên di nav xwe de zêde nedarizand. Bi kêmî hinek cezakirin hatibin kirin jî, li ser esasê

lêkolînek cidî, lêpirsînê derneket holê. Ji ber ku ev dem hinekî jî dema damezrandina rêxistinê bû. Dema xwe gihandina hêza qûralên xwe bû. Bi kurtî ev qonaxa hiqûqa xwe pêkanînê îfade dike.

Dîsa jî gelik têgînên bi vê re nakokin hebûn; armancên sereke pêkneanîn, rewşên lez devjêberdan û çûyînê dihatin jiyîn. Me jî ev weke çivanok, xirabkar, hizibçî radigihandin û darêz tenê bi vê ve sînordar dima. Heta ev di asta exlaqî de jî çêdibûn. Ji ber ku me bi hêzeke hişk bersiv nedida, tenê teşîr dikir. Teşîrkirin nêzîkatiyeke exlaqî ye, ne cezayekî hiqûqiye, yan jî dikare yek ji corên cezakirinek sivik bê destgirtin. Jixwe hinek ji wan jî sîxur derdiketin. Yên ku sîxur bûn, bi qasî ku me derfet didît û bi qasî ku me guncaw didît bi şêwazekî herî giran me ceza dikirin. Lê ev çiqas xweberin, çiqas li gorî xeta PKK'ê ne li şûna fikirandina bi vê, parastina rewa, hinekî jî ji bo parastina tenduristiya komê tevdîrên ku dihatin girtin û ya rast wateyek xwe ya siyasî hebû. Ango bi nêzîkatî û têvdîrên ku me jê re digot teşîrkirina siyasî, bi taybet jî bi propagandayê bi şêwazê avêtinê em serde diçûn. Ev jî ji bo me kafî bûn.

Lê di nava PKK'ê pêşketina bi qûral a esasî piştre pêş ket. Jixwe ragihandina rêziknamê mijara gotinê bû. Elbet tenê îlankirin têrê nake, ya girîng kêm an jî zêde bicewherkirine. Di vê wateyê de ji ber ku kadrobûn, girsebûn pêşneketibû rêzikname jî ti wateyekê îfade nake. Piştî sala 1982'an, bi taybet piştî faşîzma 12'ê Îlonê di şerde hinekî xwe piştrast kir, derket holê ku dê bikaribe şer bike, êdî pêşketina hiqûqa netewî jî bû mijara gotinê.

Pêngava 15'ê Tebaxê, jixwe serîrakirineke cidî li dijberî wahşetê ye. Dema ku derket holê kêm an zêde dê hebûna xwe bidomîne, artêşbûna gêrîla, her ku çû qûralên leşkerî xistina meriyetê, vê jî bi baldarî pêkanîna pêşengatiya partiyê pêwîst kir. Êdî derbaskirina dema komê yan jî derbaskirina pêvajoyên xeternak mijara gotinê ye. Pîvan pêş dikevin, çi li gorî partiyê ye, çi li gorî pîvanên artêşê ne, kêm ango zêde diyar dibin. Jixwe xeta siyasî ya partiyê hem dibû malê netew, hem jî ya qada navnetewî. Teoriya leşkerî jî pêş dikeve û qûralên leşkerî jî bicîh dibûn.

Dikare bê gotin ku, ji salên 1987'an şûn ve pêvajoya gêrîlabûn û pişrte jî ya girsebûnê ye. Ev pêvajo di dîroka partiya me de pêvajoyeke nû ye. Bi awayekî baş pêvajoyeke bi yên ku

qûralan pêk tînin û yên ku pêk nayînin re şerkirinê ye. Ger bê dîqatkirin, heta vê pêvajoyê gelik endamên ku qûralên partiyê pêknayînin hene. Nexasim xebatên provakasyon bi serê xwe xebateke bi erdê re kirina yek xebatên rêxistinê bû. Li beramberî rêxistina ku êdî xwe bi cih kiriye, şerekî provakatoran li beramberî rêxistinê daye despêkirine. Despêkê tevlîhevkirin, ji aliyê ruhî, moral ve tinekirin, pêknanîna gelik qûralan, heta dawî şîroveyên li gorî xwe, jidil bi rastiyên gelemper ve xwe girênedan û nesepana qûralan pir zêde hat jiyîn. Hema bêje ev şerekî hiqûqa navxweyî ye.

Çawa ku me li dijberî KT'yê şerê hiqûqeke navxweyî ferz kiriye, bandorên KT'yê yên yekser, ne yekser, nûnerên wê, di hundir de li ser PKK'ê, li hemberî qûral û hiqûqên wê ketin nav ferzkirinekê. Xirabkirina hiqûqa PKK'ê, PKK weke hêzek hiqûqî nepêşxistin, şêwaza nerastkirinê di radeyek pir dijwar de pêş xistin. Li ser pêvajoyên civînên me yên giştî, xalên sereke yên rêziknameya me weke astengiyek mezin ferz kirin.

Bêgûman sazkirina hiqûqa navxweyî ya rêxistinê weke tê zanîn ne asane. Kesên di nav xwe de darizandin, ji darizandina yên derveyî xwe gelik zahmetire. Bi wesfa hevaltiyê, hem jî di asta herî bilind de xwuya dibe û li pêşberî te radiweste. De îca bigûman be, bandorên pergalê li ser zêde bin, ferzkirina şoreşê êdî ew bi linavçûnê re rû bi rû bike, wê ev bibe berxwedaniyeke dijber û tevgerîn, qûralên xwe û kêyfîyeta xwe ferzkirin. Herweha ya ku encam jî da ev bû. Serê kêliyê carekê ev hiqûqa jê re dibêjin keyfiyet, xwe ferzkirin jî çiye? Ya rast xwe ferzkirin û parastina li beramberî qûralên şoreşê yên ku pêş dikevin, jiyana şoreşgerî, yan sîxurên bi zanabûn ên pergalê, yan jî yên ku ne yekser jê bandor bûne, jiyana kevnar derbas nekirinê ye. Bi rastî ev jî şereke. Ji ber ku pirsgirêka hundirîn a rêxistinê dibe mijara gotinê, pergala rêxistinê, qûralên rêxistinê xirakirin, binpêkirina rêziknameya rêxistinê û di heman demê de dibe ji holê rakirina hiqûqê rêxistinê.

Ev pêvajoyeke me gelikî bi zahmetî derbas kiribû û me bi van re di despêkê de têkoşîneke siyasî meşand. Lê me dît ku têr nake; teşîrkirina feraseta van jî têr nake. Belaye, tu devjê berde jî, ew devji te bernade! Mîna diz û xwediyê malê ketiye malê tu jê re dibêjî; "*Tişta ku tê bigrî bigire û biçe, ew jî dibêje; na ez devji te*

*bernadim, ez ê PKK'ê bixim bin erdê. Yan jî dibêje PKK kêfa mine.* Û wisa xwe ferz dike. Ev hema mîna dizê malê ne. Dema ku rewş wisa bû me jî pêdivî bi darizandinê dît.

Weke tê zanîn dema ku em ber bi kongreya 3. ve hatin, cara yekem hat fêmkirin ku divê em di nav xwe de darizandinek cidî pêş bixin. Çi di şer de, çi jî di xebatên partiyê yên cuda de bi awayekî cidî pêk ne anîna qûralan, qûral li aliyekî hiştin û ya herî girîng jî bi feraseteke ez bi PKK'ê gav nadim avêtinê de israrkirin û rewşa ev li ser hemû kesî ferzkirinê dihat jiyîn. Tevî hemû fedakarî, hewldanên qanihkirina siyasî, bandorkirina hevaltiyê, weke ku devji vî helwestî bernedan, bi şêwazên komplo û heta xwe ferzkirinên wan ê fîzîkî jî xwe ji hemû aliyan ve ji ber ku xwe dan der, li beramberî vê tenê tişta ku tu bikî parastina rewa ye. Ger tu ferd be jî, parastina şexsê xwe ye, ya rast rêxistin linav diçe, tê rêxistinê biparêze. Em devji nêzîkatiya wêjeyî, exlaqî berdin, nêzîkatiyeke asayî ya mirovî jî qebûl nake. Helbet wê demê hiqûqa navxweyî çi ferman dike, tê wê pêk bîne.

Cara yekem lêpirsîneke wisa hat kirin. Bi israr gotin; " *PKK çawa ji dayik bûye dê wisa bê binaxkirin, teqez em ê PKK'ê nedin meşandin, em ê xeta wê ya şer linav bibin. Taxtîkê PKK'ê nameşe, xeta şerê çekdarî, bi qûralên rêxistinê nameşe. Rêxistin herkes xwe di asta dikare şer bike ango nikare bike di nav vê kêyfîyetê de hiştine."* Nêzîkatiyeke pir aloz û ger bi baldarî li ser nehatiba sekinandin nêzîkatiyeke rêxistin tine bikira bû. Nemaze pêşxistina lêpirsînekê di cî de bû.

Dixwaze bila bi niyeta baş, dixwaze bila bi niyeta xirab be, ev kîne? Yên ku di her derfetê de xetê xirab dikin, weke ku pêdiviyê pêk nayîne yên ku dixwazin rêxistinê ji holê rakin kîye? Me hewl da bi kûrî em van kesan fêm bikin, dahûrînin.

Wek tê zanîn, di sala 1986'an de dahûrîn pir pêş ketin. Bi dahûrînan re girêdayî nasîna kesayetan, çiqasî girêdayî dewletê ne, ne rasterast bi jiyana xwe ve, bingehên xwe yên exlaqî ve, çiqasî ji aliyê dewletê ve hatine şandin, çiqasî ji nav kevneşopên paşverû hatine derket holê. Em devjêberdin hatibin nav partiyê, derket holê ku taxtîk vala derdixin, hinek ji wan kêr nayên û xwe dixapînin. Ev hemû ji rewşa giran heta ya sivik tawan hatin hesibandin. Herweha çors be jî di pêvajoya kongreya 3. de, me

pêvajoyeke wisa ya darizînê jiyan kir. Ev bû ezmûnek pir cidî. Ne weke dihat xwestin bû, lê me gaveke wisa pêş xist.

Pêvajoyên başê berfireh pêş ket. Ji aliyekî ve ji bo ku em gêrîla ava bikin, disa di her qadê de pêşengatiya partiyê saxlem bigirin hewldanên bêxedar pêş dixist, bi heman sedemê, berxwedaniya hemû çêkerên ku ji aliyên KT'yê ve hatibûn avakirin û nûnerên wê pêş ket. Jixwe çîroka provakatoran tê zanîn. Ev beşên ku vekirî tawan dikirin bûn. Bizanebûn, ango jiberxwe ve bûyîna wan zêde ne girînge. Ji ber ku li gorî zagonên netewî tevnagerin, li gorî pîvanên pêşeng tevnagerin ya herî girîng jî li gorî taxtîkên sereke tevnagerin. Hema bêje her sal em rûbirûyî xebateke provakatîf a çalak dibûn. Yan jî pevçûneke wisa her tim mijara gotinê bû. Jixwe ya li beramberî van diviya hertim bêkirin; ew teşîrkirin, tecrîdkirin û yên har, bêxedar serde tên jî darizandin û cezayê heq kiribûn ji wan re dayîn bû.

Wek tê zanîn di sala 1988'an de gelik bi berfirehî, hem di girtîgehê de, hem li çiyê û hem jî li Ewrûpa êrîşên wisa pêk hatin. Serkêşên van ev digotin; "*Me PKK desteser kir, jixwe Ewrûpa bi temamî di destê me de ye, APO dê biçe, gelik qadên welat jî aligirê me ye.*" Vekirî êrîşî rêxistinê dikirin. Tenê ne bêhiqûqiyek, êrîşeke dijber bû û xîtabî gelik hêmanên paşketî dikirin. Ji wan re soza berjewendiyê didan. Weke ku hûn zanin, demeke pir aloz bû. Di nav girtîgehê de jî heman tişt dihat jiyîn. Ev jî di redkirina partiyê de, di armancê, qûral û taxtîk de pêk dihat. Li beramberî vê jî parastina rêxistinê ya hiqûqa xwe mijara gotinê bû. Rêxistinê ev gav serkeftî pêk anî. Bi hinek lêpirsînin berfireh û cezakirinan me karî em hiqûqa xwe hinekî pêş ve bibin.

Dema ku em gihiştîn salên 1990'î, careke din bi awayekî vekirî ya ku ket nav êrîşê, ji hemû alî ve êrîşeke provakatîf a li ser xeta têkoşîna me ya çekdarî, feraseta me ya jiyanê pêş ket hebû. Li beramberî wê jî xwe ne parastina rêxistinê nayê payîn. Ji ber ku hem di nav teşîr û êrîşeke vekirî de bû, pêwist bû ku bi êrîşeke dijber bihata bêbandorkirin.

Ev qonaxên sereke ne. Ya rast di nava hemû salan de biçûk ango mezin heta di her qadê de, girtîgehê, hemû eyaletan, dervî welat de jî gelik xebatên provakatîf ên biçûk dîtin ne zahmete. Dervî xetê, bi taybet dervî taxtîk û gelik tevgerên dervî jiyanê hene. Hema bêje ji dijminê vekirî zêdetir, ji dijminê navxweyî

yan jî pîvan û qûralan nas nakin, bi taybet jî yên ku ji aliyê exlaqî ve vê pêk nayîne, di rastiya xwe de rêxistinê rûbirûyî linavçûnê dikir, gelik nêzîkatiyên wisa hebûn. Ji ber vê sedemê jî şerekî dijwar ê bêxedar mijara gotinê bû. PKK, di vê wateyê de naçar ma ku şerê herî dijwar di nava xwe de bijî.

Dema ku em gihîştîn sala 1992'an jî dîsa wisa bû. Bi taybetî jî nesepîna taxtîk ya ku di şerê Başûr de derket holê, li gorî gêrîla hêza xwe amadenekirin, dîsa ji taybetmendiyên pêşeng dûrketin, nepêkanîna pîvanên jiyana partiyê ji ber ku bi kûrî dihat jiyankirin, xeta PKK'ê ya rewa, dikarî serkeftinê bi dest bixe bi bûhraneke mezin û binketinê re rûbûrû dihiştin.

Me di sala 1993'an de darizandineke berfireh pêş xist. Bawerim zêdetir bi vê darêzê ve, li gorî pîvanên sereke yên pêşengatiyê, bi taybet jî li gorî pîvanên gêrîla çiqas berevajî ketin hatibû jiyîn, me hewl da em vê ronî bikin. Hema bêje hemû kes di darizînê re hatin derbaskirin. Hinek cezakirin pêşketin. Lê sînordar ma. Ji ber ku bi rastî jî dixwestin bûhranekê bafirînin, kesan di kesayetiya xwe de dixwestin rêxistinê vala derxin. Nemaze pêwîstî bi helwest girtinek siyasî hebû. Herweha me jî di navbera salên 1980'ê û 1993'an de, tevdîrên siyasî û leşkerî pêş xistin. Em ketin nav pêvajoya şerê bêbandorkirin, tengkirina helwestên hiqûqê rêxistinê ji nedîtîve dihatin, lîstokên li beramberî rêxistinê dihatin lîstin.

Hiqûq kengî dikare bêpêkanîn?

Tê tevdirên xwe yên siyasî û leşkerî baş bigirî, tê hinekî jî rêxistinê bihêz bigirî, piştî wê kê pê lîstiye, wî/ê li ser bingeha tawan derxîne holê. Ez di vê wateyê de dikarim vekirî vê bêjim: Di dîroka PKK'ê de cara yekem di vê qonaxê de, bawerim em dikarin pêvajoyeke erênî di lêpirsîn û darizandinê de rêve bibin. Tam jî ev qonax dibe pêvajoya lêpirsîn û darezîna tawanên navxweyî û encamên ku derketine holê.

Di qonaxên me yên berê de lêpirsîn û darizên me sînordarin. Li gorî pîvanê û hevgirtina xetê darêz nehatiye pêşxistin. Lêpirsîn kêmin, zêde ne rasteqînin. Dîsa di van demên darêzê de rêbazên ku divê neyên bikaranîn, hatine bikaranîn. Eşkereye ku em ê zêde baweriya xwe bi îşkenceyan neyînin. Dîsa pir vekiriye ev rêbazên çors ên îşkencê ne rêbazên me ne. Em zanin ku ev rêbaz hatine bikaranîn. Em hîn bi başî dibînin ku van

rêbazan lêpirsîn ji cewherê wê derxistine, tawanbarên rasteqîn veşartine. Yek bi van aliyên xwe ve lêpirsîn kêmin û hêjayî rexnekirinê ye, ji ber ku ne zanistî ne. Hinekî jî lêpirsînên ku kesan li gorî kêfa xwe meşandine. Xalên sereke yên lêpirsîna me esas nayên girtin.

Başe, lêpirsîn dê çawa bên pêşxistin?

Divê ku ji aliyê zanistî ve xwe bispêre lêkolînê. Dahûrînên me bi xwe hene, di ronahiya dahûrînan de tawanê ku hatiye kirin dîtin ne zahmete. Nemaze divê ku asta fêmkirina dahûrînan a van kesan li berçav bêgirtin, yên ku di fêmkirina xetê de serwerin vî karî bimeşînin. Yên ku tiştekî ji xetê fêm nakin, ji dahûrînan fêm nakin hûn dibînin kirine kesên yekem ên ku lêpirsîna dimeşînin. Nêzîkatiyên van ên çors, ên ji zanistgeriyê fêm nakin, eşkereye ku dê lêpirsîna ji cewher derxin. Heta wê bigihê asta pêkanîna rêbazên dijmin di nav rêxistinê de. Bi rastî jî ji ber vê gelik neyênî derketine holê û heta bûne sedema şehadetên gelik şervan, milîtanên partiyê yên ku paşê îtîbara wan hatiye dayîn. Heta vê radeyê birine.

Ya rast di bin navê lêpirsînê de –Jixwe bawerim hinek ji wan ji aliyê dijmin ve hatibûn şandin, kesên mîna Hogir û hwd hebûn- di vê mijarê de pêvajoyên lêpirsînê gelikî îstîsmar kirin û gelik kesên ku çewsîneriyek mezin li ser hevrêyên xwe meşandin derketin holê. Dîsa kesê bi navê Metîn hebû, yan jî di gelik herêman de, eyaletan de rêbazên ku li ser dijmin nedihatin pêk anîn, li ser hevalên xwe pêk anîn derketin holê. Pêwîste ev cuda bên lêpirsînkirin. Di bin navê lêpirsînê de, lêpirsînkirina kesên ku bi rastiya me ya darizandinê lîstîne jî mijareke cuda ye. Em dikarin bêjin ku ji ber vê me bi hezaran şervan winda kirine.

Tenê ne di derbarê kesan de, di asteke pir li pêş de zirar dayîna nirxên rêxistinê yên madî mijara gotinê ye. Tawanên dema borî bi xetên giştî dikarim vebêjim: Mînak, ji ber bê tevdîriyên mezin çek li erdê rizîne, bê sedem bi sedan ketine destê dijmin, bi hezaran, deh hezaran ton erzaq û hwd. Nirxên me ji ber bê tevdîriyê ketine destê dijmin. Ya herî girîng jî girîngî ji derfetên pêşketinê re bêdayîn ev bi qasî hêza artêşekê ne. Tevî ku ev hene jî, nêzîkatiyên ji rêzê yên pêkanîna xetê raber nake mijara gotinê ne. Destê xwe ne avêtine van, terkî rizînê kirine.

Bi yê amade hatiye lîstin, şervan dane revandin, perwerde nekirine, birêxistin nekirine, nêzîkatiyên ferdî, kêyfî heta dawî hatine sepandin, mirov terkî mirinê kirine, di dol û geliyan de hatine hiştin, silavek hevaltiyê ji wan re zêde hatiye dîtin. Nêzîkatiyên em ji bêexlaqiyê bigirin, heta hemû corên dij hiqûqî hatine raberkirin. Dema ku em pratîka borî bi van aliyan ve dinirxînin, em bi hesanî dikarin bêjin ku binpêkirinên hiqûq hatine jiyîn. Heta bêhiqûqiya ku dijmin nekarîye pêk bîne, xirakirina qûralan em dizanin ku di nav me de hinek kesan meşandin.

Sedemên van hemûyan hene. Weke min got nebûye endamekî rasteqîn ê partiyê, hêza dahûrînê nîne, hêza zanistî tevgerînê nîne, qûral çiye nizane, zagona leşkerî çiye nizane. Tevgerîna leşkerî çiye em hîn nû nû fêrî we dikin. Hiqûqa ku ji aliyê van ve bê pêşxistin, dê hiqûqa ku mirtib li ser bavê xwe pêk tînin be. Di rastî de me ev biwêj gelikî bikar anî; mirtib kirine paşa, despêkê bavê xwe darve kiriye! Lêpirsînerên di nav me de ya ku kirine hinekî dişibe vê, bûye dadger hevalê xwe darvekiriye. Me gelikî hewlda ku em rê li pêşiya vê bigirin. Ji bo derbaskirina vê divê ku ji mirtibbûnê derkeve.

Hinek ji wan gelikî çorsin. Yên xwe rewşenbîr dibînin jî, yên gundî ne jî, tolaz jî hema bêje hemû jî ne di ferqê de ne ku qûral çiye. Mêtingeriyê ji aliyê exlaqî ve xirakiriye, xistiye asteke qûral, pîvan çiye nas neke. Tenê kesayetiyeke stûxwar ne afirandiye, şexsiyeta ji aliyê pergala mêtinger ve bi qasî derfet bibîne bavê xwe darve bike bi serê xwe binpêkirineke mezin a hiqûq rave dike. Encamên pir giran ên ku van kesan di nav me de derxistin holê hene. Di bin navê hemû corê hiqûq pêkanînê de, xirabkirina hiqûq, hem jî ji aliyê kesan ve afirandina rewşa bê hiqûqiyeke mezin mijara gotinê ye.

Di dîroka partiya me de, her ku diçe ber bi roja me xwe gihandiyê xirabkirinek giran a qûralan heye. Ji vê jî wêdetir, xwe xistina şûna partiyê, bi gotina provakatoran; "*Her egîdek şêwazek xwe heye; herkes çawa dixwaze dikare wisa PKK'ê pêk bîne*" nêzîkatiyeke wisa raberkirin. Ya rast nasnekirina qûralan, nasnekirina hiqûqê netewî, hiqûqê artêşê û ev jî weke mafekî rewa ditinê rave dike, bi rastî yên ku vê di nav me de pêk tînin jî ne kêmin. Kêyfiyet xweşiya gelikan ji wan diçe û ev jî di wateya

siyasî de kedxwariya li ser azadiyê ye. dibêje; “*Min hêz dît, hêz ya min e.”*

Di demên borî de qûralên dijberî hiqûq hebûn. Kral digot; “*Zagon ez im”* Em jî mîna kralên biçûk, nû nû yên ku çav berdidin hêz dibêjin; “*Kral ez im.”* Di pîvanên Kurdistanê de tu ji van kesên ku encax dikarin bibin cuceyê cuceyan re dibêje; “*Neke”* lê ji ber ku bi giranî di bin bandora civaka feodal de dijî, dîsa cihê ku bi giranî çanda cendirmeyan tê de tê jiyîn, eşkereye ku dê kralokên wisa derkevin holê. Tespîtkirina me ya vê rastiyê ne zahmet bû. Lê ji bo linavbirina wan bi rastî jî weke saziya serokatiyê bi girîngiyek taybet amadekirina çarçoveya taxtîk û stratejiya PKK’ê, dîsa ji bo rêxistin ji şer û xezeba van bê parastin şerekî mezin tê meşandin. Hem jî bi hostayî şerekî polîtîk ê rêxistinî tê dayîn.

Ya rast xala ku ev dixwazin me bigihîninê, rêxistineke li beramberî mêtingeriyê nikare li ber xwe bide; rêxistineke bê derbaskirin, têkbirin û dîsa hêzekî şerê çekdarî ku dikaribe xwe bigihîne artêşbûnê ye. Heta van demên nêz jî di asteke pir li pêş de qûral serûbinî hev kirin. Dixwazin hiqûqa mêtingeriyê ya ku taxtîkê gêrîla pêknayîne bipeytînin. Dibêjin; “ *Hûn nikarin bibin artêş, nikarin bibin hêz, nemaze hûn nikarin hiqûqa netewî pêş bixin.”* Yên ku li gorî pîvanên pêşeng tevnagerin dibêjin; “*Derketina PKK’ê ya rêgezî ne derbasdare, divê ku koka wê bêqelandin, bê binaxkirin, ya derbasdare hiqûqa mêtingeriyê ye.”* Li hemû nirxandinên provakatoran binêrin, vê pir vekirî dibêjin. Ser de jî ji bo jiyana PKK’ê ya ku ji aliyê exlaqî ve pir li pêşe dibêjin; “*jiyaneke nayê tehamulkirin, nayê pejirandine.”*

Ji sê eniyan ve êrîşeke wisa dijwar heye. Jixwe êrîşa dijmin di ser ya hemûyan re ye. Em vê bi dijber derketinê yan jî bi pêşxistina hinek tevdîran dikarin asteng bikin, başe, em ê çi li van ên di nav xwe de bikin? Ya din jî rehên berfireh hene, xwedî li hiqûqa xwe dernakeve; hiqûqa rêxistinê, qûralên rêxistinê çiye haya xwe jê nîne. Qûral çawa tên parastin, komîteyeke din, yekîne, temsîlkarî çiye? Wateya van hemûyan nizane ku pêk bîne. Ger bizane jî hêza xwe nîne. Divê azweriyeke şer, girêdanek xedar bi armancê hebe da ku bikaribe pêdiviyên komîtebûnê pêk bîne. Armanc lewaze, perwerde lewaze, têgiştin sînordare, gelo yekî wisa wê bikaribe çi biparêze, wê kîja qûralî bibîne, qûral li

kîderê tê binpêkirin, kî qûralan binpê dike û li gorî vê dijbertiya qûralan çawa pêş dikeve nizane, ne di ferqê de ye.

Di hemû raporên ku niha hatine de ev hene. Tê gotin; *"Min didît, min nezanî çawa li dijberî derkevim, hêza min têr nekir, min pê re lihevkir."* Ev hemû tên wateya bûyîna şirîkê tawan. Hema bêje di hemû herêm û eyaletan de navendên tawan û yên ku pê re lihev dikin hene. Naxwazim daxim asta eyaletan. Dema ku pêwîst kir di kongreyên xwe yên giştî û taybet de em ê serî li vê bidin. Ez xalên sereke destnîşan dikim. Pêşengatî çiqasî ji cewher derketiye, çiqas derfetên gêrîla, heta hêza wî ya amade çiqasî vala hatiye derxistin? Kes naxwaze vê bîne bîra xwe jî. Ez nikarim vê qebûl bikim û vê axaftinê jî ji bo wê dikim.

Ji yên ku nizanin pratîka xwe darizînin dê hertişt jê derdikeve, lê şoreşger jê dernakeve. Di nav rêxistinê de, di nav têkoşîna çekdarî de yên ku hesabê; "*Peywir çiye, pêdiviyên wê çawa dikarin bên cêbicêkirin û min çiqas pêk anî"* baş nedin misoger nikarin di nav PKK'ê de derketinan bikin. Xwe ji vê tawanbariyê şuştinê em li aliyekî bihêlin, weke ku dê nikaribin xwe ji darizandinê rizgar bikin, wê nikaribin ji girtina cezayê herî giran jî xwe xilas bikin.

Bi taybet di vê pêvajoyê de em ê vê bêjin; bi giştî tawanên pir giran hene, tawanê xetê, bi taybetî yê taxtîk û tawanê gêrîla heye. Mînak, ji eyaletekê re tê gotin; "*Ha ji te re ewqas gêrîla, ha ji te re ji bo gêrîla ewqas endamên şervanên nû û çekên wan, ha ji te re hinek pêwendiyên gel, ha ji te re rayeya rêxistinê."* Li beramberî vê ya ku ji te tê xwestin yan jî bi awayekî objektîf encama ku divê tu jê derxî; ger tu hinekî xwe bide kar tê çend yekîneyên gêrîla ava bikî, wê çend çalakiyên wan yekîneyan pêşkevin, çiqas pêwendiyên saxlem yên girse û çiqas darbeyên ku tu li dijmin bidî derkeve holê? Dîsa ji neçarî nebe windahiyên ku te nedane, yan jî dane, te çiqas pêşengatiya partiyê pêş xistiye, te çiqas hevrêyên xwe perwerde kiriye, te çend kes qezenc kiriye ango daye revandin wê derkeve holê. Di gel vê de te çiqas kerese xistiye destê dijmin, çima, tu bû sedema bê tevdîriyên çawa yan jî te çiqas tişt ji dijmin girt?

Ango bi aliyên erênî û neyênî her eyalet, heta ger pêwîst bike heta her herêmekê dê bê lêpirsînkirin.

Ji aliyê dîrokî ve derfetên te yên avakirina artêşê heye, tu dikarî darbeyên kujer li dijmin bidî, tu gihîştiye derfet û fersendan; ger ji ber ketîbûna xwe ya ferdî yan jî muhafazakariya xwe, bi sedema bi taxtîk lîstina xwe pêwîstiya wê nekiriye, heta bi hêcetên ne di cih de hedef başguh kiriye, rista xwe jibîrkiye, bi demogojiyê tu çiqas bûye şirîkê tawan yan jî tu çiqasî dûrî bernamê ye tê veşêrî, ev tawanbariya te giran dike.

Em di rewşa dîtin û darizandina van mijaran de ne. Bi taybetî di vê qonaxê de kes nikare bêje; "*Pratîkeke min a bîst-sî salî heye, ev nayê kirin"* Divê mijarê de di tu demê de min ji pêwîstiya darizînê bawer nekir. Bi giştî gel, di darizandina pratîka şer de bi dijwariya "*Ger dê bijî bila bijî"*de nêzîk dibe. Di nav partiyê de jî vekirî pêwîste ev qûral bê bikaranîn. Em di asta pêşketinên wisa derxistina holê de ne. Yên ku pêdiviya vê pêk neyînin eşkereye ku em ê di derbarê wan de darêzê bidin despêkirin.

Ger hewce bike mirov dikare hinek sedemên siyasî liberçav bigire. Mînak mirov dikare cezayê îdamê bide hinekan. Lê ji ber sedemên siyasî yan jî sedema asta şer ev îdam ji demeke din re hiştin yan jî efûkirin ya raste. Ger hewce bike em ê biryarê bidin, lê nasepînin. Ya girîng pêşxistina darizandinê ye. Ji ber ku ji bo darêzê hem hêza me heye, hem jî tawanên pir berfireh hene. Hinek ji wan bizanabûn bi xetê dilîzin. Ger ez nebim yên ku dixwazin vê bênamûsiyê li ser hemû partiyê ferz bikin hene. Mîna dizekî nirx belavkirine. Tevî ku bi awayekî vekirî dikare hesabê vê bide, her tim tawan davêje ser sûtiyê hinekî din, arasteyî hinekî din dike.

Ger bi rêkûpêkî xwe tevlî kar bike dikare destanan binivîsîne. Lê bi pêdiviya vê re qet mijûl nebûye û ketiye pê xwedayîna jiyankirinê. Hem jî yên ku di asta herî jor de dixwazin xwe bidin jiyîn dibezin hene. Bi yek hevalê xwe re mijûl nebûye, tevî ku dikarî gelik tiştan rizgar bike û hinek tevdîr hene jî, hêza xwe têra vê jî nekiriye, heta ne di

xema wê de bû ye, lê niha mîna PKK'yî yan jî fermandar li ser serê me ye. Pêwîste mirov rûpoşê van hemûyan rake.

***C-Asta darêza PKK'ê Xwe Gihandiyê û Bingehê Sepandinê.***

Bawerim dema ku em ber bi pêvajoya kongreya 5. ve diçin, yek ji karên herî bi sûd ku em bikin, wê ev darizandin be. Bingehên stratejîk ên PKK'ê saxlemin. Sengerên ku girtine berfirehin. Em ê di pirsgirêkên siyasî û leşkerî de zêde lêpirsîn nekin. Jixwe divê mijarê de zelalbûn hene. Peywirdarî pir zelale û karên ku divê bên kirin bi hemû ziraviyên xwe ve hatine diyarkirin. Ya ku bê kirin vesazkirine. Kongre di pêkanîna vê de wê zêde tengaviyan nejî.

Lê mijara darêzê ne hesane. Ev kongre di wateyekê de jî wê bibe kongra darizandinê. Tenê ne çend kes, di nav rêxistinê de yên ku tawanê gêrîla kirine, tawanê rêbertiyê kirin wê bibe pêvajoyeke darizandina van. Di nav vê de, em ê pratîka bîst salên borî ya PKK'ê bikin. Em ê bi darêzê re xwe bihejînin, serûbin bikin. Çi tişta me ya ku divê bê hilweşîn bila hilweşe, çi tişta me ya ku pêwîste li ser piyan bimîne bila bimîne.

Ez jî di nav de, bi qasî ku ez nikarim bi ti deman re berawird bikim li beramberî hemû paşverûtiyên dîrokê, li beramberî paşverûtiyên xwe, nebesiyên xwe, çima ez nikarim meşeke serkeftinê ya mestir pêş bixim çawa didarêzim, dihejînim û bêy ku henase bigirim vê dikim; em ê vê bi hemû partiyê jî bidin kirin. Divê ku herkes vê bizane.

Ya rast dîrok vê ferman dike. Dîrok dibêje; *"Ey gelê Kurd! Xwe darizîne, êdî bese te ewqas di rewşa lanetkirî û ketî de jiyan kir, zindî be, xwe darizîne"* Dîrok ji rêxstina wê ya pêşeng re dibêje; "*Rêxistinê li beramberî xwe ewqas tawan kiriye, hemû teysînên miletekî te zêdetir li beramberî xwe jiyan kir, xwe darizîne ey PKK'e!"*

Niha lê dinêrim; erka min mafê vê darizandina dîrokî li gorî tê xwestin bikaranîne. Wisa diyare ku em ê pêşketinên herî girîng di bingeha vê darêzê de bijîn. Ya ku pêdiviya me pê heye ne fedakarî, wêrekî û egîdiye, ev

hemû pir zêde bi me re hene. Ya ku bi me re nîne li beramberî qûralên xwe durist tevnegerîn, hêza pêkanîna wan qûralan rabernekirin, ji bo pêkanîna wan qûralan şernekirine. Ango hiqûqa navxweyî, bingehê xebitîna rêxistinî, bingeh girtina xebatên gêrîla, bi taybetî jî rojane li gorî taxtîkên bingehîn xebatkirin, bingehê rêxistinî, bingehê kolektîfbûnê, karê komîteyekê, mafê nûnertiyêkê dayîn, wayeteke rast ji fermandariya yekîneyekê re dayîn û rast dayîna şerkirina yekîneya xwe ye. Ev hatiye kirin, ne hatiye kirin? Heta roja me çiqas hat kirin, rê ji çi re vekir, encamên wê çibûn? Ji aliyê kê ve, di kîja qadê de, çiqas hat kirin? Em ê van pirsan hemûyan pêş bixin û lêpirsînê berfireh bikin. Em ê lêpirsîneke pir baş bijîn.

Darêzên ku heta niha me kirine remzî ne. Dibe ku hinekî jî bibîrxistin be. Darêza bingehîn wisa tê fêmkirin em ê di pêvajoya kongreya li pêşiya me de pêş bixin. Ger bala we kişandibe, di dahûrînên nêzîkî salekê de em dikin me darêzek jî bi awayekî vekirî derxistiye holê. Dahûrînan, girêka kor a tawanan jî ber bi çareseriyê ve biriye.

Me ev jî pir zêde vegot; em girêkek korin. Tawanbar-bêtawan, mafdar-nemafdar, serkeftî-binketî, binketî-binxistî hemû têkilî hevbûne. Vaye dahûrînan hinekî ev girêka kor çareser kirin. Ev karê çareserkirinê jî, di heman demê de heta dawî pêşketina bingehê darêzê ye. Mirovê me êdî digihêje hêza xwe darizandinê. Em dikarin dijmin darêzin û ev jî ne pêşketineke ji rêzê ye.

Mirovekî nikare xwe darêze, rêxistinek, ticarî nikare dijminê xwe darêze û li beramberî wî serkeftinê dest bixe. Nemaze darêza ku em ê niha pêş bixin, ji bo serkeftinê, dibe ku ji bo encam teqez merce.

Ger em bi darêzê rêxistina xwe baqij bikin, ango hemû şaneyên xwe, darêzeke serkeftî li beramberî hemû nûnertiyên xwe, pêwendiyên xwe yên jêr-jor de bidin jiyîn; tenê ne di gotin de, yan jî bi avakirina dadgehên nimûneyî, hemû kesayetiyên xwe li gorî pêdiviya vê darêzê, di serî de jî li beramberî wijdanê xwe, li ser vî bingehî li beramberî qûralên rêxistinê, li beramberî civata hevalan, li beramberî

dîrokê, li beramberî gel em dikarin xwe bigihînin asta bê tawaniyê.

Dixwaze bila stratejîk, dixwaze li gorî bingehên taxtîkê rojane be, yan jî qûralekî ji rêzê yê xwarin û vexwarinê be, di mijara hemûyan de asta we ya fêmkirinê, pejirandinê ger em xwe bigihînin kêlî bi kêlî pêkanînê, êdî ji bo serkeftinê merca sereke û pêdiviya wê hatiye cêbicêkirin û sernexistina rêxistinê dê neyê fikirandin. Em ê bikarin xwe bigihînin vê rewşê? Bêgûman ev jî karê şere. Ji bo vê perwerde pêwîste, têkoşîn, bi hêzgirtina rêxistinê û saxlemgirtina hemû sengeran pêwîste. Ev karê encam girtinê ye. Wê tu yê rêxistinê bihêz bikî, senger girtin û binke girtinê baş bikî.

Bi taybet qonaxên ku darêz tê de tên kirin, demên aramî û serweriya rêxistinê li ser xwe tên xwestinin. Dema ku rêxistin di xeteriyê de ye tu nikare darêzekê bikî. Linavbirina netewî ewqas bi hêz be, rêxistin hewl dide dema qeyranê derbas bike, eşkereye tê nekarî darêzeke watedar pêş bixî. Jixwe di demên borî de sedemên pêşnexistina me ya darêzeke giran jî ev in. Rêxistin di pêvajoyeke zahmet de maye, qeyran li ser qeyranê jiyaye. Hûn ji senger û binkegirtinên saxlem dûrin, nemaze hûn nikarin darizandinek aramiyê dixwaze, darêzeke ji xwe baweriya rêxistinê dixwaze bingehî bikin. Nemaze wê remzî bimîne.

Niha rêxistin dikare ji xwe bawer be. Niv bi nîv rêxistin çêkera xwe ya navxweyî linavbibe jî, bi hezaran kesên ku bikarin valatiya wan tijî bikin hene. Lê di dema borî de bi heman rehetiyê me nekarî em vê bêjin. Mînak, ji bo darêzê amadekariya herî baş a ku min kiriye; di PKK’ê de dixwaze bila kevn, dixwaze bila tevlîbûneke nû be, nêviyê wan jî bi destekî bavêjim aliyekî, bi asanî dikarim cihê wan dagirim. Ji ber ku me hêza ji van baştir dikare rêxistinê pêk bîne derxistiye holê, gel ji vê re amadekiriye em dikarin vê bikin. Lê di dema borî de me nedikarî em vê bikin. Dibe ku hinek ji me re bêjin fersendparêz. Na! Ti eleqeya xwe bi fersendparêziyê nîne. Bi tevdîrên şerê rizgariya gelekî ve girêdayîne.

We di çîroka me de ev jî dît; yên ku sîxuriya wan zelal bûye, tevî ku nêzîkatiyên provakatîf jî ferz dikir min bi salan sebir kir. Çima? Ji ber ku wê demê pêdiviya min hebû, pêdiviya rêxistinê hebû, dîrokê jî ev ferman dikir û pêwîst bû. Pêwendiyeke hevalên min ên herî hêja nekarîn rojekê jê re tehamûl bikin, min deh salan tenê ne mîna zembîlekê li ser pişta xwe, di mejiyê xwe, dilê xwe de mîna xencerekê bandora wê heyî jiyan dikir. Ez ji bo vê dibêjim; dema ku roja xwe hat me di derbarê van de hinekî darizandin pêş xist.

Di eyaletan de piraniya wan ez dieşandim, hem bi qûralan dilîstin, lê min jî baş dizanî ku, ger ser de biçim ji aliyekî ve dewlet nîşan dida, dê revîba. Jixwe gelikan ev ferzkirin û dibêjin; “*Yan em ê birevin, yan înkar bikin, yan jî xira bikin.”* Ev belane. Ji bo têkbirina hesabê van, tevdîrên siyasî, yê rêxistinî pêwîstin. Diviya bû bersiv ji nêzîkatiyên van ên ku şayanî xwe ditibûn û digotin; “*Rêxistinê jî bi min re linav biçe, ger ez biçim ew ê jî biçin”* bihatana pêşwazîkirin. Hema bêje di hemû eyaletan de rewşên wisa li pêşberî me bûn. Ya herî girîng jî çavsorên ku digotin; “*Ez ê xwe ferz bikim, ji bo paşatiya rojekê ez ê hertiştî bigirim berçav”* bûn.

Ev nêzîkatî heta niha jî hene, hema bêje di her qadê, her herêmê de hene. Heta bandora xwe li asta herî jêr jî kiriye. Kesayetiya ku dibêje; “*Ez ê li ser yekîneyên rojekê weke paşa bijîm, çi tê serî bila bê ez pê qayîlim”* jixwe dema ku bi exlaqê ketî, taybetmendiyên kesayetiya ketî çavê xwe di nav rêxistinê de vedike, hema rê ji vê rewşê re vedike û dibêje; “*Bese jiyan ji bo min ewqase”* De ka bifikirin bi hezaran endam û hema bêje di hemû qadan de xwe ferzkirinên wisa hene. Jixwe erka Rêbertî ya herî girîng a çareserkirinê jî têgîştine. Ya herî girîng jî daxwaza ku ferz dikirin ferzkirina qûralê; “*Her îsyan çend rojan dikare bidome û linav diçe”* bû. Dibêjin; “*Me dest bi îsyanê kir, serneketin, yan em ê mirina xwe bigrin berçav, yan jî birevin û radest bibin”* Ev yekser tê wateya; “*Em ê bênamûsiyê bikin, vê bipejirînin.”* Ango ji me dixwazin em kesên kole, yên hov di nav partiyê de bipejirînin.

Ev tevgereke mezin a belayê ye. Ger ji van re bêhiştin dê di du-sê rojan de tegverê tasfiye bikin. Ji her tiştî re amadene. Bênamûs, dixwaze bila bireve, dixwaze bila xwe bikuje, dixwaze bila çav berde meqam, jixwe karîyer azweriyeke pir mezine. Ger em hîn zêde dakevin bingeha van; drama mirovê me yê ku xwe negihandiye asta partîbûnê, nekiriye fermandar û leşker derdikeve holê. Xwenezanek, tolaz û belengazeke.

Ez naçarim vê jî bibînim. Nemaze tevî ku ev tawanên giran kirine jî, di berdêla çi de dibe bila bibe naçarim rêxistinê bidim jiyîn. Ne ku ez tawanên wan nabînim, ango rewşa ku em di nav de ne fêm nakim. Rewşeke min a pir baş dibihîze û fêm dike heye. Lê rastî jî ev in. Bi ser we de bêm, ji xwe hûn mîna miriya ne, hûn ê mîna pîrejin bikevin. Ya ku ji destê we tê girîye, tolazî ye. Bi awayekî cidî yê ku bêje; "*Ez camêrê qûrala me, ferman û hiqûq çiye zanim û bi awayekî vekirî jî dikarim hesabê wê bidim"* nîne. Wê demê tê sebir bike, tehamul bike, rêxistinê pêş bixe û alternatîfê xwe derxe holê. Ew bi xwe re dixwaze tine bike, tê deh heban bafirîne, ew kariyeristiyê ferz dike, tê deh kesên ku dikare şûna wî bigire amade bike. Di rastî de min wiha kir. Ez bi ser xwe de çûm; min di asteke awarte de xebatê perwerdê meşand, pêwendî bi gel re pêşxist, hêza rêxistinê afirand, vêcarê ji bo vala derxistina vane.

Yên di nav partiyê de nerehetin, bi hêrsin, difikirin ku mafê wan hatiye xwarin û yên ku li gorî rastiyên xetê tevlî nabin hene. Min di rewşa piraniya ji we de ev derxist holê. Mixabin we ev winda kir. Divê ku hûn vê pir baş bizanin yan jî yên ku divê rewşê de ne divê vê baş fêm bikin, me Rizgariya Netewî girtiye bin ewlehiyê. Hemû tevdirên linavnebirina vê xetê hatine girtin. Hemû tevdîrên we yên tevlînebûna vê xetê, tevlînebûna jiyanê, pêknanîna taybetmendiyên milîtaniyê hatine girtin. Xwarina ku ez didim we jî zêde ye, cixareyek jî zêde ye. Yê herî kevn jî wisa, yê nû jî. Dema ku ez vê dibêjim, ez kontrola rêxistina xwe û gel jî di destê xwe de digirim.

Hinek ji wan dibêjin ez ê bigrîm. Tu digrî bigrî, bicehime biçe! Ez ê eleqedar bibim, lê ger tu li beramberî me wisa li ber xwe bidî ez ê ticarî qebûl nekim. Hinek ji wan dibêjin ez ê pê bilîzim, ger tu pê bilîzî tê hesabê wê jî bide. Rêbertî, hinekî jî xwe gihandina vê astê ye. Hişê xwe bide serê xwe! Te kariyera xwe da axaftin, çi marîfetê te hebû te derxist holê, te li ser koletiyê lîst, li ser ketîbûnê lîst, li ser navê nemerdiyê çi heye te kir, jixwe tiştekî te nekir nema. Di rastî de ez dikarim hinek ji van derxim holê yan jî di vê wateyê de kes çi rave dike jî dikarim nîşan bidim. Teqez yên ku divê rewşê de ne binketin.

Vana piştî vê dikarin çi bikin? Ger li beramberî rêxistinê girêdanek, hurmet û rêzdariyeke wan hebe û dîsa ger şer dixwazin, wê li beramberî rêxistinê binketinê bipejirînin. Li beramberî rêxistinê binketin ne şerme. Ya şerm, li beramberî rêxistinê liberxwedane. Tevlîbûna rêxistinê, bi rêxistina xwe re hevgirtin meselekeye şeref û anûrê ye. Heta di dema borî de sucê xwe çiqas giran dibe bila bibe, dîsa jî wisa ye. Ger dibîne, dikare ya pêwîst bike, em ê bi hesanî derfetê xwe terbiyekirinê bidinê.

Hewl didim vê diyar bikim; dema ku em di vê berfirehiyê de darêzê pêş dixin, terbiyekirin jî dê bi vê re pêş bikeve. Hûn ê vê berî hertiştî fêm bikin. Hûn baş dizanin, zêde hêza we têra kar nekir û hêz têrênekirin jî bi serê xwe suceke. Di destê we de bi sedan heval vala jiyana xwe ji dest dan, derfetên şerek ên herî baş vala hatin xerckirin. Ma hûn çima nabînin ku ev sucekî mezine. Niyeta xirab qet negirînge, xwe negihandina azadiyê jî suceke. Rê li ber pêngava azadiyê, pêngava serkeftinê venekirin jî suceke. Koletî jî suceke û di binê her binketinekê de jî rewşa sucbariyê heye.

Em darêzê bingehîn digirin dest. Bila tu kes nekeve nav nêzîkatiyên; "*Min bi zanebûn nekir, derfet ewqas bûn, encax ewqas dikarî bêkirin*" wisa erzan û parastina xwe neke. Îhtîmaleke mezine yên ku bên darizandin dê parastineke xwe pêş bixin. Parastina xwe bi vî rengî nekin; "*Ez bê cesaret bûm, min pê re lihev kir, min nedît, yan jî ji ber yek du nêzîkatiyên kêyfî û teserûfparêz ez ketim nav*

*helwestên wisa”* û vê nebêjin. Ev nabe parastineke baş. Dibe ku hûn hinekî xwe bi van sedeman bixapînin, lê parastin wisa nayê kirin. Di nav vê parastinê de xeteriya heman kêrnehatinî kirinê heye. Hemû parastinên ku ez zanim li ser vî bingehî tên pêşxistin û ev jî parastineke nebese.

Ez jî hewl didim xwe biparêzim. Hemû nebesiyên ku ez dikim, heta li beramberî rewşên tawan jî bi pêşketinekê hewl didim telafî bikim. Nebesiyeke perwerdê heye bi ser perwerdê de diçim. Nebesiya pêwendiyekê heye bi ser pêwendiyê de diçim. Nebesiyek moral heye hûn dibînin ku ez moralê xwe pêş dixim. Nebesiya derfet û îmkanan heye bê kêmasî dikim. Ger hewce dike moral bidim gelekî wê jî pêk tînim. Ango çi tişta ku ji kesayetek rêber bê payîn hebe wê raber dikim. Bê sînor min jiyan seferber kir. Li beramberî nebesiyên dîrokî yên taybetmendiyên rêbertiyê xwe parastina min li ser vî bingehî pêşket.

Hûn dibînin, ji roja yekem ve, ji rewşa tenê yek kesî derfet nedidayê, yên herî nêzîkî me jî bi salan bi me re ji bo pêngavekê jî hêza wan têr nedikir ji serdemeke wisa me ber bi vir ve anî. Lê dîsa jî ez dibêjim pêwîste em çawa zêdetir serkeftî bin darêza xwe dikim. Jixwe jiyana min bi serê xwe bêxedar xwe darizandine. Ev darêzeke rasteqîne. Ji ber ku encamên wê ji bo Rizgariya Netewî, rêxistinê, gêrîla serkeftine. Ji hemû aliyan ve ji bo mezinbûna PKK’ê serkeftine.

Darêza ku divê hûn di derbarê xwe de pêş bixin û bingehê parastinê wê di xala serkeftinê de diyar bibe. Ger na, ez ê bigrîm, sedem û hêcetan rêz bikim û devjê berdim, parastinek bi vî rengî kirin, weke ku ne parastinek jidile, ji bandora darêzê jî nikare rizgar bibe. Yên ku parastina xwe wisa pêş dixin, ji darizandin, nemaze israr bikin ji girtina cezayên girantir jî nikarin xwe rizgar bikin. Em xwe terbiyekirinê yan jî weke ku hûn pir zêde di parastinên xwe de daxwaz dikin ku şansekî din ji we re bêdayîn, em jî di despêkê de li ser bingehekî rast bi xwe terbiyekirina we ve gire didin. Mînak, em di pêşengatiyê de li nebesî, di moral

û gelik taybetmendiyên taxtîk de rewşa ku hûn raber dikin dinêrin.

Mînak hûn fermandarê yekîneya gêrîla ne, we yekîne baş perwerde nekiriye, bicihnekiriye, lojîstîka wê baş pêşwazî nekiriye, çalakgerî baş rêxistin nekiriye, xalên bingehîn ên rêziknamê pêknaniye. Ger di van mijaran de hûn bên darizandin, parastina hûn bikin divê li ser bingehê derbaskirina van be. Hûn ê yekîneyekê bigirin dest, ev yekîne di kîja aliyên jiyanê de nebese, çi aliyên ne baş hene; bibinin berevajî nîşan bidin, hûn ser bixin. Ev parastineke mezine û şêwazê parastina raste. Dîsa gelik nebesiyên te derketin holê, ger kêlî bi kêlî tu wan derbas dike, di wê kêliyê de çareseriyê pêş dixe, ev şêwazekî parastinê ye û dê bêpejirandin. Ji bo van dê şansek bê dayîn.

Ger tu bizane vî şansî bikar bîne, tu xwe dide efûkirin, di heman demê de tê wateya ji rewşa tawanbariyê derketin û ketina rewşa bûyîna endamekî/ê partiyê şervanekî. Lê tu bi şêwazekî zirav bidomîne, vê carê tawanê du qat bibe û ceza jî bê zêdekirin. Jixwe di hiqûq de jî wisa ye. Jixwe gelik tawanên ku hatine kirin hene, dibe ku pêncî carî, sed carî dubare bûye. Bi vê darizandinê re, ger dîsa jî bêdubarekirin, bawerim wê sedî bike dused û rizgariya wî/ê kesê nîne. Agno dê darêz di vê mijarê de teqez encamgir be.

Pir vekirî dibêjim; di vê qonaxa dîrokê de, darêza li beramberî van tawanbariyên kevnar û ger hûn mafê parastinê jî rast bikar bînin, derfetê xwe terbiyekirinê girînge. Li gorî ku min jî ev rojane bi xwe re daye despêkirin, hûn ê vê rast bigirin dest. Bila tu kes nebêje; "*Tawanekî min ê bi zanebûn hatiye kirin nîne"* Ez ji herî başê we vê dipirsim; tu çiqas bûyî leşker, ger tu bûye leşker qadek, yê amade jî te çiqas pêş xist, te çend şer meşandin? Min di vê navberê de hinek heval bêy ku di ferqê de bin darizand. Eşkereye ku hêza ji te re hatiye dayîn, bi derfet û fersendan re tu karî şerê mezin bimeşîne. Ew bi xwe jî li xwe mikur tên û dibêjin; "*Ya rast ya ku pêwîst bû me bida nedaye"* Wê demê tu tawanbareke.

Ger berê hesab ji we nehatiye pirsîn, ev ji ber sedemên siyasî ne. Çine sedemên siyasî? Wê demê em hinekan bi cezayên hişk darizînin, wê rewşeke girantir, paşketî derketa holê ji ber wê. Diviya bû bi cezayê herî giran bihata darizandin, lê me nedikarî em ceza bikin. Ger me ceza kiriba dê dijmin ji vê sûd wergirtiba. Ev nayê wateya tu hatiye efûkirin, ji ber sedemên siyasî cezayê te hat paşdexistin û paşdexistin jî ji bo demeke diyare. Ger paşdexistin bi te re dibe sedema dubarekirina tawan, em ê niha bingehî bi ser de biçin. Êdî em nikarin paşve jî bixin. Ji ber ku mercên siyasî ji niha ve biqasî ku em nikarin bi demên borî re berawird bikin veguherîne. Cezayê di dema borî de me nekarî em bidin, niha dikarin vî cezayî bidin.

Niha hinekê bêjin; "*Min berê jî ev tawan dikir, tu ser vê de nehat, wê bêjin, ez berpirsyarê qadê bûm çima wê demê tu hişk bi ser min de nehat*" Ez rêberekî siyasî me. Her hal ez ê li gorî tahlîla fêlbaziya te bi ser te de neyêm. Rêberek, di heman demê de, wê li kîderê şer bike, darizîne, kesê ku vê baş dizane ye.

Taxrîbatên te, komployên te, hemû corê tawanbariyê te, wê li cihê guncaw, di dem û zemînê guncaw de bêdarizandin. Ev ne bertekeke, mijara rast fêmkirina darêzê ye. Bi rêbazên cur be cur ên demogojîk, bi gazincan hêza tu kesî têra ji rêderxistina rastiyan nake. Em dixwazin li beramberî dîrokê, li beramberî gelê xwe, di serî de jî hinekî li beramberî we bibin camêrên rêzdar, karzan, yên ku karên xwe rêve dibin û em dixwazin we jî bigihînin vê astê. Bawerim ji vê baştir jî nabe. Hûn ê van şayanî xwe bibînin. Hûn ê bizanin xwe bigihînin asta milîtanên rêzdar ên rêxistinê. Çima hûn hewl didin bi rêbazên gilî û gazincan, fêlbaziyên cur be cur ser van dapoşin. Ev ê çi bi we bidin qezenckirin? Çar çar xwe gihandina pîvanên rêxistinê, ji dil û teşe bi qûralan ve girêdan ji we re zahmete? Hûn ê ya zahmet ji holê rakin.

Ez vekirî daxivim, ger xeletim bêjin. Min ji aliyê dîrokî ve, ji aliyê mercên ku niha di nav de ye, ji aliyê rastiyên rêxistinê ve ronî kir. Ger raste, wê demê tê li gorî vê tevbigerî. Tê nebêje; "*Xweperestina min, min xwe bi*

*bandor û raye zanî”* Camêrekî bi raye û bibandor, ez jî di nav de nîne.

Raye û bandorgerî; hêza pêkanîna qûralan, hêza ahenga bi xebatê re, hêza xwe razandina serkeftinê ye. Ji bilî vê kî dikare bandorger be? Kevne, navê wî hatiye bihîstin, bila heta dojehê hatibe bihîstin! Kevnbûn encax dikare bi serkeftinan ve bê pîvan. Ger te karekî hêjayî dîrokê kiribe, li beramberî dijmin pîlanekî te yê çalakiya serkeftinê hebe, tu dikarî artêşeke serkeftî damezrîne navê te wê li ser vê bingehê pêşkeve. Ez gelik kesên navdengê wan hatiye bihîstin zanim; bi dahfdanên dijmin bûn kesayetiyên ku hesab li ser wan tên kirin. Mîna şûrê demoklesîn xwestin navdêran li dijberî me bikar bînin. Me tevdîra vê jî girt. Hemû corên pêwendiyên taybet, hemû corên ku moral têk dide hene, wisa dizanin bikaranîna ajoyan wê tawîzan ji min bigirin.

Bi qasî ku dizanim bêqûralî, bêwîjdanî tê çi wateyê, wê çawa bê şerkirin jî zanim. Yê ku bi dijminê xwe re ewqas şer pêş dixe, ma wê nizanibe bi te re şer bike, wê ji te bitirse? Yê ku ewqas kar dike, dikare te jî di xeta rêxistinê de rast bike. Ez ji bo vê dibêjim; heta niha jî yên ku li gorî exlaqê rêxistinê tevnagerin, li gorî xalên bingehîn ên rêxistinê tevnegerînê mêrxasî dizanin ne kêmin. Yên ku nepêkanîna qûralan, di şêwazên xwe de bi israrin, uslûbê leşkerî, siyasî, fermî li gorî şêwazên terbiya, nepêkanîna şêwazê jiyanê, karîyerîstiyê, kêyfîyetê ji marîfetê dizanin hene. Neke! Jixwe ya ku ez jê re dibêjim darêza misoger a dîrokî jî tam jî di vê xalê de ye. Ger tu bikî, tê linav biçî. Ez ji vê re dibêjim daraza dîrokî. Pêvajo bi dawî bû, yan tê xwe terbiye bike, ya terbîye bike! Ti çareyeke din a dayîna jiyankirinê nîne.

Bi rastî jî ez dixwazim teqez hûn fêm bikin. Bi taybet di fermandarên asta pêş de, ji yên ku di nav partiyê de xwedî hewldanên rayeyê de ne re dibêjim; ev darêz tê çi wateyê, heta dawî di kesayetiya xwe de pêk bînin. Parastin çawa tê kirin; heta dawî vê fêm bikin. Xwe terbiyekirin li ser kîja bingehane; vê baş fêm bikin û derketinên xwe li ser vê bikin. Em ê şansê derketinê bidin, pêwîst nake hûn

bikevin nav fikaran. Hûn zirara herî mezin jî bidin me, heta ji pişt ve jî hûn xencerê li min bidin, dîsa jî em ê şansê xwe terbiyekirinê bidin we. Lê hûn ê jî mîna camêran vî bikar bînin. Ger careke din hûn bi wan nêzîkatiyên xwe yên kêrnayên, nebes, li gorî qayde û qûralan tevnagerin, kêyfî, tesarûfparêz, bi hewesên xwe yên karîyerîst û pir ecêb hewl bidin nav refên me şîlo bikin, berî hertiştî hûn ê veguherin kerê ku ji nav avê derketiye. Hûn di vê de bi israr bin, hûn ê pihênekê bixwun û bên avêtin.

Wê ev rêxistin xwe biparêze, çawa ev gel xwe diparêze, rêxistina wî ya pêşeng jî li beramberî vê kêrnehatiyê, nebesiyê, li beramberî israra di nebûna camêriyê de, xwe terbiyenekirinê biparêze û ev xwe parastin jî dê serkeftî bê dayîn. Xala ku misoger pêwîste hûn fêm bikin jî ev e. Ger perwerde pêwîste perwerde, bi rayeyê, yan jî bi şêwazekî din ji bo piştevaniyê çi heye em wê pêşkêş bikin. Bes tu jî me fêm bikî! Xalên sereke yê vê rêxistinê, xalên bingehîn ên ku bi xwîna ewqas şehîdî hatiye hûnan, fêm bike.

Ya din jî êdî em dixwazin derketina ji bo dîrokê pêwîste, ewqas zirara ku me daye xwe rawestînin. Em dixwazin li ser xwe, di jiyana xwe ya azad de qûralan bicîh bikin û ji vê jî yeqîn bin. Dev ji tahrîk kirin, pêşxistina fitne û fesadiyê, kesayetiya ruxêner û rizînê berdin; her gotina ku di cih de nayê kirin ruxêneriye. Her gava ku di dema xwe de nayê avêtin ji dervî taxtîk mayîne. Gelo çima ez li beramberî we di asta têrker û di cih de hêza gotinê nikarim bikar bînim? Ji bo pêkanîna qûralan, xwe gihandina pêwîstiya wan, ji bo hêza çareseriyê di cih de bikaranînê çima ez her roj di nav jiyaneke bi dîsîplîn de me. Ji bo ku ez taxtîk pêk bînim, kesî ku ji min zêdetir xwedî îmtîyaz heye? Kî dikare ji min zêdetir bikeve bin barên giran, yê ku xwe ferz bike kiye?

Pir belave ev gotin; “*Me xwe desthilatdar hesiband”* Berpirsyarê qadekê xwe kralokek hesibandiye, xistine şûna begoyekî. Tu şerm nakî? Em hîn rizgarkirina serî weke erka yekem zanin. Ji bo rêgirtina linavçûnê me hemû tiştê xwe danî holê. Tu li kîderê bû dewlet? Rizgarkirina te ji bo

me meseleyeke mezine. Hinekî hedê xwe bizane, li beramberî jiyanê û rastiyan rêzdar be û nebe hewesdarê desthilatdariya pêşwext. Qet nebe vê carê xwe nas bike.

Weke min got we helwestekî wisa li ser me ferz kir, di vê astê de qûral bên binpêkirin, rastî bên başguhxistin em ê çawa ji bin derkevin. Bi ewqas nebesiyên uslûb, herkes bêje; "*Ez begim*" ger jiyana Kurdê kevin ferz bike, her kes bêje; "*Wê kurê min bibe paşayek mezin*" ji we ne paşatî, bi qasê maşeyekê wê nirxa we hebe? Tu dibêjî; "*Ez fêm nakim, karîyerîstim, ez kêyfî me, min xwe winda kiriye.*" Ger te wisa xwe winda kiriye, tu yê çend filisa bikî, biçe bifroşe dijmin! Lê xwe nefroşe rêxistinê. Ger tu dixwazî xwe rast tevlî rêxistinê bikî, pîvanên vê hene. Pîvanên wê nebin, jixwe em ê qet nebin hêz. Tu bi devê xwe li hewa çûkan jî bigire van pîvanan binpê bikî, pîvanan pêkneyîne, tê tenê bibe berhevdêr.

Ger bê dîqatkirin ev darêz dîrokî ye. Tenê ne di nav dîroka PKK'ê de, di dîroka gelê me ya azadiyê de jî darêza herî rêk û pêke. Ya herî girîng jî, di kesayeta şexsan de ber bi encam çûyîna vê darêzê ye. Di vê wateyê de ger kongera me ya 5. bê lidarxistin, xwe darizandina PKK'ê, wê bibe kongreya ji hemû aliyan ve xwe paqijkirin û terbiyekirinê. Hemû sucên ku di nav de kombûne û yan jî hemû kêmasiyên ku çavkaniya xwe ji nezaniyê girtine, ji gunditiyê mane, çavkaniya xwe ji nîvrewşenbîrên ku dijmin afirandine, em ji hemû corê kesayetiyên binketî bigrin, heta tawanên bizanebûn hatine kirin wê derxîne holê, darizîne û terbiye bike.

Wer bawer dikim ku, darêz bê serxistin, teqez PKK wê bibe rêxistina serfiraziyê. Dîsa artêş, di vê darêzê de xwe zelal bike, wê tu kes nikaribe li pêşiya vê artêşê raweste. Rêxistineke ewqas hukmî qûralan dike, bi qûralên xwe ve şer dike, şerê çekdarî, rêxistina gêrîla dê xwe bigihîne hemû corê hedefên ku li pêşiya xwe daniye. Di heman demê de ev xwe bi xwe darizandina gele. Ji xwe her roj ewqas şehîd dide, ji vê saxlem derketin, girêdayî saxlem derketina pêşenge. Kî dikare girîngiya vê ji nedîtî ve bê?

Nikare bê gotin; “*Ez ê dervî hiqûq bimînim, ez ê dervî qûralan bimînim, hovim, demogogim, kariyeristim û teserûfparêzim, ferzkarim, lihevkerim”* Divê ku mirov van teva di dîrokê de binçal bike. Hûn ê bizanin êdî bi van taybetmendiyan kes nikare di nav rêxistinê de bijî. Ji bo ku ez sibê xirab bi ser we de neyêm, ji bo partî xirab bi ser we de neyê bi gîrîngî diyar dikim. Herî kêm rêxistin bi qasî dijmin lê dide, wê li kesên ku van qûralan pêk neyînin, vî uslûbê pêknayînin bide. Ger hûn dixwazin ji şîmaqa rêxistinê rizgar bibin, hewl bidin ji demekê zûtir xwe bigihînin van pîvanan, lêhûrbûn bikin, biparêzin û pêkanîna xetê ser bixin.

Misoger ez ji yekî ji we re jî, naxwazim yek gotineke ne di cih de bikim. Lê weke ku hûn dibînin, dema ku digihêje xaleke êdî mirov nikare jêre tehamul bike, roniya çavê min be jî, pêdiviya qûral çibe em ê wê pêk bînin. Nebêjin; “*Me nebihîst, fêm nekir”* Tu pir başî, xweşikî, lê qûral beriya te ye. Tu pir ji dilî, nêzîkî minî, lê qûral yekane rastiya ku me hemûyan dide jiyîne. Hûn ê vê esas bigirin. Rastiya Kurd êdî divê bi dahûrînê ve bigihêje vê astê. Kesayetiya xwe li ser vê bingehê divê bibe hêza sepandina rêxistinê, xwe gihandina pîvanên rêxistinê. Ji bilî vê tiştekî din we rizgar nake.

Ez vê hem ji aliyê dîrokî ve, hem jî ji aliyê rastiyê têkoşîna niha ve dibêjim. Ji ber ku hûn di asta diyarkirina ji niha û şûn ve de ne, dikarin hesabê vê bixwazin, di heman kêliyê de darizînin û bersiv bidin de ne dibêjim. Divê pêvajoyê de hûn darêzê serkeftî derbas bikin bêjin; “*Xweşbextî ya me ye”* Ji nû ve bi mirovatiyê re, bi hevrêtiyê re, bi dîrokê re hevnaskirin çiqas xweşike, çiqas watedare; naskirina jiyanê, xwe dîtin çiqas xwedî wateyeke mezine, hûn dikarin bi vî rengî binirxînin. Lê ger li şûna vê hûn bêjin; “*Ez ê kêrnehatiniya xwe ya berê bi şêwazekî zirav ber bi salên pêşî ve jî bibim”* ji we re bêjim, li ser sûc zevtkirina we û di dema tevgerînê de dadgeh pêk were. Demekê M. Kemal ev kir, hinek mînakên din ên darêzê jî hene. Ji niha û şûn de rêxistinê wisa darêze. Jixwe wisa darêze wê qûralên xwe bide axaftin, xwe bide meşandin.

Wekî din nikare bibe artêşa gel. Di nav PKK'ê de wê nikaribe xwe bigihîne xalên sereke yên pêşengatiyê. Rêxistineke ewqas mezin bûye bi şêwazekî din neyê xebitandin, nayê meşandin. Divê ku hûn vê jî fêm bikin.

Hûn hertim dibêjin; "*Tengbûn, tengbûna siyasî, tengbûna leşkerî, tengbûna rêxistinî heye.*" Ez jî ji we re dibêjim êdî derbas bikin. Me ewqas derfetên perwerdê pêşkêş kir. Tengbûn hertim nayê parastin. Qûralên kevn bi salan nayên parastin. Di vir de durûtiyek heye. Ew nebesî, xeletî, şaşitiyên we ku me bahsa wan kir ên çend sal berê bûn. Çawa dibe ku di van salan de we derbas nekirin? Ger te derbas nekiriye yan tu nexweşekî domdarî, yan demogoge, yan jî niyet xirabî. Ev hersê tawanbarî jî ji bo darêza te têr dikin. Ger ji van hersê jî rast bin, tê ji hersêkan jî bê darizandin.

Xwe nexapînin û nebêjin wê Partî dîsa şansê rexnedayînê bide. Êdî baweriya xwe bi efûkirina min jî neynin. Ji niha û şûn de ger hûn bi qûralan bilîzin xwe nexapînin û nebêjin; "*Wê destê xwe nede min, karê xwe ji min neyne*" Yê herî nêzîkî min be jî, hûn dizanin ez çawa şer dikim. Min ji îsyana yekem heta roja îro ji we re vegot. Divê ku hûn bizanin ya min jî hêzeke min heye. Min ev hêz çawa ava kiriye, bikaranîneke çawa re rûbirû me divê ku hûn fêm bikin. Ji bo ku vî hêzî bi hevrêyên xwe re parve bikim hîn di temenên xwe yên despêkê de min çawa kir ji we re nîşan da. Min ji nebûnê hebûn dafirand û parve dikir. Bawerim yê ku ji we re xizmet dike jî ez im. Lê tevî we yên ku bi erzanî li ser vê rûdinin û di vê wateyê de bi rêk û pêkî xwe nanirxînin jî, beriya dijmin ez li dijber derketim û hêrs bûm. Ev jî xalên sereke yên Rêbertiya me ne.

Ez ji bo vê dibêjim; hêza rêvebirina rêxistinekê ya qûralên xwe heye. Ne mecbûre te bi rewşa te ya berê bide meşandin. Ne mecbûre mîna diraxeke tawan, mîna girêka kor a tawan te li ser pişta xwe bigerîne. Em ji aliyê dîrokî ve jî dixwazin pêvajoya tawanên dema borî derbas bikin. Êdî em dixwazin mîna kesayetekî li ser xwe serwer, li ser xetê, jiyana rojane û şerê wê serwer bijîn. Ez bawerim ev

hem mafekî me yê xwezayî ye, hem jî erka me ya sereke ye.

Ji bo vê dibêjim; qûralên rêxistinekê bi xwe darizandinên di derbarê dema pêşiya me û demên borî de roj bi roj bi vî rengî pêş dixin. Di dema pêşiya me ya kongreya 5. de pêvajoya kongrê yan jî di pêvajoya zivistanê de bi giranî em ê li ser erkên xwe rawestin. Pêdiviya vê ji asta herî jor heta jêr di hemû qadan de, qademeyan û ber bi yekeya veguhezînin, zelal bikin û hewl bidin pêk bînin. Wisa bawerim ku, dema em vê ji hemû aliyan ve pêk bînin, bi giştî xebatên leşkerî, siyasî û rêxistinî ku em dimeşînin wê bigihêjin asta tê xwestin, qûral tam bên pêkanîn.

Di dîroka me ya partiyê de, bi taybetî jî di dîroka me ya şer de, em ê ji asta ti rêxistina ku zirar nedaye xwe, lê me dayî xwe derbixin. Nemaze em ê vê wêrekî û fedakariyê, van hewldanên esil, bi qûralên rast ên rêxistinê re derbasî şer bikin. Ev jî dê bê wateya sed kat zêdetir bidestxistina pêşketinan. Bawerim nebesiya me ya sereke jî ev e. Bi derbaskirina vê wê gelik pêşketinên mezin jî bê navber bên destxistin. Em baş dizanin ku xwe gihandina hedefên ku me danîne pêşiya xwe û girêdana bi pîlansaziyan ve wê bi vê gengaz bibe. Di salên borî de, bi taybet mijarên ku di pîlansaziyan de me danî pêşiya xwe sernexist, hedefên ku me xwe negihandê em vê carê bawerin ku em ê serbixin.

Bi rakirina ji holê yan nebesiyên bi vî rengî, em ê xwe bigihînin hêza partiyê ya ku kêm xwe dixapîne, hemû astên li ser xetê û fermandariyê serwer, rastiya artêşa ku li ser hemû şervanên xwe hikum dike. Dibe ku ji hûn texmîn dikin zêdetir bê navber em ê sedemên sereke yên serkeftina destnîşan bikin. Divê mijarê de erk dikeve ser milê we hemûyan. Bila tu kes ne xwe ji dervî vê bibîne, ne jî dilê xwe bigre û bi tengaviyan xwe bikişîne koşekê, ji bo vê jî dibêjim pêwîste tu kes ji pêşxistina parastina xwe netirse.

Dibêjim li beramberî dîrokê, rastiya têkoşîna me ya îro, bi taybet ên ku di şer de bi îdîane ya ku herî zêde şayanî xwe bibînin, peywirên ku divê bikin ev in. Ji bo serxistinê bi rastî jî bi qasî têhigîştineke kûr, kêlî bi kêlî hêza sepandinê raberkirin

pêwîste. Dîsa dibêjim hostatiya vê pêwîste ew bi xwe baş cîbicî bikin û serkeftina xwe teqez bikin.

**24 Cotmeh 1994**

## JI BO ŞERVANAN HIŞYARÎ Û PÊŞNIYAR

Ji bo mîlîtanekî pêşniyar, şîret yan jî em bi gelemperî baxivin ji şervanekî re, di her astê de yê ku wê nû dest bi şer bike şîret, pêşniyar, hişyarî yan jî dema ku ber bi şervanbûnekê ve çûyîn çêdibe çi dihizire? Ne ku ev nehatin vegotin. Ya rastî piralî û berfireh vedibêjin. Lê dîsa jî hema bêje pêwîste em abc ya vê rêz bikin. Ji ber ku bi we re rewşa xafletê, rewşa di xewdemayînê ji ya tê payîn kûrtire. Dema ku gêrîlayek ber bi hedefê ve dikeve ser rê jî wê dorpêçiyê ji kîja aliye ve derbas bike, kîja nebesiya qûral, di encamê nebesiya kê de wê çi bi xwe re bîne, ji hizrîna van mirov nikare paş de bisekine. Di asta herî jor de saf, lê ewqas jî xwe fêlbaz dihesibîne, bi hemû nebesiyan re lihev dike, gelik rastiyan ji bo xatirê hinekan datîne aliyekî ev taybetmendî pir zêde bi we re tên jiyînin. Ya sereke nedîtin, teqez ya ku li pêşiya xwe deyne nedanîna pêşiya xwe, bi karên ji rêzê re mijûlbûn, hecko gava dawî di asta herî pêşde davêje xwedayîna diyarkirin, teqez divê ku ya bê gotin negotin, ya ku neyên gotin, gotin, dem û zemîn hesabnekirin, rêvebirî nedîtin, şervan nedîtin, çiya nedîtin, rabernekirina hest, hezkirin rabernekirin, divê ku ya bê redkirin nîşan nedan, rabernekirina hêrs û kîn dibin rastiyên we. Ez ji vê ditirsim ku hûn di van mijaran hemûyan de lewaziyên mezin bijîn.

Ger ez dest bi şîretkirina şervanan bikim ez ê wisa despê bikim; tê wisa biçî çiyê, tê wisa serê xwe bixe binê kevir û tê zikê

xwe wisa têr bike ve despê bikim. Bêgûman ev ê heta dawî jiwe re ecêb were û hûn ê bêjin;"*Ma ev jî tên gotin"* Belê dixwazin dubare van bêjim. Tê derdora xwe wisa biparêzî, ger tu ji mirov fêrnabî li heywanê derdora xwe biner û jê fêr bibe, hinekî li pêşiya xwe binêre û ez ê bêjim devê xwe baş bikar bîne. Lê hûn ê ji vê re jî bêjin; "*Ma ev jî lê tê?"* Hûn nizanin baxivin jî, ez ê bêjim hêza xwe, danehevên xwe baş karbîne. Hûn ê jî bêjin; "*Jixwe em bi hemû tişta xwe ji şer re amadene"* Ez ê jî ji we re bêjim; "*Hûn qet ne amadene"* Û ez ê qûralên rêxistinê bibîr bînim. Hûn ê jî bêjin; "*Ez bi hemû tiştê xwe ya/ê rêxistinê me"* lê dîsa jî ez ê bêjim tu bela serê rêxistinê ye û ev ê jî zora we biçe. Ez ê bêjim; "*Li ser uslûbê xwe serwer be"* hûn ê bêjin; " *Ma ji min baştir kes heye"*

Em di derbarê van hemû mijaran de xwedî fikarin. Dibe ku hûn jidil jî bi rastiyan ve girêdayî bin. Lê yên li pêşberî we hene. Mînak di nav we de, ne hûn bi xwe, lê rêveberiyeke mîna kevir lêhatiye li pêşberî we ye. Nêzîkatiyên ku qet ji mirovan fêm nakin, rêveberiyeke ne ku danahevên te kar tîne, dihizire vala derxe heye. Naxwaze te fêm bikî. Heta dibe yekî naxwaze silavê jî li te bike, wê îsyanê bi te bide kirin, çi tişta ku dirîzîne dê bê raberkirin.

Tevî vê jî tê çi bike? Weke min bike. Mesele hûn dibînin, ji bo ku ez di ser pirê re derbas bibim ji çiqas hirçan re dibêjim xalo. Tehamula çiqas provakator dikim. Ger hûn vê nekin tevî hemû niyetên we yên baş jî, danehevên we dê ji aliyekî ve vala biçin. Ji bo vê min çîroka xwe ji we re vegot. Min got şervanê ku diçe xwendevanên dibistana seretayî ye, yekî ji dibistana seretayî derketiye dikare ji çîroka zarokekî deh salî fêm bike û ew jî heta radeya dawî fêrkere, ji ber vê min çîroka xwe vegot. Min hest ji we re vegotin, rêyên hezkirinê vegotin. Ji ber hûn ê bi rewşên wisa yên bêrêz, bêhezkirin re rûbirû bimînin. Ji ber vê sedemê min ji hemû aliyan ve çima û çawa hûn ê bibin hêza hezkirinê destnîşan kir. Rêyên bandorkirina mirovan vegot.

Li çîroka jiyana min binêrin, heta dawî ravekere. Min ji hemû aliyan ve xalên sereke yên rêxistinbûnê, siyasîbûn û leşkerbûnê danîn holê. Hinekî bînin bîra xwe, çi pêwîste hûn ê di wir de bibînin. Ji ber ku piraniya we dibistana seretayî qedandiye. Jixwe yên ku zanîngeh qedandina bela serî ne, ango dibe ku

xetertir be. Ger profesor be jî tiştên ku jê re kûr bên min gotin. Ji ber ku hûn ji kêmasî kirinê re gelik destdayîne, hûn nizanin hêza xwe bikar bînin. Hema di yek carê de hûn dawiya xwe tînin. Çi çavkaniya xwe ji we bigire, çi ji hinekî din bigire çima ez çûyîneke wisa erzan bipejirînim? Hîn jî aqlê min jê nagire.

Mînak yên ku herî ji xwe razî girtine nav erk û yekîneyên şaş lê tê jî bêje; "*heval, ez fêrî ewqasî bûm, ez şerkeriya te ya taximekî dikarin di perwerdekirina taximekî de pêk bînim, dikarim bibim alîgirê te, yekeya min heye, dixwazim kar bînim, min soz daye Rêbertiya pariyê. Min soz daye rêxistinê, şehîdan, gel û xwe dixwazim xwedî li soza xwe derkevim.*" Lê bifikirin kesên ku ji vir çûne heta niha yekî ji wan jî ev negotiye. Hun ji rewşa xwe re bigrîn. Çima? Ma em berpirsyarin? Koletiya we ji vê barpirsyare. Min ewqas kes perwerdekirin, yên ku min perwerdekirine ger bi soza xwe ve girêdayîne, her yek ji wan pêdiviya rêxistinekê, artêşekê çiye dikarin pêşwazî bikin.

Difikirim, çi bila komserê siyasî be, çi fermandarê leşkerî, fermandarê yekîneyê, fermandarê taximê be bi asanî dikare hemû erkan pêk bîne. Lê diçe, piştî salan dibînim ku yê me ji fermandariya mangê wêdetir neçûye, ma ev şayane? Hûn wisa dijîn. Hûn dibêjin, em paş ketin, şiyarî bi me re nema. Wê demê mafê we mirine. Ma ewqas paşketin dibe? Deh salan şer kiriye, ji leşkerekî nebuhuriye. Yê ku deh salan şer bike dibe general. Hîn xwe ji rewşa gundiyê belengaz rizgar nekiye, ma ne şerme? Weke min got, hûn diçin nikarin taximekî jî rêve bibin. Ji bo yekîneyekê jî dibêje; "*Hêza min têr nake*" Ma tu şerm nakî? Em netewekî hejmara xwe digihêje mîlyonan rêve dibin, tu çawa yekîneyekê rêvenabî? De îca piştî ku di dewreyeke me ya perwerdê dît, duristî bî karê yekîneyên tu tenê destê xwe bihejînî tê rêve bibî. Çiye? Jiyana amade dixwaze. Na!

Ez mercên çiyê nizanim. Li beramberî şer hemû hişkî hola bûne, wê nexwazin we fêm jî bikin, ger hûn bi devê xwe ji wan re çûkan jî bigirin wê zêde nirx nedin we. Ji ber ku jiyanê ew hinekî hişt kirine, hişk û hola kirine. De îca fermandar, şervan, ne şiyarin. Nizanin rojbaşê jî bikin. Li gorî ku min guhdar nakin wê qet li we gohdar nekin. Wê demê ya ku hûn bikin, weke ku ez dikime. Hemû tiştî hesab bikin, bibin tevlîkerên baş, guhdarvanên baş, kesên ku baş daxivin, awarte destwerdanan dikin, di tetîk de

bin, xwedî plansazî, çavdêrî bikin, venerînin. Ger hûn wisa tevbigerin her ku biçe hûn ê fermandariyê jî bi dest bixin. Ger pêwîst bike hûn ê fermandariya asta herî jor jî bidest bixin. Ya herî girîng jî hûn ê zirarê nedin xwe, wê gelik fêda we jî çêbibe. Çima çênebe?

Hûn ê biçin, bi mehan weke şervanekî bimînin. Ma ev me nede îsyankirin çi bike, ev rewa ye? Ger şervanekî deh-panzde salan weke şervanekî xwe nemeşîne, bila despêkê xwe lêpirsîn bike. Provakator jî derdikeve, ji ber ku camêr cahilê xwedê ye. Di mercên şer de hişk bûye. Ji ber vê sedemê tê pir zêde dahûrîner û kesê ku li gorî pîvanan tevdiger be. Ez ji vê re dibêjim hostatî. Li vir çawa vê dikim, we dît, li ber çavê we, hinêkî jî çav berdin vê, dubare bêjim ger hûn nekin; wê we jî teng bikin, bişînin mirinê û ji we re jî bêjin; "*Pêdiviya Fermanê ye*" Hûn dijber derkevin wê dest û lingê we girê din û bavêjin cihekî. Nêzîkatiyên wisa pir zêde hatine jiyîn.

Başe, mirov çawa dikare rê lêbigire? Ji bo rêlêgirtinê bi qasî kûr fêmkirina xalên sereke yên Rêbertî, divê ku hêza pêkanînê jî bê raberkirin. Dubare dibêjim; ger min yek got, hûn dehan li ser zêde bikin, ji ciwaniya xwe bawer bin, zindî bimînin. Berevajî beriya dijmin mercên me wê we şeht bikin.

Niha dixwazin van teva mîna şîret, pêşniyar û hişyariyan rêz bikim. Hemû tiştên ku min di vê dewrê de gotin hişyarî ne, fermanin. Û hêza fêmkirin, bawerî, wêrekiyê pêş dixe. Lê kesên din van erzan dixebitînin. Heya yek bi yek dahûrînên we kirine, we xistina nîzama PKK'ê, ji bo ku hûn li gorî dîsîplîna PKK'ê tevbigerin heta radeya dawî me hûn amadekirine. Baldar bin, hûn berê ne wisa bûn. Lê hinek we xirab bikar tînin. Yê ku we amade dike em in, lê yê ku bikar tîne hinekî dinin, rê li vê bigirin. Me hûn çawa amadekirine, bikaranîn jî weke ku em pêş dibînin hûn bi xwe pêş bixin. Divê ku hûn mîna xwendevanên jîr vê raber bikin.

Ji bilî vê nebêjin; " *Yên ku me ji vir girtin, tiştên ku me li beramberî xwe dîtin em ber bi şikestina xeyalên mezin ve birin"* Bêgûman wê we bibe. Ji bo ku hûn wisa nebin hûn ê amadekariyên xwe xedar derbasî pratîkê bikin. Ev pir zêde tê dîtin, tiştên ku hûn li vir fêr dibin, piştî ku we sînor derbas kir hûn li aliyekî dihêlin. Ger hûn wisa bikin hûn lanetkirî bin û bimrin.

Mafê xwe yê jiyanê jî nabe. Yên ku ji vir fêrbûne nikarin derbasî aliyê din ên sînor bikin, fermana mirina xwe wan bi destê xwe amadekiriye.

Ez şansê jiyaneke din nadim tu kesî ji we. Ger hûn bê xedar vê amadekariyê bisepînin, hûn ê bikaribin şansê xwe yê jiyanê veguherînin. Berevajî ji niha ve ferqa we ji miriyekî nîne. Nebêjin çima wisa dibe. Ez vekirî bi we re daxivim. Wekî din hûn nikarin bijîn. Berevajî jiyan dojeheke. Hûn nikarin bêjin; "*Em ciwanin, me hişyarî raber nekir"* Ji ber ku hûn ê bimrin. Wekî din nehizirin, yên din hemû xwe xapandinin. Ez vana hemûyan weke pêşniyar, hişyarî û ferman jî ji we re nabêjim. Çawa kêr we tê wisa bikin.

Ez bi perpirsyariyên xwe ve girêdayî me. Heta dawî bawermendim û baweriya min bi we jî heye. Lê di vê çarçovê de, bingeha ku li vir hat girtin di her qadê de hûn pêk bînin, ez ê ji we netirsin, wê her tişt ji destê we bê. Hûn ê ser bixin, lê hûn pêbilîzin, weke di mînakên dema borî de jî min nîşan da, ez ê bi we re nebim, ez ê îşê xwe ji karê we jî, gunehê we jî neynim. Ya ku ez erê dikim, berpirsyariya wê radikim hinekî jî van xalên ku ez pêş dibînim, yên ku me bi we re jî nîqaş kirin û hûn jî ji dil tevlîbûne. Ger hûn jiyanî bikin gengaze. Ez ji despêkê ve wîsa bûm, min wisa ji derdora xwe bawer kir, wisa tevlîbûm û ji wan jî li benda tevlîbûneke wisa me.

Ger wisa be, xedar be, di cih de be, me di girtîgehê de jî dît, weke lehengên berxwedaniya mezin bi rastî jî ew ji me ne, we di çiyê de jî dît; weke lehengên mezin bi rastî ew jî ji me ne. Lê yên xelet, xayîn û provakator jî hene, ew ne ji me ne. Ger hûn naxwazin ji wan bin, xalên ku me zelalkirinê esas bigirin. Ya herî girîng jî, yên ku em niha pêş dibînin, me pir zelalkirina bên destgirtin şervanên mezin wê ji we derkevin. Fermandarên mezin wê ji we derkevin û serkeftina kar wê ji destê we bê. Lê di vê çarçovê de, bi vê bawerî û girêdanê dibe.

**24 Ekim 1994**

## DI 71 SALIYA XWE DE RASTIYA KOMARÊ.

Îro 71. Salvegera damezrandina komarê ye. Qaşo hewl didin pîrozbahiya bi awayekî medenî pêk bînin. Ji aliyê gelên anatoliyê ve xwedî çi wateyê ye, careke din li ser esasê germahiya şerê me digirin dest. Di wateya, "*Ji aliyê gelan ve pêwîste komar çawa be*" de dinirxînin. Hem ji aliyê wate û hem jî ji aliyê sûdmendiyê girînge.

Komareke wisa ye, ango mînaka wê nîne. Weke damezrînerên wê jî dibêjin; "*Ji bilî Tirkan dostê Tirkan nîne, Tirk berdêla cîhanê ne, bextewerim bi Tirkbûna xwe*" û gotinên hwd, bi tengbûnek şovenîzma encax dikare bi êl û eşîran re bê dîtin, disa bi feraseta ataturkparêziya ku dibêje; "*Hevalno em ê sibê danê sibê komarê ragihînin*" çi jî zanista siyasetê, çi civaknasî û heta zanista dîrokî dema ku em li fikra komarperestiyê û sepandinên wê dinêrin em ê bibînin ku; mînakeke ji bilî wê nîne derdikeve pêşberî me.

Pêwîste em komara Tirkiyê fêr bibin. Ji ber ku çarenûsa me ji ya tê payîn zêdetir bandor dike. Gotinek heye û dibêjin; “*Zarokê Komarê”* Ev zarokekî wisa ye, dema ku mirov tenê di nav rastiya sedsala 20’an de bixwaze binirxîne em ê bêjin; “*Tu aliyên wê yên bi rastgiriyê, çepgiriyê, ne bi faşzîmê, ne jî bi komînizmê re dişibin hev nîne.”* Lê ger em bêjin; “*Ji her du cemseran jî ya ku jê re pêwîste çiye girtiye, cambaziya wê nîşan daye û bi vî rengî rastiya ku ravekirina pîçbûyî herî baş heq kiriye.”* Em ê hinekî din xwe nêzîkî rastiyê bikin. Dîsa ger em bêjin; “*Yê ku pir dixwest mezin bibe, lê biçûk maye, xwest bibe burjuwaziya mezin, lê ya biçûk maye, başeroja xwe pir mezin hesab dike, di rewşa xwe yan niha de pir biçûke û divê wateyê de hemû corê nexweşiyên hişmendiya ji bo vê pir bi xwesteke, nexweşiyên ruhî çawa ku di kes de bê raberkirin, ev di Komara Tirkiyê de jî bi heman şêwazî rave dibe”* dîsa em dikarin xwe nêzîkî rastiyê bûyî bihesibînin.

Me heta roja îro dahûrînên kesayetên girîng kirin. Ev dahûrîn di heman demê de dahûrînên Komara Tirkiyê ne. Hûn ji berxwe ve çênebûne. Heftê salê xwe li şûn xwe dihêle, hûn çend nifş piştî wê tên, ev jî tê wateya ku hûn ê di vê mijarê de bi hemû aliyan ve rastiya komarê bijîn û ji vê rizgar nebin. Bêgûman li beramberî vê şerê min heye. Ev şer di nav PKK’ê de di nav pêşveçûneke çawa de ye mijareke dine. Lê bi qasî rastiya hişmendiya komarê aso, bi qasî asoya xwe rastiya pêşketineke çawa û ev bandoreke çawa li ser kes ava kiriye, kî çiqasî zarokê komarê ye dîtina vê sûdmende. Dîsa ger em di vê çarçovê de dest bigirin, em ê pêwendiya di navbera xwe û komarê de rast binirxînin.

Di roja me de sermaya yekdestdar durişmeke; “*Em pir ji komara xwe hez dikin û em ê biparêzin”* bikar tîne. Pîrozbahiyên komara Tirkiyê ya îsal xala sereke ya aboriya Tirkiyê ye. Ji aliyê holdîngan ve tê fînansekirin û bernamekirin. Teqez mohra xwe lê dane. Dikare bê gotin ku, cara yekem bi şêweyekî ripîrût komar ji aliyê holdîngan û hukumeta wan a şerê taybet, ev hukumeta şer jî –di demên dawî de pir zêde ya tê gotin- derket holê ku Komara kontra ye. Ger em pênaseyeke wisa bikar bînin, tê çi wateyê pir alî binirxînin em ê careke din xwe nêzîkî rastiya komarê bikin.

Dîsa rastiyeke din tê gotin; “ *Di salên dawî de cejnên komarê yên ku herî kêm gel eleqeyê nîşan dide mijara gotinê ye”* raste. Di salên dawî de cejnên komarê yên ku gel herî kêm eleqe raber dikin. Ji ber ku xitabê salên despêkê ji netew re dikirin, komara ku hestê wan mêtinger dikir, niha komareke ripîrûte. Cara yekeme gel dibîne ti eleqeya vê komarê bi hêvî, berjewendî û bi wan re nîne. Di vê wateyê de cara yekeme dijbertiya gel wisa vekirî derdikeve holê. Ji aliyê fêmkirina çawaniya wê ve ger em bêjin; “*Ji aliyê gel ve komar çi rave dike”* em ê hinekî din xwe nêzîkî rastiyê bihesibînin.

Ger em bêjin *“Fêmkirina komarê, naskirin, ji bo kê çiye, ji bo kê ne çiye, ji bo kê sûd û berjewendiye, ji bo kê zirar û ziyane, ji bo kê îşkenceye, ji bo kê jiyane, ji bo kê mezinbûne, ji bo kê biçûkbûne cudabûna vê jî dîsa bi qasî ku bi ti salê re neyê qeyaskirin niha xwedî şansê kirina vê ye”* em ê hinekî din rastiyê ji nêz ve hîs bikin. Em naçarin komarê fêr bibin. Ji ber ku toveke ji hemû aliyan ve jiyan dorpêç kiriye, girtiye. Bila tu kes bi serê xwe yê biçûk, bi feraseteke teng a siyasî, aborî, polîtîk, heta ku pêwendiyên rejîmên zorê fêm nekin, wer texmîn neke ku wê bibe rewşenbîrekî baş, de îca bila qet texmîn neke wê bibe şoreşgerek.

Ev tê çi wateyê ji salên 1970’ê vir ve qaşo bi hêzên herî zindî yên komarê ve çiqas bi ser tevgerên ciwanên şoreşger de diçe, artêşa wê çawa bi ser de dimeşe, herî zêde jî hêviyên xwe yên ku di daxwaziya azadiyê de dixwestin bînin ziman çawa bi erdê re kir yek em bibînin, em ê bibînin ku vê komarê bersiveke çawa ji jiyanê re ava kiriye. Divê ku mirov fêr bibe, ji ber ku hûn dixwazin bijîn. Ger ev mertalê kevnperest ê mezin neyê kunkirin, tenê ne di wateya bûyîna mertalê hêza mêtingerî û çewsêneriya mezin de, heta ya ku wî jê hemû dîroka wî digire, rastiyê digire, jidil û mejî digire neyê fêmkirin û kunkirin, azweriyên me yên jiyanê tenê wê di hewesên me de bimînin.

Çawa ku tirkiye, ji aliyê gelê xwe ve Tirkiyeke bê henase ye, ger gelên wê dibêjin; “*Em dema herî zêde bêhenase hatine hiştin dijîn”* û qîr didin, bi xêra vê komara ku îro bi saxtekarî ber bi pîrozbahiya wê direvine. Di serî de jî gelê Tirkiyê divê ku ev baş bê fêmkirin. Ruh û hizra wê veguhertine depê nivîs û jêbirinê. Ber bi her derê cihanê ve dibeze. Sergoyê Ewrûpa nîmeta herî baş dihesibîne. Wê dema borî ya dagirkeriyê mîna leşkerên bi pera

bikaranînên weke polîtîka dibîne. Sefaleta bêkariya mezin dibe ku di nav rastiya navnetewî de bi şêweyekî cuda, di nav rastiya gelê faşîzmê bi kûrahî dijî de ger tê xwestin derî bên vekirin, divê ku ev nîqaşên komarê bi hemû aliyên xwe ve rast bên kirin û ji aliyê gelan ve encamên teqez jê bên derxistin.

Ne ku hinek nîqaş nayên kirin, nîqaşên Komara yekem û Komara duwem hene. Lê ev nîqaşên ku di jor de tên kirinin. Çep jî bi gelik pirbêjiyan peyvên weke; "*Komara gel, Komara sosyalîst*" bikaranîn. Komara Kemalîst ya pir dijwar dibe ku ji komara Hîtler û Mussolînî zêdetir weke rejîmeke dijminê gel hebûna xwe didomîne. Zêdebûna wê jî ev e; komareke xwe veşartiye, dijbertiya xwe ya gel, di bin navê Komara gelparêz de veşartiye. Komara herî zêde dij demokrasiyê ye. Komara herî zêde bi çapûlgeriya kapîtalîzmê dixwaze xwe bide jiyîne û divê wateyê de komara herî paşverû ye. Dema ji dayik bû xwînaviye, dema mezin dibe xwînavîye û niha jî komara herî zêde xwînave. Divê ku ev bên fêmkirin. Beravajî şansê jiyanê dê rast neyê karanîn û ne gengaze ku em vî şansî ji aliyê jiyanê ve kar bînin.

Ji bo vê pêwîste hûn siyasîbûnê bijîn. Rastiya Tirkiyê di vê wateyê de ji hemû aliyan ve bibînin, da ku hûn bikarin rêzdariya xwe li xwe vegerînin, bikarin rast bihizirin, bibin xwedî reftarekî rast û xwedî nêzîkatiya jiyaneke polîtîk. Wekî din hertişt naçarî di gewriya we de mayînê ye. Ev di dema borî de wisa bû, lê di pêşerojê de wê tenê di gewriya we de nemîne, wê veguhere kevirbûnê û parçe bike. Ji bo vê pêwîste hûn pir cidî bin. Nirx ji mirov re, nirx ji mirovê azad re pir pêwîste, lê çiqasî li dijberî vê ye, çi li dijberî vê ye, ji kengî ve dijbere û wê heta kendî dijber be? Heta ku hûn van pirsan ji xwe nepirsin, hûn ê nikaribin xwe ji îflasgerê jiyanê, xwe xapandinê û heta dijberiya xwe lîstinê rizgar bikin.

Misoger divê hûn vegera taybetmendiyên xwe yên mirovî û sereke pêk bînin. Hûn nikarin bêjin; "*Çi pêwendiya vê bi nîqaşên komarê re hene?*" Ji ber ku vê komargeriyê hûn ji taybetmendiyên we yên mirovî sereke qut kiriye. Tenê ne Kurd, ji Kurdan jî zêdetir Tirk qut kiriye. Gelo Tirkekî bi tenduristî dikare bihizire heye? Em dikarin bahsa têgeheke rewşenbîrên Tirk bikin? Ger em ê bahs bikin, divê ku taybetmendiyên rewşenbîrekî Tirkan

ê sereke çibe? Pêwendiya di navbera têgeha rewşenbîrê Tirk û Komarê de çiye?

Ji bo komarê tê gotin; “ *Serdema ronakbîriyê”* Yên Kemalîst û qoşo rewşenbîr vê dibêjin. Ev ronakbîrî ji bo kê ye, çavê kê vekir? Holdîngên ku îro dibêjin; “*Em pir ji te hez dikin û em ê pir baş te biparêzin”* ne. Di serî de jî begên mîna Îlhan Selçûk, ez ji wan kesên ku dibêjin komar rejîmeke ronakbîriye dipirsim: ronakbîriya herî mezin holdîng najîn, yên ku herî zêde jê sûd werdigrin, herî zêde berjewendiyên xwe tê de dibînin, yên ku herî zêde li ser esasê çîna xwe zana dibin, lewra ne ev rewşenbîrin? Dubare bal dikişînim ser wî û qaşo ew ên ku xwe rewşenbîr dibînin dipirsim; Îlhan efendi ger hûn ne korin, bi zanabûn xiyanet li taybetmendiyên rewşenbîriyê nakin, yan jî hûn ne cahil û xafilin, ronakbîriya Komarê tê çi wateyê?

Pêwendiya ronakbîriyê bi çîn û berjewendiyan re heye. Ronakbîriya burjuwa, îro desthilate, komar bi xwe ye. Raveya wê ya fermî û leşkeriye, kontra ye, milkiyeta taybet, ger li ser navê sûda raya giştî çend kompanya hene, xwemalîkirina wan e.

Li Tirkiyê Komareke cuda heye? Ez ji wan beg û xatûna dipirsim; komara ku pêk hatiye, encamekî cuda yê komara Kemalîste, rawestgeheke din mijara gotinê ye? Qet pêwîstî bi pesindayîna derewan, bangewaziya xwezaya yê nebe nîne. Ger komareke din ya Kemalîst heye bila biselmînin. Li kîderê ye, di kîja demê de ye, çi daye gel?

Ez dîsa ji van bipirsim; kîja komarê ewqas mêtingerî, çewsandin li ser gelê xwe kiriye, di ti komarên Ewrûpî de, di komara Emerîka de ev hene? Na, ev komar, komara Kemalîste. Li beramberî komara duwem –jixwe ev jî têgehe cuda ya hêjayî nirxandinê ye- ji aliyê parêzerên xwe, ango ew bi xwe diyar dikin wê komara îro bi hemû aliyên xwe ve biparêzin. Komara ku herî zêde Uxur Mûmcû, Emîn Çolaşan herî zêde berdevkiya wê dikine. Dixwaze bila bêjin ya yekemîn, dixwaze nizanim bêjin kîja taybetmendiya wê, rastî ev e.

Ji aliyê din ve ji bo miletekî, ji aliyê berjewendiyên kedkaran ger wê behsa ronakbîriyê bê kirin; îro van rewşenbîr dikin, tarî dikin, divê ku mirov pirs bike. Zanabûna wan, berjewendî bi qasî ku bi ti demê re, serdema Osmaniyan jî di nav de neyê qeyaskirin ma tarîkirina rastiya gelekî ne mijara gotinê

ye? Gelê Tirk serdema herî tarî ya dîroka xwe dijî. Hemû şaneyên civakî jî hatine parçekirin, şeht bûye, ma rewşeke wisa niha najî? Tenê partiyeke berjewendiyên gel biparêze heye? Jixwe ev begana jî vê rastiyê pir baş zanin. Îro yên ku mîna demokratên civakî tên pênasekirin, qaşo partiyên alîgirê kedêne bixwe vê dibêjin; "*Xiyaneta herî mezin di demokrasiya civakî de SHP'ê lîst*" Ya ku vê jî dibêje partiya dîrokî ya komarê CHP ye û rêveberiyên wê ne.

Ev xiyaneta mezin partiya herî kevn a komarê SHP'ê bi xwe kiribe, tawanbar kiye? Xayîn kiye û divê li beramberî vê çi bêkirin? Yên ku vê dibêjin, divê ku vê bibersivînin. Berevajî ji durû nirxandinê wê nikaribin xwe rizgar bikin. Ger heya rastiya komareke berjewendiyên gel diparêze û yên xiyanet li vê kirine, yek bi yek divê bên destnîşankirin, ya herî girîng jî ji bo wê divê ku têkoşîneke xedar bêmeşandin. M. Kemal jî di nav hişmendiya xwe de, di ragihandina komara xwe de xedar bû. Em çiqas rexne bikin jî, hêzên ku li dijberî wan komara xwe ragihandibû dema pêwîst kir jiyana xwe danî holê yan jî hemû corê têkoşînê digirt berçav û ser wan de diçû. Wî komara xwe wisa damezrand. Ger pênaseyeke cuda ya vê komarê heye, yên ku dibêjin em pê ve girêdayîne, herî kêm biqasî M. Kemal berpirsyarê derketineke takekesî û partiyê ne.

Em vê jî pir baş zanin; ev komar qet ne komareke weke ew zanin li gorî berjewendiyên gele û ne komareke di derbarê rewşenbîriya gel de ye. Di gotin de çend tişt dikarin bên gotin. Ez jî îdea dikim ku, tarîkirina asoya gelan, zêdetir jî ya gelê Tirk, heta ji serdema hilweşîna Osmaniyan jî xirabtir tariye. Ti padîşahên Osmaniyan, rêveberên wan ne hêzeke ewqasî çewsîner û mêtingerin. Holdîngên îro ji paşayên Osmaniyan jî zêdetir mêtinger û îşkenceparêzin. Hêzên bendav li beramberî pêşeroj û dîrokê danîne, hêzên ku ew rêxistin kirine. Êdî dema rastî weke xwe danîna holê ye.

Emperyalîzm- kapîtalîzm di mijara mêtinkirina mirovan de hosta ne. Ti rejîm di dîrokê de bi qasî rejîmên kapîtalîst-emperyalîst di mêtingeriya behremendiyên mirovan ji mêtingeriyê re vekirinê ne serkeftîne. Ev di kevneşopiya cîhanê de wisa ye. Di mêringeriya hestên mirov, ruh, mantiq, hêza hizrînê, hata ajoyan de, ti rejîm bi qasî emperyalîzm-kapîtalîzma

îro ne bi zanabûn, ne bi vîn, ne çavsorî, ne bêexlaqî, ne jî di asta harbûnê de bikare bike de nîne. Ger ev raste, -jixwe ji rastiya wê gûman nayê kirin- di lûtkeyên pêşketina mirovan de rûbirûyî xeteriyeke girantire.

Dema ku mirovatî pêş dikeve li beramberî hêzên dirinde yên xwezayê, cinawarên wê bêtir bi hêvi bû û di asta pêşerojeke hêvîker de bû. Em li mirovatiya niha binêrin; xeterî ji xwezayê nayên, xeterî li ser xwezayê ji aliyê emperyalîzm û kapîtalîzmê ve pêş dikeve. Cinawarên ji derve tên, ji cihana heywanan tên nînin. Ev cinawir tam jî ji nav yekdestdariyên emperyalîzm û kapîtalîzmê tên. Bi qasî ku bi cinawirên dema borî re neyên qiyaskirin hilweşînerin. Di dîroka mirovatiyê de, rojane û pêşerojê de çi heye mîna nexweşiya pençeşêrê tinekirin û ji holê rakirinê hemû tiştî xerc dikin. Êdî ev ji aliyê herkesê ve tê nîqaşkirin.

Îdeologon emperyalîzmê jî êdî bahsa dema bêdîrokiyê dikin. Tê gotin pêvajoya qutbûna asoyê mirov. Teqez pêwendiya vê bi mantiqê kapîtalîzmê û emperyalîzmê ve heye. Ger em ê behsa naçariya vê, herî kêm rêzdariya li beramberî mirov bikin, girêdan bi rastiya civaka mirov re bikin, ger me hêvî ji dest nedaye, dema ku em li rastiya ku em dijîn dinêrin em ê çibêjin?

Komara Tirkiyê li beramberî mirovê xwe, ji cinawirê hilweşêner ê kapîtalîst û emperyalîstê îro, zêdetir di nav hilweşînkariyê de ye. Divê ku kes li demogogê mezin Demîrel nenêre û xwe ji dîtina kûrahiya dûr negire. Ti serokkomara bi qasî serkêşên komarê yên îro henekên xwe bi rastiyan nekirine. Ti Serokkomar bi qasî yê îro hoqebaziyê nakin. Hemû serokên komarê ji mehê salê carekê gotar didin. Ev rojê deh gotaran dide. Di dîrokê û roja me ya îro de ti serokkomar ne wisa ne. Ez ê bahsa rekorekî bikim. Ez bi bîr bînim, yê ku pirtûka rekorên Gînesê îdare dike kiye, teqez divê mafê Suleyman Demîrel bidiyê. Ew, di vê wateye de îhtîmaleke mezin rekortmenê demogogên komarê ye. Ez ne bawerim ev rekora ku wî derbaskiriye di dîrokê de careke din bê derbaskirin.

Ev çima wisa ye? Dixwaze hinek tiştan veşêre ji ber wê. Ew bi xwe weke “*Şivan silo”* tê naskirin. Belê, dibe ku di dema borî de ji çend miyan re şivantî kiribe û mirov ji wê şivantiyê re rêz digire. Lê gelê Tirkiyê yê îro, gelê me xistina şûna kerî, hem jî

li ser navê faşîzmê, li ser navê kontrayan şivantî kirin, ez bawerim xirabiya herî mezin bê kirine. Û niha ew şivantiyê li ser vê xirabiyê ava dike. Ev, zilmeke mezine. Dîsa ti padîşahên Osmaniyan ewqas ne zilmdarin. Çiqas bê rexnekirin jî, Abdulhamît çil qat jî vî demokratir û mirovtire. Ev çima wisa ye? Ji ber ku rejîma jê re xizmet dike, aboriya wê rejîmê, avaniya civakî ya dahûrandiye, bi qasî ku bi ti deman re neyê qeyaskirin dij mirovî ye. Tirkiye bi dîroka wê, bi dewlemendiyên ser erd û bin erd, ya herî girîng jî bi mirovên wê ti rejîmê ewqas bi erzanî dernexistiye sûkê. Ji bo derxistinê, divê ku tu di rewşa rêjîmeke pir faşîst de be û divê ev faşîzm jî bi demogojiyeke mezin bikare gelê xwe îdare bike. Vaye ya tê kirin ev e.

Em li çiroka dawî ya xwemalîkirinê binêrin; hemuyan ji hêzên hêcet re pêşkêş dikin. Hikumetên herî baş, mînak em li hikumeta Fransa binêrin; di cihanê de li ser navê şoreşgeriyê çi heye dijberî wan şer ragihandiye. Lê di rêza yekem de difroşe wan. Difroşe çavsoriya kapîtalîzma Japon. Difroşe hikumetên rastgirê yên Almanya. Weke min got ji ber ku ti fikareke wan a mirovî nîne, xizmeta faşîzmê dike, bêy ku guh bidê lihev dike û bi hevre dimeşînin.

Pêwîste mirov niha baştir li dîmenên mirovê gelê Tirk binêre. Dil dixwest ku, di nav gelê Tirkiyê de rewşenbîrek hebe. me bigîhst dibêje, “*Êdî ez xwe tawanbar dibînim”* Jixwe ev jî kesekî li ser navê gel hinekî xwe rewşenbîr dihesibîne. Em rêz didinê, lê bi rastî jî piştî van darêzên dawî, îşkence dîtin û şûnde xwe weke şirîkê tawan dîtin watedare û ev jî dibe li xwe mikurhatina rewşenbîrekî. Mînak pirtûkek bi navê; “*Pirtûka reş”* dinivîse, ya herî balkêşe dibe; “*Jiyana nû”* Me weke tê xwestin teşxîsa we di derbarê vî de diyar nekir, lê bi rastî jî dixwazim tenê yek ji wan başbe û bêje; “*Law hûn vî gelî ber bi kîderê ve dibin?”* Bi qasî Namik Kemalê serdema Osmaniyan – jixwe em dizanin ew çiqas Osamanîparêz bû- rewşenbîr be. Tirsa min ew e ku em ewqasî jî nebînin.

Em li serkêşên herî zêde ji xwe re dibêjin; “*Yê herî şoreşger ez im, rêya şoreşgerî me”* binêrin. Karmendiyeke biçûk ya van holdîngan dilpakî dizanin. Tevî li ber serê wan ewqas îşkence, biryarên lisêdarêdanê sozên ku dabûn, ev kesên ku ji soza xwe poşman bibûn ji bo bi destxistina berjewendiyeke biçûk

çil teqleyî davêjin. Çepgirê herî şoreşger, rêwiyê wê, nizanim çî wê ger wisa be, gelo em dikarin çi ji rewşenbîrê burjuvaziya biçûk hêvî bikin. Ez wisa dihizirim ku divê mirov gelê Tirk li beramberî vê komarê baş fêm bike. Dema ku bi vê jî dihizire pêwîste mirov li dîrokê binêre. Dixwaze bila di dîrokê de be, dixweza bila rastiya gel bi çîna serdest ve hatiye girêdan, -Jixwe ev jî çîna mêtinger û serderste- tenê ji bo berjewendiya wan tê xebitîn. Ji bilî vê ne gengaze mirov miletekî din bibîne. Ez naçar dimînin vê tesbîtê bikim.

Hîn de qonaxa barbariya jor de –Biqasî tê zanînin- di derfetên mêringerî û dagirkeriyên li ser Rojhilata Navîn pêşketine, begê êlan, begê eşîretan herî kêm bi qasî ser gelên xistine bin mêtingeriya xwe bi ser endamên eşîretan de jî çûne. Dîsa bi qasî tê zanîn ev begana dema ku hatine Anatolê û di wan qadên şaristaniya kevnar de begêtîyên xwe ava kirine, ji gelê xwe re, gelê Tirkmen re û ew ên li lûtkeyên Torosê ji ber darbeyê şûrên wan mane re derfetê jiyanê nasîne. Ger ji vê re derfet bê gotin. Ya rast Tirkmen û Yorûk jî gelin û hemû jî li serê çiyayane û li çolên Bozkûrtane. Ev jî ji ber serdema karaktera çîna serdest wisa ye. Niha jî li Tirkmenên li serê çiya, Elewî, Yorûk û Tahtaciyan binêrin; di nav mercên jiyaneke ji yê Kurdan xirabtir dene û paşketîne. Ev jî ji ber çîna serdest wisa ye. Begîtiya wan, sultaniya wan, bi qasî padişahiyê, ji bo ku bidim diyarkirin komargeriya îro çiqas dijberî gele û vê nirxandinê piştrast bikim van mînakan didim.

Sultanên Osmanî û yên Bîzansiyan bi asanî lihevkirine. Hîn dema ketina Anatolê bi qasî bi feodalên herêmê yên Bîzansiyan, herî dawî dema dagirkirina Stenbol de jî lihevkirinek mezin di navbera wan de heye. Pêwîste ev baş bê dîtin. Lê fatihê li Stanbolê lihevkirin pêk aniye, li Konyayê bêgên Karamanî yên ku hinekî nêzîkî gelin û pêwendiyên wan bi Tirkmenan re heye bê rehm linavbiriye. Ez van ji bo fêmkirina îro vedibêjim. Li gorî padîşahên Osmaniyan beg hinekî din nêzîkî gel bûn. Lê ji aliyê padîşahan ve bêrehm hemû linav birin.

Yawûz Sultan Selîm komkujiya herî mezin li dijberî Elewîtiya Tirkmenan meşand. Ji aliyê dîrokê ve tê gotin; “*Çil hezar ji wan tenê ji aliyê Kuyucu Mûrat paşa ve avêtin binê bîran”* dîrok wisa dinivîse. Heta niha jî deyîşên Pîr Sultan zindî

ne. Ez ji bo vê dibêjim; dijbertiya gel tenê ne xisleteke roja me ya îro ye, xwe dispêre paşerejeke dîrokî ya dirêj û heta îro tê. Ti nerîna ku dîrokê ji nedîtî ve tê, têkiliya xwe bi dîrokê re çêneke ne di hêza vegotina rastiyan de ye. Çîna serdest a Tirka xwedî xisletek dîrokî ya wisa ye. Ti kes nikare ser vê bi netewperestiyeke sexte û netewperestiyeke şoven dapoşe. Dijbertiya gel ewqas dijware.

Çîna serdest a Tirkan çima di tevahiya dîrokê de serî li sepandineke wisa da? Ji ber lewaziya xwe ye. Ji du aliyan ve di bin çewsîneriyê de ye. Dixwaze xwe bigihîne asta çînatiyê. Di qadên ku bêrê dagirkirine de çînên serdest hene û li beramberî wan li pê serweriyekê ye. Di vê wateyê de dagirkere. Di heman demê ji bo bibe çîna serdest naçare ku ji endamên eşîreta xwe rizgar bibe. Pêwîste eşîret û bizavên eşîretgerî bên derbaskirin. Êdî şûna girêdanê begên Oxuzî û eşîretan, divê begên Tirkan bigirin. Ev jî tê wateya ji nedîtîve hatina endamên eşîretên xwe û meşandina dijminatiyê. Dused salan di bin dorpiçiyeke wisa de ne. Heta niha jî berdewam dike. Lewma çîneke serdest a wisa dê paşverûbe û heta niha jî vê xisleta xwe didomîne. Ew naçara li beramberî gelê xwe dijmin be, naçare bibe çîna serdest a cîran. Vaye faşîstbûn, zextkarî û bêrehmbûn ji nêz ve bi vê rastiyê ve têkildare. Herweha bi sedên sal her tim dijmintiyeke gel a wisa û bi hêzên serdest ên cîran re, bi hêzên serdest ên qadê ku dixwaze tê de serwer bibe re şerê xedar wisa berdewam dike.

Sedsalên Osmaniyan ji hemû aliyan ve sedsalên şerê dijberî gelane. Ji aliyekî ve bi gel û çînên serdest ên qadê dagir û îstila kiriye re bi dijminatiyan ve dagirtiye. Rêjîmeke osmaniyan a wisa ye ku, tenê deh salên wê yên ku bê şer derbas bûbe jî nîne. Makîneyek şere. Şer hem di hundir de, hem di derve de pir bê rehme. Heta da yê hundirîn hîn zêde bê rehm tê jiyîn. Gelê Tirk di dîroka xwe de hinekî jî gelekî wisa teşe girtiye. Ger îlehî dîroka gelekî dixwaze bê nivîsin, divê ku mirov vê bibîne. Beravajî dê henekê xwe bi rastiya kirin be. Yan jî wê dîroka çîna serdest, mîna dîroka gel watedar bibe ku, xirabiya herî mezin bi gelan û zanist bê kirin jî dê ev be. Herweha di roja me de ya tê kirin ev bi xwe ye. Bi vê munasebetê pêwîste ev bê vekirin. Dema ku em hewl didin komarê ji nû ve vebêjin, qet nebe dibê ku em bikevin zanabûna erkên xwe yên wisa li beramberî gel.

Hewce nabînim vê zêde vekim; bi Îslamgeriyeke qet jê fêm nedikirin heta naverastên Ewrûpa, Kafkasya, Asya Navîn çawa hespê xwe bezandin? Ez sond û qesem dixwum, ne biçûk, ne mezinê wan Îslamiyet çiye qet fêm nekirine? Texlîdgeriyeke pir mezine. Weke texlîdgeriya emperyalîzmê, Emerîka û Ewrûpaya niha. Wê demê jî nêzîkî pênc-deh sedsalan bi texlîdgeriya Îslamê hem bîrdoziya dagirkerî û îstilayan ava kirin, hem jî korbûna gel pêk anîn. Îslamiyet, weke şêweyekî jiyana rast ji gel re nehat pêşkêşkirin. Çiqas duayên ku jê fêm nake hene, bi zorê dan jiberkirin û dîsa şêweyên reftaran, bêfêmkirina hiqûqa Îslamê dan sepandin.

Ez naxwazim li vir bêjim Îslamiyet hemû ev e. Îslamiyet şoreşeke. Di niv girava Ereban de yek ji şoreşên herî girîng ku derketiye holê ye. Teqez tevkariya wê ji dîrokê re heye. Li gorî dema xwe pir pêşverû û nexasim radîkalîzma heyî heta roja îro jî bandora xwe didomîne. Elewîtiyeke dibe ku hezar sale serdestên Tirkan pê re şer dikir hebû. Her çiqas îro dixwazin ber bi lihevkirineke sexte ve biçin jî, tê gotin; “*Ya herî şoven, faşîst”* çina serdest a Tirkan jî rejîma rastgir ya herî faşîst a Îslamî ye. Sûnitiya herî bi hêze, cahile, di heman demê de hêza herî çewsêner û îşkencegere. Dema ku em li dîrokê dinêrin dikarin bi asanî vê bêjin.

Çawa ku di roja me ya îro de emperyalîzm hêza dij mirovî ya şoven, paşverû û cendirmetiya wê dike, Îslam jî li gorî serdema xwe di nav belavbûneke wisa de ye. Hêza wê ya emperyalîst, ya herî mêtinger, çewsîner vaye ji aliyê çîna serdest a Tirkan ve tê kirin. Sedemên vê jî weke hat gotine. Hem ji bo tasfiyekirina gelê xwe, parçekirina pêwendiyên eşîretî ber bi çiya ve ajotin, yên mayî jî avêtina binê bîra, hem jî di bin navê gawir de çiqas hêzên şareza hene êrîşî ser wan dike. Em bi çîneke serdest a Tirkan ku dîroka wan wisa hatiye avakirin re rûbirû ne.

Dema ku sedsala 19’an bi dawî bû, ev çîna ku bi giranî feodal bûn, dest bi qalik guhertinê û burjuwabûnê ve dike. Dinêre êdî temenê feodalîzma Îslamê bi dawî dibe, li şûna wê kapîtalîzma ku di cihanê de bilind dibe serwere. Derenge be jî vê fêm dike û wê demê hêdî hêdî weke Rojava tevdigere. Vê carê jî bi texlîdgeriya vê dixwazin dema jiyankirina xwe dirêj bikin. Tevgerên Meşrûtiyeta 1’îm û 2’mîn yên ku em dizanin,

Osmaniyên ciwan, Jon Tirk û herî dawî jî tevgera Komara Kemalîst, her tim li ser esasê dijberiya şoreşgeran di asta herî jor de bi destê dewletê, ji aliyê vê çîna feodal a Tirkan ku ber bi Burjuwazîbûnê ve diçe mijara gotinê ye. –Jixwe ev şêwazê Almana ye, lê ne ewqase; şêwazê Alman, lê bi temamî bi şêwazê dij şoreşê ye. Mînaka her berçav a ji çîna feodal ber bi çîna burjiwa ve veguherînê mînaka Tirka ye. Rastiya çîna serdest a Tirkan li ser bî bingehî pêk tê û heta niha jî dewam dike.

Ger em bala xwe bidinê, burjuwaziya ku li Ewrûpa bilind dibe, li beramberî çîna feodal ku çîneke cudane şer dike. Bi sedên sal çanda xwe, bizava xwe ya ronakbîriyê, partiyên xwe û heta artêşên xwe ava dike. Şerekî pir dijwar ê komargeriyê dide û dikeve rêya pêkanînê. Ji bo ku bibe hêzeke aborî, civakî, siyasî sedên sal pêwîstin û hemû jî bi xwîn rêvebirin, hinekî jî bi şoreşê kir. Şoreşa burjuwa ya Fransa ya mezin di vê wateyê de ye. Biçûk ango mezin hema bêje di hemû netewên Ewrûpa de şoreşên burjuwa yên wisa hatin jiyîn.

Çîna serdest a Tirkan dema ku bi serdemeke şoreşên wisa burjuva re rûbirû bibe wê çawa bike? Çawa ku Îslam bi şêweya herî paşketî, fêm nekir xwe weke fêm kiriye da diyarkirin û texlîd kir, vê carê jî bi heman şêwazî –jixwe fêrbûye- dest bi texlîdkirina pergala burjiwa kir. Jiyana burjuwa, ya ku şêwaza wê ya herî dawî ye, bi şer avabûye, komara di oxura wê de sedên sal hatibû xerckirin wisa texlîd kiriye. M. Kemal taxlîdgerê herî cahil, ê çavsorê komarê ye. Pêwîste mirov vê vekirî bêje, vekirî gotin dê sûdmend be; çawa padîşahên Osmaniyan texlîdê xelîfetiya Yavûz kirin, ne bawerim Yawûz bi erebî zaniye û tenê wateya ayeteke Quranê jî bi rêk û pêkî fêm kiribe, lê tevî vê jî xwe xelîfe ragihand. Yanî kesê ku piştî pêxember tê; siya xwedê. Tevî ku cahilekî mezin bû jî, vê radigihîne, ji ber ku mêtingerî û serdestî heye.

Vaye komargeriya M. Kemal û meşrûtiyeta yên berê, komargeriya wan bi temamî mînaka cehiltiyek mezine. Weke pir zêde tê gotin, çanda M. Kemal ya Ewrûpa nîne. Lêkolîneke wî ya cidî ne diderbarê bizavên felsefî yên Ewrûpa û ne jî di wateya lîberalîzma burjuwa de, ne jî di wateya sosyalîst de –dîrok nîşan dide- nîne. Ger lêkolîna wî hebe jî, meyleke wî ya siyasî nîne.

Dîsa dîrok vê nîşanî me dide; Îttîhatî Terakkî weke tevgereke siyasî –Jixwe ew jî pir çelexwariye- li beramberî burjuwaziya Ewrûpa di nav nêzîkatiyeke cahilane de ye. Lê tevî vê jî di nav wan de yên hinekî zana jî hene. Ziya Gokalp dibe îdolologek be û hinek îdeologên wisa, nûnerên siyasî û leşkerî hebin. M. Kemal di nava van de kesê herî cahil û bêkêre. Hemû behremendiyên wî, hinek qurnaztiyên gundîtî yan jî fêlbaziyên bajêr ên burjiwaziya biçûk ango mehelî ne. Em dem dem hewl didin kesayetiya M. Kemal pênase bikin. Teqez pêwîste bê pênasekirin. Wekî din dahûrîna kesayetiya mirovê Tirk nayê kirin.

Bi rastî jî em diyar bikin; kurê karmendê postayê ye. Weke îro pir zêde ji aliyê rastgiran ve tê gotin; "*Ji dayikeke bavê wî ne diyar ji dayik bûye"* Bawerim bi vê dixwazin vê bêjin; di Selanîkê de bizavên siyasî hene, Masonî heye, çandên cuda hene û di vê wateyê de nasnameyeke M. Kemal jî nîne, ev jî raste. Gelik kesên ku ji Balkanan hatine bê nasname ne. Nasnameya Tirkmenên Anatolê heye, lê nasnameya koçberên Balkanan nîne. Suleyman Demîrel û Kenan Evren koçberên Yugoslavin. M. Kemal jî koçberê Selanîkê ye û hemû jî vegeryayî ne. Ne diyare, dibe ku nasnameya wan a çandî ji netewekî din be jî. Îhtîmaleke mezin jî wisa ne, dibe ku çavkaniya wan a olî, netewî û civakî cuda be. Ji ber ku cudane li beramberî gelên Anatolê ewqas faşîst, şoven û zalim tevdigerin. Yek ji xalên ku divê mijarê de hinekî dixwazin ronî bikim; ev ya rast li ser gelên Tirk ên Anatolê dagirkerin. Mîna ku di Balkanan de bûyî, di rewşa tevgera çewsîneriya nû de ne. Tevgerên ku qaşo M. Kemal hat Anatolê û çewsand, tevgereke Anatolê bû ya Çerkez Ethem û heta wan îsyanên ku başketî binav dikin, ya rast piraniya wan tevgerên gelin. Ji nû ve nivîsandina dîrokê dê sûdmend be û ev pêwîste jî, rastî jî ev e.

Gelik paşa hene. Weke min got hemû berhevkiriyên Balkanane; berhevkirin Arnavût û Bûlgarin. Hemû jî di heft saliya xwe de di Ocaxên Yenîçeriyan de dikin Tirk. Ger na ti têkiliya wan bi Tirkbûna rasteqîn ve nîne. Hejmar û hêza van jî zêde ye û dema ku împaratoriya Osmaniyan diruxe hemû bê kar û hê hêz dimînin. Ser de jî hemû hovane ji Balkanan tên derkirin. Ji ber ku gelên wir şiyar dibin. Bi vî rengî hemû ber bi Stanbolê ve, piştî Stenbolê berê xwe didin Anqerê. Vaye ev tevgera gel –gelik

tevgerên gel ên Kurd, gelik tevgerên gelê Anatolê hene- mohra paşverûtiyê li hemûyan didin. Ya rast dixwazin ji xwe re Komarekê ava bikin.

Vaye li Anqerê, nexasim komara ku li Anqerê hatiye ragihandin divê mirov baş fêm bike. Ger em pê bifikirin; dema ku ev tên jixwe tevgera gel heye. Hem jî tevgereke dijberî dewletên emperyalîste. Li Mereşê, Entabê, Riha yê jixwe raperîn mijara gotinê ne. Dîsa li Erziromê, Behrareş, Torosan, heta li Anatolê tevger hene. Ev weke tevgerên paşverû, raperîn tên pênasekirin. Lê hinekî din pêşketibana dê rewşên cuda jî derxistana holê. Ya din jî tevgerên zana yên komîst hene. Bi baldarî derdikeve holê ku ji şoreşa Cotmehê bandor bûne. Vaye di bin navê artêşa Kesk de jî pêşketineke mezin raber dikin, heta rêxistineke xwe digihîne asta tabûran - di nav tevgera giştî ya Anatolê de- xwe birêxistin dikin. M. Kemal navê çewsandina van teva ye.

Dagirkeriya Yûnan –jixwe ew jî lîstokeke emperyalîste- tevî ku ji gelê Yûnanî re ti rêyeke bi sûd nîşan nedaye û karekî xêrê nekiriye, tenê ji bo serweriya xwe li ser anatolê pêk bîne, kralên Yûnanî ber bi Anatolê ve dişîne. Paşê jî xiyanetê li gelê Yûnan dike û rê linavçûna wan vedike. Hema mîna sorkirina Împaratoriya Osmaniyan a Ermeniyan, piştî ku berjewendiyên xwe dest dixe wan di nêviyê rê de dihêle û rê ji komkujiya wan re vedike. Ermenî û Rûmiyên bi hezaran sale xwediyê virin tên qetilkirin û tevkarekî mîna M. Kemal ê bi wan ve girêdayî dimîne. Li Yûnanîstanê jî kralekî tevkar dimîne. Xirabî jî tê serê gel. Pêwîste dîrok li ser vê bingehê bê dîtin û ya rast jî –bi taybet ji aliyê gelan ve- ev e.

Em hinekî din şûnde biçin, çîna serdest a Tirkan bi paşketina feodalîzmê re, dev ji texlîdgeriya Îslamê berdan, xwe naçarî texlîdgeriya Rojava dîtin. Dema ku vê dikin jî di ferqê dene ku dê ji risteke pêlîstok wêdetir neçin. Tanzîmat, meşrûtiyeta 1’mîn û 2’mîn ya rast ji bo burjuwazîkirina vê çîna serdeste û hem jî tevgereke ji bo rê li ber belavkirina xwe girtinê ye. Ev girînge. Ger em bal bidinê, li Ewrûpa berevajî vê heye; li Ewrûpa Burjuwazî ciwane, heta radeya dawî bîrdozî, polîtîka û aboriyê hildiberîne. Çîna medenî, serwer a dîroka nû ye.

Çîna serdest a Tirka çawa ye? Feodale, li dijberî burjiwaziya Ewrûpa ya nû ye. Sultanên Osmanî dîsa dijberî

bizaveke komarger a wisa ne. Wê demê ji bo li ser piya mayînê çi pêwîste? Divê hem bihizire, hem jî rê li belavbûnê bigire. Tevgera nûbûnê ya di nav Osmaniyan de derdikeve ev e. Em li îdeologên wê binêrin; hemû paşa ne, em ji Mûstafa Reşît paşa bigirin, heta Namik Kemal, hemû zarokê paşayane û hemû borokratên dewletê ne.

Ya ku daxwaz dikin eve; "*Em hinekî veguherin*" acizbûnên ku vê bi xwe re aniye bi wêje, bi hinek tevgerên Jon Tirkan digihînin asta pêşengatiyê û bê qeza û bela, ango beriya împaratorî belav bibe dixwazin çareser bikin. Pir vekiriye ku ti nirxeke vê ya veguhertinê nîne. Berevajî dema ku vediguhere jî, zêdetir çewsandina gel û mêtingerî pêş dikeve. Pir zêde bi derve ve girêdan, tawîz dayîn pêş dikeve û ev jî dijberî berjewendiyên welat û gelin.

Kapîtalîzma Ewrûpa dema di van salan de ber bi Rojhilat ve belav dibe emperyalîste, mêtingere. Osmanî jî veguherandiye nîv mêtingeriyê. Çîna serdest a Tirkan ku lewaz bûye hemû corê tawîzan dide, biçûk dibe, bi qasî biçûk dibe bi ser mirovê xwe de diçe, bi bacê, qanûna leşkeriya naçarî, hema bêje roja me jî dişibe yên ku di dawiya sedsala 19'an de pêk hatine. Heta dawî tê girêdan, bi qasî ji dest tê diçewsîne û çîneke ecêb ya serdest derdikeve holê. Îttîhatî Terakkî partiya vê ya pêşenge, pêwîst nake em zêde li vê lêhûr bibin. Ji şoreşa Kemalîste, ji ber ku yên komar damezrandine Burjuwazî ne, dibêjin şoreşa burjuwa. Niha jî em lêbinêrin bê ka şoreşeke çawa ye û em bibînin komara ku damezrandine bê ka komareke şoreşger a çawa ye?

Di vê navberê de em vê jî diyar bikin: Komar ji aliyê pênase ve tê wateya rêveberiya gel. Li Yûnanê wisa ye, ango di Romaya serdema despêkê de, nîvgirava Yûnanê, dîsa di qonaxa feodal de û heta di serdema navîn de jî komar mijara gotinê ne. Lê dema xwe ya herî belave, qonaxa komarên burjuwa ye. Em dizanin proleterya jî xwedî hewldaneke damezradina komarên gel, komarên sosyalîste. Ceribandina Yekîtiya Komara Sovyet jî yek ji mînakên wê yê herî girîngin. Her çiqas komara çîna serdest yan jî ya çepikên mezin ên gel girtî be, bi monarşî û padîşahekî ve negirêdayî ye. Yan rêveberiyeke bi hilbijartinên beşeke berfireh a gele, yan jî çîna serdest ku em jêre dibêjin konsul, -Li Roma, Atîna û serdema navîn de wisa- rêveberiya bi hilbijartina beşeke

berfireh a arîstokrata ye. Şêwazê ku mohra xwe li dîrokê daye û heta roja me ya îro jî şêwazê rêveberiya serdesta ye.

Monarşiya ku xwedî paşerojek hezaran sal a ku li Tirkiyê demdirêj hebûna xwe dewam kiriye heye. Çîna serdest a Tirkan çawa derdikeve dernakeve mûtlaqgere, -ji Selçûkiyan despê dike, heta despêka sedsala 20'an- hem jî xwedî monarşiya herî paşverû ye. Divê ku mirov vê tesbît bike. Ji ber ku weke min got, di serdema derketinê de hem qonaxa belavbûna li Îranê, hem Rojhilata Navîn û hem Anatolê, dema ku herî zêde şêwazê herî paşverû yê Îslamê girtiye.

Disa serdemeke Osmaniyan a beramberî bilindbûna kapîtalîzma Ewrûpa dibe heye. Bi serê xwe ev ji aliyê dîrokî ve pêvajoyeke paşverû rave dike. Lewra padîşahên ku ji mêj ve serdema wan derbas bûye wê padîşahên demê bin û nemaze jî wisa ye. Ji aliyê komargeriya Tirk ve em dikarin heman nirxandinê bikin. Li her derê komarên burjuwa hatine damezrandin û rista xwe lîstine. Ji bo Komara Tirk jî dibêjin; "*li dijberî mêtingeriya emperyalîzmê, li ser bingehê rizgariyê hat damezradin.*"

Tevgera ku M. Kemal pêşengatiya wê dikir, tevgereke li dijberî îhtîmalê komara li Anatolê pêşkeve hatiye arastekirine.

Dema ku ber bi Anatolê ve dikeve ser rê, ji hemû aliyan ve ji Vahdettîn raye girtine. Peywireke weke mufetîşiya artêşê ya herî girîng dewr girtiye. Ger rayeyek wisa nebe, te M. Kemal kuştiba wê ji Pera Palasê ( Otêleke li Stanbolê) derneketa derve. Îro jî dibêjin; "*Me Vahdettîn ji welat avêt*" Mîna dizê malê avêtiye. Hebûna xwe ya îro deyndarê Vahdettîne. Paşayê Osmaniye, ji xwe heta dawî nabêje; "*Ez dijberî Vahdettînim*" Madem komarpereste, generalekî giştiye temenê çil saliya xwe çima li ser komarê tenê gotineke wî jî nîne? Heta kesayetek di nav Îttîhatî Terakkî de navê wî jî derbas nabe ye, meyleke wî ya siyasî jî nîne. Bi temamî hewl daye mîna leşkerekî baş be.

Sûltan Vahdettîn dema ku vê rayeyê didê wî wisa dinirxîne; "*Qet têkilî siyasetê nebûye, generalekî ji hemû aliyan ve girêdayî vîna sûltane.*" Ya rast jî ev e. Em tînin ser vê: Rayeya padîşahekî, rayeya dewleta Osmaniyan –Jixwe ev jî dij komarê ye girêdayî ye, dijbertiya gele. Dewleta Osmaniyan wisa ye- digire û tê Anatolê. Peywira jê re tê dayîn jî ev e; "*Îsyan heye, tê biçî*

*biçewsînî"* Îsyanên Anatolê pir pêş dikevin û Îngîlîz vê ji padîşah re dibêjin, padîşah jî vê jê re dibêje û ew jî qebûl dike. Ango bernama ku ew girêdayîye û rêxistin, bername û rêxistina padîşahe.

Wisa derbasî Anatolê bû. Di roja îro ya ku bi başî pîroz dikin, vaye jêre dibêjin "*19'ê Gulanê gav avêt Semsûnê*." Dema pêlê dike jî –ez dubare bêjim- ti armanceke wî ya rizgariyê nîne. Bila dîrok bêje, ger rojêk beriya 19'ê Gulanê, dema derbas dibe, ti pîlanekî wî yê rizgariya Anatolê heye, ji yek hevalê xwe re jî gotibe; "*Em ê vê çalakiya gel lidarbixin, em ê komareke gel ya wisa damezrînin"* bila derewkarê wî em bin. Na! Ew ji bo çar çar erka xwe ya mufetîşiyê cê bi cê bike derbasî Samsûnê bûye. Lê dema çûye vê dibîne: Padîşah di Stenbolê de hatiye asê kirin û destbisere. Nûçeyên tên hene – Jiber ku mufetîşe, ji her derê rapor digire- gelên Anatolê di nav raperînê de ne, Enteb, Mereş, Riha, Koçgîrî, Behrareş di rewşa raperînê de ne. Ango eşkereye ku wê otorîteya padîşah a wê serdemê sernegire –hema weke van rojên îro- valatiyeke mezin a siyasî heye. Weke generalekî dîtina wî ya vê rastiyê ne zahmete. Nayê hizirîn ku vîna sûltan li Anatolê zêde bi bandor be, lê bermahiyên wê hene. Gelik paşa-welî hene û hêz jî di destê van de ye. Lê îsyan hîn ne rêxistinkirîne, ji xwe gihandina raveyeke bîrdozî, rêxistinî ya zexm dûrin. Komînîst jî, Keskparêz jî, kêm netew jî, ger hene Ermenî û Rûm jî ji xwe rêxistinkirinek zexm dûrin. Di navbera gelan de zêde enternasyonalîzmek tine ye, mînaka Sovyet jî hîn di dema pêşketinê de ye. Bandora xwe li ser Anatolê jî dike. M. Sûphî wan amadekariyan dikin, lê ji xwe gihandinê pir dûrin.

Van hemûyan heta şaneyên laşê xwe hîs dike û dibîne. Komeke M. Kemal a paşayan heye. Paşê hema tên Amasya yê, çar paşayên mezin, li wir rewşê dinirxînin. Berî hertiştî felaket tê serê wan. Jixwe paşatiya wan ber bi linavçûnê ye, desthilatî hindik maye ji destê wan biçe. Heta wê demê netewperestiyeke wan a pevgirtî jî nîne, ya ku dixwazin rizgar bikin desthilatî û berjewendiyên ku rave dikine. Giştînameyekê derdixînin. Giştînameya Amasya, di wateya burjuwa de jî ne xwedî naverokek siyasî, naveroka netewiye. Perpektîfeke bi fikarên desthilatiyê dagirtiye. Di fêmkirina vê rewşê de zêde zahmetiyan najîn: "*Dê îsyan pêşkeve, bi taybet jî hereşeya Bolşevîzmê*

*hereşeyeke cidiye. Komara Tirkiyê hertim ev bihîstiye û niha jî dibihîze. Kemnetew hereşeyeke cidî ne, Kurdînî hereşeyeke cidiye, îsyana Tirkmenên Anatolê –Divê ku mirov ji vê raperînê re bêje îsyana Tirkmenan- jî hereşeyeke cidiye. Divê rewşê de ya pêwîst çiye?"* Vaye li gorî xwe –Wê paşê ji vê re bêjin komarparêzî-têgehek bi navê Kuva-î Mîllî (Berxwedana Netewî) bikaranîne. Ya rastev têgeh jî ne ya M. Kemale, beriya wî jî heye, lê têgeheke pir zêde ji aliyê Îttîhatgeran ve hatiye texlîdkirine.

Weke min got brokrasiya siyasî û leşkerî ya Osmaniyan bê kar dimîne. Ji dervê yên Stenbolê bi taybet li serekî digerin. Çi fermandarên kolordiyê, çi welî li begekî giştî digerin, hema mîna begêbegan ê Anatolê, ha M. Kemal vê tesbit dike. Dinêre, sultan bi hesanî nikare ji dervî Stenbolê bandor bike, îsyan jî pir lewazin. Li şûnve rêya sêyemîn, ango rêya M. Kemal dimîne. Çiye ev rê? Bi xwe spartina kavilên dewleta Osmaniyan bi lez, pele li gorî wê demê dikare di şovenîzma burjuwa de netewparêzî serkeve. Bi taybet eşraf hene û ev jî pir zêde ji Rûm û Ermeniyan ditirsin. Dîsa gelik bermahiyên nû –weke min got- bermahiyên sûbaya, welî û qeymeqama hene. Hema bêje wê bê kar û bê pere bimînin, nemaze pêwîstiya wan bi rêxistin û bîrdoziyekê heye. Bi lezgînî di têgîştina bûyerên diqewimin û hevgirtina wan di netewparêziya burjuva de zahmetiyê najîn. Ger bê dîqatkirin, heta radeya dawî eklektîk, rewşeke heta dawî ecele hatiye kirin –Jixwe vê vekirî dibêje- û bi bîrdoziyeke bêbîni, rêxistineke bêbinî û paşê jî komareke bêbînî ya lez ava dike.

Ji 19'ê Gulana 1919'an û pê ve şeş meh li Amasya, Sîwas, Erziromê derbas dibe. Li wir çi dibîne? Kolordiya Kazim Karabekîr a ku li ser piya maye dibîne, xeteriya Ermeniyan dibîne. Rewşa desteserkirina eşrafan a mal û milkê Ermeniyan heye. Vaye lêgerîna tevgera eşrafan a li dijberî Ermeniyan dibîne. Li Rojava bi piştevaniya kralê Yûnanîstanê xeteriya Rûman heye, wan dengan dibihîze, ya herî girîng jî gelik walî hene. Bangewaziya wan dibîne û hemûyan bi yekemîn kongreya Erziromê, piştî wê duwemîn kongreya Sîwasê û piştî wê jî kongreya Anqerê ya Rojava û Rojhilatê wê jî dike yek, ango bi TBMM (Meclîsa Mezin a Miletê Tirkiyê) dihizire.

Tesbîtkirina van zêde ne zahmete. Rewşê dinirxîne, kongra 1. Kongra 2. jê re Rojhilat tê çi wateyê vedibêje; eşraf û axayên

Kurdan ên malê Ermendiyan desteser kirine hene, reîsê eşîretan hene. Bermahiyên Alayên Hamîdiyan hene. Eşrafên malê Ermendiyên Tirk, ên malê li Behrareş malê Rûma desteser kirine hene, di girtina piştevaniya wan de qet zahmetiyê najî. Jixwe di pêwendî avakirina bi gelik paşayan re qet zahmetî najî, weliyan hema bi xwe ve girêdide û bi lez vana bi vê kongrê li Anqerê kom dike. TBMM jî ev e.

Weke taktîsyenekî, li dijberî dagirkeriya Yûnan di komkirina hêzê xwe de zahmetiyê najî. Jixwe ber bi nav Anatolê ve beza Yûnaniyan jî lîstokeke Îngilîza ye. Ji bo berî M. Kemal di padîşahiyê de serkeve, -Jixwe M. Kemal amûrekî sereke ya vê ye- dibêje; "*M. Kemal ji bo raperînê venerîn bike hatiye şandin, li wir maye"* Pir balkêşe, Îngilîz welatekî pêşwext piştevaniya xwe daye M. Kemal. Lord Kîngros ji M. Kemal re nivîsiye û tu kesî bi qasî wî pênaseya M. Kemal nekiriye. Pir baş dibîne xulam, texlîdgerekî burjuwa ye. Baskê Îttîhatgeran, Enwer, Talat û Cemal ji ber ku hinekî Elmanparêzin, îhtîmaleke mezin li beramberî wan dijberî û kompleksa wî heye.

Li beramberî Elmanan di seranserê cihanê de hêz Îngilîz û Fransî ne. Yên ku ji şer herî zêde bi hêz derdikevin Îngilîzin. Yên ku herî zêde jî M. Kemal texlîdê wan dike Îngîlîzin. Îngilîz jî dibêjin; "*Vahdettîn nebe, em bi M. Kemal re Anatolê bigrin"* û hûn di sala 1921-22'an de bi Bekîr Samî re wezîrê karê derve ava dikin. Bekîr Samî yê ku aligirê Îngilîza ye dişînin Îngîltere. Hemû lêgerînên M. Kemal, Bolşevîkî weke behokan dide nîşandan û dibêje; "*Ger desthilatdariya min –hûn weke kral fêm bikin- hûn nas nekin, li şûna Vahdettîn hûn desthilatdariya min nepejirînin, ez ê biçim gel Bolşevîkan."*

Pêwendiyên xwe bi Bolşevîkiyan re her tim li ser esasê çavniqandin, cilve kirin yan jî di vê wateyên de tevgerînên ber bi bazariyê ye. Her tim li beramberî Îngîlîzan bi şêweya; "*Ger tu min nepejirîne, ez ê biçim gel wan e."* Herweha ji Lenîn re nameyan dişîne. Heta bangî M. Suphiyan jî dike. Hîn ji sala 1929'an ve waneya pêwîst Îngîlîzan dîtiye, hinekî nasnameya vî camêrî pênase kirine. Di fêmkirina bê eslî û saxtekariya wî de dereng namînin. Bi lez hewl didin wî derbasî şûna Vahdettîn bikin. Hêzeke taze ye û fêda wî demdirêjî wê watedartirbe.

Ya rast ger bixwazin dikarin Yûnaniyan bi ser de bişînin, heta hêzên girêdayî Vahdetîn, îsyanên Kurdan hene, dikare rayedarekî wî heta Meletî bê, ger bixwaze tişta ku Bavras li Erebîstanê kir, bi asanî îsyana Kurd li dar bixe. Lê di nivîsa de dibêje; "*Destê xwe ji ser îsyanê Kurdan rake,* yan jî "*Hindik maye em M. Kemal qezenc bikin, zêde pêwîstî bi tengavkirin û afirandina Erebîstaneke duwem nîne, piştewaniyê bide."* Hîn di sala 1921-22'an de alikariya M. Kemal pêş dikeve û Îngîlîz tenê ji bo çav tirsandinê sûbayek du sûbayên xwe di nav Kurdan de digerînin û dibêjin; "*Ger tu ber bi me ve neyê em ê raperînê bi dawî bikin."*

Rûma ji xwe berdane Yûnaniyan û ew jihevde xistine. Ji wan re jî dibêje; "*Jixwe ez ê piştevaniya Yûnaniyan nekim"* û alikariya xwe jî nivço dihêle. Helbet M. Kemal jî ji vê pir raziye. Gelê Ermenî, gelê Rûm, gelê Kurd heta Vadettîn û îsyanên Anatolê jî wisa dihêle û berî hertiştî dixwaze wan wek amûrekî gef xwarinê bikarbîne. M. Kemal piştî ku bi temamî dest dixe û şûnde devjê berdide. Dema ku di sala 1923'an de komarê radigihîne komareke çar çar aligirê Îngîlîzane. Nemaze bijareya kapîtalîzmê kiriye, dij Bolşevîkiye, dij Kurdane, dij gelane û bi lez û bez komkirina hêz mijara gotinê ye.

Pir girînge û kevneşopa împaratoriyeke 6 hezar salê wê bê derbaskirin heye, îsyan hene, berjewendiyên wan hene, ev ê bên çewsandin, ji bo vê ya pêwîst çiye? Pêwîstî bi lez bûyîna aligirê Rojava heye, alîgiriya Îngîlîzan heye û di encam de hemû texlîdgerî berhema vane. Dîsa ya ku tempoya M. Kemal diyar dike ev e. Ev serdema derketinê naçare hinek tiştan rizgar bike. Dîsa di rojekê de dîktatoriya xwe weke komar ragihandin, ji aliyê vê rastiya dîrokî ve tê diyarkirin. Em bersiv didin vê pirsê: Çima bingehek siyasî ya demdirêj nîne, çima hewldaneke wî ya rêxistinî û bîrdozî nayê dîtin û dibêje; "*Hevalno xwe amade bikin em ê sibê komarê ragihînin?"* Bawerim me hinekî ronî kir. Rewşa zilam a ji padîşahekî re bûyîna evd heye. Ger merc guncaw bin, yan jî hinekî xwe weke dijberê sûltan diyar bike, komar li aliyekî bimîne, wê desthilatdariya padîşah belav bike.

Ma pêwîst dike bi komarê bihizire yan jî divê ku hizrandineke wî ya wisa nexwezayî be û jixwe tine ye. Her çiqas bê gotin; *"M. Kemal li Stenbolê di Pera Palas de yan jî li Şîşlîyê,*

*di daîreyekê de ji hevalekî xwe re gotiye û wî jî di dilê xwe de veşartiye”* û çîrokek wisa lihev bînin û dibêjin gotiye, “*hevalno em ê îro komarê damezrînin”* derewe. Ti nirxeke vê ya belgefîlmê nîne. Qaşo di guhê yekî de gotiye. Ya rast ji bo damezrandina bingehekî dîrokî îhtîmaleke mezin serî lihevdanan dane. Ev emirberekî padîşah yê pir başe û hema bêje alîkarê wî ye. Di nav salekê de bi vê re mijûl dibe. Teqez heta şeş mehan jî pêwendiya xwe ji padîşah qut nekiriye. Çima pêwendiya xwe ji padîşah qut dike? Piştî ku tê fêmkirin wê di Anatolê de desthilatdariyek nû pêşkeve, pêwendiya xwe di sala 1921’an de qut dike û hewl dide saziyên wan bi gel ve girêde. Piştî ku vê digire bin ewlehiyê pêwendiyên xwe qut dike.

Dîsa çîroka çewsîna îsyanan gelik ecêbe! Tenê ceribandina Çerkez Ethem jî pir fêrkere. Despêkê zilam bikartîne, eşrafên Kurdan bikar tîne. Ev hemû taxtîkin. Heta niha jî di rastgirên Tirkan de jî, di çepgiran de jî ev heye; di oxira taxtîk de tiştekî bikarneyînin nîne. Ev Kemalîzm bixwe ye. Em M. Kemal fêm dikin, lê di fêmkirina qonaxên piştî wê de em zehmetiyan dijîn. M. Kemal di wateya dîrokî de naçare bike, ji bo bersiv bide feraseta xwe ya desthilatdariyê her kesî bikar tîne. Ger pêwîst bike diçewsîne û fermana xwe dadimezrîne. Di encam de padîşahên jê re hevalbendî kirine jî diçewsîne.

Ger Kazim Karabekîr nebe nikare gava xwe jî bavêje Erziromê. Ne gengaze ku gav bavêje Sêwasê jî. Ger Elî Fuat Cebesoy nebe nikare xwe bigihîne Anqereyê jî. Ger Çerkez Ethem nebe, nikare li hember îsyanekê jî gav bavêje. Van hêzan tevê bikar tîne. Cebesoy fermandarê artêşê ye. Bi wî re herêma heta Palo venerîn dike. Kazim Karabekîr heta Sêwasê bandorgere. Çend paşayên din ên wisa hene, ger ew nebin nikare henase bistîne. Ger eşraf nebin dîsa wisa ye, lê piştre êrîşî ser hemûyan dike. Ji bo serdestiya wî ya teqez ev pêwîste. Dibe ku ev jî komarekê bixwazin. Ango bi asanî dikariya li Tirkiyê komareke eşrafê damezrînin.

Herweha di TBMM ( Meclîsa Mezin a Miletê Tirkiyê) de koma yekem, koma duwem û bizava Komara Terakkî Perwer heye. Bi rastî jî ev partiyên ku komarê dixwazin. Dîsa bizava Serbest a Komara nû heye. Tevî ku ev partî hemû girêdayîne jî, derfeteke biçûk ya îflah bûnê nadin wan û wan belav dikin.

Kazim Karabekîr dibêje; *Di vê komarê de hinekî para me jî heye”* Alî Fûat paşa jî heman tiştî dibêje. Alî Fûat paşa ji wir dûr dixin û berê wî didin Moskova. Tevî ku yek ji wan kesên ku herî zêde xwedî hewldane jî, Kazim Karabekîr ceza dikin. Kesekî wek Îsmet Paşa yê bê bandor, berdest li şûna hemûyan dikin Serokwezîr. Paşayên din hinekî xwedî kesayetin û bawerim bi qasî vî ne dijminê gelin. Hinekî di çarçoveya feraseta xwe de bin jî, dibe ku komargerî watedar be.

Di rastiyê de ev kes dîktatoriyê dixwaze. Hinekî weke Napoleon, Cromwele, weke wan hêz bidest xistiye û naçare bêrehm be. Herweha di wateya Burjuwazî ango eşrafiyê de be jî, ger dê demokrasîgeriyek bê kirin, wê jî ji holê radikin. Bi şêweyek wahşî îsyanên Kurdan, tevgerên komînîst diçewsîne û hemûyan jî dixapîne. Despêkê ronahiya kesk pê dixin û dibêjin; “*Werin Anqerê”* -Hema bêje mîna ku di dema di 12’ê Îlonê de komînîstan, kurdan vedixwînin Anqerê- û di heman demê de taxtîk di dewrê de ye. Bangî wan dike, bikar tîne, piştre ji ber ku hemû hêzê zindî yên serdemê ne qetil dike. Tenê rastiya M. Kemal’ê bêqusûr dimîne.

Wek hûn dizanin di hemû temenê xwe de komara yek kesî tê damezrandin. Kî çi dibêje bila bêje ev komara yek kesî ye. Komar bi giştî ya gel, bi taybet jî bijardeya çînên serdestin. Ji bo ku komara gel be, tê wateya komara ji aliyê gel ve hatiye diyarkirin. Lê dema ku dixwaze bibe komara burjuwa, heta komara feodal û eşrafan, komareke bijareya wan tê amadekirine.

Texmîn dikim di sala 1923’an de hinek parlementer dixwazin anûra xwe rizgar bikin, hewl didin dengekî cuda bilind bikin, lê hemû tên qetilkirin. Şukrî paşa û yên din di bin navê; “*sûîkast li min kirin”* de çiqas muxalîf hene –yên ku qet eleqeya xwe pê nebûn- lê ji ber serdema; “*Ev jî şoreşgerin, dibe ku cihên min bigirin”* hemûyan ber bi sêdarê ve dişîne. Kazim Karabekîr jî bi geflêxwarinê bêdeng dikin. Niha çi pêwendiya vî bi komarê re heye? Tê gotin; “*Komar dîktatoriye.”* Na, dema ku dîktator be jî ji aliyê konsulekî ve tê tayînkirin.

Dibe ku di sala 1920-21-22’yan de li Meclîsa Mezin a Miletê Tirkiyê konsuleke wisa mijara gotinê be, lê piştî ku ew kom belavkirin û şûnve ew çawanî ji holê rabûye. Ya ku pêkhatiye dîktatoriya yek kesî ye. Pir zêde mirov dikare ji vê re

bêje Bonapartîzîm û Cromelîzme. Di sala 1920'an de encax Hîtler û Mosîlînî ye. Nemaze xwedî heman hemdemiyê ne û Hîtler dibêje; "*M. Kemal mamosteyê min e.*" Pir zêde bi Mosîlînî re di nav dan û stendina de ye. Ew ji wî fêr dibe, digire û pêk tîne; rewş ev e. Em dikarin jê re bêjin heman roj, ango sê nasnameyên faşîst ên di heman mehan de jiyane mijara gotinê ne.

Dibe ku ferqa Hîtler di rastiya Elmanya de ye, ya Mosîlînî jî di rastriya Îtalya de ye. Dibe ku M. Kemal ji wan jî xetertirbe, herweha aboriya lewaz, çêkera civakî wî zêdetir bêrehm dike. Em dibêjin Bonapart, lê Bonapart, bonapartîzma serdema pêşverû ya kapîtalîzmê ye. Cromwel, Cromweliyê serdema pêşverû ya kapîtalîzmê ye. Lê rewşeke M. Kemal ya nûneratiya dema burjuwaziya Tirk a pêşverû kirinê nîne.

Lewra em nikarin bêjin Bonapartîzm jî. Lê di rastiyê de kesekî di navbera Mosîlînî-Hîtler û di navbera Bonapartîzmê û faşîzmê de dilize. Vaye komareke ji van pêk tê mijara gotinê ye, komara yek kesî. Ya rast peyva komara yek kesî, di wateya peyvê de cemawer, yanî raveya piraniyê ye. Komar xwedî wateyeke piraniyê ye. Li cihê serweriya yek kesî hebe komar nabe, dîktatorî dibe. Di vê qateyê de em dikarin bêjim M. Kemal împaratoreke. Di wateya rast de jî împaratore. Lê di wateya aborî, civakî, siyasî beramberî faşîzmê tê û împaratoriyeke bi lez ber bi wê ve dibeze ye.

Model ev e; ger em kom bikin, bi awayekî lez nirxandina rewşên rojane tên jiyîn û bi şêwazekî oportonîstî bikaranîna derdora xwe dike. Rewşa cîhanê ya heyî dinirxîne. Li beramberî kapîtalîzmê komînîzmê, yan jî Bolşevîzmê, li beramberî Bolşevîzmê kapîtalîzmê bikar tîne. Di hundir de jî herduyan li beramberî hev bikar tîne. Yên herî nêzîkî xwe jî di nav hêz de bikar aniye. Roja damezrandina Komara Tirkiyê xwe ji nav van derxistin û bikaraniyê ye.

Herçiqas 71 saliya xwe jî bijî, damezrandina wê çibe roja wê ya îro jî hemane. Dixwazim bînim ser vê dibe ku hûn bêjin; "*Em salên navber çawa dikarin binirxînin?*" Ez dikarim salên di navberê de weke mîdeya werimî binirxînin. Zik birçiye, paresû bi hev ve zeliqîne – di salên 1923'an de- paşê ew mîde werimî û bi vî rengî heta salên 1950-60'an zik hinekî mezin bû, lê di navbera salên 1960-80'ê êdî zik mezin derket. Wisa bawerim ku wê di

navbera salên 1990 û 2000’an de zik biteqe. Em dikarin nirxandinekê di vê wateyê de pêşkêş bikin. Pêşketinek din ne mijara gotinê ye. Serdema wî, ango serdema M. Kemal, qaşo li gorî xalên bingehîn ên damezrandina komarê, em dikarin wek dema damezrandina sazî û xalên bingehîn yên makezagonî bikin.

Gelik piştre, berî hertiştî bîrdoziyeke sexte, bîrdoziya herî paşverû ya Ewrûpa çiye, wê digire û tîne, ev jî wek polîtîvîzm tê şîrovekirin. Polîtîvîzm, qaşo bingehgirtina zanyariyê ye, lê bermahiya bîrdozî ya herî paşketî ye, wê digire û tîne. Zagonên wan digire, li kîderê zagonek li gorî xwe guncaw dibîne, wê digire û tîne. Ferasetek sexte ya dîrokî û ferasetek ziman pêş dixe. Di hemû cihanê de, vaye ji Tirkbûnê derketine, di salên 1930’î de teoriya zimanê Rojê û nerîneke dîrokî ava dikin. Ti têkîliya xwe bi zanistiyê ve nîne. Qaşo dixwazin bawerî bidin netewperestiyê. Zanyariyeke wî ya aborî ya saxlem nîne. Dibêje reqabeta serbest, ger ev jî nebe vê carê ezmûna Stalîn a ku li Sovyetê hatiye ceribandin heye. Di sala 1930’î de hewl da wê texlît kir.

Heta dawî bijartekere, hinek heta niha jî pesnê wî didin û dibêjin; “*M. Kemal çiqas bi aqile, çiqas baş karê xwe dimeşîne.”* Ya rast jî wisa ye. Ew texlîdgerekî pir başe, ha ji te re tiştê ku ji Stanlîn girtiye pêk bîne, ji Hîtler girtiye pêk bîne, ji Mosîlînî girtiye pêk bîne, ji kapîtalîzmê girtiye, ji sosyaslîzmê girtiye pêk bîne, ango çi kêrî wî bê pêk bîne. Lewra li vir dîn û îman nîne, exlaq nîne, di vir de alozî heye. Li vir tevlîhevkirinek mezin heye. Jixwe bûhrana di kesayetiya komarê de jî wisa dest pê dike. Bingehekî saxlem yê bîrdozî nîne. Faşîzm û komînîzm dijminên hev yên xedarin, lê herduyan jî di nav heman partiyê de digihîne hev. CHP heta niha jî wisa ye, ango ji hev cudakirina yê faşîst Turkêşe, Ecewîte, Înuniye em zahmetiyê dijîn. Karayalçin faşîste, demokratê civakî ye, di cudakirinê de em zehmetiyê dijîn. Di despêkê de jî wisa aloz kiriye.

Di sala 1920’an de dema ku Partiya Komara Tirkiyê ya Gel tê damezrandin, yekî dişîne Romayê, yekî jî dişine Moskovayê. Dîrok bi belgeyên vê dagirtîne. Jê re dibêje; “*Çi tişta ku bi kêrî me bê bîne”* û tîne. Berdestên wisa gelikin, padîşahên Osmaniyan jî hema wisa dikin. Abdûlhemîd li gorî M. Kemal divê wateyê de reformxwazekî mezine, em dikarin bêjin ku hemdemtire.

Texlîdgeriya M. Kemal pir li paş ya Abdûlhemîde. Vaye ezmûna Partiya Komara Gel!

Niha jî nîqaşa vê dikin, bê ka ev partî pêşverûye, paşverûye, faşîste, sosyalîste yan na. Raste jî, jiber ku herdu jî di nav de hene, ya rast şêwaza bêjîtiya herduyan jî tê de heye. Ango nikarim bêjim; "*Komînîzm tê de heye.*" Ger bide dê xelet be, lê çi tişta ku komînîzm ji rê derxistiye, xesandiye, ji komînîstbûnê derxistiye heye, li wir heye; sextekarî, sîxurî hema tu çi bixwazî tê de heye. Qaşo partiya komînîst damezrand, vaye ev partiya gel jî partiya sexte ya komînîste. Ji ya sexte re em nikarin bêjin; "*Komînîstê sexteye, dibe ku hinek tiştên di derbarê komînîzmê de be.*" Ji ber ku ew tevgereke sîxur a komînîzmê ye, navê komînîst lêkiriye, tenê ji bo ku rê li komînîzmê bigire. Gelo ji faşîzmê tiştek girtiye? Bêgûman girtiye. Ji Hîtler û Mossîlînî pir tişt girtine û gelik tişt jî dane.

Dîrok dide nîşandan ku, van pir tişt ji M. Kemal –Bi taybet Hîtler- girtine. Di vê wateyê de tevkariyek M. Kemal a mezin ji faşîzmê re çêbûye. Hîtler vê di salên 1930'yî de dike, Mossîlînî jî piştî salên 1930'yan dike. Jixwe M. Kemal piştî sala 1929'an vê dike. Çi dike? Dîktatoriya yek kesî, rikeberê xwe diçewsîne. Di vê mijarê de mînaka herî zêde îlham dide ye. Nemaze dikare bibe damezrînerê faşîzmê û tevkariyê jê re bike. Ji ber ku kapîtalîzmê jî bi şêwazê herî paşverû bikar tîne. Hîtler jî, têgeha nasyonalîzma sosyalîzmê bikaranî. Ji ber ku damezrînerê yekem M. Kemale, yê ku cara yekê ji Moskovayê deyn dike ew e.

Serdema M. Kemal, di her astê de dibe raveya qurçkirin, bîrdoziyeke bijarteker, bîrdoziyek faşîst a wisa. Bêgûman di wê demê de darizandinên komînîstan hene, em baş zanin ku çiqasî rista celadan lîst. Em ji tasfiyekirina M. Sûphiyan bigirin, heta Nazim Hîkmetan, dîsa heta Dr. Hîkmet Kivilciman lîstokên ku lîstine hene. Beşek ji wan qetil dike, beşa din jî dixesîne. Heta niha jî tevgerek nexweş ya çepgir heye. Ev hemû bermahiyên serdema M. Kemalin. Weke di mînaka Şevket Sureyya Aydemîr de tê dîtin –ev hemû damezrîner û sekreterên partiya komînîstin- piştî ku hinek ji wan ditirsîne û qetil dike, yên din jî digirin nav tevgera kadro, paşê jî digirin nav tevgera CHP'ê û van dike îdologên herî baş ên rejîma pergala xwe. Hemû komînîstên din ên

dimînin, îdeologên CHP'ê ne. Bi taybet divê ku mirov vê di rastiya tevgera kadro de şênber bibîne.

Wê demê hinek îsyanên gelê Kurd hene, sepanek faşîzan li ser wan pêk tînin. Ancex bernameyek komkujiya ku tenê faşist bikarin pêk bînin mijara gotinê ye. Ji bo ku mirov asta wan a faşîst bibîne, ev îsyan dikarin wek mînakek baş bên nîşandan. Û di serî de jî tasfiyekirina derdora wî ya herî nêzîk heye, hema bêje dişibe operasyonên baqijkirina derdorê ya kesayetiyê faşîst. Vaye komarek wisa di şexsê kes de pêk tê. Ev kes jî saziyeke wisa ava dike. Heta dawî şovenîst, mêtinger, zextkar û yek kesî ye. Ji împaratorên Romayê zêdetir xwe wek hêza împaratoriyê rave dike.

Vaye dema ku KT'yê ji kesekî wisa re tê hiştin di hemû temenê xwe de teşegirtina xwe dide komarê. Nexwe dê pêvajoya peyre çawa berdewam bike. Mîna bangerekê di ser civakê de biçe, di kesayetiya xwe û ya CHP'ê de hemû civakê bike bêjî. Hinek muxalîf dixwazin rexne bikin, lê ji ber ku hêza wan nîne nizanin rexne bikin. Ya rast em bi bêjîkirina sazî û têgehên hemdem re rûbirû ne. Û ev jî bêtir çi bi xwe re derdixe holê? Rastiya mirovê Tirk, rastiya rewşa trajediya ji ya gelê Kurd xirabtir derdixe holê. Hem trajediye û hem jî komedî ye. Rê li ber derketina holê ya kesayetiyên bê esil vedike. Mirovên derewkar, demogog, sextekar û qeşmer derdixe holê. Jixwe di salên 1959'î de bi Înunu re – Înunu bi temamî rewşa berdestiyê raber dike- û piştî salên 1950'î yan serdema Bayer-Menderes despê dike.

Ya rast ji vê re, li gorî dema berê dibêjin serdema dij şoreşê, lê ez ê nebêjim şoreş jî. Tevgera Partiya demokrasiyê, tevgerek hinekî xwe li gorî civakê, hinekî jî li gorî pêdiviyên kapîtalîzmê lêguncandinê ye. Em dikarin bêjin piştî sala 1920'an ji nû ve xwe zindîkirina Bizava Komara Terakkî ye. Hinekî nêzîkî komarê ye, lê ez ê nebêjim bi tamamî nêzîke. Hinekî hewl didin li gorî xalên sereke yên kapîtalîzmê bin. Di vê wateyê de ger teqez divê nirxandineke paşverû, pêşverûtiyê bêkirin –li gorî min zêde ne guncawe- piştî salên 1950'î, li gorî beriya salên 1950'î watedare, hinekî din hemdeme, hinekî din li gorî rastiya mirov lêhatinê rave dike.

Tu nikarî di nav corê faşîst a kevneşop de jî bi cih bikî. Tu di nav corê komînîzma vê demê de jî bicih nakî. Dibe serdema

herî sosret, lewra ya herî xeter, ya ku herî zêde mirov û gelan çelexwarî dike. Vedibêjin, hîn di wê demê de muzîka gelerî qedexe kiriye û gotiye wê mûzîka Rojava bê guhdarkirin. Ew teoriya ziman, teoriya dîrokê derxistiye holê, hewl daye serê mirovan bipîve, li dijberî ol tevgerek pêş xistiye, di vê wateyê de xwe xistiye şûna ol.

Vaye ev dem dema bi sosretan dagirtiye. Ma êdî fêda kesekî ewqas bi serê mirovan, bi dilê wan dilîze heye? Lewra hûn êdî fêm dikin zarokê komarê zarokekî çawa ye? Ez nizanim bê ka Partiya Demokrat çiqas kariye nexweşiyên komarê derbas bike û çiqasî xwe gihandiye asta komareke demokratîk. Li ser esaseke erênî gotina vê gelik zahmete. Weke paşê gelik zêde gotin, ya rast 27'ê Gulanê hinekî heweskirina Kemalîzma kevne. Belê derzek tê de vekiriye, ji dervî vîna wî ber bi gel ve pêşketinek heye, lê pir sînordare.

Dema piştre ya Demîrele, serdema demogogê mezin vedibe. Taybetmendiya sereke ya vê demê çiye? Wê ji pêşveçûna wê ya xwezayî hinekî kapîtalîzm pêşkeve, lê wê têkoşîna kedkaran jî pêş bikeve. Lewra wê asta faşîst a deweletê bikeve dewrê. Ger em li ser vê NATO'parêziyê, ketina NATO'yê zêde bikin û serdehatina Emerîka bi ser gelan de a di dorfirehiya cîhanê de lê zêde bikin, Tirkiye jî di nav de, nexasim Rojhilata Navîn, dîsa ji Tirkiyê re rista cendirmebûnê tê dayîn û dixwazin bi vê venerîn bikin; dîsa di himêza Sovyetê de ye. Her çiqas faşîstgerî û dij şoreşiya wî di holê de be jî, di vê wateyê de di sala 1965'an de Demîrel zilamê Emerîka ye, Demîrelê Marîsoxlû, nûnerê şîrketê ye. Jixwe Turkêş di NATO'yê de Serokê Daîreya Şerê Taybete. Xebatên komela têkoşîna bi komînîzmê re, li şûna MHP'ê, DP'ê AP, dîsa ji aliyê CHP'ê ve li gorî şayanî dîroka xwe şiklê xwe guhert. Ji tevgerên demokratên civakî û rizgariyên netewî yên wê demê îlham girt, lê paşê ji poşman bû. Ez ê ji vê re nebêjim veguherîn, em bi tevgerek tîpîk a çîvandinê re rûbirû ne. Dibêjin ji bo rêgirtina li çepgiran. Ji bo rê li çepgiriya me, li çepgiran bigirin. Çawa ku di sala 1920'an de bi komînîzma me rê li komînîzmê girtin bi heman şêwazî ji bo rêgirtinê ye.

Tevgera Ecewît jî di salên 1965'an de xwedî weteyeke wisa ye. Min bi çavên xwe dît, ji bo rê li pêşiya tevgerên şoreşger bigire, wî û Rehşen bi hev re çentê xwe, darê xwe dihejandin û

dixwestin çepgiriyê bikin. Tevgera DEV-GENCÊ girtin pêşberî xwe; polîtîkayek CHP'ê ya bi vî rengî, ya rêgirtina li çepgiriyê ya wisa mijara gotinê bû.

Li aliyê din jî faşîzm, têkoşîna ku pêş diket, darbeya 12'ê Adarê û ya heta niha jî rê lê nehatiya girtin, hema mîna ku di salên 1920'î de bûyî pêşketina tevgerê di munahasirên cuda de, pêşketina tevgera Kurd, vaye bersiva 12'ê Îlonê û di vê wateyê de ketina komarê ya serdema rizînê ye. Ango ji komara zik navîn, ji komara zik werimî, piştî sala 1970'ê derbasbûn û zikê hindik maye biteqe tengav bike, bi zirxekî leşkerî bigre bin ewlehiyê; 12'ê Îlonê ev e. Ew bi xwe dibêjin; "*Ev ji makezagonê re firehe"* tengkirin, tê wateya civak girtina nav zirx. Ji ber ku wê biteqe, ger biteqe wê bimire. Li gorî wê, navekî din ê komarê lê tê kirin; em dikarin jê re bêjin; "*Komara 12'ê Îlonê"* yan jî em dikarin jê re bêjin *"komara duwemîn."*

Divê pêvajoyê de Ozal derket holê. Ez vê jî diyar bikim; parêzvanên 12'ê Adarê hene, parêzvanên 27'ê Gulanê hene û dîsa parêzvanên 12'ê Îlonê jî pir dijwar Kemalîstparêzin. M. Kemal generalê kapîtalîzma ku li gorî dema xwe paresûyên wî têkilhev bûne. Îsmet Înûnî jî şêweya wî ya zêde derketî pêşe. Gûrsel jî li gorî kapîtalîzma pêşketî generalê wî yê zikmezine. Memduh Tolmaç, hinekî din ji xwe bawere, ji ber ku kapîtalîzm hinekî pêşketiye. Kenan Ewren hinekî din dilnerehete, biqiswete; ji ber ku, kapîtalîzm di xeteriyê de ye, lê dîsa jî pir bi îda ye, ji ber ku komar xwedî daneheveke ye.

Ya din jî, beşekî medenî ku ji nav van derdikevin hene. Beşa medenî ya Înunu, Bayer-Menderes, teqez dijbertiya van a Kemalîzmê nîne. Zaravayê medenî, ji bo hinekî din henase bi zaravaye leşkerî dayîna stendin û rista rûpêşiyê dîtinê ye. Ger kevn bûbe -bi taybet Îsmet paşa pir kevn bûye- ji bo henas bê dayîna stendinê ye. Ew bi xwe westiyan, klîka medenî westiya. 27'ê Gulanê, ji bo çend salan bi armanca parastina wê westînê, zirx girt. Rê ji qelewbûna serdema Demîrel re vekir. Dê teqîba; 12'ê Adarê hat hinekî din qelew kir. Dê vê carê dîsa biteqiya. Lê 12'ê Îlonê hat. Ango veguhertina di navbera leşker û medeniyan, ya rast ji bo rêgirtin li westîna komarê bû. Qelew dibe dê biteqe, ji bo vê jî bi darbeyan hewl dide biparêze. Piştî hinek tengaviyan, qaşo bi hêz dibe. Yên mûxalîf, tên tasfiyekirin, dubare

kapîtalîzmê qelew dike. Dubare dixwazin bi darbeyekê rê ber teqînê bigirin.

Pêwîste mirov bûyera Ozal jî wisa binirxîne. 12'ê Îlonê mîna zirxekî dijwar derket holê. Hinek din dixwest ku kapîtalîzmê pêş bixe. Dixwest bi pîvanên hemdemî bide rûnistandin. Helbet Eşkere bû ku dê kapîtalîzma Tirk ango KT'yê nekariya li ber xwe bide. Ozal li vir hinekî pêş ve çû. Saziyên Kemalîzmê yên sereke, qûralên wê esas negirt. Hinekî zêde baweriya xwe bi Emerîka anî, baweriya xwe bi kapîtalîzmê anî. Qaşo xwest veguhertinek wisa bi xirs pêş bixe. Bêgûman dê qûralên serwer ên KT'yê bêje; "*Raweste.*" Bi rastî jî di dîroka komarê de bi awayekî herî xeter ew bikaranîn, hem jî bi awayekî xirab xistin. Ji Menderes xirabtir xistin. Xalên bingehîn ên darizandina Menderes diyarin, dibe ku veşartî ber bi sêdarê ve birin, lê herkes dizane li sêdarê dan. Heta niha jî nihîniyeke mezine bê ka Ozal çawa hat tengavkirin, hat kuştin.

Gelik komkujiyên bi vî rengî yên Kemalîzmê hene. De îca bê hejmar komkujiyên dema damezrandinê hene. M. Sûphî wan çawa kuştin hêjî ne diyare. Topal Yehya yê ku ew kuşt û kuştina wî bi xwe jî hêjî nihîniyeke. Topal Osman hebû, gelik muxalîf bi destê wî dan kuştin; ev nihîniyeke. Serok pê dane kuştin, parlementer pê dane kuştin; ev nihîniyeke. Qaşo ji vê re dibêjin taxtîkên Kemalîst. Heta niha jî ev kovneşop li Tirkiyê serwere. Hinekî jî ji Îttîhatgeran maye. Ango ji bo armancê hertişt rewa ye; ya rast şêwazê linavbirinê ya herî xirabe. Ya ku dixwazim bêjim, li vir ya ji rêzê ye dema ku em ber bi sala 1990'î ve tên, ji hemû aliyan ve komar tê dorpêçkirin.

Jixwe Ozal bi xwe jî nîqaşeke din dide despêkirin. Dibêje komara kevn ji kapîtalîzmê re tenge, heta neyê derbaskirinê dê pêşketin- hinekî jî piştevaniya Emerîka digirin û pêşketinên di Rojhilata Navîn de hesab dikin- nabe. Dixwaze tiştekî din bike; komarê hertim zaniye ku dê bi çewsînê pirsgirêka Kurd çareser bike. Ev jî, hinekî bi rêya reforman, vaye dibe ku xweserî hinekî jî ev be yan jî dibêje; "*Herî kêm divê ku em dijber bin, ger ez dijber bim jî divê ku nîqaşa wê azad be*" Ev îhlalkirinek pir cidî ya komarê ye. Vaye weke "*Hizrandina azad*" behsa vê dikin.

Her çiqas bêjin Ozal dize jî, -îro hinek camêr vê dibêjin- Ozal ji despêka 1970'ê-80'ê ve wezîre, Serokwezîre. Çima wê

demê Çolaşan, Mûmcû di derbarê Ozal de xebatek cidî raber nakin. Jixwe ev li ser navê MÎT'ê, li ser navê serkana giştî xebat dimeşînin. Çima di wê demê dizkeriya Ozal, dizkeriya malbatê nebû, bi salên 1990'î re berfireh bû. Ji ber ku di van salan de li gorî wan Ozal baş dixebitî. Yek ji camêrên herî ewle yê Emerîka bû, kredî bi dest dixist, di demên zahmet de aborî rizgar dikir, ji wan bi xwe re pêwîst bû. Lewra camêrekî mezine jî. Lê kî demê ji çarçoveya Kemalîzma klasîk derket, wê demê ket rewşa malbata diz a mezin.

Niha raya giştî vê nîqaş dike û nîqaşek pir durûye. Qaşo hemû diziyên xwe dixwazin di serê xanedana Ozal de derxin. Hinek rojnamevan, didin diyarkirin ku xanedana Înunu ji hemû xanedanan dewlemendtire. Eşkereye ku pêwîst nake mirov bêje malbat, jixwe komar ya wan e, nîv bi nîv ya Ataturke; paşê ya Îsmete û ya kurên wî ye. Ya Ozal malbatek biçûke. Dibe ku xwestibe misqalekê bigire. Lê paşê jî hemû bi bêvla wî re anîn. Ji ber ku xwediyê wî pir bi hêze. Ya ku diqewime ev e.

Ya rast mirov li kîderê binêre matmayî dimîne. Heta duh yên ku berz dikirin, îro çawa li binguhê erdê didin. Li vir hêzên çînî hene, dayîna axaftin a hinek taybetmendiyên komarê hene. Bêxedariya qalibên Kemalîzmê hene. Eşkereye ku Kemalîzmê xweşbînî nîşanî nîqaşên komarê nede hene. Wê qûralên xwe yên dijwar bide axaftin. Em careke din dibînin wê dawiya yên ku dixwazin reforman bidin kirin, çareseriyê pêş bixin zêde baş nebe.

Niha demogogê mezin li ser kare, divê ku mirov vî kesî baş nas bike. Di dîrokê de mirov dikare bişibîne kê? Mînaka vê jî zêde nîne. Rewşenbîrê Tirk hinek bihizire jî; demogogên xwe binase, Kemalîzmê binase û lewra hinekî hizir ramanekî rast bi mirovê xwe, nerînek rast pê bide qezenckirinê dê baş be. Ev sî sale demogojiya çi dike? Belê, bi xetên sereke hinek tiştan dibêjin. Wisa ji yekdestdariyê re xizmet kiriye, wisa Emerîkaparêze, nizanim wisa rê li faşîzmê vedike, nizanim wisa rê bi kapîtalîzmê dide girtin. Ev têr nakin pêwîste zêdetir bê destnîşankirin. Divê ku ev sî sal baş bênirxandin. Di pêkhatina hemû darbeyan de hem para xwe heye, hem jî encamê wan e. Encama 27'ê Mijdarê, 12'ê Adarê, 12'ê Îlonê li dijberî wî bixwe tê kirin.

Di xistina Ozal de, dîsa rêxistingerê sereke ye. Ev alîgirê kê ye, domdarê kê ye, li dijberî çiye? Bêguman, bi taybetmendiyên sereke yên kapîtalîzmê re, têkiliya wê dikare bê ava kirin. Dîsa bi rastiya navnetewî, bi yekîtiya Sovyet ya hilweşiyayî re, bi DYE, Ewrûpa û rastiya welatên cihana sêyemîn re têkilî dikare bê avakirin. Çawa ku M. Kemal ji hemû hêzê wê demê û ji saziyên ji aliyê bîrdozî ve pêşengatî jê re kirine pêvek girtiye û ûye mînakek eklektîzmê, ev jî bi îhtîmalek mezin bi girtina pêvekên ku di cihana piştî salên 1960'î  de heyî re, hewl dide rejîmek Tirk a eklektîk -ez ji bo vî jî nebêjin hewl daye pêk bîne- bidomîne. Demogogiya wî hinekî ji ber vê sedemê ye.

Vaye ji te re, li gorî demê li her derê heye. Ji bo domdariyê çi pêwîste, ji bo sergirtina şerma xwe çi pêwîste, ji bo rizgarkirina rojê çi pêwîste, ji bo şêlandina kedê û nûnerên kedê çi pêwîste; tiştên ku MHP'ya faşîst xwedî dike ye. Artêşa taybet damezrîne ango bi demokrasiya civakî re lihevkirin, tifaq û bi îslamparêziyê re ketina nav lihevkirinê. Li gorî demê sûda çi hebe, çi pêwîst be destê xwe dirêjî wê dike. Varyanteke cuda ya Kemalîzmê ye. Bi rastî vê dike, lê hîn paşketî, hîn hov, hewl dide mîna karîkatorê karîkator vê bike. Qaşo niha pîrozbahîya komara medenî dike. Sovyet jî vê dike. Xweziya xwe bi wê tîne. Ewrûpa ji mêj ve kiriye, bi sedan sal beriya niha ev kir. Niha hewl dide wê dubare bike. Em dibînin ku texlîdgerekî çiqas mezine. Lê texlîdgeriyeke derengmayî, ji wê jî wêdetir ev komar bi asanî îflah nabe, serdemek kujende dijî.

Ev pîrozbahî, rûpoşkirina vê hebûna nexweşiya kujende û xemlîna wê ye. Ti têkiliya xwe bi şahiyên dema damezrandinê re nîne, her çiqas bixwazin şahiyan pêş bixin jî, ya ku tê kirin qalibê mirina komarê ye. Dibe ku îro, îsal, piştî çend salên din şûnve pêk neyê, lê di wateya dîrokî de wateya ku komar li ser civak û gelê xwe rave bike mirî ye. Di kare bahsa perpitînê bê kirin. Vaye tiştek wisa ye. Ti rêjîm ji ber xwe ve nabêjin vaye ez dimirim. Dema ku dimire jî, hewl dide xwe bi deng, xeml bide diyarkirin. Ya ku tê kirin dişibe vê. Ji gelik aliyan ve tenê ne nîşaneyên rizînê, nîşaneyên perpitînê jî nîşan dide.

Jixwe sedema ku em dibêjin; "*Komara kontr-gêrîla"* jî ev e. Komareke, her roj cînayetên kujerên wan ne diyar hene, her roj binpêkirina zagonan heye –Ew bixwe îtîraf dike- polîtîkaya

xilasbûyî û rastiya partiyên polîtîk bûne heye û dîsa ji hemû aliyan ve aboriya îflaskirî heye. Di ti welatî de enflasyon negihîştiye ji sedî 60-70’ê. Yan jî ji sedî pekîna hezarî heye? Wateya vê tê dayîn. Ji sedî 15 de, daketina binya ji sedî deh heye û wateya vê jî tê dayîn. Lê di cîhanê de di ti welatî de mînaka di navbera ji sedî pêncî û sedî nîne. Tenê û tenê li Tirkiyê heye. Di van salan de heye. Ev şêwazê herî xeter ya mêtingeriyê ye, ji bo wê.

Asta enflasyonê ya ku gihiştiye ji sedî sed, rewşa herî xeter û rêbazê herî zirav ê mêtingeriya li ser gele. Mînaka wê nîne. Ger hûn lê jî bigerin hûn nabînin. Niha derkeve ji sedî hezar wê hema tevdîr bigirin, daxin asta ji sedî bîst. Dernaxe ji sedî deh jî. Ger derkeve asta ji sedî sed, ji sedî pênsed dê çareseriyê bibînin. Piştî salek- du salên din, hema weke li Arjantiyê bûyî, li Sovyetan bûyî dê çareseriyê bibînin. Daxe bina ji sedî bîstan; ew jî çareseriyeke û dê mêtingerî kêm bibe. Derfet ji vê re jî nadin.

Bi rastî jî ev pazde, bîst salên dawî ne, tenê polîtîkayên enflasyonê yên komarê ji aliyê aborî ve, polîtîkayek heta dawî ya mêtingeriyê ye. partiyên siyasî li ser vê çawa demogojîkin, gel çawa dixapînin, bi mînakên dîroka ti demogojiyan de nehatiye dîtine. Wek min gotî, xwezî rewşenbîrekî Tirkan hebûya, ji aliyê gelê xwe ve ev anîba ziman. Ev şêwaza mêtingeriyê di kî dema dîrokê de û di kîja welatan de hatiye dîtin, lêkolîn kiriba. Ger heye, ji hinekan re ez dibêjim; ez zêde ji aboriyê fêm nakim, lê hinekî texmîn dikim. Li gorî min mînakekî wisa kêm tê dîtin.

Çima, armanc çiye, çawa pêk tê; bila vê jî ew bixwe lêkolîn bikin. Ji ber ku hejmarek zêde aborîzanên wan hene. Hinek ji wan hewl didin bi hinek peyvan nêzîk bibin. Hinek nirxandinên mîna; “*Aboriya fêlbaziyê”* nizanim encax bi peyvên bi vî rengî dikarin bên navkirin bikar tînin, jixwe ev jî raste. Ya rast aboriyeke wisa nîne. Ev şêvazê diziya herî pêş ketiye. Ger em mînakekî bidin; bilindbûna dolar. Şebekeyek berfireh ya berjewendiya û tevdîrê wê digirin. Devulasyonê diteqînin û diziyeke mezin dikin. Bawerim di bilindbûnekê de çen tirîlyona dixin bêrîka xwe. Gelo ti diz dikarin bi operasyonek wisa ya aborî çend tirîlyona di carekê de bi dest bixin? Ti şêlanker, dagirker, di rojekê de gelo dikare di rojekê de ewqas tirilyonan bixe bêrîka xwe? Lê di

serdema Tansû Çîller de ev hatiye kirin. Û bi sedan operasyonên aborî yên wisa bi tirilyonan pere desteserkirinê hene.

Di dema vê hikumeta şerê taybet a dawî de, di vê komara kontra de çiqas karsaz hatin qetilkirin? Di navbera xwe de îro şerê dosyayan dimeşînin. Bûyera Engîn Cîvanlar mînaka vê ye. Ya rast dizek derbasî cihê din dibe, yên beriya wê lez derdikin û cih ji dizên nû re vedibe. Bi awayekî nehatiye dîtin. Ya herî xirab jî, gel ji hemû aliyan ve temaşe dike. Li Stenbolê, li ava zêraba digerin wê jî nabînin. Tenê ne li Stenbolê, li her derê hemane. Miletek bi çorbekê terbiye dikin, yên ku şorbe dest wan dikeve ango bi qurişekî îdarê dibîne, xwe dixe şûna; "*Kaptanê keştiya xwe rizgar kiriye.*"

Bûyera ku em jê re dibêjin meymûn kirin, vaye wisa derxistine holê. Ango tu dema kuçikekî fêr bikî, birsî bihêlî, dema ku te hestiyek avêt pêşiyê, hema ber bi te ve dibeze û bi asanî bi te ve tê girêdan. Kûçikê mîde û parsû bi hev ve zeliqîye, bi hestî tê îdarekirin. Gel anîne vê rewşê, çawa anîne vê rewşê? Bi Komara kontra; îşkenca wê heye, hêzeke polîs ya ku nehatiye dîtin heye, wê 27 hezarên din jî îsal bigirin. Komara kontra, komara polîse. Hem jî bi şêwaza tîmên taybet. Ger dixwaze bila dengê xwe derbixe. Bawerim niha karmend bi zêdebûna mûçeyekî dused lîreyî –bawerim ev jî têra xwarinekê nake- ango xwarina rojekê rizgar kiriye, riswa bûye, dixwaze du gavan bavêje lê rê lê tê girtin û niha dinalîne, digîrî.

Firmêskên çavê meymûnê, çima ji ber ku dema komara kontra ji hemû aliyan ve serdestiya xwe ava dike ev bêdengin. Niha yê herî ecêb jî, demek beriya niha Turkêş di kongreya xwe de bangewazî kir û got; "*Bila çepgir jî bên nav me.*" Û dê biçin, ji ber ku niha çavkaniyên aborî Turkêş di destê xwe de digire. Her kes birsiye û çepgir di dema borî de SHP'yîyan hinekî di nav eniya şaredariyan de bi cih dibûn. Niha ew rê jî hat qutkirin. Hemû pere li gel Turkêş kom dibe û dê hemû ber bi wir ve bibezin. Ev bermahiyên Dev-Yolê, nizanim bermahiyên kîja çepan hûn ê bibînin di dema pêşiya me de dê hemû ber bi wir ve bibezin. Wê di wir de şerê çînatî bikin. Têkoşîna çi? Têkoşîna mûçexwuriyê. Ya rast ev çiqasî têkoşîna çînî ye? Bi asanî dikarin teoriyekê jî lihev bînin. Di kevneşopa dewleta Tirkan de ev bi hemû aliyan ve wisa ye.

Di serdema Abdûlhamîd de, heta beriya wê jî di nav de wisa ye. Sûltan pir baş dizane û dibêje; "*Hinek mûçeyên din jî vî re pêwîste.*" Namik Kemal jî li ser vî bingehî kişandiye nav xwe. Ma wê niha evdalê Dev-Yolê nekişîne. Jixwe camêr hinekî tengav bûye, hinekî jî di girtîgehê de serê wî êşiyaye, mûçeyekî xweş pêşkêşî wî dike. Bi rêyên ne yekser hem jî cihê kar jî jê re peyda dike. Û li şûna sosyalîzma zik têrnake –ya ku ji sosyalîzmê jî fêm dike çapulgeriyeke- hezar car bi qurbana kapîtalîzma ku niha şanaziyeke ewqas mezin pêşkêş dike û dide despêkirin, vaye sosyalîzm, nizanim dîktatoriya Stalîn; kapîtalîzm, aramiya lîberalîzmê, azadî û hdw. Dike, tenê bila bêrîka xwe tijî bibe.

Ger em bînin berçav, hemû çepgirên kevn wîsa ber bi mûçeyê dewletê ve bezîne, belê çavkaniyên mûçe, venerîna wê niha di destê Turkêş de ye û binêrin, jixwe bizave dane despêkirin. Çiqas pêşnûmeyên rewşenbîr hene, heta ku yên dixwazin ji nav ciwanan bikin hene, li wir kom dibin. Ji ber ku komara kontr gêrîla encax dikare xwe wisa li ser lingan bigire ji bo wê. Demîrel dişibe wî maraşalê ku rê ji Hîtler re vekir. Navê wî Nenbûrg bû, çi bû? Bûye pir, baş xwedî bike paşê jî, bêgûman li beramberî çi wisa ye? Li beramberî têkoşîna me ya ku pêş dikeve wisa ye. Niha bi vî awayî em dibînin ku KT'yê çawa di ber sikrata de ye û bi demogojiya demogogekî çawa dixwazin biposîn. Bi wêjeya pir zindiye, dê ev bê dawî be, di xemilînin. Lê di rastiya xwe de bi hikumeta şerê taybet, bi bilindbûna faşîst a tomarkirî hewl didin biparêzin û wê bigihînin tenduristiya berê. Em vê vekirî dibînin. Bêgûman li beramberî çi, şerekî PKK pêşengatiya wê dike heye, li beramberî vê. Ev komar 20 sale li beramberî vê rastiyê radiweste û ya herî girîng jî rûbirûyê şerê bêxedar ê vê salê ye.

Cankêşî ji ber vî şeriye. Li beramberî şer tenê ne qonaxa 70'ê salî, hemû pêvajoya Osmaniyan û Selçûqiyan jî di nav de, li beramberî raperîna vê carê darbeyên ji aliyê çîna serdest ve tên rêvebirin sernakevin. Ger em sala 1970'ê yan jî bihesîbînin, nêzîkî 25 sala ye; heta em ji 1965'an bidin despêkirin, nêzîkî 30 salî ye bi giştî di Tirkiyê de, bi taybet di Kurdistanê de şer heye. Demogog ji xwe serkêşê faşîst ê vê berxwedanê û şerê gel yê ku dixwaze bi çewsîne ye. Ango demogogê wê ye. Divê ku mirov vê baş bizane. Bi şerekî 30 salî yê şoreşgerî û şerê dij şoreşa ku li ser

tê ferzkirin yê ku di asta herî jor de eyar dike; bi danahevên şerê taybet ê Turkêş, bi yekîneyên kontr gêrîlayên artêşa taybet şerekî hewl didin biçewsînin.

Baskê vî şerê yê Tirkiyê kêm ango zêde dema em ber bi salên 1980'ê yan ve tên dikarin bêjin ku çewsandine. Lê yên ku rexnegiriyek rast li çepgirên Tirkiyê dike û zagonên pêşketina xwe bi vesaziyên saxlem li hev rast kir, li beramberî tevgera me ya şoreşgerî di van deh salên dawî de, bi taybet şansê serkeftinê nehat dayîn. Ji ber ku nehat dayîn, ji despêka 1990'î ve –pêwîste heta 1990'î nirxandinek bê kirin. Heta weke ku me kir- wisa zanîn ku dê bi polîtîkayên bidûrxistinê yên kevnar ji holê rake. Di sala 1987'an de bi vê hişmendiyê got; em ê bipelîxînin. Rewşa awarte ragihandin. Gotin hûn ê heta sala 1990'î tine bibin. Dema ku fêm kir nikare tine bike, şerê topyekûn xist meriyetê. Ango qirkeriya faşîst, valakirina hemû Kurdistanê jî li ser vê zêde kir û wisa payîn ku dê ji binî derkevin û ev jî raste. Tevgera çepgir a Tirkan ji gel qutkirin, xelet araste kirin, bi komployan ber bi provakasyona ve birin û di tasfiyekirina wê de serkeftîne. Pêwîst nake em çîroka vê dûr û dirêj vebêjin. Nirxandinên pêwîst jî me kirine.

Çepê Tirk çima gelerî nebû, çima xwe negihand partîbûnê? Hinekî karê wan bi xwe ye, lê bi rexneyên me re gelikî ronî bûye. Li beramberî şerê taybet ê ku hat ferzkirin, şerê şoreşgerî pêş nexist. Ji şerê pêşeng, veneguherî şerê girseyî. Ji Rêbertiya komekê, xwe veneguherand tevgera kadro. Di serî de jî dahûrîna xwe, dahûrîna civakî, dahûrîna kes nekir. Tevger jî ji komeke ferdî wêdetir neçû. Bêgûman aliyê vê yê siyasî û bîrdozî heye.

Xwe negihand feraseta nirxandinek dîrokî, civakî ya saxlem û dîsa xwe negihand bernameyek nirxandina siyasî û bîrdozî ya hevgirtî. Xebatên rêxistinê, bi taybet jî li ser taxtîkên şer lêhûrbûn nekir. Û bi gelik rexneyên dişibin van, vaye rexne li Kemalîzmê nekir. Xwe ji jiyanek rast a rêxistinê û ya partiyê re amade nekirin. Bi qalibên jiyana komarê û bi qalibên jiyana pergalê jiyan kirin. Jiyana şoreşgeriyê çi pêwîst dike qet ne anîn bîra xwe jî. Di gotin şoreşger, lê bi kadroyên ku di pratîkê jiyana pergalê, nedîtin ku dê şoreş neyê kirin. Hîn di gelik xalên wisa yên ku mirov dikara rexne bike ji ber ku xwe nedahûrandin, wek hûn dizanin ji binketinê xwe rizgar nekirin.

Ji bo xwe ji vê rizgar bikin, gelik tiştên ku ji ezmûna PKK'ê fêr bibin hene. Vaye wek em hewl didin hinekî bikin, bi giştî dahûrîna dîroka çîna serdest, Osmaniyan, komarê û lewra dahûrîna Kemalîst, dahûrîna kapîtalîst a Tirkiyê, mirovê ku çêdibe, pergal, dahûrîna jiyanê; destnîşankirina gel, diyardeya rêya gel çiye bibersivînin. Bîrdozî, polîtîkaya wê diyarkirin, kadro û şerê wê diyarkirin, taxtîk û rêxistina vê diyarkirin, şerkerê wê diyarkirin ango bi van aliyan ve peywirên wan ên pir mezin hene. Ger bikarin xwe bigihînin vê; bêgûman dikare dîrokek gel a cuda, dîrokek komarê ya cuda û ya gelekî cuda jî dikare bê çêkirin. Lê tenê di gotin de ma. Ya pêwîst nehat kirin.

Pir vekirîbû, me yê li vê nenêriya û xwe nelikimanda. Bi lez em ji wan cuda bûn. Li ser bingehê van rexneyan paşê me rêya xwe, herî kêm di şênberiya Kurdistanê de bi sexlemî dît û rast jî bû. Weke hûn dizanin şêwazê Rêbertiya rast a vê re yê, dahûrînên Rêbertiyê, partî, her ku çû li ser şerê çekdarî hat teyisîn. Bi qasî ku stratejîk bû, xwe gihandina şêwazê rast a Rêbertiya textîkî, ev jî bi perwerdeyek baş û ferasetek jiyanê re kûrkirin cewherê serkeftina PKK'ê pêk tînin. Nêzîkatiyên wisa, îro ya ku vî şerî dimeşînin, pêş dixin û xalên sereke yên ber bi serkeftinê ve dibîne. Bi temamî alternatîfa KT'yê ye, vebijêrkek cuda ye, êdî her kes vê dibîne û dibêje.

Wê ji pergalê qutbûn çawa pêk were; qutbûna bîrdozî, qutbûna rêxistinî, qutbûna jiyanî, qurbûna ji çalekî, heta ji hêzên wê yên zordest qutbûn dê çawa pêk were hatine diyarkirin. Dîsa xwe gihandina gel a artêşa şoreşger, pêşxistina artêşa gel ji hemû aliyan ve hatine diyarkirin. Bê navber û serkeftî dewamkirina wê jî êdî di nav derfetan de ye.

Jixwe piştî salên 1990'î, dema ku hat fêmkirin dê bi hişmendiya artêşa Kemalîst a kevnar nikaribin rê li PKK'ê bigirin, Ozal bi ceribandinek dawî bi şêwazê; "*Gelo em ê bikarin bi hinek reforman ve lihev bikin"* nêzîk bû. Piştî ku ev hemû bi xemgîniyeke mezin bi dawî bûn û şûn ve derbasî pêvajoya şerê topyekûn bûn. Valakirina gundan, valakirina bajaran polîtîkaya vekirî "*Ya hûn ê faşîzmê bipejirînin, yan jî bên qetilkirin"* pêvajoyên linavbirinê bi polîtîkaya Kemalîst bi polîtîkayeke ji ya 1925-40'î xirabtir nêzîk bûn. Li ser vî bingehî mîna ku ji nû ve hundirê komarê dagirin, hikumeta şerê taybet, qaşo komara niha,

raveya komara îro, ji hemû aliyan ve li ser bingehê dijbertiya PKK'ê ji nû ve rêxistin kirin û qaşo ji nû ve jîndar kirine. Êdî çiqas jîndar kirine nirxandina wê cuda ye, lê ew nûnertiyê dike û hewl didin wê biparêzin.

Di aboriyê de bi diziyek wisa, xistine bin venerîna faşîzmê. Dixwaze bila gel bi şelîne, dixwaze bila Tirkiyê bifroşe her alî ne di xemê de ye. Ya ku ji bo faşîzmê girînge, venêrîne û rêxistinkirina wê bi xwe ye. Ji aliyê civakî ve, ti aliyê wê yê ku nehatiye rûxandin nemaye. Ji her alî ve çêkereke civakî ya ku hatiye malîn; ji exlaq tiştek nemaye, li beramberî çîna kedkar qet rêz nîne, yê heyî jî cîhana ser û bin kiriye û beşekî holdîngparêzên faşîst ê ku pir di jor de hatiye rêxistinkirin. Rewşeke aborî-civakî ya ku kapîtalîstên çîna navîn jî li ser qiyametê radikin heye di holê de. Partiyê siyasî yên îflaskirî, çepgirên wê ji rastgiran faşîstirin, rastgirên wê ji çepgiran bêtir xwe çepgir dibînin. Têkilhevkirinek wisa ya faşîst. Jixwe şerekî taybet û hikumeteke ji her alî ve, ji aliyê yekîneyên şerê taybet ve tê birêvebirine. Ango em rûbirûyî tovê pola yê dewletê ne. Êdî hemû tiştî bi hişmendiyek faşîst dimeşîne, dest davêje hemû saziyan, bi hemû corê têkiliyan dilîze. Ji hemû aliyan ve bi kesayet dilîze, xwe dirêjî nav hemû çînan dike. Di Kurdistanê de cerdewanan pêş dixe, cerdevan têr nakin, eşîretan, eşîret têr nakin gelik rêxistinên sîxwurî yên cuda, rêxistinkirina nokeriyê û rêxistina kontr gêrîla ya ku di nav hemû saziyên Tirkiyê de xwe bi cih kiriye mijara gotinê ye. Dîsa hemû Partî desteser kirine, yekîneyên şerê taybet di hemû qademeyên dewletê de yekîneyên şerê taybet bi cih kirine, yekîneyên parastinên xwe cihî avakirine û bi vî rengî dayîna jiyankirina komara şerê taybet ango konrt gêrîla mijara gotinê ye.

Ev, bawerim bi qasî ku mirov nikare bi ti demên din qeyas bike, di pîrozbahiyên îsal yan jî qaşo di jîndarkirina komarê de tên dîtin. Gelik stranan dibêjin, pir zêde, bêwate derdorê dixemlînin û li her derê al dihejin. Bi temamî wisa ye, hem rastî pênaseya faşîzmê tê, hem jî ji bo veşartina rewşa heyberekî derasayî vê dikin. Ger bê dîqatkirin, faşîzm ji kapîtalîzma ber bi hilweşînê ve diçe re çareseriyeke. Heman ev tê jiyîn. Ya rast li Elmanya, Îtalya hildiweşî. Û dê li wir hema rejîmek sosyalîst bihata ser kar. Heta niha jî Îtalya bi nexweşiyên wê re dijî.

Partiyên komînîst ên ku peywirên xwe pêk ne anîn xwe digihînin encamên herî xirab. Û aloze,  dewletên herî zêde dij sosyalîst jî îro Îtalya û Almanya ye. Niha Tirkiye ji van jî wêdetire, dema ku em dibêjin modelekî faşîstire; çavkaniya xwe ji vê rastiyê digire. Li pişt serê wê têkoşîna me ya pir mezin heye, her kêliyê dê wê ber bi hilweşînê ve bibe. Nikare xwe ji rewş û encameke wisa rizgar bike.

Di dema pêşiya me de wê pêşketinek çawa raber bike? Cihê ku ev komar bigihêjê, ewqase. Cankêşana xwe jî encax bi van rêbazên kontr gêrîla dikare bigire bin ewlehiyê û hinekî temenê xwe dirêj bike. PKK'ê ji niha ve, tenê ne di rizgariya netewê Kurdistanê de, çanda berxwedaniya gelan û di nav Tirkiyê de her tişta ku di wateya muxalefetê de ye, nîşan dide ku xwedî taybetmendiya zindîkirina mîrateya wan e.

Di sala 1920'an de tevgerên Îslamî yên ku hatine çewsîn jî hene. Îro ev bi xêra PKK'ê zindî dibin; tevgera kedê hebû, bi xwe sipartina me dikare pêş bikeve. Di serî de jî îsyangeriya Kurd a ku xedar li dijberî komarê şer dike heye. Niha di pêvajoya herî bihêz de ye, dixwaze xwe ber bi rizgariyê ve bibe. Ango her tişta ku komarê digot min çewsand, di vî 70'ê salî de min beton kir, binax kir çi heye, PKK hemûyan derdixe. Ev jî zindîkirina mozayîka gelên Anatolê ye. Pir zêde dibêjin; "*Mozayîka çandê"* ya ku vê derdixe holê têkoşîna me ye.

Ango nîqaşên komarê encamekî din a bandora me ye. Lê hîn weke di salên 1920'an de xwe bi temamî negihandiye raveya rêxistinî, hêza xwe kom nekiriye, di rewşa meylekê de ye. Gefan li komarê dixwun, lê rêxistina pêşeng, ya herî rêxistinkirî û rêxistina ber bi şer ve kişandiye PKK ye. Di vê wateyê de ji hemûyan re pêşengatiyê dike. Wer tê fêmkirin ku dê hîn jî pêşengatiya xwe pêş bixe. Nirxandinên ku tên kirin, dê ji komarê re alternatîfeke çawa ava bike bi awayekî vekirî diyar dike.

Şoreşa ku di Kurdistanê de serkeftinê bi dest bixe, ya rast şoreşeke tîpîk a belavbûyî ku di Tirkiyê de serkeftiye.

Ew yekîneyên taybet ên ku li Kurdistanê belavbûne, dibe ku li Tirkiyê pêşwext wek komareke civakî yan jî pêşketinek berjewendiyê kedê esas digire –jixwe ji niha ve hema her roj şer heye- ger bi zorê be jî dibe ku ferz bikin. Hinekî din mercên binesaziya pêşketî, dibe ku di Kurdistanê de rê ji pêkhateyek

siyasî ya nû û pêşwext re rê vebike. Eşkereye ku di Tirkiyê de em demokrasiyê tengav dikin. Li şûna komara di sekeratê de ye, bijareyek demokratîk ya pir nêz bûye mijara gotinê ye.

Her çendî ev ji ber çewsîneriya şerê taybet neyê dîtin jî, di nirxa berevajî de ye. Ango di rewşa şikestinê de, bi lez weke vebijêrk derketina holê ne îhtîmalek dûre. Lê eşkereye ku ev niha di Kurdistanê de asê dibe. Ger bikarîna zirxê xwe yê şovenîst derbas bikirana, diviya bû Tirkiye ber bi aliyên kedê, heta aliyên hemû mafên çandî û hêzên demokrasiyê ve biherikiyana û rizgariya xwe ya li wir pêk baniyan. Weke ku ev pir vekirî ji aliyê Tirkiyê ve wisa ye, hinekî jî ji bo Rojhilata Navîn jî wisa ye.

Şoreşa ku di Kurdistanê de ser bixe, biqasî ku şoreşa Tirkiyê ye, di heman demê de şoreşa Rojhilata Navîne.

Ger rastiya demokratîk, çandî û dîrokî derxîne holê, jixwe dij emperyalîstiya wê şênbere, paşverûtiya navnetewî, ya herêmî bi asanî KT'yê di rewşa wê de bihêlin dê bimre, lê tevî vê jî bi zorê li ser piyan digirin. De bihizirin, ger krediyên hêzên paşverû yên Rojhilata Navîn nebin; ger piştevaniya DYE'ê ji aliyê leşkerî, siyasî û îşkencekirinê ve nebe, gelo ev rejîm wê çend roja bikaribe li ser piyan bimîne? Dîsa tengaviyên yekitiya Ewrûpa ya ku xwe pir zêde demokratîk dibîne nebe, dê temenê wê çiqas be, şayanî lêpirsînkirinê ye. Ango komara Tirkiyê ji ya tê payîn zêdetir ferzkirinek hêzên paşverû yên navnetewiye. Tenê ne ferzkirina faşîstekî xwecihî ye; ev ên ku em ji wan re dibêjin tekel, ji wan re dibêjin holdîng bi temamî ji burjuwaziya kevn a ku em ji re dibêjin komprodor zêdetir bi derve ve girêdayîne. Lewra, ev komara ku ew niha li ser dilîzin, ji hemû aliyan ve malê derve ye. Berjewendiyê wan diparêze.

Siyonizmek heye, vaye dixwaze di Rojhilata Navîn de ber bi aşîtiyekê ve biçe. Aligirê herî mezin weke di şer de bûyî, ber bi aşîtiyek nû vebûnê de Tirkiye ye. Du dostên herî zêde bi hev ve girêdayî dibêjin; "*Ber bi Asya navîn ve vebûn*" Bi hevre pîlan dikin. Çiye ev? Qaşo ev KT'yê ye, lê di cewherê xwe de ev qeysikê siyonîzmê ye. Ji bo xwe gihandina emperyalîzm ber bi Rojhilata Navîn a nû, Kafkasan, Asya Navîn rista pirê dilîze. Jixwe ew bi xwe her roj vê dibêjin. Ango bûyerek başverû ya qada navnetewî, nemaze hilweşandina vê ewqas dê rê li ber

enternasyolanîzmê vedike û dê bibe bûyera şoreşê. Me ev dema borî jî digot. Lê em niha hîn şênber dibêjin.

Pêşketinê rojane şoreşa me rûbirûyî bûyîna şoreşa Rojhilata Navîn kiriye. Wê bandora wê li Kafkasan bibe, heta bandora wê li Balkanan jî bibe. Di dema borî de ji aliyê teorîk ve nirxandinên ku dihatin kirin, niha pratîkî pêktên. Em vê dibînin, nemaze ev şer tenê ne şerê Tirk û Kurdane. Berevajî, bi sedên sal li ser gelê Kurd xwe ferz kiriye. Di roja me ya îro de jî bi van taybetmendiyên xwe yên rizî, bi nêzîkatiyên di vê astê de mêtinger, îşkenceker, li beramberî rêxistinek bêgane, her çiqas bi alên Tirkan bixemîlînin jî, di wê astê de li beramberî rêxistinek xizmet ji hêzên mêtinger ên derve re dike ye. Bi qasî vê jî dijberî KT'yê ye. Ew çend her çiqas wek rizgariya netewî diyar bibe, bi tevgerek şoreşgerî ya ku ji wê zêdetir xwedî wateyek enternasyonalîste û bi şerê wê re em rûbirû ne.

Ji aliyê hemû kesên ku di van salên dawî de pêşketina şer di vê astê de dinirxînin ve pir baş tê dîtin. Em tenê di hundir de bi komara xwe dispêre çîna serdest re şer nakin. Ji hemû aliyan ve li beramberî emperyalîzma herî pêşketî, Ewrûpa, Japonya –Herî dawî hinekî din jî lê zêde bûn- di serî de jî bi derfetên ku Emerîka piştevaniya wê dike û heta dema li ber mirinê ye jî bi rêbazên taybet dixwazin wê rizgar bikin. Em bi saziyek wisa re rûbirû ne. Di vê wateyê de em bi şerê tevgerek şoreşgerî ya ku herî kêm bi qasî şoreşa Fransa, bi qasî şoreşa Bolşevîk wateya xwe heye re rûbirû ne.

Jixwe ewqas hevgirtina hêzên paşverû jî çavkaniya xwe ji asta enternasyonal ya vê şoreşê digire. Em dikarin vê hinekî şênber bibînin û bêjin. Dema pêşiya me wê çi bêje? Ger şoreş bi rewşa niha heyî sengerên ku bi destxistine û şêwazê şerê wê, perspektîfa wê ya bîrdozî, siyasî, ya herî girîng jî asta xwe ya jiyanî nehejîne, hertim pêşve bibe, em bi asanî dikarin bêjin wê ti gavan paşde navêje û ji ti sengerên xwe neyê derxistin.

Di gel vê de KT'yê ya ku dixwazin bi piştevaniyên dawî li ser piyan bigirin, sengerên ku girtine dê her ku biçe teng bibin, piraniya van ji destê wan bên girtin. Bi taybet jî di qada Tirkiyê de teqez nepejirandina vê, -Jixwe ji niha ve pir zêde tê jiyîn- dê bigihêje astek neyê tehamulkirin û dê ev komar bê derbaskirin. Lê bi şêwazê şoreşgerî yê ku em dixwazin, yan jî bi reforman derbas

bikin, ango wê komarek modelê Refahê bê damezrandin; ango wê komarek faşîst a dijwar serkeve; wê armanca van hemûyan têkoşîn diyar bike. Em ji ber xwe ve nikarin bêjin dê wisa bibe, ango bi awayekî din bibe. Dê têkoşîna şoreşgerî diyarker be.

Zêdetir pêşket, ger serkeftina wê zêde bibe wê bandorên wê yên yekser jî zêde bibin. Heta wê bandorên wê yên navnetewî jî zêde bibin. Herweha dê li gorî berjewendiyên gelan bijarde zêdetir bibin û dibe ku ber bi serkeftinê ve jî biçe. Lê ger ser nexe, di nava xwe de biçewse, wek çepê Tirkan bixetime em dikarin li bendewariya derbasbûna faşîzmek dijwar a ser desthilatdariyê jî bikin. Ango herdu jî hevdu bin nexin dibe ku modelên yên wek Refahê bi lez bibin. Nemaze nediyariyek heye. Lê îdaya şoreşger, perpektîfa şoreşgerî ger vê leza xwe bidomîne, dê pêşketin di çarçoveya berjewendiyên gelan be. Di Anatolê de jî li şûna komarek dijberî gelan, em dikarin bêjin ku dê komarek gelparêz pêş bikeve.

***Jixwe ya ku di Kurdistanê de bê damezrandin komara gele û federasyona wê ye.***

***Ji aliyê gelên Rojhilata Navîn ve federasyonek li Kurdistanê bê damezrandin jî, bingehê komara gelan a Rojhilata Navîne.***

Lêgerînên vê hene, hinek xebat di parçeyên Kurdistanê de tên çavdêrî kirin. Ger pir paşketî be jî, lê dîsa jî gihîştiye qonaxek pir girîng. Pêşengatiya PKK'ê, tenê ne di wateya Tirkî ber bi federasyonbûnekê vê birinê, di Rojhilata Navîn de federasyonbûnek wisa bi şêwazekî cuda, şêwazê demokratîk, ji aliyê şêwazê komara gelan ve ye. Di serî de nîşandanên bîrdozî bi vî rengî ne. Niha jî derdikeve holê ku dikare bi rêyên vê yên pratîkî re jî pêşketin bên sazkirin. Nemaze di salvegera 71'ê de li dijberî komara Kemalîst, ji bo berjewendiyên gelên Rojhilata Navîn, têkoşînek gelan a ku PKK pêşengatiya wê dike, têkoşîna wan ber bi komarek gel ve pêşveçûnek mijara gotinê ye.

Ev rastiyek ji aliyê têkoşîna me ve hatiye selmandine. Lê ji bo serkeftinek bi temamî bi rastî jî pêdivî bi şerekî xetê yê xedar, kûrbûyî, yê ku afirêneriya wî roj bi roj zêde dibe, di vê wateyê de serkeftinê ferz dike heye. Ya heta niha divê ku wek despêkek ji rêzê bê dîtin. Şerê rast ê di leha gelan de ger bi vî rengî bê meşandin em dikarin bêjin ku dê serkeftin jî teqez bibe. Ev nayê

vê wateyê ku em pêşbîniyekê dikin. Dema ku em li yê heta roja îro hatine kirin dinêrin, weke ku diyare divê em çi çawa bikin vekiriye, hevşêweyê kedên heta niha hatine raberkirin, di nav rêxistina pêşeng de, di şerê artêşê de û di gelik pîvanên rêxistinên şoreşgerê yên ji xwe bawer ger bên pêkanîn, em li ser bingehê serkeftinên xwe yên şoreşgerî niha, bi asanî dikarin bêjin ku; dê serkeftin di lehê gelan de û bi şêwazê rastiya komara wan pêk werin.

Belê, min hewl da ez vê mijarê jî wisa temam bikim. Wê bixwazin nîqaşên me ji niha û şûn ve cuda pêş bixin.

Em pirsgirêkên têkoşîna xwe yên rojane jî wisa dinirxînin û koman amade dikin. Komên qadan, jixwe me perspektîfên girîng danîn pêşiya wan, dagirtî çûn. Lê bi israr bibîrxistinên me çêbûn. Mixabin kesayetiyên teng, yên ku ji rista dîrokî, kûrahiya siyasî dûr, bi taybet kesayetiya ji rojanebûnê dûr, ji rêzê van kedên me tehdît dike, em dixwazin rê li vê bigirin. Bi rastî jî di leha gelan de dîrok dikare bê nivîsandin, lê bi kîja kesayetê, bi kîja şêwazî, em hewl didin vê nîşan bidin.

Mixabin di gelik qadan de em devjê berdin rewşa koman, di nav me de jî gelik qad, bi înad xwe ferz dikin. Bingehê rast nêzîkbûna kar, pir alî nêzîkatî ji kar re raber kirin û afirêner nêzîkbûnê nikarin ser bixin. Û kesayetiyên we di astek mirov nikare bawer bike de, tevî hemû kedên me yên pêşiya we vekirinê, hewldanên me yên piştevaniyê jî, pêşketin, nexasim taybetmendiyên afirêner, îda û li gorî vê rewşa raberkirina hewldanê lewaz dimîne. Di îda de lewaz e, hewldan lewaz e, di perpektîf bi nêzîkatiyên taxtîkî yên rojane derbasî meriyetê kirinê de lewaz dimînin. Wê demê ji bi we gotina dikarin şansê perspektîfa di asteke bilinde bidomînin pir zahmet dibe. Di vê wateyê de hûn naxwazin xwe di ber çav re jî derbas bikin.

Bi rastî jî weke ku di vê nirxandina kurt de jî tê dîtin, divê ku hûn vê kesayetiya xwe bigihînin asta serkeftinê pêk tîne. Mîna ku em hertim dibêjin, fêrbûna ku hûn ji bo cixareyekê nîşan didin, divê ku hûn vegûherînin serkeftina fêrbûnek şoreşgerî. Ev merdiye û jiyan di vir de ye. Ev merdbûne û çavê xwe berdin vê jiyanê, ger na ti wateya çavberdana yetkiyê, karêkî jiyana rojane nîne. Lê lewaziya herî mezin a kadroyê me, hêza me ya fermandar di vir de ye. Bi rayeyê xwe rehet bike, bi hêza partiyê

bi zor û zahmetiyan afirandiye bilîze, vaye wek hemû kesayetiyên burjiwaziya biçûk wisa xwe ferz bike û biçe. Nabe, bi vê ne dikarin bibin rêveber, ne jî fermandar. Me got ku divê ev bê derbaskirin.

Hinek tevdîrên me hene, vaye ev kom raveya vê ne. Me gelik kom şandin, bi taybet şandinên me yên Botanê çêbûn. Em dixwazin hinek nûnerên xwe bişînin metrepolan. Bi rastî jî divê ku ev rista xwe baş fêm bikin. Xebatên girseyên metrepolan, xebatên rêxistinê, legalîte, pêwendiyên îlegal, xebatên fireh û teng, bi qasî derxistina zanînê, ji niha ve bi pêngavên guncaw dayîna despêkirin û ji bo ku ev qad baş rista xwe bilîzin xalek bivê nevê ye. Û ev jî ne bi hejmarek zêde, bi hejmarek kêm, kadroyên çalak dikare bêpêşxistin û serxistin. Ji bo ku mirov bibe kadroyekî wisa divê bi ser xwe de biçe. Êdî divê mirov ji heq derfetê serkeftinê bê û derfetê serkeftinê jî kes di şexsê xwe de pêk bîne.

Tiştekî jê neyê bawerkirine, lê me bi sedan kadroyên metrepolan afirand. Çûn, hinekî tengav bûne di nav refên me de, xwe davêjin apartmanekê, termê wan derdikeve û bê amadekarî tên girtin. Bi çek, amûr û hemû tiştên ser xwe ji dijmin re alavan pêşkêş dike. Hinekî di nav jiyana şoreşgerî de tengavbûye, xwe radestî dijmin kiriye, lê ne di ferqê de ye. Tiştekî jê neyê bawerkirine! De were û wisa xwe li ser derfetan belav bike. Pêwîste ev bê derbaskirin.  Metrepol jî qadek girîng a şere. Divê ku qet mirov nekeve bin bandora jiyana pergalê. Divê ku mirov bizane hêza pêre têkoşînkirinê rojane raber bike, kêlî bi kêlî pê re di nav têkoşînê de be, wekî din karê metrepolê nayê ser xistin. Dê perîşan bibin û di encam de di nav du rojan de polîs hemûyan dike îtîrafkar. Bêgûman xebatek bi vî rengî bi awayekî din nikare xwe rizgar bike. Encax di destê dijmin de bibe pêlîstokek û perîşan dibin.

Rêya derbaskirina vê, di rast nêzîkatî raberkirin û serkeftinê de derbas dibe. Tê mîlîtanekî baş bî, şiyar bî, pir rêxistinkerî bî, hertim amade bî, çiqas taybetmendiyên tên zanîn hene tê van hemûyan raber bikî, perwerde û rêxistin bikî. Ger tu girseya amade jî nebînî û tu nikaribe yên ku dibêjin; "*Em ji şoreşê re amade ne"* nikaribî derbîxî û ber bi xwe ve bikişînî, kadrobûna te li vir bimîne, encax tu dikarî bibe belaya serî. Derbaskirina vê pir

girînge. Berendamên nû yên kadro teqez pêwîste vê rastiyê bibînin û birêkevin. Qadên legal, ji qadên îlegal bêtir xebatek zêde dixwazin. Kesayetiyek ji qada bejahî zêdetir komî ser hev dixwaze, ji îlegalîtê zêdetir baldariyê dixwaze û jêhatîbûnê dixwaze.

Hûn ê di van mijaran de serê xwe bişixûlînin, li kî derê çiqas îlegalîte, li kî derê çiqas legalîte, çiqas ji bo te, çiqas ji bê hinekî din, tê çiqasî bi rêxistinê bide kirin; ji vê ji çi re, çawa divê têr bike, tê li bersiva hemûyan bigerî. Tê yê amade nebîne û biçe li ser yê amade razê. Pişt re jî bêje; "*Bila şoreş pêk bê"* wê te jî rizgar neke. Di encam de ev kes li serê xwe jî bûne bela. Nizanim gelik tişt hatin gotin û hatin nirxandin. Yê ku dibêje ez ji vê re amade me, divê ku aqlê xwe bîne serê xwe û li ber xwe bidin, bi ser xwe de biçin û ser bixin. Ez ji vê zêdetir nikarim bikim. Divê ku hûn tiştên ku me daye we fêm bikin.

Em çend komên din ên qada bejahî amade dikin. Bi taybet jî em dixwazin bişînin Xarzanê û Amedê. Ev çend rojin em vê jî nîqaş dikin. Tevdîrek demkî ye. Destwerdenên me yên mayînde mîna me hertim kiriye, wê ji niha û pêve jî bibin. Lê di vê zivistanê de jî, bi taybet di vê qadê de, divê dibistana me de dahûrîneke dîrokî hat kirin. Di du astan de jî zelalbûn hat destxistin. Ez dibêjim veguhestina vê pir girînge û raste jî. Evder ber bi Xarzanê ve veguhestin, ji hezaran zêdetir kadro û şervan ronî kirin, zelalkirin, ber bi jiyanek bi anûr ve kişandine. Û ev jî yeksane xebata qadek pir mezin û bi serê xwe şoreşeke. Qadek wek Amedê rêxistinkirin, bi taybetî perwerdekirin, ronî kirin, rêxistin û bi cihkirina hezaran kadro tê wateya bikaranîna sengerek pir mezin a şer ku; niv bi nîv binxistina dijmin jî bi vê dikare bê destxistin. Tenê rêxistinkirina navenda bajarê Amedê, - hinek bajarên din jî yên mîna vî hene, mesele Êlihê, Sîlwanê, nizanim gelik bajarên din hene- gihandina rêxistinek civakî – hemû jî gengazin- tê wateya hilweşîna şerê taybet.

Di bajaran de hilweşîn tê wateya di bejahiyê de jî hilweşînê. Lê em dibêjin rêveberiyek dikare vê bike; nûneratiya rêxistinê, tenê mînakên derdikevin pêşberî me, yekîneyan çawa xerc dikin, çawa dest navêjin qadan, çawa bi derfetên amade dilîzin? Ez ticarî bi feraseta çarenûsê li bûyerên ku diqewimin nanêrim. Di vê wateyê de pir zêde –de îca piştî vê qonaxê û

şûnde- dê karê bê derxistin, ber bi çiya ve bê derxistin, ji bajêr bê derxistin. Kesayetîyek pir baş xwe ji şoreşê re amade kiriye, bi qasî perpektîfê, kesayetiyek hukmî taxtîk dike, derfetên teknîkî û bi qasî wê derfetê kadro û şervanan yên ku pir baş dikarin binirxînin, dîsa yekî rewşa gel jî baş dinirxîne dikare di nav rojekê de pir tiştan bi cih bike. Dîsa dikare di nav mehekê de pir tiştan bi cih bike û di zivistanekê de pir zêdetir tiştan bi cih bike. Dibe ku bingehê serkeftin û serfiraziyê jî pir baş ava bike.

Di vê wateyê de, em dixwazin mudaxleyekê bikin. Bi taybetî vê jî bi komên ku ji qada me derdikevin re, em gelikî li ser rawestiyan. Em ji niyeta baş a hevalan ne bi gûmanin. Ji fedakariya wan jî, lê şoreşgerî jî hunerê afirîneriyê ye. Ji bo serkeftina wê awartebûnê dixwaze, ziravî û afirêneriyê dixwaze. Tê wisa, bi çareseriyê dest bi rojê bike û weke çareseriyê ji nav rojê derkeve. Tê her roja xwe, bike xeleka roja din û xeleka serkeftinê. Tê vê hêzê rabe bike, wekî din tu nikarî bibî xwediyê serkeftinê.

Kadroyên me yên ku vê digirin ber çav kîne? Bi rastî jî xwe amade kirine? Bal bidinê, divê ku mirov wîsa be. Di bingeh de jî divê ku kadro ji xwe bawer be. Lê divê ku ev ne bi şêwazekî nepixok û dogmatîk be. Hîn jî fikarên min ên kûr hene. We pir hêz girt, kî dizanê wê jî çawa çarçûr bikin û hûn ê bikin. Hûn nizanin we çawa hêz jî girtiye. Em devjê berdin hûn bizanibin hêz çawa bikar bînin, hûn vî hêzî jî bi ferdiyetek mezin bikar tînin. Heta hûn bi wê re şaşî û kêmasiyan bi kûranî didin jiyîn. Tevî ku ne maf û rayeya we ye jî. Ya rast nêzîkatiyek rast heye û ew jî hatiye gotin. Me ev jî daniye pêşiya we. Lê ne li gorî dilê we ye. Şêwazê kirina we ya burjuwaziya biçûk ango –dahûrên kesayet ên tên zanîn hene- hinekî aliyê wê yê rastgir fêm kirin, şêwazê gundîtiyê, fêlbaziya bajarvaniyê, şêwazê rewşenbîrî hinekî kar tevlîhev dike, ber bi demogojiya kar ve direve, ber bi fêlbaziyê ve dibeze û bi vî rengî têk dide. Divê ku ev bê derbaskirin.

***Fermiyet; di wateya leşkerbûnê de, siyasîbûnê de, di wateya bi qûral tevgerînê de divê ku bê nîşandan.***

Lê ehbabçawîşî û herêmgeriyek kûr serwere. Dîsa paşverûtiyên hovane pir serwerin. Ji aliyê ruhî û moral ve ji armancên xwe qut bûne, ji rastiya şer qut bûne, lê ne di ferqê de ne. Rêveberê herî jî xwe razî jî bi vî karî re mijûl nabe. Moralê

şervanan tine bûye, lê ne di ferqê de ye, çiqas girêdana şervanan bi armancê ve heye, ne di ferqê de ye. Ma fermandarî û rêveberiyek wisa dibe? Lê ji sedî nodên ku niha serwerin rewşa wan wisa ye. Gelo ev fermandar wê îmzeya xwe bavêje binê kîja serkeftina mezin? Ger ne di ferqê de be, lê ji xebatek teqez divê pêdiviya wê pêk bîne dûr raweste gelo çiqas dikare afirîner be? Tevî ku em van pir zêde vedibêjin jî, ez hêjî wan bi hêz bikim, lê bila ew jî xwe noq bikin. Nabe! Êdî vê ne di gotin de jî, divê ku hûn bi gavên xwe yên pratîkî jî bi hostatî derbas bikin.

Ji bo qada Xerzan û Amedê nîqaş dikare bê pêşxistin. Em ê di pêvajoya kongreya xwe de, bêgûman di zivistanê de zêdetir kûr bikin. Lê ji niha ve wek mînak me hinek nirxandin pêşxistin. Û em ê hîn jî pêş bixin. Kêm zêde nirxandina Amedê hatiye kirin. Dahûrîna Xerzanê, Partî ber bi wir ve veguhestin, dîroka şerê çekdarî, taybetmendiyên kesayet, rewşa yekîneyan, rewşa rêveberiyê, senger girtin, pirsgirêkên binkegirtinê, şêwazê şer ê ku bê pejirandin, pîlansaziyek nû ango bi xetên sereke perpektîf vê tîne ziman û hêza erêkirina vê wê kadro be. Hem jî bi gavên pir di cih de, weke ku pir zêde hat gotin roj li ser roja din zêde bike û hewldanan di cih de bide rûnişkandin. Ji kê re, kîja şervanî re divê nêzîkatiyek çawa bê raberkirin, kîja yekîne çawa bên damezrandin, bi hejmara xwe ve, çawaniya xwe ve li kî derê binke bigire, bi kûrahî û berfirehiya xwe ve li ser bingehê peywiran, divê ku dem û şêwaz bê diyarkirin û naçare ber bi serkeftinê ve biçe. Ez wisa dihizirim ku mirov bi asanî dikare van ser bixe. Ev yeke, ji kî derê re, ev yeke divê çawa şer bike û ev fermandar divê ku çawa xwe bigîhînê? Mercên vekirî hene, xalên sereke yên rêvebirnamê hene.

Kî dikare bibe fermandar? Feraseta fermandarekî ya binke girtinê, feraseta lidarxistina çalekiyekê, perwerdekirina yekîneya xwe, feraseta rêvebirinê êdî zelale, pêwîste bê sepandin. Camêr diçe, şêwazekî hemû tiştî ser û bin dike ferz dike. Divê ku ev bê venerînkirin, rê lê bê girtin. Heta niha jî ketina gundan bi xeletiyan dagirtiye. Ketina kemînê, kemîn danîn bi xeletiyan dagirtiye. Heta niha jî gêrîlatiya ku em bikarin jê rê bêjin xedar û şerkeriya vê nehatiye pêşxistin. Ez di vê baweriyê de me ku bi vê hêza şer gêrîlatiyek pir baş dikare bê sepandin. Ez ji vê jî ne bawerim ya ku heta niha hatiye pêkanîn ne çarenûse û ji vê

zêdetir nikare bê kirin. Berevajî, bi hesanî dikarim bêjim bi awayekî herî xirab bi gêrîlatiyê lîstin û ya herî xirab kirin ev e. Pir zêde xirabî bi xwe jî kirin. Bêgûman ev jî çavkaniya xwe ji kesayet digire, ji xwe perwerdenekirinê, nebûna endamê partiyê û nebûna leşkeriyê digire.

Divê ku serê pêşî mirov bizanibe bibe leşker, beriya wê jî bibe endamê partiyê.

Xwe fêrî pêdiviyên wê bike, bi xwe bide xwarin.

Divê ku hûn baş bizanin uslûbê hûn şayanî xwe dibînin, taybetmendiyên kesayetî bêwate ne, ber bi xeletiyan ve dibe û cihê ku vala derdixe hûn ê hilweşin, bên derbaskirin. Ger pêwîst bike hûn ê bi çeqo jêkin û bavêjin.

Îro em li Amedê dimêzînin, kesayetiyên nîv feodal, nîv burjiva cîrîda davêjin. Îsyangerê çors, bi lez ji hişmendiya me ya şer qut dibe, ji şêwazê jiyanê qut dibe û ev jî yeksane felaket, windahî li ser windahiyan. Heta niha jî li gorî erndnîgariyê senger girtin nîne. Carekê tu lê dinerê di deştê de ketiye şerê senger; tu lê dinêre karê di deh, panzde xulekan de bê temamkirin, li rojekê belav kiriye; tu lê dinêre cihê ji yek du kesan zêdetir tu nikarî tê de bi cih bikî, yekîneyek gêrîla tê de bi cih kiriye. Ango nêzîkatiyên wisa jixweber. Tu lê dinêre karê du kes dikarin çareser bikin, yekîneyek erkdar kirine. Di hedefek du gêrîla tê de fedakirin qet neyê qebûlkirin, taximek feda kiriye.

Ev xeletiya mezin ya hesabkirinê ye, tawane heta dawî belave û heta niha jî tê jiyîn. Ma mirov nikare rê lê bigire? Belê, rê li hemûyan jî dikare bê girtin. Bi aqlê saxlem, bi aqilê artêşê yê saxlem hemû jî dikarin bên serxistin. Mantiqê; “*Ez ji vî karî re heme û bi îda me”* dikare van hemûyan derbas bike. Kesayetiya ku dibêje; “*Ez di vê çûyînê de pir bi biryarim, pêdiviya min bi demê heye, pêwîstiya min bi bêhnvedanê heye. Lê ez dikarim hemû tiştan pêşwazî bikim”* dikare pirsgirêkan çareser bike. Lê haya xwe ji hejmara yekîneyan jî nîne. Qet haya xwe ji şêwaz nîne, kî li kî derê ye, çi çawa dijî, ne di ferqê de ye. Xwe mahkûmî tengbûnê, zimandirêjî, yarentiyê kirin heye. Eşkereye ku tê nikaribe di vê qadê de şer pêş bixe. Encax bi zor û zahmetiyê tu bikarî bandor û derfetên partiyê li derdora xwe kom bikî. Ya ku tê kirin jî hinekî ev e.

Kesayetiyek fermandar a ku pêngavên dîrokî bi vî rengî nabe. Qet pêdivî bi xwe xapandina xwe nîne. Hûn ê bi destê xwe bikaribin çi bikin, ji wîjdan û mantiqê xwe bipirsin û wisa biryar bidin. Bi qasî îdaye, divê ku hûn keda wê jî raber bikin. Ne zahmete, ji vî çiyayî re ev yekîne û ev şêwazê şer pêwîste. Mirov di vê rêyê de wisa diçe, wisa dikeve vî gundî, em ê li ser vir çalekiyek wisa ferz bikin, rojane pîlankirina van ne zahmete û ne jî bêderfete.

Feraseta gelikan a şer bi qederperestiyê ve girêdayî ye. Ev hişmendiya; "*Tiştê ku bê serî em dê bikşînin, çi derkeve pêşiya me em ê lêdin; ger hêştir jî derkeve em ê lêdin, kêç jî derkeve em ê lêdin, em ê gule li hêştirê jî bireşînîn, li kêçê jî"* ye. Lê kêç di navbera du tilîyan de jî dipelçiqe, fîşek jî hêştir li nav nabe, tenê roketek dikare li nav bibe. Di vê baweriyê de me hesabê van kirin zêde ne zahmete, lê li gorî yê me pir zahmete. Şêwazê şerekî wisa ye, bi taybet şêwazê bi ser hedefê de çûyînê hemane. Ango ji hev cudanekirina hêştir û kêçê. Hîn gelik kêmasiyên dişibin van hene. Ango nabe, ma qet rêbertiyek taxtîkî ya wisa dibe?

Ji bilî vê gelik taybetmendiyên kesayeta fermandar ên ku bi vê re nakokin hene. Camêr îsyangerê feodale yan jî nehatiye perwerdekirin, lê gelik raye dane destê wî. Ma ji bilî çarçûrkirinê wê çi bike? Ma ev fermandarî dikare ji vê wêdetir biçe? Nikare biçe, jixwe mînakên vê jî pir zêde ne. Bi giştî ev di gelik qadan de heye, li Amedê, Xerzanê, pir zêde tên jiyîn. Divê ku ferasetên wisa yên fermandarî, yên yekîneyê bên derbaskirin. Weke min got, erdnîgariyê ez ji vir dibînim. Lê ew li wir nabînin. Erdnîgarî heye, cihê ku roja despêkê mirov biçê ye, hem jî bixedarî, lê heta niha jî neketine vê erdnîgariyê. Çiye, zahmete, xwarin lê nîne. Li gund xwarin heye, bikevê bişkê, bikevê bide şikandin. Ma ev ketina gêrîla ye? Gelik mînakên dişibin vê yên ku bi jiyana gêrîlatiyê re nakokin tên raberkirin. Bêgûman encam ne serkeftine. Ev şer, bi vî şêwazî ber bi binketinê ve dibe. Weke min got, dîtina van zêde ne zahmete. Dihizirim ku ji niha û şûnde nirxandina çiyê, nirxandina ketina gundan, vesazkirina çalekiyê, herî zêde jî yekîneya vê avanekirin, leşker û fermandarê vê pêkanîn ne zahmete.

Tiştên ku hûn zanin divê ku hûn tenê di zanînê de nehêlin. Vê veguherînin kesayetiyek fêmkirî û ya li ser vê lêhûrbûyî. Piştî

wê jî divê ku mirov veguherîne şêwaz, qûral û hêza yekîtiya madî. Hûn hinekî dizanin, fermanan jî didin û wisa fêm dikin dê paşê pêk bê. Ne wisa ye. Ez li ser esasê ezmûnên xwe dibêjim, zanîn têr nake, qûral têr nake, tê di dil, mêjî û serî de bi cih bike. Pê re yek pare bike, tê yekeyê wisa ava bike, leşkerî wisa ava bike û fermandar jî wisa ava bike. De îca em lê binêrin bê ka wê şansê serkeftinê çawa li pê were. Hûn nikarin vê bikin.

Di dema borî de hemû hevalên ku di rêveberiya taxtîkî de cihê xwe digirtin, wisa dizanîn ku dê bi çend destnîşankirinan karên giştî jî wisa bimeşînin. Min jî wisa texmîn dikir, lê başê min aqlê xwe da serê xwe û vaye wisa hinekî hûn xistin nav lêhûrbûnê. Ev lêhûrbûn jî sînordare. Ger ez li qada şerê germ bûma, min ê deh qatê vê lêhûrbûn pêk baniya. Ji vê zêdetir rêxistinkirin, ji bo vê perwerde, sengergirtinek paştir bikira. Bêgûman vî karî li vê qadê ewqas dimeşînim. Dîqat bikin, ne qada şerê germe, gelo ez li wir bûma minê çi bikira. Lê hûn ji vir rizgar dibin, gavekê diçin wî milê sînor hema dev ji xwe berdidin. Bêgûman ya ku hûn dê bijîn linavçûne.

Dibe ku hûn bi xêra me dijîn, lê encam teqez binkeftine. Dibe ku li vir sistbûnek çêbibe, lê li wî milê sînor, de îca piştî ku derbasî qada şerê germ bûn, ji bo serkeftinek berz mîna bahozê tevgerîna we jênereve. Hûn ê hinekê kesayet, şêwaza û tempoya xwe wisa amade bikin. Tengavbûn jî çiye? Di şer de, kesayetiya fermandar de qala gotinek bi navê tengavbûnê nayê kirin. Dikare qala wizeyek bilind, kedek bilind û nemaze encamekî bê kirin. Diçin; "*Fermandarî cihê rehetbûnê ye, cihê li ser pişta şervanan xwe dayîna jiyankirinê ye.*" Ev xiyanete, tawane. Fermandariyek wisa nabe. Em ji we re dibêjin van hemûyan bavêjin. Kesên ku dibêjin; "*Ez ê heta dawî wizeya xwe xerc bikim, heta dawî mîna bahozê tevbigerim. Di vê qadê de beliniya vê serkeftinê didim*" û yên ku vê jî di pratîka xwe ya rojane bi gavên şênber îspat dike dikare bibe fermandar.

Li gorî vê nirxandinê, ma destnîşankirina kesayetiyek fermandar zahmete. Û heta niha yên ku bi zexeliya herî mezin li hev dikin, ehbab çawîşê hev in, di bin re kar wisa bi rayeyê, bi rêveberiyek erzan digirin dest qaşo fermandariyê rêve dibin. Divê ku bê derbaskirin, divê ku şervan jî bibe şervan, gelo zahmete? Camêr hatiye jiyana xwe daniye holê, wî di nav xwe de bihelîne.

Ez li vir bi axaftinekê çawa we di helînim? Hûn salekê bi taximekî re mijûl dibin, ma hûn nikarin wî amade bikin? Gelo yê ku nikare wî amade bike, dikare bibe fermandar?

Tenê şevekê heta sibêhê axaftina wî jî, ji bo yekîneyekê di xeta PKK'ê de amadekirinê têr dike. Ger karê di şevekê de dikare bê kirin tu taloqî şeş mehan bikî, bêgûman dê yekîneya te bireve, belav bibe, nizanin dê linav jî biçe. Divê ku êdî ev jî bên dîtin û tawane. Em ê zivistanê bi berfirehî li ser van rawestin. Jixwe dahûrînên heta niha jî heta dawî rê li vê vekirine. Jixwe konferans hatiye lidarxistin, girêdayî encama belgeyên konferansê; em ê vê careke din ber bi encam ve bibin. Ji bo vê jî darizandinekê, em ê di her astê de bikin û ber bi encam ve bibin.

Yekîneyên ku ber bi biharê ve me amade kirine, wê ji yekîneyên ku heta niha em pê dihizirîn pir cudatir bin. Dîsa şerê ku me dimeşand, teqez wê şerekî cudatir be. Êdî em ji vê re dibêjin şerê rasteqîn. Em ê bi temamî bikevin nav şer, em heta niha hinekî têkilî şer bûn; ji niha û şûnde tenê ne têkil bûn, şerekî, rûbirûyê hev bimeşînin. Wê ezmûneke me ya şerkeriya wisa çêbibe. Hûn naçarin li gorî vê xwe amade bikin. Bêgûman dema ku vê dibêjim, ez dîsa weke hûn fêm dikin venabêjim. Wê dîsa gêrîla hebe, wê dîsa ne diyar be li kî derê çawa lê dide, di vê wateyê de dibêjim. Ger na biçe di sengerê de asê bimîne, çavsor be, direnede be, çavsorî û afirêneriyekî wisa nabe, ev wê te îmha bike. Kûrkirina şêwaz gengaze. Di şer de ya herî xirab qederparêziye.

Şer tam hunereke. De îca di şerê gelerî de ev bi temamî wîsa ye. Hûn ê niha ewqas xwe tengav bikin û nebêjin bê derfete. Windahiyên ku hun didin berçav, ger hûn di şerkeriyek di vê wateya ku min gotiye de bigirin berçav tenê ne gund, hûn ê bajaran fetih bikin. Hûn ê niha bibûna serwerê qadan. Yekî van windahiyan digire berçav, hinekî van derfetan dinirxîne dê niha li pê serfiraziyê bûya. Êdî em dixwazin we ji eşqîyatiyê rizgar bikin. Hewceye ku hûn vê bibînin. Ger em destwerdana Amedê nekin, di demek pir kurt de hûn ê bibin bermahiyên eşqiyayan.

Şer hunere û ger bixedarî li ser bê rawestîn; bi rastî jî hunerekî bi perwerdê, siyasetê, bi kesayetiyek çalak hunerekî serxistinê ye. Ez yên ku ji welat tên dibînim, hundirê hemûyan hatiye valakirin û tinekirin. Ji xwe re dibêjim; "*Ev çine.*" Ma

diviya bû wisa bûna? Şer hunere, diviya bû bi wê dagirtîbûna. Ji bilî serker dişibin her tiştî. Ji min zêdetir sivîl bûne, têkiliya xwe ji kesayetiya şerker qut kirine. Bûne bela û tên vir. Ma kesên ku bi salan di qada şer de man gelo tiştek fêm nekirine? Çima hûn fêrnebûn? Ecêbe!

Divê ku mirov ji we pirs bike, ma hûn ewqas bêrêzin, li beramberî welatê xwe, gelê xwe, qûralên partiya xwe ewqas korin. Em li vir bi derfetên pir kêm cîhanê îdare dikin. Tevgera netewî îdare dikin. Hûn nikarin xwe îdare bikin, divê ku mirov şerm bike. Hûn rast xwe bikar nayînin. Ma şer hunerekî wisa korane bê îcra kirine? Piştî wê jî mîna bavê xwe bêje; "*Li ser razê, çarenûse, tişta ku bê serî em dê bikşînin*" na, hemû derew û xeletin. Hûn ê dev ji van berdin. Xapandin nabe, di hemû hunerande xapandin dibe, lê di şer de nabe. Hunerê herî rasteqîne. Hunerê herî zêde şiyariyê dixwaze, zanabûnê dixwaze, pîlansaziyê dixwaze, hunerê şere.

Diçin, rehetiya ku di civakê de nabînin, dixwazin di nêvenga şer de bijîn. Ev bi temamî berevajî kesayetiya şere. Ezmûnên min bi xwe hene, ango tevî li vir derfetên jiyanek rehet heye jî, bi qasî bi ti demê re neyê qiyaskirin, ez ji hemû elametên jiyanê dûr ketime. Ne wek tê xwestin derfetê razanê, ne yê xwarinê, ne jî yê henase girtinê heye. Şer li gorî xwezaya xwe wisa ye. Ev şîdeta şerê ku pêşket wisa li min kir, hem jî ji dûr ve. Hûn di nav de ne, ji min zêdetir divê ku hûn wisa bin.

Têknedana rehetiya xwe, xewa xwe, her roj sê dan xwarina germ xwarin û amadekirin ne li gorî gêrîla ye. Ev ji rêzê ne û gelik tiştên din hene. Gelik heval rehetiya ku di pergalê de nedîtine, ber bi di nav refên partiyê de dîtinê bez dide. Nêzîkatiyek xelete, rizgarvan wisa nabe, bi vê felsefê, bi vê ferasetê encax di nav refande dikare bibe bela. Divê ku di van mijaran de hûn ji bingeh ve gûhertinê pêk bînin, ji bo guhertina vê platformên nîqaşê pêş bixîn. Binêrin ez her roj ji bo we çawa pêş dixim. Ger ne sîxurin, ne kesayetiyên îflah nabin, hemû bi nîqaşek du nîqaşan dê werin rê. Jixwe sîxur be wê li gorî zagonên şer bê darizandin. Ger nebû dê di pênc rojan de bê tasfiyekirin. Divê ku hûn êdî vê bizanin, ji ber ku dibêjim; "*Bi zagonên şer nayê lîstin.*"

Kesayetiya vê qadê, nizanim kesayetiya Mêrdînê, ya Amedê, Dêrsimê, Serhedê û ya Botanê em mahf kirin. Ger ji sedî dehê wan van qûralan pêk tînin, ji sedî nod jî vala derdixin. Qet nebe em xwe bigihînin asta nîv bi nîv. Bi hewldanên me yên kesî jî ev şer meşandin zêde ne watedare. Dijmin vê dibêje; ev şerê ku kesekî daye despêkirine, şerê kesek dimeşîne, ger ew tine bibe dê şer jî bi dawî bibe. Ev bendewariyek mezin a dijmine. Ji bo ku ev pêk neyê, pêdiviya we bi şerkeriya we bi xwe heye. Temam, min şer pêş xist, bi min re binketin nîne, heta ez henase bidim û bistînim ango ez ê ber bi sedsalan ve jî veguhezînim û ev karê min e.

Karên ku hûn bi xwe jî pêk bînin hene. Karê we di qadan de pêkanîna me ye. Tiştên ku we ji me girtine li wan dera temsîlkirin erkên we ne. Hem jî bixedarî. Wekî din hevrêtî nayê kirin, wekî din mirov xwe naspêre hêza rêbertiyê, derfetên partiyê nayên dest girtin. Wê di qirika we de bimîne û we şaht bike. Qûral hene, xalên sereke yên rêbertiyê, yên pariyê hene, ger tu van li aliyekî bihêle, ferdiyeta xwe, ezeziya xwe ferz bikî dibe ku tu bibî pêşnûmeya axayekî. Lê di mercên şer de bi vê axatiyê tu yê bibî bela serî. Hûn ê van tevan ji hemû aliyan ve fêm bikin, kesayetiya ku tê xwe bigihîne kesayetiya fermandar a ku tê fermankirin. We heta niha bi fêlbaziya gundîtî jiyankir, bi fêlbaziya burjiwaziya biçûk jî, lê ji niha û şûnve ne gengaze. Ez jî nikarim qebûl bikim û rastiya şer jî vê qebûl nake.

Belê, ji bo Amedê, Garzanê û ji bo hemû qadan ez çima carek din van hemûyan diyar dikim? Heval diçin, ji bin dernakevin. Niyeta wan başe, lê nikarin bikin. Hinek kesên ku kesayetiya xwe dikin bela, hema bêje van hemû derfetan ber bi binketinê ve dibin. Heyfa ewqas şervanan, heyfa niyeta wan a baş. Divê ku mirov bê eman bimeşe, lê bi hostayî û bi pîlan. Vê têkoşînê hemû –tevî hemû rexneyan jî- mîna ava binê kayê ango mîna mar bi zimanê xweş ji kunê derxistinê ez çawa dimeşînim? Şikandin û xirakirin nîne, ji karîyerîstan, ji provakatoran re derfet dayîn nîne. Ger pêwîst bike ez vê jî bikar tînim. Tevdîrên min hene, tu kes nikare serî hilde.

We Rêbertî dît. Ez kê çawa di xebitînim, kê çawa araste dikim, qadên çawa di afirînim, qadan çawa dinirxînim, ji sifirê çawa didim despêkirin? We hemû dîtin, bi hemû aliyan ve min

nîşanî we da. Hûn ê hinekî vê bisepînin. Me ji aliyê teorîk ve da û ji aliyê pratîkî ve jî pêşkêş kir. Hûn ê hinekî bi xwe bidin xwarin. Wekî din hûn dê nikaribin jiyana xwe jî pêk bînin. Ger hûn li ser vî bingehî bin dê meşên we jî, têkoşînên we jî serkeftî bin û dê encamên baş jî bi xwe re derxîne holê. Em jî dixwazin bi vî çavî binirxînin.

Ger kadroyê demê wisa be encax bikare ji şerê taybet re bibe bersiv. Berevajî bi encamekî cuda re rûbirû mayîn jî mijara gotinê ye. Naxwazim hûn bên xapandin. Heta ji we re nabêjin; "*Werin bibin, rica dikim, peywirê bibin.*" Ger hûn divê çarçoveya ku hat gotin de amade ne, heta dawî ger hûn ê camêrê xwedî li sozê xwe derdikevin bin, hem jî li horî vê amadekariyên we temam in peywirê bigirin, ger na di cihê xwe de rûnin. Bi van karan nelîzin û nebin qurbanê hewesên xwe. Weke meseleyek grûrê jî nêzîk nebin. Ev kareke û bi temamî karekî pisporiyê ye. Rojana hemû dema xwe, bi awayekî hosta karê xwe eyarkirinê ye. karê sebrê ye, înadê ye, tempoye; ne şêwazê xebatek ji rêzê, tempoyekî ji rêzê ye, pergalek kar a ku leza xwe, şêwazê xebata xwe wisa ye.

Bawerim hemû şagirt û kadroyên dibistana me ev rastî dîtin. Yên ku çûn, yên mayî jî naçarin hêdî hêdî biçin. Mirov dikare gelik xalên din jî pîlan bike, dibe ku rêziknameyên hûr û kûr jî pêwîst bikin, ev jî karê we ne. Bêgûman em hemû tevgeran jî bi qûralan ve girênedin. Şêwaz jî, tempo, naverok û teşe jî dikarim ji hemû aliyan ve diyar bikim, lê ev karê we ye.

Karê xwe bi min dayîna kirin zêde ne aqilane ye. Ji ber ku hûn ê bi tena serê xwe bimînin û bimeşin. Ez ê li vir bikim, li cihekî din nakim, tê bilikime. Divê ku her kes baş bizane karê xwe bike. Alîkariya hevaltiyê dibe, lê hertişt jî bi hinekî din dayîna kirin ango bi hinekên din kirin, bi şervanan dayîna kirinê dê we tine bike, vala derxe û di encam de ya herî zêde jî di nav refên me de tê jiyîn ev e. Divê ku êdî mirov bikare dawî li vê jî bîne. Em hem vê hêvî dikin, hem jî li benda vê ne. Hem bawer dikin, hem jî jê bawerin, hûn hinekî peywirdarên wisa hatine amadekirinin. Ger hûn li ser vê bingehêne divê ku îdaya we temam be.

Rewşa serkeftinê çiye, li pêş çavên we ye. Ji çi re serkeftin tê gotin, çi binkeftine? Divê ku ev bi temamî bê fêmkirin.

Serkeftina ji zivistanekê re hatiye diyarkirin çiye, wê çawa bê pêkanîn? Divê ku kêlî bi kêlî li berşav bê girtin. Girêdan bi armancê ve ger hûn kêlî bi kêlî bînin berçav, hûn ê bikarin bi kîja amûran û çawa divê xwe bigihînînê jî bibersivînin. Em hinekî raveya vê ya rêbertiyê ne û we hemû dîtin. Bêgûman qad çawa mîna herêman tên dabeşkirin, herêm çawa mîna mintîqan tên dabeşkirin, ji her herêmekê re divê kî bê dayîn, çiqas bê dayîn divê ku mirov van bi hemû ziraviyan ve lêkolîn bike. Dîsa wê yekîne çawa binke bigirin, veşartîbûna wan çawa be, bin erdê wê dê çawa be, kûrahî û firehî çawa be, bi lêkolînê û bizat di qadan de berpirsyarî girtinê gengaz dibe.

Xebatên eniyê, dê bajêr çawa bi bejahiyê ve bê girêdan, ji bejahiyê bajêr çawa tê rêvebirin, li wir tê diyarkirin. Min bi xetên giştî diyarkirin, ji hev cudakirina herêm, mintiqe, gund û bajaran zêde ne zahmete. Dîsa di kûrahî, firehî, senger, tevgerîn, çalakî, pîlan û van tevan de pîvan hene, lê sepandin karê we ye. Mafê we yê miradê me di ber me de hiştinê nîne. Mafê we yê erzan windakirinê jî nîne. Ger hûn miradê me di ber dilê me de bihêlin hûn ê winda bikin. Wê Rêbertî rêberiya xwe bike, dîsa ew ê bi xwe bimeşîne, mesele xwe meşandina we ye.

Lê ne weke ku we heta niha meşandiye, hûn di rewşek perîşande derdikevin pêşberî me. Piştî ku bi salan şer dikin û şûnde, piştî ku we deh salan şer kir diviya bû hûn weke generalan derketana pêşberî me. Ger na ne wek leşkerên îflaskirî, ev ne şayane. Ez ê jî rojekê derbasî welat bibim. Lê hûn ji niha ve dikarin şêwazê derbasbûna min texmîn bikin. Ez amadekariyan dikim, ez jî xwediyê vê xebatê me. Ma rûyê leşkerekî îflaskirî bi min re heye? Madem hûn jî hinekî bi Rêbertî ve girêdayîne, di qadekê de xebitîna we, du-sê sala mayîna we, divê ku bibe derfetê serkeftinekê û hûn bibin xwediyê meşek navdar. Ya şayane ev e, ya tê hêvîkirin ev e û ya rast jî ev e.

Mixabin heta niha ti hevalên me ya ku şayanî me ye, em hêvî dikin û ya tê emir kirin temsîl nekirin. Barkirî çû, vala derket; hat, îflas kir. Çima hûn şayanî xwe dibînin? Dema ku ez jî hatim vir tiştekî min nebû. Hûn ê bêjin, tu bi aqilî, fêlbazî, bêgûman ez bi aqilim, fêlbazim, bêgûman ez ê hertiştî li gorî pêdiviya dozê bigirim dest. Tu jî wisa bikî, derfetên ku bi min re nînin bi te re hene. Lê te nekarî bikar bînî, derfet nenirxand, te

nezanî li gorî doza rasteqîn xwe bixebitîne, te xwe bi evdalî girt dest, bi evdalî winda kir yan jî li gorî fêlbaziya gundîtî girt dest û winda kir. Ma fêlbaziya gundîtî dikare zêde qezenc bike? şêwazê rast qezenckirinê şêwazê me ye û di holê de ye. Bi şêwazê xebata me, bi ser hertiştî de çûyîna me di holê de ye, wisa tê qezenckirin.

Hemû marîfeta min, dehaya min a polîtîk, taxtîkê min ên polîtîk li gorî bingehê qezenckirinê û ev jî tiştekî başe. Li beramberî gel pir başe, ji bo dîrokê başe, ji bo we jî başe. Şûna ku ez bi şêwazekî îflaskirî derkevin pêşberî we, qet dernakevim. Jixwe em sifatekî Rêbertiyek wisa jî şayanî xwe nabînin. Ez ê xwe veşêrim, herî kêm bêjim şerme. Weke ku piraniya we nebûne xwedî serkeftineke cidî, bi awayekî îflaskirî hûn derdikevin pêşberî me dibin bilbil. Divê ku hûn dev ji vî uslûbî berdin, bi qasî serkeftinên xwe baxivin.

Ez nabêjim bila îdaya we nebe, bila îdaya we mezin be, em ê dîsa piştevaniya we bikin, lê êdî hûn jî xwe bigihînin şêwazê rast. Bêy ku hûn ser bixin dernekevin pêşberî mirovatiyê. Bi gotinek xweşik, bi pîlanekî baş, di arastekirinek de baş derkevin pêşberî yekîneyê, pêşberî herêmê, ger hebe platformek berfireh divê ku hûn bêjin ez ê derkevim pêşberî wê. Şêwazê rast ê Rêbertiyê û derketina wî wisa ye. Yên herî zêde şikayet dikin, yên kelogirî tên û hewl didin derdora min dagirin. Nekin! Temam we guhdar dikim, lê ev li we jî nayê. Ya ku şayanî we ye bi aqilbûne, serkeftî meşe. Herweha em piştevaniyek mezin didin perwerdeya we, li her derê û her demê hewl bidin şayanî vê bin. Wê demê mirin ji kîderê ve tê bila bê. Ger jiyan jî hebe, li ser vî bingehî ya herî zêde şayane.

Hêvîdarim di vê çarçovê de komên me, gelik nûnerên me yên qadan bi ser demê de biçin. Me heta dawî lêhûrbûn kir û ger em wisa dewam bikin dê derfetên serkeftinê zêde bibin. Dijmin şerê xwe yê taybet heta vê zivistanê jî ferz kir, lê vala derket. Yên ku em jî li ser zivistanê ferz dikin, dibe ku serkeftinê care yekem di vê biharê de em bikarin dest xwe bixin û wisa derkevin holê. Azwerî ev e, kelecan ev e. Dilê ku vê bibihîze tê teqînê çêbike, hemû corê afirîneriya hizrî û dê hilberîna taxtîk pêk bîne. Divê ku hûn xwe bikin xwedî şansekî wisa. Qet nebe di asta şansê niha wisa nirxandinê de xwe bigirin dest. Jiyan, şansê carêkê bê bikaranîne.

Ger hûn biwestin, cihekî we çû, tê wateya ku we ev şans winda kiriye. Ji bo ku hûn wida nekin hûn ê bi awayekî awarte xwe birêxistin bikin û xwe bigihînin raveya vê ya bi pîlan. Kesayetiyek dîrokî ya cidî, mezinbûna kesayet bi vê şêwazê dike. Qet nebe em jî dixwazin mînakên vê di dema pêşiya xwe de di kesayetiyên demê de bibînin.

Hûn soza xwe li ser vî bingehî didin û hûn her tim soza didin. Dubare dibêjim; ya ku herî zêde şayane ev e. Ya ku herî baş me ber bi jiyanê ve jî bibe ev e. Bila tu kes ne xwe, ne jî min bixapîne. Ji ber ku pêdiviya we bi xapandinê nîne. Divê ku em ji serkeftinê jî bawer bikin. Keda mirov, ger bike armanc tişta ku sernexe nîne, em dikarin wisa jî pênase bikin. Çima wisa dibe? Ez jê hêrs dibim, ji kesayetiya ku nikare serbixe, kesayetiya tevî ewqas rastiyan jî nakeve arasteyek rast hêrs dibim. Li şûna ku hûn ê wisa derkevin pêşberî me, wisa di nav refan de bimînin; yan bikevin binê erdê, yan jî biçin gel dijmin.

Cudabûnên rêyên wisa şayanî xwe nebînin. Şayanî tu kesî jî nebînin û derfet jî nedinê. Divê ku meşa ber bi qadan ve wisa be. Dema ku wisa be jî wê dîsa jî windahî çêbibin. Dibe ku di encamê qezayekê de jî hûn winda bikin, ez ji bo vê tiştekî nabêjim. Şere, dibe ku gelik tişt jî bên serê mirov. Dibe ku ji dervî îrade we be jî, lê tenê kesekî ji rêzê jî bimîne, ger wisa bi meşîne, dikare serkeftî vî karî heta dawî bibe. Em rewşên qezayan liberçav digirin. Em dibêjin dibe ku hinek xalên ne di hesab de jî encam bi me nedin girtin. Lê ger ev nebin, hertişk weke ku hatiye pîlan kirin bimeşe, biqasî derfet tên nirxandin, egeriyên tesadufan jî hene, ger ew jî derketin pêşiya we, ger em fersendan binirxînin, yeqîn dikim dê derfetên serkeftinê zêdetir bibin.

Divê ku hûn êdî vê teqez fêm bikin, bi temamî kesayetiyên xwe li gorî vê amade bikin. Her cihê ku hûn biçinê ber bi avakirina kesayet û rêxistinek wisa ve biçin. Ger pêwîst kir bibin xizmetkarên pir baş, pêwîst kir bibin rêveberekî baş, pêwîst kir bibin fermanberekî baş –ger hûn guncaw dibînin- bi ser de biçin û ev kar wisa dimeşe. Hêjî bi dijwarî pêdiviya we bi vê heye. Ji bilî vê ti rêyek din a jiyanê jî nîne. Ez jî perpirsyariyê nagirim. Min berê jî got, niha jî bi hemû aliyan min vekir. Ez dubare dibêjim, ya rast jî eve.

Wekî din ez ê çawa we ji vê bejnkurtiyê rizgar bikim, wekî din çawa we ji vê rebeniyê rizgar bikim? Hûn di nav vê cîhanê de nexweşekin, em ê bi mîlyonan yên weke we ber bi kîderê ve veguhezînin? Ger hûn derfetên pir baş hatine amadekirin jî bikar neyînin, karên ku bi asanî dikarin bên serxistin sernexin, kî yê we qebûl bike û êdî ez naxwazim bi mînakê mirovên wisa nexweş, windakirî re rûbirû bibim. Ev ne çarenûseke, ne jî ti fêda wê ji kesî re heye. Jixwe ji aliyê me ve ya ku herî zêde divê mirov jê nefret bike jî ev e. Me ev ji we re got, we bi baldarî dît. Vê carê li gorî min mirov dikare biçe hinek qadan.

Ger hûn li wir pêk bînin dê xêrûbera we hezar qat zêdetir bibe. Ger hûn nekin jî, em ê tevdîrên xwe bigirin. Nexasim ez bi xwe, bi biryarim ku dema pêşiya me wisa bi dawî bikim. Li gorî vê hûn jî xwe di nav xebatan de belav bikin, kesek jî dikare gelek karan bike. Dikare herêmekê, eyaletekê jî pir baş bike. Ev ne karê ziraviyê ye, karê çawaniyê ye. Li metrepolan çen nûner dikarin rê li ber karên pir mezin vekin. Divê ku mirov ji vê jî bawer bike, hem jî divê ku mirov şênberiya van derfetan jî bibîne. Şêwazê bikaranînê jî, hostatiyekê, êdî ew jî li ser kesayetiya we ya ku dixwaze derketinek dîrokî çawa bike dimîne. Mezînbûna îdea ya we û bê ka hûn çiqas bi qûralan –jixwe divê ku ji hemû aliyan ve mirov wisa be- pêk tînin ve girêdayî ye.

Li ser vê bingehê me ev dewra xwe bi dawî kir, weke min got hêdî hêdî ber bi qonaxeke nû û em ber bi zivistanê ve vediguhezînin. Amadekariyên kûr ên biharê, lê bihar û zivistana vê nîne, çalakî di zivistanê de jî dibe. Lê bi xetên giştî amadekarî kûrkirin, hêzên me yên heyî li ser vî bingehî ji nûve vesazkirin, di şer de vesazkirin, di sengerên paş de vesazkirin ji bo serkeftinê mercê sereke ye. Di hinek qadan de, hinek komên me yên bijare vê vesaziyê, ger pêwîst bike di nava xwe de ji nû ve bizanin vesaziyên xwe bikin dê derfetên serkeftinê jî zêde bike. Ya ku ji gelik herêman tê hêvîkirin ev e û ji bo vê ger pêwîst bike em ê jî hemû hêza xwe bikar bînin û hewl bidin vê bidin pêk anîn.

Erka hevrêyan ne çarçûrkirina derfeta ye, de îca li pêşiyê bûyîna astengiyê qet nîne. Heta dawî bi şarezatî alîkarî kirine. Ya tê hêvîkirin ev e. Me jî heta niha hertim bi vî şêwazî da we. Divê ku hûn jî hinekî wisa bidin xwe, derdora xwe, li gorî rastiya xwe ya rêbertiyê bizanin wisa bidin û teqez divê hûn wisa ser bixin.

**29 Cotmeh 1994**

## NIRXANDINÊN RÊBERTÎ DI DERBARÊ EYALETÊN AMED Û XERZANÊ DE

Em îro ji du herêmên girîng, encamgir û dîrokî re komên biçûk, lê ger wek tê xwestin li ser armanc û berfirehiyê serwer bibin du komên ku dê bikarin rista xwe bilîzin bi rê dikin Em qala qadên Amed û Xerzanê dikin. Em difikirin van her du koman ji vir bişînin. Dîsa ji bo xebatên girseyî dê hinek heval biçin. Em dikarin hinekî li ser rewşa wan rawestin û guftûgo pêş bixin. Di vê navberê de ji şer û eniya dijmin nûçeyên rojane tên hene, em bi kurtî dikarin li ser wan jî rawestin. Çi ji eniya dijmin, çi jî ji eniya me nûçeyên dawî hatine çine? Keremke?

***Ab.:*** Serokê min, di nûçeyên dawî yên cîhazê de qala rewşa Xerzanê dike. Dibêjin dema ku komek diçe peywirê dikeve nav zeviyê mayîna û şehîd hene. Ya li Gabarê çalekiyek mezin, êrîşek mezine, lê di nav de lewazî hene, windahiyên me yên ku çavkaniya xwe ji nebesiyan digire hene. li Amedê şehîdbûna hinek hevalên xebatên civakî dimeşînin heye.

***---.:*** Wekî din?

***Ab.:*** Nûçeyên radyo û sernivîsên rojnameyan hebûn.

***---.:*** Çine?

***Ab.:*** Daxwuyaniyên Tansû Çîller hebûn. Di civînek li Fasê de axiviye. Dixwazin di derbarê Rojhilata Navîn de hewldanên nû bikin. dema ku çûye wir di derbarê Kurdistanê de hinek daxwuyanî dane. Xala ku diyar dikin ev e; îsal dewletê xeteriyek mezin derbas kiriye, mîna Yûgoslavya ber bi parçebûn û dabeşbûnê ve hatiye, lê di encamê têkoşîna mezin ku meşandine de rê lê girtine, herî kêm dê êdî dabeşiyek wisa nebe, ev xeteriya çavkaniya xwe ji pirsgirêka Kurd digir ji holê rakirine, lê hêjî

xeteriya Îslamî hebûna xwe diparêze, dê ji niha û şûnde bi wê re eleqeder bibin û digot wê bi serê wê de biçin.

Li ser vê hinek şîroveyên Cengîz Çandar hene; dibêje wê serdema serokwezîriya Tansû Çîller, di Kurdistanê de çareseriyek siyasî, heta di derbarê Kurdistanê de, ji aliyê gelan ve hinek pêşketinên sînordar ên demokratîk jî nebin mijara gotin. Weke heta niha heyî li gorî pêdiviya şerê taybet li Tirkiyê di bin navê, "*Pakêta Demokratîk"* de wê rewş bê domandin. Ya rast dê hewl bidin muxalefeta heyî jî biçewsînin ango dê şer bi hemû dijwariya xwe bidome.

***---.:*** Wekî din?

***Ab.:*** Yên girîng ev in Serokê min. Yek jî di derbarê Hevalê Kanî de nûçeyek hebû.

***---.:*** Ev çawa dikare bê şîrovekirin?

***Ab.:*** Ya rastî derbas bû. Ev di derbarê me de ye, ango karekî bi zanebûn hatiye kirine. Ji wî bi xwe re dawetmane heye, ji aliyekî ve jî asteng dikin, du alî nêzîkbûnek heye. Di nav têkoşînê de ne. Rewşa Îngîltere jî hinekî wisa fêm dibe. Beşek her çiqas mîna yê Îtalya û Yûnanîstanê be jî, dixwazin bi nêzîkatiyek erênîtir kar pêş bixin. Baskek ji wan jî bi Tirkiyê re di nav pêwendiyên baş de ye, dibe ku ev derdorê berjewendîparêz bin. Bi awayekî zêde dijberî radiwestin, hewl didin vê pêşketinê asteng bikin. Di navbera wan de dubendiyek wisa heye. Dewlet jî, Îngîltere jî ji vê re vekirî diyarin.

***---.:*** Belê, di derbarê civîna me de tu wekî din çi dibêjî?

***Ab.:*** Dikare di derbarê çûyîna koman û li ser çûyîna hevalan nirxandin bê kirin Serokê min. Herdu qad jî pir girîngin, ya rast heta niha nirxandinên ku hatin kirin têr dikin, lê di asta hişyariyên dawî de be jî, ya din jî di derbarê girîngiya qadan de hinek nîşandan û nîqaş dikarin bên kirin.

***---.:*** Yên hatine jî hene.

***Ab.:*** Komek ji Zelê hatiye û komek jî hevalên me yên birîndar ku ji tedawiyê hatine hene. Ya rast destnîşankirina xeteriyê guncawe, lê dibêjin me xeterî derbas kiriye ev ne raste. Lê bi vê ya ku dixwazin vebêjin ev e, xeterî mezin bû û diviya bû mezin bi serê me de teqîba. Lê weke ku zêde baweriya wan bi wan nîne, lewaziyên mezin ên ku di şerkeriya PKK'ê de heyî rê li mezin neteqîna bi serê wan de vekiriye. Di asta mezinbûna

xeteriyê de şerkeriyek li ser wan ferznekirin, qismî be jî ew hinekî aram kiriye ango wisa diyar dibe. Herî kêm dixwaze vê wisa vebêje. Encama ku divê jê bê derxistin ev e.

**---.:**Heta niha ev vekirî nedigot. Tenê dibêje, "*Me hinekî derbas kir.*" Ya rast rexneyên ku li ser fermandariya Tirkiyê serwere tîne ziman. Heta niha hewl didan înkar bikin. Lê êdî hêdî hêdî ji devê xwe derdixin. Lê ji aliyê din de jî raste, meziniya xeteriyê heye. Me dikarî em vê giran bi wan bidin dayîn. Lê lewaziyên mezin ên ku di nav şervanên me de, xafletên mezin ên di qada siyasî û leşkerî de bi şervanên me re heyî, bi rastiya şer lîstina wan, rê ji derbasbûna xeteriya mezin a ku dijmin li bendê bû vedike. Û ev heta niha jî didome.

Em bi hemû hêza xwe vê dibînin û dixwazin biser de biçin. Lê em hîn jî di nûçeyên ji eniya me tên de dibînin ku, camêr cihê ku lingê xwe bavêjî jî bi awayekî rêk û pêk nabîne. Vaye gelik nexweş hatin vir jî. Bila ew jî guhê xwe baş vekin û fêr bibin, mîna keran kes nikare bê qada me. Yên ku wek tê xwestin nizanin di rê de bimeşin, serê kêliyê carekê pêl mayînê dikin û teqla bi xwe didin avêtin nikarin bibin şervanên tendurist, de îca qet nikarin bibin gêrîla. Ger heye rêzdariyek we li beramberî we, cidiyeta we ya şer hûn ê biçin ji wan bêşerman re jî bêjin.

Pêl zinaran bikin, pêl perçê zinaran bikin! Ma zinar li welat nînin, ma hemû ne zinarin? Hinek tiştan fêrî şervanên xwe bikin. Hûn ji bo cixareyekê deh teqla davêjin, ji bo şorbeyekê çil teqla davêjin, lê hûn ê qûralekî ji rêzê yê gêrîla pêk neyînin. Wê demê hûn mirovên çawa ne? De were û neteqe! Dema ku ji cihekî derbasî cihê din dibin, hema pêl mayînê dikin. Vêca li pêşberî me jî xwe fermandar dibînin. Çiqas kesayetiyên wisa çine ango ne çine nediyar hene, niha hemû li serê min kom dibin. Ger behreya we nîne, soza şerefê nîne, soza fermandariyê nîne wê demê hûn li çi digerin? Ger bi qasî ku hûn nikarin şer bikin lewazin, çi karê we di nav refên şer de heye?

Belê, koma me diçe, hêvîdarim cara dawî jî baş min guhdar bikin û biçin. Gelikî kêfa xwe ji ketina gundekî, ji şobeyekê re tê, lê hûn şaht dibin, lingên we parçe parçe dibin. Hûn ji pêlêkirina zinarekî bêzarin. Ma hûn gavên xwe hinekî din hişk bavêjin û pêl zinarekî bikin hûn ê bimrin? Ma ev jî karekî jêhatîbûnê dixwaze? Zeviyê mayîna ye, hûn dizanin ku xefkên

dijmin hene. Bi zanabûn, korane ma hûn çawa di ser de derbas dibin û pêlê dikin? Ji bo ku ez vê jî fêrî we bikim gelo divê hîn ez çi bikim? Ya rast divê ku mirov zingilekî nîv metrî ku li ser gotinên baldar be hatiye nivîsandin bi guhê we ve bike.

Me bi dehan car got; mirov wisa dikeve gund, şêwazê birêve çûna gêrîla, şêwazê rûnişkandinê wisa dibe. Madem hûn ewqas girêdayî jiyanê ne, -bêgûman mafê we ye- pêdiviya wê pêk bînin. Hûn ewqas girêdayî jiyanê ne, ji bo cixareyekê –Yê di girtîgehê de jî wisa bû- aliyê ku hûn li ber dijmin negerîn jî we nehişt. Camer li beramberî îşkencê bi mehan li ber xwe dide, lê li beramberî cixareyekê li ber xwe nade. Belê, ev hemû asta ketîbûna jiyanê diyar dikin.

Çi karê kadroyên civakî li gund heye? Li Mêrdînê sê kes wisa çûne. Heyfa min bi wan çekên we tê yan jî serkeftina erzan a dijmin. Ez pê xemgînim ku dijmin dibêje; “*Me xeterî derbas kir.”* Lê ez ê ji niha û şûnde pê xemgîn nebim. Mirov dizane talîmatekê guhdar bike. Divê gêrîlayek çawa bijî? Me got di Xerzanê û Amedê de binkegirtin, ma binkegirtin nîne? Hûn hertim li serê gundiyan dibin bela. Gundî miriye, parsûyê wî bi hev zelîqîne, gelo dikare çi bide we? Qaşo diçin lojîstîkê bigirin, lojîstîk wisa nayê girtin. Ev ne lojîstîke diziye, li serê gel, ê gundiyan bûyîna bela ye. Lojîstîk cuda tê destgirtin. Li gel gundiyan mirov aram nabe û hizûrê nabîne. Gel di bin kutanê de ye. Tu diçî mala wî belengazî, çima? Ji bo parvekirinê. Tu çawa tenezil dikî? Germe, xwarin heye, ma tu ji xwe şerm nakî? Ewder mîna qeşayê ye.

Ez hîn dema deh salî bûm diçûm mala xwe min sê roja jî li ber xwe ne dida. Min îsyana yekem çawa da despêkirin ji we re vegot. Dema ku ez di zanîngehê jî de bûm hîn bi rêk û pêkî nebibûm şoreşger. Dema ku sê roja li mala gund dimam ji wê hêrsê, di nav wan mercên jiyana ku mirov nedikarî jê re tehemul bike cîhan ji min re dibû girtîgeh û min zadê xwe ye şeş mehan digirt. Başe, hûn çima tenezil dikin, hûn diçin bi mehan hem jî li ser navê şoreşgeriyê dimînin? Bi we re ruh nîne. Hûn bi bandora PKK’ê diçin li serê gel dibin bela. Hûn kesayetiyên pir xeter ên burjiwaziya biçûkin. Yek ji sedemên sereke yê hatina we ya nav PKK’ê jî ev e. Ez çûyîna we, xwarina nanê gundiyan û bi mehan li ser serê gel bûyîna we ya belê fêm nakim.

Dîsa binkegirtin nîne. Gavek jî ne avêtine çiyayên ku kes nikare xwe bigihînê. Ez qet vî gêrîlayî fêm nakim. Gêrîla bi asanî ji binkeyên xwe danakeve, lê hûn her roj ji cihekî diçin cihekî din. Li heywanekî, li şêrekî, li pilingekî, li gurekî binêrin, ma bi asanî ji kuna xwe derdikevin? Dema ku derdikeve jî çiqas bi tevdîre, çiqas bi heybete. Mirov xwe davêje erdê, dike bela, ma ewqasî jî dike? Ma qet tiştek bi navê pergal û nîzamê bi we re nîne? Ma qet nêzîkatiya li beramberî xwezaya hestyar ji cîhana lawiran, cîhana balindeyan re nîne. Ma ez hîn jî bêjim, ango kesekî herî hov jî nakeve nav rewşek wisa.

Tê bîra min, yek ji têgehên herî zêde di berxwedêriya Sîwerekê de dihat bikaranîn têgeha tirşikçîtiyê bû. Tirşikçîtî çiye? Ji bo tirşikçitiya axa hemû tişt kirin û hemû corê xwedayîna qebûlkirinê raber kirine. Li Sêwerekê têgehek wisa hebû û ji bo me pirsgirêk ava dikir. Di dema borî de li ber deriyê axa tirşikçîtî hebû, niha jî gelik ji wan li ber deriyê PKK'ê tirşikçitiyê dikin. Tenezilî jiyanek wisa erzan kirin, çi te li berderiyê Bucax tirşikçîtî kir, çi jî li ber deriyê PKK'ê heman tişte. Başe çiye ev? Ma hûn ê ji xwe re bêjin em şerkerin? Camêrên ku nikarin çiyayê pişt serê xwe baş hilbijêrin, bi rêk û pêkî nikarin di rêyekê de bimeşin ma ne tirşikçî ne çine? Yên ku di nav civakê de kêrî tiştekî nehatine, hatine nav PKK'ê, xwe avêtine naverastê û dibêje; " *Bila min xwedî bike û bimeşîne."*

Di dîrokê de jî, di roja me ya îro de jî bi qasî ku em nikaribin bi jiyana leşkerên bi pere leşkertiyê dikin jî nayê muqayesekirin. Dijmin hûn xistine, hemû corê heqaretan li we kiriye û hûn tên bi van min mijûl dikin. Ya rast we heta niha re têgehek bi navê heysiyet û anorê re hevnaskirin nekiriye. Me bi hezaran car ji we re got xwe sererast bikin. Bi dijwarî hinek têgehan himêz bikin. Nêzîkatiyên me yên hevaltiyek bilind îstîsmarkirin ne nêzîkatiyek duriste. Kes naçara bizane bi anûr be, rast xwe bigihîne anorê. Ger şoreşger be ev zêdetir pêwîste.

Em xwe nexapînin, çima hûn li gorî qûralê şerê xedar tevnagerin? Vê pirsê ji xwe bipirsin, çima hûn nikarin bi rêk û pêkî di rêyekê de bimeşin? Hûn ê bêjin ferman û talîmat pêwîste, lê çavkaniya yekem a ferman û talîmata ez im. Ewqas jî li ser vî karî radiwestim. Hûn çawa vê derewê şayanî xwe dibînin? Ez jî di van rêyan de meşîm, hemû jî tarîgewrk bûn. Ez di rêyên ku qet

şop jî têde nebûn de meşîm. Ma min tenê carekê jî pêl xeteriyê kir? Na! Lê hûn di rêya amade de jî nikarin bimeşin. Di çiyayên hatine vekirin de jî nikarin cih ji xwe re bibînin. Şervanên amade jî nizanin bikar bînin. Divê ku hûn rewşa xwe fêm bikin. Me fêm kir, we para xwe ji tiştekî bi navê terbiyê negirtiye, lê ji niha û şûnde qet nebe bi terbiye bin, dibe ku hûn bi vê bikarin hinekî bijîn. Em hewl didin hinekî we fêrî jiyankirinê bikin. Em devjêberdin şervanên artêşa azadiyê, artêşa koleyan jî wisa bi rastiya şer nalîze.

Tolaziya di nav civakî de heyî dixwazin di nav refên me de jî serwer bikin. Bi salane em talîmata didin Amedê, Xerzanê, vir û wir û dibêjin binekbigrin. Ma qet fêm dike? Her roj nûçe ji gundan tên, bi gundî re şer kiriye, çar gundî kuştine, jixwe nêzîkatiya wan bi xwe jî wisa ye; deh heban dibe, deh heb jî bi xwe diçin. Hey hejar û belengazno! Li îhtîşama şêrekî binêrin, kuna wî çawa ye û çawa gav davêje? Madem tu ewqas ketiyê jiyanê ye çima derketî? Hûn mafdarin, camêrên ku hûn jê re tirşikçitiyê jî bikin neman, derfetên tewleta Tirkan ê ku hûn xwe bifroşinê jî neman. Ji bo vê we xwe kiriye bela.

Rewş ev e, lê rewşek xelete. Hûn xwe linav dibin. Me got perwerde pir pêwîste, hûn ê bi terbiye bin. Nêvnega xebatê ya ku bi fedakariyên mezin min amade kiriye jî hûn têk didin, ma ne şerme? Ger hêza xwe ya dîsîplînê nîne, hêza we ya li gorî qûralan tevgerînê nîne biçin cihê xwe, cihê xwe yê kevn. Ez hatime vî temenî, ma ez qet ketim rewşek dijberî şoreşê. Ma xwe di rewşeke herî biçûk a ku bi şoreşgeriyê re lihev neke de dihêlim? Hûn di bîst saliya xwe dene. Lê ti ferqa we ji pîrejinekê nîne. Ma hûn ê wisa bibin leşker? Hûn ê ji artêşa azadiyê re wisa fermandariyê bikin? Rûmeta hinek têgehan heye, bûyîna şervan û leşkerê artêşa azadiyê girêdana xwe bi rûmet û anûrê re heye.

Têgeha anorê hinekî jî weke ku min got divê bê fêmkirin. Başe, bê rûmetî çiye? Çûyîna ber lingê gundiyekî, bi darê zorê derfetê jiyana wî ji dest girtin û parvekirine. Bê rûmetî ev e. Dîsa di rêya rast de ketine, ji bo ku neweste di dol û geliyekî de xwe linavbirine, mayînek bi xwe de teqandine. Nizanim dema ku pêwîst nake pir zêde fêrbûnên rê, gelik fêrbûnên xeletin. Ev hemû bêrûmetîne. Heke hûn fêm nekin, wê rojekê bi we bidin fêmkirin. Ger tu ji zahemtiyê re ne amadeyî, ji qûralan re ne amadeyî, tê

çawa bibe xwedî artêş? KT'yê em fêrkirine. Lê artêşek KT'yê ya pir bi dîsîplîn û şanaz heye. Ew, bê dîsîplînî û tolaziyê bi gel dide kirin.

Ev faşîzme. Ango ji bo ku bi asanî rêve bibe di nav bê esilbûnê digire, bê qûraliyê ferz dike û di nav serseritiyê de dihêle. Ger na KT'yê bixwe pir bi dîsîplîne. Bi qasî ku nas dikim xwedî fermandarên herî bi dîsîplîne. Leşkerên artêşa KT'yê yên tolaz yan jî ji bo rêvebirinê hilgirên herî bê esil ên ku di cîhanê de nehatine dîtinin. Belê, ma em niha bi xwe bilîzin, em dijmin di nav xwe de bihewînin? Ji bo hinek biryarên xwe em şer bikin? Ez ji yên ku wê nû biçin re dibêjim; ger heye ewqas rûmeta we, em ê we bibînin. Bi gotin nabe, bi xwe fedakirinê jî nabe. Ev bi serkeftinê dibe. Hûn ê hemû biçin. Em ê carek din we bibînin.

Ez li sûbayên artêşa bi pere dinêrim, leşkerên xwe ji aliyê moral ve çiqas bi xwe ve girêdane. Em artêşek ji nan û avê zêdetir pêdiviya xwe bi azadiyê hene. Moralê wan tine bûye, fermandar jî, leşker jî vê rewşê şayanî xwe dibîne. Hûn dê biçin û bibînin. Vaye ev bê rûmetiya herî mezine û bê anorî ye. Me bi dehan car ji we re got; nekevin nav vê rewşê û vê rewşê bi xwe nedin xwarin. Me fêm kir, dijmin bi we lîstiye, tiştek di we de nehiştiye, lê em jî we fêrî dilpakî, rûmet û anorê dikin. Derfetê xwe pêgihandinê heye, ma bi rûmet jiyankirin asane? Hûn hertiştî tevlîhev dikin.

Ji deh saliya xwe ve, ji bo hinekî bikarim li ser pîya bimînim bi ser xwe de diçim. Mîn çîroka xwe bi hemû ziraviyan vekir. Ger hûn pir bi hêzin wê demê ji we dipirsim; "*Çima we nekarî li beramberî dijmin tiştekî bikin?*" Ger hûn biqasî ku bikarin di rêya saxlem de bimeşin bi xwe bawerin, serê kêliyê carekê çima dikevin. Çima serkeftinek we ya cidî nîne? Me got; "*Pêdiviya wan bi perwerdê heye.*" Bi mehane em li ser radiwestin, çima hûn fêr nabin? Pişta xwe didim we, hûn nerehetiyên xwe didin axaftin? Ma mirov ewqas ji cîdiyetê dûr û bê par dibî? Jixwe hez bikin, lê bila şansê jiyanê di nav de hebe. Ew jî nîne. Çima we bidim jiyankirin, ez ê çawa we bidim jiyankirin? Ez kesekî di halê xwe de yê siyasî û bi xebatên leşkerî re mijûl dibime. Çima hûn li ser xebatên min giraniyê ava dikin? Hûn, tên û tevlî min dibin.

Herweha hûn pir xirab hatine fêrkirin. We ji KT'yê, fêrbûnên civaka feodal pir tişt girtine û hatine. Ma di xema we de

ye? Ger dibistanek burjuwaziya biçûk bûya, ji bo bi destxistina karmendiyek burjuwaziya biçûk bi dest bixe dê çil teqle avêtiba. Ma vê nizanim? Lê ev xelete, hûn ê bi vê negihêjin tiştekî. Dema ku hûn pir girêdayîne jî, ez nikarim xwe ji hekaret kirina li we dûr bigirim. Çima? Ji ber ku hûn bi esasên kar dilîzin. Hûn nikarin bi asanî min bixapînin. Hûn hemû corê belengazî û rebeniyê jî şayanî xwe dibînin. Li pêşberî we yekî bê xapandin nîne. Hûn pir baş dizanin ku bi safî, zaroktiyê xwe davêjin naverastê û dixapînin. Hûn hemû corê rebenî û belengaziyê şayanî xwe dibînin. Lê ez hinekî vê fêm dikim. Bi qasî ku nebim amûrê van hêviyên we yên qirêj jî şiyarim.

Bûyîna leşker tiştekî xweşe. De îca bi gavên dîrokî meşîn tiştekî pir xweşiktire. Ketina nav gel jî tiştekî pir xweşike, lê ne wek we. Bi armanca fetihkirinê ber bi lûtkeyên çiyayan ve çûyîn, ketina nav gel, ji bo despêkirina îsyanek pîroz pir hêja ye. Ji bo xebata rêxistinê, ji bo avakirina bingehekî pir bi nirxe. Wek propagandaciyekî rê girtin jî pir girînge. Lê hûn yekê jî ji van nakin. Li gorî we ev kar hemû bela serîne. Na. Gava yekem a cidî bûnê ye. Gava rêzgirtin li jiyanê ye. Çareyek we ya din nîne. Ev hemû hêza dijmin çiye min fêm nekir? Ev hêza civaka kevnar çiye ku ewqas we girtiye û çima şoreşgerî ji we re ne balkêşe? Bi rastî jî mirov di fêm kirinê de zahmetiyan dijî.

Niha çi ji we re vebêjim, her lawirek jî dikare di kuna xwe de xwe bi xwe bijî, ez ji van mirovan re çi vebêjim? Cihê xweter kî derê ye, dê kengî ji kuna xwe derkeve, çawa derkeve û bi kîja armancê derkeve? Belê, nêzîkatiyê lawirekî di asta ji baweriyê der de ye. Ev çiyayê mirov dikare tê de li dijmin bide jî nasnekirin. Ango li kî derê dikarin baş li dijmin bidin, hîn jî fêr nebûne. Bi çiqas hêz, li kî derê çawa dikarin li dijmin bidin, wê jî nizanin. Şervanên gelin! Ger vê carê biçim axaftina cîhazê, çend peyv hatin ber devê min. Ez ê têgehek mîna; "*Fermandarên tên xapandin û jixwe razî"* bikar bînim. Ji niha û şûnde ez ê têra xwe dujîna bikim. Kî bi xalên sereke bilîze ez ê jî pê bilîzim. Bila dijmin bikene, ma min çi jê ye. Ez jî bi esasên kar dilîzim. Herî kêm yên ku ewqaz xwe fêlbaz dihesibînin, em jî hinekî heqaretan li wan bikin, qet nebe em nekevin rewşa nexweşinên derûnî û em xwe bi ser vir de navêjin.

Wê tevdîreke herî biçûk jî negire. Hinek derfetên bi zor û zahmetiyan rêxistinê bidest xistine vala xerc bike û piştre wê wek fermandarekî derkeve pêşberî min, divê ku em vê şermê ji holê rakin. Her roj, ew komên ku dibêjin em erkdaran dişînin hemû jî çekdarin. Dijmin di oxira vê de dixwazin hemû tiştên xwe deynin holê û linav bibe, lê hûn ji bo pêdiviyek ji rêzê ya herî biçûk nirxên pir mezin xerc dikin. Mesele li naverok binêrin, çûyîna van cihan, girtina wan rêyan, teqez nayên pejirandin.

Rêveberiyekî hêja be yan jî tenê kesekî berpirsyar be, ne wisa dişîne, ne di wan rêyan re dişîne û ne jî di ewqas demê de dişîne. Yekê ji van jî napejirîne. Lê fermandarek û tenê hêzek rêveberiyê nîne. De were û weke camêran li van binêre! Yên ku li wan qadan bi qûralên jiyanê dilîzin, ma gengaze nirxandinek rêk û pêk a camêran ji me bigirin? Bi vê rewşa xwe hûn nikarin ji min erêkirinê bigirin? Ango tu ewqas bi qûralan bilîzî, ez çawa te qebûl bikim?  Bi vê rewşa xwe hûn nikarin ji min erêkirinê bigirin û derbas bibin, ez ji vê re nabim amûr. Qet nebe ez ê hewl bidim anora xwe rizgar bikim. Lê dîsa jî bihizirin, ez dîsa hinek tiştan didim we. Ji hevrêyekî çi bê hêvîkirin wê nîşan didim, lê hûn nîşan nadin.

Min hertim got; qîmeta ku hûn didin cixareya xwe, ji qûralê xebatek hêja re nîşan nadin. Li beramberî van xwe ferzkirinên we, ji bo ku nehelim hewl didim xwe kom bikim. Ji ber ku ferzkirinên we pir xirabin, pir bi fêlbazîne, ango hertişt tê de heye. Divê ku li beramberî hemûyan mirov biparêze.

Tê jî di demek nêzde biçe, ez ê te fêrî çi bikim? Hêjî tu yê herî kêmî. Li xwe binêre, hûn li serê min jî, yê xwe jî bûn bela. Em ê çawa we ji belabûnê derxin? Artêş û leşkerê xwe tu bi xwe ava bike. Ha ji te re ewqas pere, ha ji te re ewqas fedayiyên girêdayî, ha ji te re ewqas qayde qûral, ger tu hîn jî pêk nayînî ma wê ji te re nebêjin; "*Tu li çi digerî?"* Ger 20 sale tu fêr nebûyî, nesepandiye, tu li çi digerî? Tê vê reşwa xwe çibike, çawa derbas bike? Em carek din jî şansekî bidin te, lê ew hêz bi te re heye? Hertim hûn şerkeriyê ji min dixwazin, ha ji te re ewqas derfet, tê çawa pê bilîzî, de ka em bibînin.

Ev hemû zarokin, hûn hinekî bi aqilin. Çima hûn nikarin vînekê raber bikin, çima we xwe negihand uslûbekî leşkerî, çima arasteyek nekir; çima hûn nikarin milê xwe dirêj bikin û hinek

karan ser bixin? Hûn qet min jî fêm nakin. Ango naxwazin wek piştevanekî ji rêzê binirxînin. Başe, wê demê behremendiya we ya fermandariyê çiye? Hûn çi dixwazin çawa bikin? Ger we tiştek fêm nekiriye, hewl bidin fêm bikin ango devjê berdin. Lê şêwazekî we şayanî xwe dîtiye heye, ew şêwazî di holê de ye, ango we ji tiştekî rizgar nake. Hûn dîlin, ger li ber xwe bidin jî hûn ê tine bibin. Ji vê zêdetir ti qîmeta vî şêwazê nîne.

Di vê baweriyê de ku min hinekî be jî xalên sereke yên leşkeriyê dan we. Ger nadim, bi min re nîqaş bikin. Ya rast me gelik hîn kir. Belê hûn bi ezmûnin. Xwe bigihînin asta berpirsyariya ninek koman. Em ê dubare erê bikin û rayeyan bidin. Gelik ji wan bi serê xwe ne. Nabêjim nebin otorîte, berevajî xedar bin. Lê di holê de ye. Îhtîmalek mezin dîsa we fêm nekir, hûn ê biçin û di ser serê xwe de bavêjin. Herweha me gelik amade kiribû. Hêzeke fermandarî ya baş, ma hûn ê wê jî raber nekin? Hûn xwe bi xwe şêwazekî diafirînin.

Ev şêwaz we ji ber bi linavçûnak mezin çûyînê ve rizgar nake. Taloq dikin, pir zexel, tempo nîne, teqez nîne. Dîsa şopandina dijmin nîne, rê li dijmin girtin nîne, xeteke pir dûze. Ango biqasî ku hûn nikaribin tiştekî rizgar bikin bê îda ne. Ma wisa dibe, wê dijmin fetih bike, nabe! Ya ku herî baş hûn dikarin bikin pirgotiniye. Ger ev jî nebû despêkirinek întîharî ye. Başe, em ê çi ji vê şerkeriya te bikin? Di nav we de qaşo hinek hatine û xwe dane vî karî. Dijmin bi xêra we xeteriyek mezin derbas kir, we niha fêm kir? Ez rewşek bi qasî vê esef nabînim. Tê li dijberî dijmin derkeve, lê ewqas jî xwe bavêje erdê. Piraniya xwe jî wê bimrin.

Mirinek wisa erzan şayanî xwe dîtin, di vê cîhanê de xirabiya herî mezin ku mirov bi xwe bike ye. Lê belê hûn najîn, heta ku bi mirinê bihizirin. Ji xwe hûn mirî ne. Di navbera jiyana we de zêde ferq nîne, kesayetiya mirî ger hebe nokere, dê bibe pêlîstokê pergalê, ger bê qada azadiyê jî dê bibe belayê serî. Hûn vê rave dikin. Ez jî bawer nakim, ango nêvengek ji şer re ewqas guncaw, em ê ewqas derefetan pêşkêş bikin, lê hûn ê nikaribin çalekiyek rêk û pêk vesaz bikin. Her roj bi qezayan wê pênc-deh camêr linav biçin, vê fêm nakim. Hemû bi qezayan diçin. Yek ji van jî ne windahiyên li gorî rastiya şer tên dayînin. Başe, em waneyê çawa kûr bikin? Ez çi bidim komên ku wê biçin –jixwe di

demek kurt de wê hemû biçin- ez hîn çi bidim, çawa bidim? Kêmasî di ku de yê, şaşîtî di ku de ye?

**Ab.:** Serokê min, ya rast şaşîti jî nîne, nebesî jî. Tenê zahmetî hene.

**---.:** Zahmetiyên çi, demên borî dibe ku zahmetiyên xwe hebûn. Lê piştî ku di nav şer de derfet çêbûn, zahmetî ne peyvek mirov bigire ser zimanê xwe ye.

**Ab.:** Ez ji aliyê derfetên şer dibêjim.

**---.:** Ger derfetên şer çêbûn, zahmetî dibin xwarina şervanan.

**Ab.:** Di qada şer de zêde zahmetî nînin. Ez ji aliyê Rêbertî ve dibêjim.

**---.:** Ji aliyê Rêbertî ve jî zêde zahmetî nînin, zahmetî çavkaniya xwe ji we digirin.

**Ab.:** Serokê min derfet sînordarin.

**---.:** Derfetên kê sînordarin? Derfetên min ne sînordarin, derfetên pir berfireh hene. Zahmetî di yên ku nikarin van derfetên min bikarbînin de heye. Zahmetî çavkaniya xwe ji hêza xwe ya xas digire, ger na ne ji ber derfetên kême. Çavkanî ji şêwazê nebikaranîna we ya derfetan digire. Ma çek nîne? Binêre, dijmin hertim vê dibêje; "*Li cihekî em dipên biryargeha wan bû me 150 roket desteser kirin, nizanim 100 mayîn, nizanim çend çekên navîn girt."* Her roj wisa ye. Zahmete, çavkaniya xwe ji yên ku nizanin van nirxan biparêzin digire. Di bin navê zahmetiyê de şervanên li ber serê xwe avêtine.

Duh diaxivim dibêjim; "*Nizanim ji Behdînanê hêzek bi qasî taximekî revîne Botanê û hatin gel we.* Dibêjin; "*Na Serokê min zêdetir, zêdetire Serokê min"* Ango taximek, yekîneyek ji gel camêr firara navxweyî dike. Naçe gel dijmin jî. Tenê ji ber ku rûçikekî nexweşik, nikare nêzîkatiyek mirovî ji hevrêyên xwe re raber bike direvin. Ger ev xayîn bin, qaçax bin dê birevin û biçin gel dijmin, radest bibin. Ji ber kêmbûna eleqeyê, ji ber layîq nebûnê direvin, ev pir vekiriye.

Di nav artêşên Îslamê de jî berê bi evîna xwedê herkes girêdan. Dema ku tê gotin xwedê, di çolên Erebîstanê de, Asya navîn de, nizanim heta Ewrûpa navîn, Efrîqa bi wê evînê meşîn û fetih kirin. Hem jî di nav mercên paşketî de. Niha di oxira evîna azadiya sereke de gundekî fetih nakin. Biçin û xwe pê re qiyas

bikin. Tirşikçîtî û tehamula şorbeyekê kirin. Ya rast leşkerên bi pere jî ji bo ku zêdetir desteser bikin hîn zêde bi azwerî şer dikin. Ger hûn mîna leşkerên bi pere tevbigerin hûn ê baştir lêdin. Ji ber ku hûn lê jî didin hûn ê qut bikin û hûn ê vê zêde bixwun. Ne tirşikek, hûn ê şahiyekê li dar bixin. Belê, şahiyekê li dar xin, li gorî min hinekî rûmeta vê jî heye. Vaye karê tirşikçitiyê jî di vir de ye û hemû corên bêterbiyê jî raber dikin. Li her derê wisa ye. Li pêşberî me jî. Mixabin ev şayanî me dîtin.

Belê, we vê carê tiştek fêm kir, ger piştre pêwîst bike em ê bi kûrî bigirin dest, lê cewherê kar ev e. Tê biçî, tê bi teoriyê şikayeta vê bike, dînamîzma şoreşgerî çiye, derfetê şoreşgerî çiye, tu tenê van binirxînî tê bikarî baş sererast bikî. Bêgûman dê bi zagonên şer re pir zêde bikeve nav nakokiya, jixwe bihaneyên wan jî pirin. Vaye ya ku hûn hertim dikin ev e. Di zimanê şer de cih ji van nêzîkatiyan re nîne. Ez her roj ji we re qala hunerê şer dikim. Ma me bi du gotinan li dijmin neda, bi du gotina dest bi vî karî nekir? Çima hûn fêm nakin? Ez bi du gotina ji te re dibêjim min xedar lêda.

Ma ev ne lêdanek bi tena serê xwe û li dijberî herkesî ye? Û kêlî bi kêlî di hemû pêvajoya de di bûyera Rêbertî de şêwazê lêdanê pêş nakeve? Başe, hûn ewqas hêza lêdanê di destê xwe de digirin, wê demê çima hûn li dijmin nadin? Her tişt di destê we de vediguhere kêrek kor. Gihîştiye asta lêdanê, tu destê xwe bi hejîne dê pêncî heb bi hevre bikevin xwarê, lê mîna yê ku kêrê li xwe dide ye. Li gel min bûyîna leşker ne asane. Dibe ku hûn henekê xwe jî bikin û hûn komploger bin jî, ez ê tenezilî we nekim. Di nav we de sîxur be jî, dê pênc filisa neke. Dê nikaribe ti karî jî bike. Li pêşberî min ne tişteke. Lê ger hûn niyet başin, xwe îspat bikin û ev jî ne wisa asane.

Gelik şervanên ku dibêjin; "*Em dixwazin biçin qada Rêbertiyê"* hene. Raporên we dixwînim, hêjî ji welat gelik kes dibêjin; "*Ez jî dixwazim werim."* Başe, werin, lê dema ku tu hat jî axatiya xwe nede axaftin. Şêwazê hatina we ne ji bo fêmkirinê ye. Bi rastî em fêrî hemûyan jî dikin. Me bi qasî deryayan amûrên fêrbûnê pêşkêş kirin.

Hûn niha dubare xwe amade dikin Ab?

***Ab.:*** Xwe amade dikim Serokê min.

***---.:*** Tu dîsa bi îdea yî, em di rojên pêşiya me de li ser rawestin, di cih de ye, tu hîn jî bi xwestekî?

***Ab.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Bi rastî jî tu dixwazî leşkeriyê bikî?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Gelo tu amade ye wan çiyayan rast binirxînî, di wateya rast de çiyayan binirxînî, qet nebe tu amade ye li wan deran hinekî hêza jiyanê raber bikî?

***Ab.:*** Amade me Serokê min.

***---.:*** Tu poşman nebî, ne poşmanî, tu nekevî nav nexweşiyeke nebikaranînê û tu jî weke yê din nekî, gelo tu wisa bikî dê çi bê serê te?

***Ab.:*** Asta hemû şer…

***---.:*** Jixwe te sala 1985'an wisa mirin girt berçavê xwe û hat çiyayê Gabarê. Tu tenê ji bo mirinê hatibû ne wisa?

***Ab.:*** Tenê ne ji bo mirinê Serokê min.

***---.:*** Temam, ango ji bo rizgarkirina anûra xwe ya şexsî.

***Ab.:*** Rewş….

***---.:*** Ango ji bo ku bê gotin; "*Ab. Ne revî, xirab ne mir.*

***Ab.:*** Zahmetiyên rêxistinê jî hebûn Serokê min.

***---.:*** Lê te baş dizanî tê bi wê rewşa xwe nikaribe zahmetiyên rêxistinê derbas bikî yan jî derbasnekirina te hatibû fêmkirin.

***Ab.:*** Min hinek tevdîr girtin Serokê min.

***---.:*** Lê te zêde tiştek rizgar nekir.

***Ab.:*** Bawer nakim.

***---.:*** Tu li xetîce nenêre, bi netêcê binêre. Ango te zêde tiştek rizgar nekir. Ger tu xwe bidî kuştin jî ti nirxeke wê nîne. Bi kurtî em ê li ser te hinekî din dahûrîna pêş bixin. Ya ji destê min tê ez ê dîsa bikim. Madem tu pir dixwazî, xatirê hevaltiya kevne, ez ê te neşkînim, bi anûra te nelîzim, lê teqez vê carê hûn jî hinekî fêm bikin. Hûn xwe dixin şûna evdala, min nexin şûna yekî wisa. Qet nebe vê carê cidî bin û şayanî vê bin. Teqez rêzdariya xwe lêvegerînin û ser bixin. Lê divê ku hûn vê jî teqez û bê aman pêk bînin. Divê ku hûn pir baş bizanin ku li ser navê me wê di asta herî jor de rist neyê lîstin, di kêliyê de ji bilî afirîneriyê bi şêwazekî din gav neyê avêtin. Hewceye ku şervanê xwe, kadro,

perwerde, taxtîkê rêxistinê, taxtîkê çalekiyê û divê ku ev tev jî têkil hev bên meşandin. Ez ji niha de vê hişyariyê li te dikim.

Belê, hevalê Yil. tu jî bi pratîka Amedê bifikire. Gelo wê tiştek ji destê te bê? Vaye ev rewşa Amedê rewşek pir zêde hûn jî dijîne. Te bi xwe got hîn aliyê çiya ku divê bên girtin nehatine girtin. Tu dibêjî; "*Çawa dibe ku ev aliyê çiyê ji bo gêrîla guncawe heta niha nehatiye girtin?*" Ev çi bê şermiye? Başe, ma dîtina vê niha hat bîra te, çima te berê nedît?

***Yı.:*** Serokê min serobero heye.

***---.:*** Ji ber sedema bi vî rengî ketina gundan bawerim salane windahiyek sê sed kadro û şervanan çêdibe. Em sê çar salan bihesibînin, bawerim herî kêm windakirina hêzek biqasî pênsed kesî ye. Tenê ji ber şêwazê xwe sipartina gundan.

***Yı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Çawa dilê we vê qebûl dike? Vaye tu berpirsyarê PKK'ê ye, ango negotin hêzeke me ya fermandar û ev nedîtin û pê nehizirîn. Tirsa min ewe ku tu jî biçî û ji vê re bibî amûr. Ango hêza te ya rê lêgirtinê nebe, wê demê tê çawa sifatê erkdariyê şayanî xwe bibînî?

***Yı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Belê, tu wisa yî. Bawerim tê pir erzan bimrî.

***Yı.:*** Em van derbas dikin Serokê min.

***---.:*** Bivê nevê. Belê, xwezî hûn nemirina û we rastiya xwe fêm kiriba. Li wir çiqas kesayetiyên bi fermandariyê dilîzîn û divê ku mirov heyfa xwe bi wan bîne hene! Ên li wir rêvebirin, ez ê çî wan rexne bikim, kî dera wan a neyê rexnekirin maye? Hîn te wek tê xwestin cihê çiyê yê ku bê girtin negirtibe, li ser gundiyê reben –qada ku herî zêde dihat çewsandin bû- tu her roj wek çewsînerekî, şêwazê erzan winda dike ferz bikî, me çi ji vê şoreşgeriyê fêm kir? Her roj bi dehan roketan vala biteqîne. Belê, ev heta niha jî nikarin fîşekekê, ewqas şervanan bi rêk û pêkî bikar bînin. Em devjêberdin ev me ber bi serkeftinê ve bibin, dibe sedema gotina dijmin ku dibêje; "*Me xeterî derbas kir.*" Li beramberî dijmin hinek hêrsên we, kîna we heye, lê em bêjin hunerê vê bi dijmin giran dayînê nîne. Gelo me karî em fêrî we bikin? Çiya ew kesayetiya ku li wir we şayanî xwe dîtiye, kesayetiya fermandar? Tolaziyek xeter heye. Taybetmendiyên muxalîf ên herêmî hene ku, bi van yan tê li beramber dijmin bin

bikevî, yan jî tê bibî nokerî wî û nikaribî xwe ji vê rizgar bikî. Hûn ê niha fêm bikin?

***Yı.:*** Serokê min em ê wî hêzî raber bikin.

***---.:*** Jixwe em jî mirovên ewqas zalimin ku me ew reben kiriye fermandarê wan hevalên wir. Ya rast divê em şayanî we bibînin, lê li aliyê din jî fikar nekirin û heta ji kenê xwe pêkirinê jî bi zorê xwe digirin. Hûn dihejin û xwe dihejînin. Ger tu derfet bibînî herî zêde tê bibî kesekî azadiyek erzan şayanî xwe dibîne ewqas. Lê kesayetiyên ku hinekî dixwazin şopa xwe li şûn xwe bihêlin wisa nabin. Gundiyek jî dema azweriya wî hebe ewqas bê îdîa nabe. Ango ew gundiyê ku em pir rexne dikin, ji bo hevjîna xwe, zarokê xwe, zeviyê xwe, bi xedarî şer dike. Ew hêza berxwedêriyê jî bi we re nîne. Hêza azweriyê jî nîne, di wateya fetihkirina peywirên siyasî leşkerî de jî azweriya we nîne. Dema ku teqez hûn xwe didin vê xweser dimînin.

Di dîrokê de ti kesayetiyên fermandar wîsa navdan nabin. Di bûyera fermandariyê de heta dawî şîlo ye. Bêxedarî nîne, teqezbûn nîne, hûn ji KT'yê fêrî çend peyvan bûne û di devê xwe de dibin û tînin. Hema bêje hûn dibin devê dijmin. Dîsa hinek fêrbûnên we yên gundîtî hene. Ev fêrbûnên we tiştekî nadin we. Dibe ku ji sedî heştêyên we ji dijmin pêk tên. Ez jî bi ser we de têm. Vaye hûn çima nabin fermandar. Ger ji sedî hêştêyên we ji daneheva dijmin, nokerî û rastiya civakî pêk bên, dê çî we yê saxlem bîmîne?

Hevalekî min ê kevin ê belengaz hebû digot; "*Te xwe li vir bi cih kir, da bicihkirin. Çiyê we di şûnde ma? Em mîna ... av dagirtîne. Dema ku te li cihekî da, ava heyî vala dibe. Ti aliyekî me yê saxlem nîne."* Dibe ku wî ji dijmin şopandibe. Dibe ku ya di nav me de ne ji sedî heştê be, ji sedî nod û pênc ji ber vê gotiye. Bawerim hûn bi temamî ne ji dijminin. Li beramberî wî jî hinek aliyên we hene, xwe dispêrim wê, ji wê bawer dikim û dibêjim. Başe, em çawa we bikin fermandar? Ez hîn çi bikim?

***Yı.:*** Xalên sereke hatine destnîşankirin Serokê min.

***---.:*** Daxwaz, hêrs û hêza te heye?

***Yı.:*** Serokê min heye.

***---.:*** Tu vê çûyîn û meşê şayanî xwe dibînî?

***Yı.:*** Şayanî xwe dibînim.

**---.:** Tê bikarî behremendiyên xwe bikar bînî? Behremendiyên te hene? Mesele aliyê te yê dîtina wî aliyê çiyê yê ku nehatiye girtin heye? Tê rast çiyê bibînî?

***Yı.:*** Di vê mijarê de serwerî heye Serokê min.

**---.:** Dema ku te dît, hêza te ya di cih de dayîna rûnişkaninê heye?

***Yı.:*** Heye.

**---.:** Di vê mijarê de tu ji xwe bawerî?

***Yı.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Bi hezaran çûn, hertim dixwest dakevin bakur û Başûr ne wisa? Hêjî meyla giştî wisa ye. Tê tevdîrên vê çawa pêş bixî, rê lê bigirî? Camêr li pê tirşikçitiyê ye, ango te jî dema ku nan nedît tê biçî gund, dema ku li gund jî nedît biçî gel dijmin? Tê çawa rê li vê bigirî?

***Yı.:*** Derfet zêdene Serokê min. Nexasim li wê qadê pir zêdene.

**---.:** Binêre, hîn dema ez di deh saliya xwe de bûm min nêçîra çûkan dikir, pîvok hebûn, min bêrîka xwe tijî pîvok dikirin û ji bo wan ciwanan li gel xwe bigirim dida wan û ew wisa mijûl dikirin. Ne diçûn gel malbatên xwe, dihatin gel min. We taxtîk fêm kir ne wisa? Ango divê tu bi tişta zikê wan têr bike bihizirî. Bi qasî ku tenezilî gund neke, bi wan bide bawerkirin lûtkeyên çiya berzin û bi coş wan îknayî bijartina çiya bikî. Ya duwem, lojîstîka gundiye. Erzaqe, nizanim çiye tê tenezilî van neke. Berevajî, tê di lûtkeyên çiyayan de hinek kereseyên xwe kom bike da ku çavê wan bêje; "*Xwarin di çiya de ye.*" hat fêm kirin? Dîsa mîna îsyangeriya gundîtî tê nebêjî; "*Em biçin qereqolê têlan qutkin û nizanim çi bikin*" çalekiya gêrîla wisa nabe.

Çalekiya gêrîla şêwazê wê li kî derê, çawa û bi çi awayî li dijmin bide ne diyare. Tê bikarî vê pêk bînî? Ji ber ku li wir li ku derê ne, çiqasin, dixwazin çawa lêdin, hemû ji aliyê dijmin ve tên zanîn. Ji ber ku zane jî ticarî gêrîlatî nayê kirin. Tê bikare rê li vê jî bigirî? Min sê rêgez ên rê lê girtinê gotin, hêza te wê têrê bike, tu dikarî li ser rûmeta xwe soza vê bidî?

***Yı.:*** Soz didim Serokê min.

**---.:** Çawa, tu dikarî çi bikî? Bêgûman ger tu ji rûmetê fêm dikî. Belê, temenê te çende?

***Yı.:*** 23 Serokê min.

***---.:*** Ji bo fermandariyê temenê te guncawe? Fermandarî têkiliya xwe bi temen heye?

***Yı.:*** Nîne Serokê min.

***---.:*** Nîne, çawa nîne? Fatîh Sûltan Mehmet dema ku Stenbol fetih kir di 23'ê saliya xwe de bû.

***Yı.:*** Dibêjim bi temen ve ne girêdayî ye.

***---.:*** Belê, bi temen ve ne girêdayî ye. Ji bo ku tu bibî fermandarekî baş çi ji te re pêwîste?

***Yı.:*** Girêdayî ked û eleqeya me ye.

***---.:*** Tê niha bikarî yê nû bisepîne? Me ewqas nirxandinên berfireh ên şer kirin. Hêza te ya soz dayînê heye?

***Yı.:*** Heye Serokê min.

***---.:*** Tê bikarî şiyariya mezin, tevdîrgirtinek mezin û çareseriyek mezin pêş bixî? Tê jî wek vanê din ji me re dujîna nedî? Te li vir dît kî dibe sedema dujîna û dujîn çawa pêş dikevin. Tê jî rê li vê vekî?

***Yı.:*** Na Serokê min.

***---.:*** Înşellah! Hêviya te ya serkeftinê heye? Li gorî te li ser vî bingehî serkeftin girêdayî çiye?

***Yı.:*** Bi hêmêzkirina kar ve girêdayî ye. .

***---.:*** Yek. Wekî din? Bêje. Bi lez bêje. Madem te xwe daye vê waneyê, divê ku tu mîna avê waneya xwe bidî.

***Yı.:*** Girêdayî kedek mezine.

***---.:*** Bi xirs himêzkirin, ked. Wekî din?

***Yı.:*** Bi îdîa bûn.

***---.:*** Hîn zêde bi azwerî bi ser kar de çûyîn, ev e. Wekî din? Rast bêje, tê çen xalên sereke bêjî. Îda, ked, wekî din çi pêwîste?

***Yı.:*** Bi kûrahiyek mezin bi ser karan de çûyîn.

***---.:*** Mîna fîlozofan ne axive, kûrbûn têgehek giştiye. Qûral û esasên şer hene, hêza bi dîsîplîn li gorî wan tevgerîn. Wekî din?

***Yı.:*** Kêlî bi kêlî şopandina dijmin.

***---.:*** Tê bêjî bi xedar şopandin ango bi çi ve girêdayî ye, ji bo ku tu bê eman dijmin bişopîne çi pêwîste? Wekî din li beramberî dijmin çi pêwîste? Yan tê pir hez bikî, yan li beramberî dijmin pir kîn bigirî, ango kînek mezin pêwîste, başe ev bi te re heye?

***Yı.:*** Kînek mezin heye Serokê min.

***---.:*** Heye. Zanistî û dîrokî ye?

***Yı.:*** Zanistiye.

***---.:*** Bi zanistiye û bi sosyalîstî ye. Ji bo serkeftinê wekî din çi pêwîste? Bêgûman ev ji bo te û ji bo wî jî derbasdare, ji bo we hemûyan derbasdare.

***Ab.:*** Şêwaz û rêbaz.

***---.:*** Me jê re got qûral. Qûral ev e; ev hemû tiştên ku me hejmartin qûralin. Ger ya despêkê bê girtin lûtkeyê çiya ye, ew qûraleke. Rast daketina gunde, bi armancê fetihkirinê dibe, ew qûrale. Ji bo temînkirina lojîstîkê, rast bikaranîna lojîstîkê qûraleke. Neketina şerê senger qûraleke. Li kî derê çawa tê li dijmin bidî ji aliyê dijmin ve nezanîna vê qûraleke. Gelik hesabên taxtîkî yên tên zanîn, ev hemû qûralin û hertim bi afirênerî qûral sepandin, ev jî qûraleke. Wekî din çi pêwîste?

***Ab.:*** Tevdîr, însîyatîf û lez.

***---.:*** Tevdîr, însiyatîf û lez heman têgehin. Ev hersê bi hev re kêlî bi kêlî tevgerînên ku divê bên sepandinin. Ji bo hûn serkeftinê wekî din divê hûn çi dîqat bikin û hûn ê bi kê re şer bikin?

***Yı.:*** Bi dijmin re Serokê min.

***---.:*** Temam em bi dijmin re şer dikin, lê bi kê şer dikin?

***Yı.:*** Bi gel, hevrêyan.

***---.:*** Ev têgehên giştîne. Ango tu di yekîneya xwe de şer dikî. Ya din jî yê di ser te re heye, bi te re hene, ango bi rêveberiyê, fermandariya jor û şervanên jêr re, tê çawa nêzîkî pirsgirêkên van yan jî şêwazê meşandina van a têkiliyan bibî? Tu girêdana bi fermandiriya jor re dizanî?

***Yı.:*** Di vê mijarê de gûmana min nîne.

***---.:*** Ji bo rast meşandina jêr çi pêwîste?

***Yı.:*** Eleqeyek zêde.

***---.:*** Eleqe, şênbertir perwerde, asta rêxistinkirinê û moral pêwîste. Ger şervanek hinekî ji xwe bêzar bûbe tu nikarî wî di nav artêşa azadiyê de bigirî. Lê di nav yekîneyên we yên herî kevn de çawa bû?

***Yı.:*** Rev zêde bûn.

***---.:*** Ti têkiliya vê bi awaya artêşa azadiyê û asta daxwaziya wê re heye?

***Yı.:*** Nîne.

***---.:*** Nîne, başe we çawa nedît? Tu jî nekeve heman kêmasiyê?

***Yı.:*** Di vê mijarê de ez ê hewldan raber bikim.

***---.:*** Ango bi moral, xwestek, bi coş ger te şervan bi hev girênedan ew ne yê te en, yê dijminin. Te fêm kir? Ji bo vê min di deh saliya xwe de çi kir? Jiyana herî xweşik li gel min e. Ev jidil dibe, tu bi zorê hinek tiştên ne sepîne, tê rê li revê vekî. Ji ber pêdiviya qûral, a fermanê wisa ye tu xwe nexapînî? Te fêm kir? Ev xalên sereke yên şerin.

Bi çewsandin û xwe ferzkirinê artêşa gel nayê birêvebirin. Wekî din çi pêwîste? Uslûb, xîtab û otorîte pêwîste? Tu serê xwe dihejînî, fermandarekî baş serî nahejîne, ya din jî tu bi hêz na axivî. Xîtab, taybetmendiyek sereke ya fermandare. Mîna helbestan axaftin ji serdema Romayê maye û hertim derbasdare. Bi kem kum kirinê mirov nikare bibe fermandarekî baş. De îca tê pir baldar bî Ab. Ji ber ku hêza axaftinê jî, hêzeke herî mezin a daxwaza mirov ji holê radike ye. Dema ku te gotina herî eleqedar, ya herî balkêş bikaranî wê hêza te ya herikînê zêde bibe û jixwe bê vê jî nabe. Hat fêmkirin? Bi dujîna nabe, bi çewsandinê nabe, de îca bi zimanê şîlo qet nabe.

***Yı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ji bo ku xwe bibandor bikî wekî din çi dihizirî? Gelik nêzîkatiyên bertekan diafirînin, rêzdariyê raber nakin hene, ma tu di ferqa van de ye? Tê çawa xwe bigihîne asta kesayetiyek tê hezkirin û rêz lê tê girtin? Ger hêza ku te ji me girtiye xirab bikar bînî tê mahf bibî. Bi behremendiyên xwe yên taybet û afirêneriya xwe encax tu ewqasî bikî. Çend kesên ku bi vî re biçin Amedê hene? Hûn dê bikarin kesayetiya vî rakin?

***Me.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Nebe bar, we tengav neke?

***Me.:*** Wê tengav neke Serokê min.

***---.:*** Yên din çi difikirin, hevalê Ser.?

***Se.:*** Na Serokê min. Li gorî dema borî heval gelikî xwe sererast kiriye. Wer xwuya ye.

***---.:*** Teqez, hûn ê bikarin wek hevalekî xwe, kesekî jorê xwe pê re bimeşin?

***Se.:*** Em ê bikarin Serokê min.

***Bo.:*** Li gorî dema borî heval gelikî xwe pêş xistiye Serokê min.

***---.:*** Wê bikara şayanî rayeyên ku me danê be, şayane?

***Bo.:*** Dikare bike Serokê min.

***---.:*** Li gorî we dikare ev perspektîf û qûralên ku me li pêşiya wî danîne pêk bîne?

***Bo.:*** Serokê min, dikare van perspektîfan pêk bîne.

***---.:*** Yên din jî bawerin, dipejirînin?

***Se.:*** Belê Serokê min.

***X.:*** Kapasîteya wî heye Serokê min.

***---.:*** Tu jidil tevlî xebatê wî dibî?

***Se.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Bêgûman hûn ne leşkerên kolene, leşkerên azadiyê ne. Heman rêgez ji bo we jî derbasdarin.

***Se.:*** Belê Serokê min. Teqez em ê van rêgezan pêk bînin.

***---.:*** Lewra divê hûn jî xwe ji fermandariyê re amade bikin. Heman tişt ji bo we jî derbasdar e, hûn niha di ferqê de ne, di binê van hemû nebesiyên ku li Amedê tên jiyîn perpirsyariya we heye. Ya ku em di şexsê kesekî dî didahûrînin şerkeriya Amedê ye. Hûn ji xwe bawerin, hûn ê derbas bikin?

***X.:*** Belê.

***Se.:*** Em bawerin ku em ê derbas bikin Serokê min.

***---.:*** Em we jî bişînin? Belê, navê te çi bû?

***Me.:*** Me. Serokê min.

***---.:*** Me. Tu li ser esasê vî şêwazî, bi vî tempoyî û bi vê armancê amade ye ku biçî?

***Me.:*** Amade me Serokê min.

***---.:*** Dê serkeftin ji destê te bê.

***Me.:*** Ji xwe bawerim.

***---.:*** Navê te çiye?

***Se.:*** Se. Serokê min.

***---.:*** Belê Se., tu di vê çarçoveya ku me diyarkir de amade yî?

***Se.:*** Amade me Serokê min.

***---.:*** Bi rastî jî tu arasteyî serkeftina ku tê awatkirin a mezin dibî? Ew behremendiyên te hene? Ez çawa ji te bawer bikim?

***Se.:*** Ez pir ji xwe bawerim ku perwerdeya min ji vir girtiye ez ê veguhezînim wir û xwe amade dibînim.

***---.:*** Ji we re nabêjim biçin Stenbolê û Romayê fetih bikin, qet nebe hûn ê bikarin gundê xwe fetih bikin, ji bo ku ji vê îşkence û linavbirinê rizgar bikin tê bikarî hinek tiştan bikî?

***Se.:*** Em ê hewl bidin şayanî soza ku me daye bibin Serokê min.

***---.:*** Dibe ku hûn bimrin jî. Mîna Ab. Kirî, dikarin sefera mirina dawî vesaz bikin. Ew jî tiştekî rizgar nake.

***Se.:*** Na Serokê min. Karê herî dawî bikim wê ev be.

***---.:*** Tê herî dawî bi vê bifikirî. Ango beriya wê bila tenê dilopek xwîna ku ji damarê te biherike nemîne, tê fêmkirin?

***Se.:*** Tê fêmkirin Serokê min.

***---.:*** Ev gotin tê çi wateyê? Navê te çi bû?

***Bo.:*** Bo.

***---.:*** Botan, Te jî fêm kir, ev gotina ku dibêjim tê çi wateyê?

***Bo.:*** Dema em hatin jî me gelik tişt bi xwe re anîbûn. Li vir bi hêza ku me ji dahûrînên Rêbertî girtin em ê bi ser pratîkê de biçin û em ê hewl bidin di gava yekem de van jiyanî bikin. Vê ji xwe re bikin hedef.

***---.:*** Dibêjim, dema ku hûn mirin bila dilopek xwîna biherike di damarê we de nemîne. Tu vê çawa fêm dikî?

***Bo.:*** Di kesayetiya xwe de yên heyî em ê bixin tevgerê.

***---.:*** Tu çawa fêm dikî fermandarê ecemî, şîrove bike, berevajî tu nikarî hêza fermandariyê fêm bikî, nemaze tê nikaribe bixe tevgerê jî. Tu şîrove bike Ab. Ecemîne, zêde zanîna wan nîne.

***Ab.:*** Heta mirinê her tişt dayîn, hemû hêz û behremendiya xwe xistina tevgerê têkoşîn kirin û tiştek bi xwe re nebirina gorê.

***---.:*** Li gorî te min xwe gihandiye vê xalê? Ango ez niha bimrim dilopek xwîna min jî nemaye.

***Ab.:*** Divê xetê de ye.

***---.:*** Divê xetê de ye, di xetek çawa de ye? Çendîn sal beriya niha me xwe gihand vê astê. Dema ku dijmin li min bide wê bêje; “*Xwîn di vî de nemaye.”* Bi hêza xebatê ya pir zêde ku em raber dikin, jixwe kesên wisa dema ku hatin kuştin, mirine, mayîne zêde diyar nabe. Bi rastî jî fermandar wisa ye. Rewşa we mîna berxên qurbanê ne. Dema ku tu kêrekê lê bide dê hema xwîn bipijiqe.

Çima xwîna berxên qurbanê pir dipijiqe? Ji ber ku hûn ne jiyane ji bo wê. Herwerha dema ku te hinek heyber wisa kuştin, tu dilopek xwîn naherîkînî. Ji ber ku hemû jiyana xwe jiya ye û xwîna ku birjîne nemaye. Vaye rewşa we dişibe ya berxên qurbanê. Dema cihekî xwe birîn dibe hema xwîn jê dipejiqe. Ne ku nemaye, we tenê dilopek xwîn jî bikar ne anî ango dilopek xwîna we ya ku hûn bikarbînin nîne. Hemû jî di nav we de ne. Hûn dixwazin biherikînin, dişibe şêwazê berxa qurbanê. Her roj wisa tên kuştin. Ev kuştinên erzan ên di bîst saliya xwe de, şêwazê berxa qurbanê ne.

Di şerkeriya PKK'ê de, di hêza Rêbertî de bi qasî tu vê derbas bikî heyî û rastî. Vaye hûn ê biçin, divê ku hûn wisa biherikînin. Ne bêxwînin. Fêm bikin, ger fêm nekin ez ê dujînên herî xirab arasteyî we bikim. Ji destê min rizgarbûna we ne gengaze. Belê, tu fêrî dilop bi dilop herikandina xwîna xwe bû, dema ku tu mir dê xwîna te nepijiqe, temam?

***Yı.:*** Hat fêmkirin Serokê min.

***---.:*** Ger dipolek xwîna we ye ku bê herikandin nemabe hûn yê herî serkeftîne. Hat fêmkirin?

***Me.:*** Hat fêmkirin Serokê min.

***---.:*** Hûn fêm dikin ne wisa?

***Se.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Ger ez bibihîzim di bin fermandariya we de her roj berxên qurbanê diçin, wê demê divê ku ez çi ji we bikim? Dibe ku em we nekujin, lê herî kêm em ê heyf pêşwazî bikin.

***Yı.:*** Em ê hewl bidin derfet nedin vê.

***---.:*** Li ser vî bingehî yekeyek çar kesî, ger hûn dixwazin çil kesî jî tevlî xwe bikin, qet ne girînge, çar hezar kes jî dikarin bimeşin, cewher hemane. Me baş hûn amade kirin, azweriya mezin pêk hat?

***Se.:*** Belê Serokê min. Nexasim ev dahûrînên Rêbertî yên dawî perspektîfek mezin pêşkêşî me kir.

***---.:*** Perspektîfa mezin, azweriya mezin, tevdîrên mezin, gelo hemû jî hinekî ava bûn? Hûn xwe mîna ba hîs dikin?

***Yı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Hûn gihîştin asta bayê?

***Yı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Lê jibîr nekin ku, hûn li wan deran reşebayan radiwestînin.

***Se.:*** Em ê ji niha û şûn ve jibîr nekin Serokê min.

***---.:*** Yekîneyên ku hûn ava dikin, ya ku em ji we re dikin, di nav ewqas karî de karekî ji rêzê ye. Hûn bi şer û roj li pêşiya yekîneyane. Hûn ê çil qatî ji ya ez dikim zêdetir bikin. Fermandarî wisa tê avakirin. Binêrin, we ez dîtim, hinekî rêzdar bin. Ev kar bi çewsandinê, nizanim bi şêwazê axatiyê nabe. De îca bi feraseta leşkerên navdêr ên KT'yê qet nabe. Van çiyayên ku hûn dê biçinê di dîrokê de gelik sefer li wan deran hatine kirin. Gelik fetihên mezin, karên navdêr jî hatine kirin. Ger hûn wateya wê bizanin bi hêviyan, azwerî û bi hesta kîn-hêrsê dagirtî –ger ev bi we re hebin- hûn ê bijîn. Rêk û pêk nekirina yekîneyê, rast bi karne anîna çekê, rast binke negirtinê dê neyê aqlê we jî. Ger hûn wisa bin, em şer erê dikin.

***Yı.:*** Wisa ye Serokê min.

***---.:*** Ger hûn giryokin, rebenin ez dîsa jî dikarim we xwedî bikim.

***Yı.:*** Na Serokê min.

***---.:*** Derfetên min ên demdirêj xwdîkirinê hene.

***X.:*** Serokê min, ya bê dayîn hat dayîn. Tenê dahûrîna Rêbertî ya dawî esas bêgirtin dê serkeftinek mezin bê bidestxistin.

***---.:*** Ango naxwazim bi berxê qurbanê kar pêş bixim. Teqez bi wan re kar nakim. Niha derfetên min hene. Ez ê şer bi çêkera xwe ve bimeşînim, lê ger hûn pir bi xwestekin û dibêjin; "*Em pir amadene, nizanim em pir dixwazin"* ez ê nebim asteng. Lê çarçoveya ku em erê dikin jî ev e.

***Yı.:*** Em amadene Serokê min.

***---.:*** Di kesayetiya we de tenê ne li eyaletekê, dibe ku hûn ber bi qadên cîran ve jî veguhezînin. Herweha em erkdarê fetihkirina welatin. Paşê hûn carek din nekevin rewşa belengaza û dernekevin pêşberî me. Hûn tên vir rewşa we wêrane. Nekin! Divê ku hatineke we ya fermandarên bi heybet hebe ma ne wisa? Ger hûn pênc, deh salan di şer de man, teqez divê ya serkeftin ya serkeftin be, wekî din hûn nikarin derkevin pêşiya gel. Vê carê hûn ji vê bi tamamî bawerin?

***Yı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Em paşê we di rewşa pîlên xwe xilasbûyî, nizanim kî dera we derbasî kî derê we bûye de nebînin.

***Se.:*** Em ê xwe nexin wê rewşê Serokê min.

***---.:*** Nexin wê rewşê, ango li wir nan nîne, îşaretên mezinbûnê, nizanim derfet nînin, na hemû hene. Ma mirov xwe li wir nake leşker, perwerde nake? Dema ku mirov naçarbûn bê qada Rojhilata Navîn, wê demê tê. Di dîroka me de jî pir hatin çêbûn. Lê me pir dubare kir û eşkereye ku bi armanca perwerdê bû. Ew jî pir baş hat dîtin. Sepandin peywirek xedare. Belê em di kesayetiya vê komê de bawerin ku, ger qezayek çênebe, saxlem bigihêjin cihê xwe, destnîşankirin dê xedar bên pêk anîn û dê li vir çarenûsa her tiştî bê guhertin. Em dihizirin dê her tişt di vê çarçoveyê de bi wate bibe û pêşketinê bên destxistin. Û hûn jî soza vê didin.

***Bo.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ewqas nebesî şayanî fermandar, heta şervan jî nabe. Rûmeta fermandar heye, nakeve nav ewqas nebesî û xeletiyan, tenezil jî nake. Ev ji bo gel pêwîst in. Dive weke şans ji bo we ne girîng be, lê ji bo destûrên me yên leşkerî, gel û dîrokê pêwîstin. Weke tak hûn jî dikarin bibin, lê anora PKK'ê û dema leşkerê PKK'ê bû mijara gotinê, gelik tiştan rave dike. Hûn nûneratiya vê dikin, ne ya xwe. Em vê derketinê bi dîrokê didin kirin, bêgûman dema ku wisa be hûn nikarin bêjin; "*Ev taybetmendiya min a takekesî, ev fikara min, ev nebesiya min."* Eman vê nebêjin û xwe nedin xapandin. Ligel vê, ti fêda ku ev bide we nîne. Li ser vî esasî bi temamî soz heye, kûrbûna armancê heye. Teqez pêwîste ev bi hostayî bi we re pêş bikevin. Tenê bila rewşek ne asayî, qeza û belayek ji dervî vînê we nebîne. Ya ku li şûnve dimîne hûn ê pêk bînin. Dixwaze bila kesek be, dixwaze çil kes, dixwaze jî bila çar sed kes bin wê li ser heman bingehî bimeşin û ser bixin. Te tiştek fêm kir?

***Ve.:*** Fêm kir Serokê min.

***---.:*** Heman tiştên ku me gotin ji bo te jî derbasdarin.

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Temenê te çend bû?

***Ve.:*** 23.

***---.:*** 23. Hûn di heman temenî de ne. Dibe ku tu pir ciwan û bê ezmûn be, lê ez bawerim tu jî dibêje ez amade me?

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Em te jî bişînin?

***Ve.:*** Amademe Serokê min.

***---.:*** Ango di vê çarçovê de me Xerzan jî xist nîqaşê. Tu dibînî, hêjî li ser hev nûçeyên wir tên. Tê xedar bi ser de biçe. Ango ji bo we jî ger qezayek nebe hûn ê bigihîjin wir, sererastkirin û rastî serwerkirin mijara gotinê ye. Ev armance yan jî ev erkek sereke ye, ya li şûnve dimîne rista xwe lîstine. Tu dibêjî ez amade me, lê te xwe nexapandibe?

***Ve.:*** Serokê min, ev derbas bûye. Me serweriyek diyar li ser çiya çêkiriye. Rewşa ku qad di nav de ye, bi vê pratîka dawî ya şer jî derketiye holê.

***---.:*** Lê hûn dikarin bi ser camêran de biçin. Bi textîk mirov diçe, bi qûral diçe, lê ya ku ew serê kêliyê carekê dibêjin; "*Çûn gund peywirê"* tu bixwe jî dizane ku kom bi kom mirov winda kirin. Ew peywira ku dibêjin çû gund ji bo rizgarkirina tirşikê û cixareyekê ye. Ma fermandarekî rast komê wisa dişîne? Dîsa fermandarekî binkegirtibe, ma wisa zêde yekîneyan jin binkeyê wan dadibezîne? Komek biçûke, lê ewqas jî bêqûrale. Hûn ê çawa rê li vê bigirin? Ma ji vî karî fêmkirin ewqas zahmete, hûn hêjî fêm nakin? We li Mêrdînê dît û we bixwe jî jiyan kir. Li Mêrdînê bi nexweşekî re heft birîndara li gund dihêle û paşê jî dibêje bîrîndar nekarîn bimeşin. Kî dizane ji bo erzan bijîn çend rojan li wir mane.

***Ve.:*** Berdewamkirina şêwazê kevne.

***---.:*** Sê camêrên mîna te û çend çekên me yên val diçin. Bêwîjdano! Qet nebe bile dilê we bi dê û bavê xwe bişewite. Çiqas bi rehetî dibêje şêwazê me yê berê. Xisletên te yên fermandariyê hene, tu hinekî ji xwe bawerî û baweriya te bi te heye?

***Ve.:*** Bixwe bawerim Serokê min.

***---.:*** Hêrsa te heye, tu bi xwestekî? Însiyatîf, baldarî û tevdîrên te çawa ne?

***Ve.:*** Serokê min, di rewşa niha heyî de bixwe bawerim.

***---.:*** Tu bi hestên serkeftinê, azweriyê dagirtiye?

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Tu çûyîna qadê digirî berçavê xwe? Dîsa çiyanên qadê yên ku nehatine girtin hene û hemû di derdora çiya dizivirin.

Diçin cihên wisa xeter û biqasî ku wisa bikevin nav zeviyê mayîna korin. Di lûtkeyê wan çiyan de, di nav wan taht û zinaran de çawa pêl mayînê dikin ez matmayî dimînim. Bi rastî jî matmayî dimînim. Tê biçî û bikarî bi sitûyê wan bigirî? Tê bikarî ji hinekan re bêjî; "*Tu kiye, çiye, çawa wisa tevdigerî?*" tê vê hêz û şiyariyê raber bikî? Berî hertiştî baweriya te bi pêdiviya vê heye?

***Ve.:*** Bawer dikim Serokê min.

***---.:*** Başe çiye, min fêm nekir? Min jî ew dîtin, çiyayên wisa hene ku, tu kes nikare xwe bigihînê. Ya ku fêm nakim, cihê ku tu nikare konrtol bike çima xwe lê bi cih dikî? Gêrîlavanek cihê ku nikare kontrol bike nikare gêrîlayê xwe bide meşandin. Binêrin, despêkê çi dike? Mînak, şêr despêkê xwe baş amade dike. Em jê re bêjin taxtîkê şêr. Zinare, ji bo parastinê guncawe û mîna kefa destê xwe nasdike, paşê hêdî hêdî dadikeve. Her çîhê ku dadikevê jî bi pîlan digire bin venerîna xwe, nexasim bi şev cihên ku dijmin kemînê davêje xweber meş tê de çênabe. Ez ê bi dubarekirinê van ji kê re bêjim? Qaşo gêrîlatiyê pêk tînin. Ez ji vê re dibêjim, meşa çavkorî, bi darê zorê û tevî ku qet pêwîst nake.

Rewşa li Xerzanê diqewime çiye? Di salê de çend sed mirov windakirin? Jixwe fermandarê wan ji dema borî de mîna kesekî xwe nenas û muxtarekî ye. Xwe di mala kê de vêdişêre.

Wek di mînaka şehîd Merwan de hat dîtin nizanin ji aliyê kê ve jî hatiye şehîdkirin. Kontr gêrîla tê, dema ku rojname di desta de ye dikuje û bixwe dikeve. Fermandarê alayê ye. Tiştek neyê bawerkirine! Qaşo li wir di rehetiyê de dijî. Tenê waneyên ku ji vê bûyerê bên derxistin ewqas zêdene. Ma me li vir rehet jiyan kir û piraniya wan wisa daketin gundan, piştre alîgirê fermandar, piştî wê alîgirê din wisa hemûya dawiya xwe anîn. Hêjî li derdora xwe dizivirin. Ger hûn girêdayî jiyanê ne ma çima ji Stenbolê derketin? Çima hûn ji mala bavê xwe derketin? Min di deh saliya xwe de fêm kir ku di gund de wisa nayê jiyankirin. Te îsyana yekem guhdar kir, çi wateyê rave dike? Îsyana yekem hizra wisa li gunda nayê mayîne, te fêm kir?

***Ve.:*** Fêm kir Serokê min.

***---.:*** Wateya xwe eve Ab.?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Hêvîdarim ku tu di romanê de cih bidiyê. Ango bi wê rewşa xwe ya zarokatiyê di wê malbatê de, di wî gundî de ji ber ku min got nabe bimînim, îsyan da despêkirin. Hêza min têrê nekir, min devjêberda. Lê hûn di heman demê de li serê gundê perîşan, mirî dibin bela. Paşê jî dibêjim bila min bide jiyîn.

Hîn di deh saliya xwe de min fêm kir ku wisa nayê jiyîn û ji gund derketim. Qet jiyanê nizanin, diçin xwe dispêrin gundan. Jixwe yê mirî miriye, çawa di şer de tenezilî bêqûraliyan dikin? Ger ez bêjim hûn çima ji mal û malbata xwe cuda bûn, hûn ê bêjin; "*Ji bo azadiyê."* Azadî di lûtkeyê çiyayan de veşartiye. Ji serê kêliyê carekê bûyîna bela serê gel ti pêwendiya xwe bi azadiyê re nîne. Hûn çiqas muhafazakarin.

Di îsyana yekem de ez çawa di kêleka gund re derbas bûm min ji we re vegot. Ji ber ku xeteriya girtina min hebû henase bi henase mîna ba bêy ku bal bikişînim di gund re derbas bûm. Hûn fermandarên mezinin, cihên ku hûn diçinê, cihên ku hûn tê de derbas dibin tenê nizanim dijmin çî we nizane. Hûn di navenda wî re derbas dibin, hema bêje ji bo ku hûn bêjin va em li virin û were li me bide ya ji destê we tê dikin. Ez zarokekî deh salî bûm, dîsa di wê îsyana xwe ya ji rêzê de jî ez ewqas tevdîr digirim. Lê hûn fermandarê gêrîla ne, ewqas bela tînin serê me. Xwedê we îflah bike. Ma wekî din çi bêjim, ji we re çi vebêjim? Qaşo hûn di bin fermandariya me de şer dikin, ma baweriya we bi dibin fermandariya me de şerkirinê heye?

***Ve.:*** Bawer dikim Serokê min.

***---.:*** Başe çawa dibe ewqasî bi fermandariya me tê lîstin? Hûn leşkerê kî derê ne, kê hûn kirin leşker? Bi zorê hûn bûn leşker? Hûn ê bibin leşkerê şêwazê me? Ger hêza te nîne bêje.

***Ve.:*** Heye Serokê min.

***---.:*** Tu jî li Amedê bû, tu dizanî çi hat serê Amedê. Ev heman dijmine, li çiyê jî camêran wisa difetisîne. Tu ji bo vê tevdîrên xwe digirî? Li vir hemû gel qetil dikin, tu dikarî rê li vê bigirî? Tu bi xwe re berpirsyariya vê dibînî?

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ger tu xwe berpirsyar dibînî, tê bi tevdîra vê ya mezin jî bifikirî. Ger na dê camêran bigirin, piştî îşkenceyek mezin bi fîşekekê bikujin. Jixwe bûyerên kujerên wan nediyar hene, ji bo rê girtin li vê tê çi bikî? Ha ji te re hêza PKK'ê, ji te re çeka

PKK’ê, tê bikarî vê bikar bînî? Tu niha fêm dikî ev çiqas pêwîst û girînge? Ji bo tolgirtinê bi hêrsî, dixwazî tiştekî bikî?

***Ve.:*** Pir bi hêrsim Serokê min.

***---.:*** Ji bo vê pêwîstî bi hewldanek pir mezin heye. Berî hertiştî ev rezaleta li Xerzanê û laûbalîtî divê bi dawî bibe. Her roj dibêjin nizanim bi ku dera wan de mayîn teqî û çû. Ev çiye, em çi bikin? Ma kesî ji te re dibêje derkeve heye? Ger hêza te ya meşê nîne, li cihê xwe de rûnê. Ger tu derketiye yan tê bişibe şêr, yan jî rovî. Ez nikarin hertiştî ji we re vêbêjim. Jixwe bi mehane vedibêjim. Bawerim tu cewherê kar fêm dikî?

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Tê bikarî pirsgirêkan rast bigirî dest, çûyîna te ya despêkê wê serkeftî be? Tê mijarê em ji şervanê ji rêzê bigirin, qaşo heta rêveberiyê, yên ku fermandarê jidilin, tê bikarî bi awayekî rast ji wan re veguhezînî? Tu rojane di van mijaran de xwe pîlan dikî, tu di vê mijarê de henase bi henase kar dikî?

***Ve.:*** Lêhûrbûn heye Serokê min.

***---.:*** Pirsgirêk, nexweşî dîtin, teşîsa wê di dema xwe de kirin, tu kêlî bi kêlî pêdiviya tedawîkirinê dijî?

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Li gorî te ji bo wir pirsgirêk çiye, hema mîna Amedê ye? Pirsgirêka yekem cihê yekem ê çiya ku bê girtin yan jî qada ku divê bê girtin negirtine?

***Ve.:*** Raste Serokê min. Pirsgirêkên wisa bi pêşxistina şêwazê fermandarî û feraseta binkegirtinê dikarin bên derbaskirin.

***---.:*** Pirsgirêk, şêwazê fermandarî, binkegirtin û şêwazê tevgerê ye? Şêwazekî xelet ê binkegirtinê heye ne wisa?

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Tê bikarî rê li vê bigirî? Lingê yên bi şêwazê tevgerînê dilîzin bişkîne. Pêdivî bi hewldanek mezin heye, li gorî te ji binkegirtinê direvin?

***Ve.:*** Çavkaniya xwe ji jiyana rehet digire.

***---.:*** Belê, jiyana rehet, xwezî bizaniyan bijîn. Gelo bêjim ev xayînin? Rehetî wisa nabe. Li vê rewşa min binêrin, ez jî bi rêgezim. Bi awayekî rehet xwadayîna jiyankirinê em li aliyekî bihêlin, qet nizanim bidim jiyankirin. Divê ku hûn bikarin bêjin fermandar wisa, serfermandar wisa ye. Ev camêr dê çawa xwe

rehet bidin jiyîn? Ma hûn şêtin? Ger serfermandar wisa be, yê li çiyê dê çawa bijîn? Ma mirov bi rastiya kar ewqasî dilîze.

***Ve.:*** Muhaseba wîjdan.

***---.:*** Devji wîjdan berde, hûn ê bibin berxê qurbanê û hûn dê nejîn. Jixwe wîjdan hebûya nediketin van rewşan. Dîsa ez fêlbazim, hêjî hevî dikim ku bijîm, hêviya şîrovekirina jiyanê dikim. Jixwe ji niha û şûnde ji bo me jiyan şere. Te fêm kir, jiyan şere, şer jî hemû tişta ku bêkirine.

***Ve.:*** Min fêm kir Serokê min.

***---.:*** Pir mezin û rast hizirin, perwerdekirin, binkegirtin, ev û ew. Jiyan ev e. Xwedêyo, ya rebbî. Li vê xeletiya mezin binêrin, ev camêrên me çima wisa tevdigerin? Çine ev tevgerîn? Fêrasetên kîja jiyanê ne, ferasetê kîja jiyana rehetin, ev feraset ji kî derê girtine? Em ê çawa bikarin van ji vê ferasetê rizgar bikin?

***Yı.:*** Bi pêşxistina şer.

***---.:*** Temam tê çawa pêş bixî? Camêr ji şer direve, ji binkegirtinê direve, camêr ji şêwazê rast tevgerînê direve, tê tevdîrên vê çawa pêş bixî?

***Ve.:*** Pêwîste rastî bên ferzkirin Serokê min.

***---.:*** Ev rastiyên giştîne. Me di çîrokê de hinekî anîn ziman. Ango tê taxtîkê mar bi ziman xweş ji kunê derxistinê, textîkê nêçîrvan yan jî taxtîkê dehşetê, kîja ji van bikar bînî?

***Ve.:*** Hewce dike ev hemû di nav hev de bên bikaranîn. Yên ku pratîka niha afirandine wisa dizanin ku di hinek mijaran de vî textîkî bikar tînin.

***---.:*** Xafîlno! Xafîl bi çi tên şiyarkirin?

***Ve.:*** Divê ku şêwazê tê zanîn em wan fêrî di cih de pêkanînê bikin. Bi tevdîr û hay ji xwe heyî tevbigerin.

***---.:*** Înada Kurd heye. bêqûraliya Kurd û girêka kor a kurdan heye. Ev hemû di kesekî de tên jiyîn. Pir bi înadin, tê çi ji wan bike? Camêr bi îdane. Ji bo cixareyekê dikare hemû tiştî ser û bin bike. Li gorî min divê ku hûn îkna bikin ku ji cixarê bi nirxtir tiştekî din jî heye. Dibêje şorbeyek, divê ku tu bidî îkna kirin ji şorbê bi hêjatir heyberek heye. Tê bidî bawerkirin ne wisa? Ez jî hêza xwe ji vê digirim. Jiyana azad bi min re ye. Dixwaze bila bireve, tenezil jî nakim. Ewqas bi ser wan de diçim, dixwaze bila birevin. We bi çavên xwe dît, me ji bo we tiştek îspat kir, di vê wateyê de çarçoveyek berfireh heye, derfetê

jiyanek bi rûmet heye, hûn bi vê ve girêdayî dimînin. Temame? Ger na ez jî cixreyekê pêşkêşî we nakim. Li şûna şorbekê, ez şorbeyek din jî bi we nadim vexwarin. Min hinek xalên din ên ku pê ve bên girêdan pêşkêş kiriye. Di bingeh de ez Rêbertiya xwe wisa didomînim. Hûn ê vê bikin ne wisa, tevdîrên vê bigirin.

***Yı.:*** Belê Serokê min, em ê bi armancê ve girê din.

***---.:*** Piştî wê ger pêwîst bike ez mar bi zimanê şêrîn ji kunê derdixim, hem jî dimeşînim û ger ez ê ser de jî biçim, dê nizanibe çawa hatiye kuştin jî. Ji ber ku di nav şer de rev xetere. Ji piştê de xencerbûn xetere. Tê vê baş tesbît bike û di rewşa bêbandor de bihêle. Ev hemû xalên sereke yên ku divê fermandarek li pê wan bibeze ne. Mînak; Wedat Aydin çawa linavbirin? Hinekî bi xapandinê ango ji bê çaretiyê ye? xapêneriyek dîrokî ye.

***Ve.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Lê heman taxtîkî niha di hemû Kurdistanê de bikar tînin. Li gorî min li ser we hemûyan pêk tînin. Çiye ev taxtîk? Bê amadekarî zevtkirina dijmin ya we ye ne wisa? Şîlobûna dijmine. Ger tu hinek dijmin wek dijmin fêm nekî nikarî tola xwe rakî.

Ez Wedat tawanbar nakim, polîse dibêje; “*ya Xwedê*” ango dikare bi wan re biçe jî. Di çarçoveya zagonî de tiştekî bê kirin nîne, lê ev niha taxtîkekî giştiye, eşkereye ku dijmin bi fêl tê. Eşkereye hinek caran di postê berxikê de tê û ya herî girîng jî ji kêmasiyên me sûd werdigire. Qet nebe piştî ewqas dahûrîn xwe ber bi gurê di postê berxikê de tê nexin ango nedin xwarin. Ev hemû berxikin. Wê lî kîderê rehet bijîn? Ma li Amedê karîn bi rehetî bijîn? Niha welatparêzek dikare bi rehetî bijî? Ger xwe bi rêxistin neke, rojane di sengerên şer de cih negire û di şêwazê şer de cih negire ma gengaze bijî?

***Ve.:*** Ne gengaze Serokê min.

***---.:*** Tu di ferqa vê ferasetê de yî? Bila tu demê gelê me wisa texmîn neke ku dê bikaribe xwe bide jiyankirin. De îca sê-çar rojan ev şervan di gundan de hiştin, tê wateya bê tevdîr meşê. Ew rewşa ku hûn dibêjin bûyîna endamê dijmine. Ketina kemîna dijmin a girtina berxika qurbanê ye. Tenê ne fermandar, divê ku êdî leşkerek jî, heta welatparêzek jî neyê vê lîstokê. Hûn tiştek fêm dikin?

***Ve.:*** Fêm dikim Serokê min.

***---.:*** Çiya di vê wateyê de divê pir baş bê nirxandin. Ji ber ku tu di pêvajoya linavbirinê de ye. Gêr pêwîst bike dê vekirî jî li ber xwe bide ango mîna gurê di postê berxikê de te bixwe. Tê nirx bide çeka xwe, ji ber ku li wan dera çek bi zahmetî peyda dibe. Tê qimeta şervanan pir baş bizanî, ji ber ku tu bi wî hatiye afirandin. Em devjêberdin dayîna revandina wan, tê bi şêwazekî neyê bawerkirin mezin bikî. Ji ber ku wekî din tu nikarî bijî. Dijminê bi qanûnê, bi îşkenceyan di dawî de jî bi awayekî wahşî wê qetil bike û bavêje naverasta rê, jixwe her roj wisa dike. Berpirsyariya mezin, tolgirtina mezin ango ev hemû pêwîstin. Piştî ku rewş wisa lêhat û şûnde, meş jî pir bê wate dibin. Camêr dijî, ev çawa dimeşin. Ev hevalê me yê ji Xerzanê jî wisa ye. Li gorî te kê rê li vê vekir? Hûn ê biçim çawa hesab bipirsin? Te jî fêrî vî şêwazî nekin. Tu nekevî dê heyf be.

***Ve.:*** Em ê nekevin Serokê min.

***---.:*** Li gor gelik ferasetên wisa hatine pêşxistin hene, tu ji van re nebî amûr?

***Ve.:*** Serokê min, min ev feraset derxistine zanebûn.

***---.:*** Ji vê zêdetir pêdiviya te bi ronîbûnê heye?

***Ve.:*** Di platformê de hat diyarkirin Serokê min. Kar girêdayî rast xwe tevlîkirina me ye.

***---.:*** Sê kesên din hebûn? Navê te Şo.. bû?

***Şo.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Te fêm kir Şo.. tu jî neçî û zimanê KT'yê bikarneyînî, jixwe em perîşan kirin. Tu hinekî pêgihîşt?

***Şo.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Di derbarê te de pir rexne hatin kirin. Aliyekî te yê ku nehat rexnekirin nemaye. Em çawa cesaret dikin û te dubare dişîni, lê tu me poşman nekî?

***Şo.:*** Poşman nakim Serokê min.

***---.:*** Tu çend salî bû?

***Şo.:*** 26.

***---.:*** 26. Tu bixwe bawerî, behremendiyek te heye?

***Şo.:*** Heye Serokê min.

***---.:*** Hêza te têra sererastkirinê dike, teqez tê ji nû ve sererast bikî? Tê bikarî li gorî vê çarçoveyê tevbigerî?

***Şo.:*** Raste Serokê min. Ez ê bi van nebesiyên kevn dernekevim pêşberî partiyê.

**---.:** Kêm ango zêde te vê carê xalên sereke yên fermandariyê fêm kirin? Tu heman kelecan û azweriya mezin dijî, dîsa li beramberî dijmin hêrs û kînek te heye? Dîsa ji aliyê şêwaz û tempo tu ronî bûyî, tu dizanê divê xalên sereke yên afireneriyê çawa bên pêşxistin?

***Şo.:*** Serokê min, xalên ku ji bo hevalan hatin gotin ji bo min jî heman derbasdarin.

**---.:** Divê ku te zêdetir fêm kiribe, ji ber ku nebesiyên te jî hene. Tu pir dixwazî biçî?

***Şo.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Tu teqez dixwazî ser bixî ango daxwaza bi te re di asta azweriyê de ye?

***Şo.:*** Serokê min, em ê hemû hêza xwe raber bikin.

**---.:** Na, hestên te yên niha heyî di asta xedar serxistinê de ye? Tu xwe wisa hîs dikî?

***Şo.:*** Ez ê ser bixim Serokê min.

**---.:** Navê te çi bû heval?

***Az.:*** Az. Serokê min.

**---.:** Tu jî ji wir hat ne wisa?

***Az.:*** Ez ji Botanê hatibûm Serokê min.

**---.:** Ji Botanê. Tu li xerzanê mabû?

***Az.:*** Nemame Serokê min.

**---.:** Araziya Tatwanê çawa ye, mayîn çandine, tu jî neçe û li wir pêl mayînê neke?

***Az.:*** Di demên borî de tiştekî wisa nebû Serokê min. Ger hebe jî nû danîne.

**---.:** Ma dîtin û nirxandina mayînekê pir zahmete?

***Az.:*** Ger dijmin bê şopandin zêde ne zahmete.

**---.:** Yê ku dijmin neşopîne, dikare gêrîlatiyê bike?

***Az.:*** Nikara bike Serokê min.

**---.:** Nikare bike. Ya yekem şopandin; duwem gêrîla hertim zinaran tercîh dike. Jixwe li wir rewşen mirov nikare jê bawer bike hene. Em binêrin, te jî ev çarçove baş fêm kir?

***Az.:*** Fêm kir.

**---.:** Çavekî te çû, lê bi çavekî jî pir kar dikarin bên kirin. Hêrsa te heye, teqez tu dixwazî hinek tiştan bikî? Tu amade yî?

***Az.:*** Amade me Serokê min.

***---.:*** Tu çend mehan li vir mayî. Te hinekî taybetmendiyên xwe yên fermandariyê ango yên sereke dîtin?

***Az.:*** Serokê min bi zelalî min dîtin. Ya ku li şûnve dimîne pêkanîne.

***---.:*** Tu çend salî bû?

***Az.:*** 21.

***---.:*** 21. Tu dikarî bike. Ango vê carê li ser bingehê rastiyan eleqeyek te ya meşek mezin heye, bawerim di rast destgirtina van karan de tê bi însîyatîf bî û rist bigirî ser milê xwe. Tu ji bo Xerzanê ji xwe bawerî, li gorî te lewazîyê wan ên sereke li wir çine, çima bi israr xeletiyan ferz dikin? Ev kîne û bi kîja cesaretî dikevin ser vê rêyê?

***Az.:*** Serokê min, ev potansiyela şer ya heyî û hem jî girse tevger nekirine.

***---.:*** Ango bi erzanî li ser derfetên partiyê razane. Tu çawa dibînî Şo.?

***Şo.:*** Serokê min, bi qasî ku me lêkolîn kir di çarçoveya ku hat diyarkirin de dibe. Lê li wir komkirin heye. Bi qasî ku ez dibînim bi taybet kombûna hevalên kevn li wir, rê li ber dayîna axaftina ferasetên xwe vedike. Ev jî dibe sedema tarzê heyî û derketina holê. Ez bi vî rengî dinirxînim.

***---.:*** Dibe derfetên bi asanî nehatine destxistin ango derfetên partiyê bi zorê qezenckirine, yên ku bi asanî qezenc nekirine, yên erzan jiyan dikin û erzan xerckirina van.

***X.:*** Serokê min çavkaniya xwe ji tevgerînên kêyfî û cîdî nêzîknebûna şer digirin.

***---.:*** Tevgerîna kêyfî tevgerîna kê ye? Yê ku bi keda xwe qezenc neke kêyfî ye, tolaze, karmendên dijmin ên erzan kêyfî ne, nokerên axa kêyfî ne. Yên bi keda xwe dijîn, di nav mercên zahmet de qezenc dikin teqez kêyfî nêzîk nabin û erzan winda nakin.

***X.:*** Ji ber ku bi van aliyan ve nirxan ava nakin…

***---.:*** Şêwazê bi me dayîna windakirina yên nirxan ava nakine. Yên ku azweriya wan a azadiyê ne bilinde, di civakê de kêrî tiştekî nayê û şêwazê yên ku di nav PKK’ê de fêrî erzan jiyankirinê bûne ye. Ya ku li Xerzanê niha di meriyetê de ye ev e. Ev nayê pejirandin û rewşek neyê pejirandine. Ango divê bi

hestyariyek mezin hûn li ser rawestin, ev hêza we heye? Navê te çi bû heval?

***Er.:*** Er.

**---.:** Belê Er., ev hêza we heye?

***Er.:*** Heye Serokê min.

**---.:** Tu berê li wir mayî, te ewder dîtiye?

***Er.:*** Serokê min, li wir nemame, lê dizanim.

**---.:** Tu bi temamî di ferqê deyî, ango tê bikarî vê çarçoveyê bidî rûnişkandin. Hûn jî diçin Xerzanê. Çi çar kes, çi çil kes, çi jî hejmarek çar hezarî qet ferq nake, ya girîng çawaniye. Ev hêza xwe heye?

***Er.:*** Serokê min, yên ku me ji vir girtine ger li wir em rast pêk bînin, ji aliyê ya rast pêkanînan de em xwedî hewldan bin, li ser esasê rastiyan em xwe bixemlînin em dê ser bixin.

**---.:** Ne em bixwazin, hûn ê xedar li pê vê bin.

***Er.:*** Kedeke min a xedar heye Serokê min.

**---.:** Pir dagirtiye, ango ev hest esase; wek dema borî bi awayekî pîl xilasbûyî, parsû ketine hundirê hev, nizanim çavtirs neyên pêşberî me. Hûn ê vê carê çawa bin?

***Er.:*** Serokê min. Bi vî alî ve ji bo ku em nekevin rewşeke wisa tiştên pêwîst hene, xet heye, rê û rêbazên pêwîst hene. Em ê van rê û rêbazan ji bo ku nekevin rewşek wisa xwe pêş bixin û em ê bersiva şerê ku dem ji me dixwaze di kesayetiya xwe de serwer bikin.

**---.:** Ango hûn dibêjin me şêwazê rast ê Rêbertiyê ku zelal bûye, PKK'a heqîqî û şêwazê wê yê şer fêm kir û em ê xedar pêk bînin. Ne weke dema borî we kir û şerê we meşand, yan jî hûn dibêjin di şêwazê kevn de jiyan nîne. Hûn di wî şêwazî de tine bûn û wisa hatin vir.

***Er.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Lê hûn niha çawa ne?

***Er.:*** Serokê min, li wir nezanî û bê rêbazî hebû, dîsa ezmûnekî pir mezin ê şer heye. Ya rast di ronahiya ezmûnên şer ên ku me ji wir girtin û perwerdeya ku me li vir dît em ê li berçav bigirin, ezmûn û ceribandinan di berçav re derbas bikin û vê carê şêwazê şerekî rast esas bigirin.

**---.:** Başe, we li vir çi ji xwe kir, xwe çawa hîs dikin, dema hûn derdikevin û dema hûn hatin çawa bûn?

***Er.:*** Ferqek mezin heye Serokê min.

***---.:*** Lê evder ne navenda welatê me ye, cihekî pir dûrî welate. Hûn leşkeriya rast li vir dibînin ne wisa? Roja borî yekî deh salan di nav şer de maye digot; "*Ez li vir bûm leşker.*" Şermek pir mezine, deh salan şer kiriye, lê fêrî ABC ya leşkeriyê nebûye, hatiye li vir fêr bûye. Lê hûn ewqas li çiya ne, her roj di nav şerê germ de ne, hûn çawa fêrî xalên sereke yên leşkeriyê nebûn?

***Er.:*** Ji ber ku em di wê mijarê de lehûrbûn nakin.

***---.:*** Leşkerî yeksane, di asta herî jor de lêhûrbûn. Devji vê çorsiya gundîtî berdin. Bûyîna leşkerên hinekî din derbas bikin. Min bi bêderfetiyan xwe gihan vê xalê û hemû cîhan dijberî min bû. De îca niha binêrin, ez di cihê xwe de çiqas bi hêzim, ne wisa? Ango herî kêm dikare bêgotin ku ez bi qasî şêrekî bi hêzim. Tevî ewqas êrîş û serdehatinan jî nehejîm, tu kes nehat û ez ji cihê min dernexistim. Cîhan hemû bi ser min de hat, heta Clînton jî xwe gihand min, ma karî bê li vir min bihejîne? Nexwe giraniya min heye yan jî min baş xwe bi cih kiriye. Belê, hem jî pir yeman, ne wekî din, ango pir yeman xwe bi cih kiriye. Lê hûn nizanin li gorî giraniya xwe jî xwe bi cih jî bikin. Ma ev ne şermek mezine? Heta niha hûn nikarin vesaziya çiyayekî dijmin bitirsîne jî pêk bînin. Ma kes nîne, çek nînin?

***X.:*** Her tişt heye Serokê min.

***---.:*** Çima hûn nikarin bikin? Tê bi çiyayekî wisa pêşiya xwe bigire ku, dema ku dijmin hat nekevê, careke din bi ser de biçin, wê demê dijmin nikare bikeve vî çiyayî, ma gengaze bikevê. Wê demê em ê jî bêjin temam şêrek heye li wir. Tê fêm kirin ne wisa? Ango li wir ne mîna revokekî, şemtokekî, divê ku hûn mîna şêran bin. Lê KT'yê we mîna revok û şemitokan digire dest. Niha dixwazi PKK'yî yan bitirsîne; çima? Ji ber ku qûral û qayde nedane rûnişkandin, ji ber wê şerkeriya we ya dema berê ne wisa? Ger we çiya girtiba, yekîne baş dabana rûnişkandin, bi binerdê xwe, nihînîbûna xwe, tevgerîn û xedarî di vê çarçoveyê de daba rûnişkandin, dê ev dijmin jî binketiba. Ji ber ku ez dijminê xwe nas dikim. Xwedêyo, ya Rebbê min! Hûn bi hovitiya xwe ya gundîtî hewl didin di naverastê de bijîn, ger wisa bihata jiyîn, wê gundî li wan deran bijiyana, ne wisa? Hemû jî mîna guran fêlbazin, mîna rovîyan fêlbazin ne wisa?

***X.:*** Ev fêlbazî kêr nayê.

***---.:*** Bêgûman ma fêlbaziya gundîtî pere dike. Însaf! Qurnaziya burjuvaziya biçûk, ma ew jî pere dike. Nake. Em ê we jî perwerde bikin, matmayî dimînim. Min jî nîşanî wan da, lê cidî nagirin, di serî de jî Ab.. tengavî jiya. Ez niha pê difikirim wî çawa bidim jiyankirin. Min rêya jiyankirinê nîşan da. Ma hîn di despêka 1982'an de min rêya jiyanê bi awayekî herî baş nîşan neda? Bi tenduristî negihan çiyê? Ger hûn rast bi ser Colemêrgê de biçûna, we ew hêz ras daba me, bê aman we jê bawer kiriba; niha her tişt û çarenûsa dîrokê wê cudabûya. Yekî fêlbaziya gundîtî kir, yekî xwe ber bi bayê –ya rast serê wî tevlîhev bû, yan jî nezanî xwe bikarbîne- rewşenbîriya sivik xist. Çi qezenc kir? Tiştek qezenc nekir! Lê rastî dikarin li wir bên dîtîn û pêk anîn jî, ev hatibû fêm kirin jî. Ya rast şansê xwe bikar ne anîn.

Ez ê dubare li ser rawestim, hêvîdarim ku em di demê pêş de van waneyan bigihînin we jî. Di tirsim careke din jî bikarneyîne, jê bi fikarim. Ji pratîka wî waneyan ji xwe re derxin, jixwe me vegot. Mirov wisa nakeve çiyê derfet wisa nayên bikaranîn û hîn jî gelik ji wan wisa ne, hûn ê biçin bibînin. Dema ku hûn diçin di rê de mîna bayê bin û wan şiyar bikin. Çavê xwe berdane xebatên min, nabêjin; "*Ev heval ev çend sale bi çi re di nav pevçûnê de ye, çawa dijî?"* Yê ku vê dipirse qet nîne. Dibêje; "*Ez jî dixwazim wer im, ez jî dixwazim hinekî hêz bigirim."* Temam, ez mirovekî merdim, ez ê hêz bidim we hemûyan, ji vê jî bêzar nabim. Lê xwe xistina te ya vê rewşê ne şerme? Di destê te de jî derfet hene.

Nebêjin;"*Ev der ne çiya ye"* ev der jî çiya ye. Ez li vir bi mirovan re mijûl dibim. Li çiyayê xwe yê biçûk ez jî mam, lê me 15 hezar gêrîla perwerde kir. Xeterî li wir jî heye, welatê xelkê ye. Hûn nizanin bijîn, çiye fêlbaziya gundîtiye, çiye demogojiya rewşenbîriye, heta niha vana çi dan we? Ber bi ya rehet ve bezî, rehetiya çi, tu di nav êş û janê de ye. Hêvîdarim ku vê carê we hinekî din rastî fêm kiribin. Şêwazê rast ê fermandariyê, bi qûralên rasteqîn nalîze. Taxtîk çiye? Di van hemûyan de armanc, qûral, ziravî, şêwaz û tempo we hemû fêm kir. Nexasim we balkêşiya tevgerînê fêm kir. Tenê ev herdu wane jî têra we dikin. Ma hûn dikarin bi hevre di nav lihevkirinekê de biçin?

***X.:*** Em ê biçin Serokê min.

***---.:*** Ango asta we hemûyan wekheve, hûn hemû jî berendamên fermandariyê ne, em fermandar jî diyar nakin.

***X.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Bawerim hûn hêzeke kolektîf ya fermandariyê ne, ya herî rast jî ev e.

***X.:*** Di vê mijarê de pirsgirêk dernakeve.

***---.:*** Pirsgirêk dernakeve, jixwe hûn hêzeke kolektîf ya fermandariyê ne. Em şêwazê fermandariya tenê di vê pêvajoyê de nikarin derxînin pêş, xeteriyên tenêkirinê hene. Ji bo Amedê jî wisa ye, xeteriya tenêkirinê heye. Ab.. jî wê bi konseyek mezin a şoreşger û kolektîf re bixebite. Tenêbûn nabe. Ji bo wê xwe negihînin siviktiyek tûjkirin a tenê derketina pêş. Hûn ê bikarin fermandariyek kolektîf pêk bînin?

***X.:*** Pêwîste Serokê min, em dikarin pêk bînin.

***---.:*** Ev çarçove bese yan jî em dikarin baweriya xwe bi we bînin, çûyîna we ne şibe berxa qurbanê?

***X.:*** Serokê min, em ê careke din nekevin nav wan rewşên berê.

***---.:*** Ger Qezayek nebe, em dikarin bi serkeftina we bawer bin.

***X.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Er.?

***Er.:*** Serokê min, hûn dikarin bawer bin. Lê ne li ser esasê lihevkirinek vala, li ser esasê li hevkirineke şoreşgerî em ê pêk bînin.

***---.:*** Lihevkirinek vala nabe, bêgûman dê lihevkirinek şoreşgerî be, soz? Me ji we re ewqas bingeh vekir, rastiyên fermandariya ji dîrokê hatiye vekir. Êdî devjêberdin, valabûn çiye, ehbab çawîşî çiye? Divê ku di nav we de qet neyê dîtin, gotina wê jî neyê kirin. Divê ku tevgerîn têrker, jidil, bi ast û balkêş bin. Ger hûn fêlbaziya gundîtî bikin, hûn ê ser nexin. Ger serxistiba dê Ab.. ser bixista. Ger bi zimandirêjiya rewşenbîrî kar bihatana rizgarkirin dê Ab. Rizgar kiriba. Ma hûn kîne? Bêgûman hûn ê jidil, têrker û fêrkerbin. Wê ehbab çawîşî nebe, cendirmetî nebe, tevgerînên axawarî nebin, dê peyva wê jî nebe di navbera we de.

Şêwazê fermandariya artêşa azadiyê û yên ku em jê re dibêjin xalên bingehîn pêwîste we fêm kiribe. Berevajî dê rûmeta

we nebe. Min ji we re got leşkerê bi pere jî bi şêwazê tirşikçitiyê jiyankirinê ji xwe re qebûl nakin. Ger hûn bi wî şêwazî bêjin; "*ji bo tirşikê wisa daket gund, wisa ji bo komkirina derfetên jiyanê berhevkirinê daket"* ez ê jî vê heqaretê li we bikim. Heqaret çiye, em girantir ceza nekin. Ger hûn bêjin; "*em ji bo erkê daketin Başûr, deştê, ji bo erkê em daketin gund"* ez ê peyvek girantir bikarbînim. Şerme, lê hûn bixwazin ez ê bikar bînim.

***X.:*** Serokê min, em ê nekevin vê rewşê.

***---.:*** Hûn ê nekevinê ne wisa? Bi rastî jî hûn bikevin vê rewşê ez ê giran biaxivim.

***X.:*** Em ê tenezil nekin Serokê min.

***---.:*** Ez ê bêjim. Wê çi ji min re bêjin, ger derkeve pêşberî min jî ez ê ceza bikim. Sê giyan bi hevre windakirin, sê çek bi hev re xistina destê dijmin ma hêsane?

***X.:*** Ne hêsane Serokê min.

***---.:*** Na, dibe ku li gel me hêsan be, ma em jî dikarin bi hêsanî qebûl bikin?

***X.:*** Nikarin qebûl bikin Serokê min.

***---.:*** Bila dayika xwe bifroşe, bila biçe sulala xwe bifroşe, lê destdirêjiyê li ser nirxên min neke. Çekên min bi zorê tên destxistin û min ji bo çekekê mirin daye berçavê xwe, ji bo çekekê sî sal girtîgeh da berçavê xwe. Tu çawa dikarî wisa bi erzanî çar çûr bikî? Ji bo şervanekî min xwe perçe perçe kir, tê çawa vala xerc bikî? Ez vekirî diaxivim ne wisa Yıl.? Tu hemû fêm dikî, jibîr neke em mafdarin. Ji ber ku bi dîrokê dilîzin.

***Yı.:*** Raste Serokê min, bi dîrokê dilîzin.

***---.:*** Me bi hezar û yek kedê anî heta vir. Ma niha em bêrêziyê li beramberî xwe bikin. Dijmin dibêje; "*Me xeteriya mezin derbas kir."*Vaye ji ber van kêmasiyan xeteriya mezin derbas kir. Ger bi min bûya dê ev dijmin cehîmîba. Ango dema hûn çûn wîr divê ku her kes li pêşberî we bicirife ango ji rêzdariyê, ji hestan mirov dicirife. Çima wisa dikin? Çima em erzan dijmin şad dikin? Çima tevî ku mezin bi dijmin dayîna windakirin gengaze, em bi tevgerînên xwe rê li rizgariya wî vedikin? Çi heqê me heye? Ger ez şad nabim, divê ku dijminê xwe jî şad nekim, ma ne wisa ye?

***X.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Bi van camêran re namûs nîne, namûs, anor hebûya ma wê biça gund, di rêya rast de mayînê biteqîne? Ango fermandar wisa be, ger ev ez jî bim nebexşin. Ti fermandar, di rêya şaş de kesî nade meşandin, bi zanabûn taxtîkê xelet pêk nayîne. Vê jî bikin guhar ji guhê xwe re. Heta xalên sereke yên saxlem nebin, di serî de mirov bi rêveberiyê re mijûl dibe. Rêveberî belave, rêveberî ji rêgezên sereke dûre, rêveberî ji jiyana partiyê, ya artêşê dûre, ji qûralên dîsîplîne dûre, ji binkegirtinê dûre, kî dibe bila bibe despêkê dest bixin qirka wî rêveberî, ger ev ez jî bim wisa bikin. Jibîr nekin, ger camêr kesekî îflah nabeye ceza bikin. sîxurê objektîfe ceza bikin, qet nebe bifroşin. Na, ger dibêje; "*Ez şerkerim"* wê demê bila qûralan rast pêk bîne, ger ji xwe re dibêje; "*Rêvebirim"* anora rêveberiyê heye, rêzdarî heye, bila li gorî pêdiviya vê bijî. Ger jiyan nake çi karê wê li van deran heye? Naçare rast têbikoşe. Ger rewşeke wî ya berxwedanê nîne, bila kar bide destê yê şayane. Ev ne zahmete.

Niha ev nebe, hûn ê çawa xwe rehet hîs bikin? Ez li beramberî feraseta we ya rehetiyê matmayî dimînim. Gotinek heye û tê gotin; "*Heta ku tu kera xwe baş bi sinc ve girê nede rehet ranez ê."* Gundiyek heta kera xwe bi sinc ve girê nede heta sibê rehet ranazê. Ne ku we bi sinc ve girê nedaye, hemûyan benê xwe qut kiriye. Hem jî di nêvenga xeteriya kujer de û pirxe pirxa we hûn di xewê dene. Xafletek mirov jê bawer nake ye. Bi wî sincî ve girêdan tê çi wateyê, pir baş her kes bi qûralan ve, bi şêwazê şer ve girêdane. Bawer nakim, çawa ewqas dervî qûralan mayînê hûn şayanî xwe dibînin? Ya rastez bi fikarim, gelo ev fêrbûn dîsa we veneguherîna ya berê? Ger hûn wisa jî bibin ez dubare dibêjim; ger hûn sax bimînin jî hûn ê nikaribin derkevin pêşiya min. Îhtîmalek mezin hûn bimrin. Ez derfeta sêyem jî nasnakim, di vê çarçoveyê de ye.

Dema ku ewqas erzan windakirina van koman tînim berçavê xwe, di vê çarçoveyê de li ser israr dikim. Dibe ku ez ne rêberekî yaman bim, lê madem hûn di girêdanê de bi israrin, wê demê dibê pêdiviyên vê wisa bên fêmkirin. Ango dibe ku behremendiyên min pir baş nebin, lê dayîn ji pêwîste di vê çarçove de bê nirxandin. Hûn ê cidî bin. Herweha em ji nebûnê diafirînin. Hêjî hûn çi ji min dixwazin? We çi ji sulala xwe girt û ji min re anî, ji bilî belayê. Fêrbûnên we yên jiyanê ji hemû aliyan

ve bela ne. Hemû li beramberî dijmin binketine, dewlemendî jî di nav de hemû bûne pênc quriş. Hûn weke miriyan hatin vir, dîsa me hûn bi hêz kirin. Hêvîdarim ku hûn vê carê xwedî qedir û qimetê bin.

Wê meşa 15 salan a şayanî milîtanê rasteqîn ê PKK'ê bibe ya we, navdare. Xwe gihandina Amedê, Xerzanê, hemû qadên Kurdistanê, tiştekî ji vê zêdetir bexteweriyê bide, mirov di nav kelecanê de bihêle û meşek wisa nîne di vê cîhanê de. Bi serê xwe ev çiqas hêja ye tenê fêmkirina we ya vê jî xelata herî mezin ji we re bê dayîne. Lê hûn fêm nekin, serê kêliyê carekê bêjin; "*Cixare, tirşî, tirşik"* biçin û gav navêjin nav vî karî. Kelecana wî karî mezine, azweriya wî mezine, wisa tenezilî gundî nake, evîna xwe mezine, hest mezine û deng mezine.

We çawa fêm nekir ez li we ecêb dimînim. Afirandina vî karî jî esase. Dibe ku ya li ser we serwer dîsa jî feraseta kevnare. Vaye ji bo ku em hinekî bi anorê ve girêdayî bin, ger hûn xwe hinekî bi guvişin, ez ticarî ferasetek wisa ya rûmetê naxwazim. Ferasetek fermandariyê ya wisa qet naxwazim. Em dibêjim çi tişta we li ser piya bihêle, bi ser bixe heye wê bikin.

Bi min ve girêdan qet ne girînge, dujîna ji min re bikin, nizanim hûn çi ji min dikin bikin, lê di encam de divê hûn girêdayî bin. Min hertim ev got; yê ku herî zêde dijberî min derket li dijmin xistibe, ger min ber bi sêdarê ve jî bibe ez qet xemgîn nebûm. Lê li beramberî dijmin ne tişteke, li beramberî min jî zimandirêjeke. Ev nayê qebûlkirin. Hûn dê afirîner bin, ger ji we re zahmet jî be, hûn ê hêza xwe li ser piya girtinê raber bikin. Xwestina vê mafê me ye, jixwe ez we dawetî xwedî li xwe, li nasnameya xwe, jiyana xwe derketinê dikim. Hûn nikarin vê red bikin. Ger tu red bikî wê demê mafê me yê bi bingehî ve şerkirinê derdikeve holê û em ê ser wê de jî biçin. Ti nemerd, ti xirab bila jîrbûnê ji me nexwaze. Ji me parastinê nexwaze. Bawerim niha bi giştî Rêbertî, bi taybet jî hûn xalên bingehîn yên fermandariyê û dayîna rûnişkandina gêrîla fêm dikin. Ciwanin, ya li şûnve dimîne temam bikin, ne wisa heval?

***Er.:*** Wê hewldan hebin Serokê min.

**---.*:*** Hewldan hebe, qala wê jî nayê kirin. Ez qala serkeftinê dikim. Di nav vê de helbet wê hewldan jî hebe. Pêdiviya me bi çend tiştan heye, hûn ê bêjin henase dayîn û sitendin ya ku li şûn

dimîne temame. Ango em dixwazin vê meşa we wisa bi nav bikin û dixwazin soza we jî di vê çarçoveyê de qebûl bikin.

***Er.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Temame heval?

***Az.:*** Serokê min, ji bilî vê ti bijareyek me ya din nîne.

***---.:*** Ne bijareya me heye, ne awat heye, ne wisa? Ma evîna me ya herî mezin ne ev e?

***X.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Temame ne wisa? Ewqas bese?

***Ab.:*** Bese Serokê min.

***---.:*** Başe, keremkin rûnin. Kopyayek vê çarçoveyê bigirin. Ev heta dawiya temenê we têra we dike. Hinekî din yên hatine hene, hûn ê soza tevlîbûnê ji yê nû hatine bigirin.

***Ab.:*** Em ê bigirin Serokê min.

***---.:*** Herhal piraniya wan tevizîne, dibe xafîl û hincirî hatibin. Soza rast tevlîbûnê bigirin. Wê rast tevlî vir bibin. Evder girînge. Em ê pir ked bidin. Em ê ber bi xizmeta wan ve bibezin, ew ê jî xwedî li vê kedê derkevin, tê fêmkirin? Hûn berpirsyarin, dema ku mirovekî digirin dest, tevlî xebatekê dikin, hûn ê qûral û armancê baş bidin fêmkirin. Hûn ê bêjin; "*Rêzdar, em ê baş xizmeta te bikin, lê tê jî li gorî armancê xwe, xwe pêbigihîne"* qûral ev e! Komeke me ya din jî di sînor re derbas dibe? Herhal ew diçin nav gel, ew kî bûn? Yên ku biçin nav gel çend kesin? Hevalên gazî ne? Van di nav şer de zû xwe birîndar kirine.

***Ab.:*** Du hevalên din hene.

***---.:*** Ew kîne?

***Ab.:*** Du hevalên me yên jin ku ji vir biçin welat hene, dîsa di nav koma nû hatine de pênc hevalên biçin welat hene.

***---.:*** Ev hevalên me diçin welat?

***Ab.:*** Beşek ji wan jî wê biçin ser sînor.

***---.:*** Em ê bi wan re biaxivin. Hûn ji bo welat amadene? Hûn ê biçin welat?

***X.:*** Ez ê biçim nav gel Serokê min.

***---.:*** Yên ku biçin nav gel kîne?

***Ab.:*** Hevalên jin wê biçin Botanê.

***---.:*** Hevalên jin wê biçin welat, wekî din yên biçin kîne? Rewşa hevala Zin.. çiye, bawerim darêzek derbas kir, tevlîkirina we ya wê raste, hûn wek rêveberiya wargehê gihîştin encamekî?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Rastiya derket holê çî ye?

***Ab.:*** Li ser rewşa wê li vir nêzîkatiyên pêwîst, nirxandin û darizandin hat kirin. Ev hemû bi agahiya çêkerê pêk hatin. Di vê mijarê de bi wê re nîqaş hat kirin. Pêvajoya piştî wê, pêvajoya pêkanîna vê biryarê ye. Çavdêriyên me yên di vê pêvajoyê de erênî ne. Nebesî hebin jî hewl dide xwe tevlî bike û ji nûve sererast bike. Ji bo ku hinekî din pêş bikeve me ew xistina nav xebatê guncaw dît.

***---.:*** Rastiya wê çiye? Hatiye nav refê me û demekê jî di nav refên me de maye. Ji aliyê civakî, siyasî ve çi rave dike, ev derket holê û hat fêmkirin? Li gorî vê darizandina we pêşketinek yan jî rastiyek derxist holê?

***Ab.:*** Hinek xal baştir hatin diyarkirin. Yek ji van jî; Tirkitiya ku hatiye pejirandin, bişavtin…

***---.:*** Bila ya hatibe bişaftin Tirkek be.

***Ab.:*** Ew ji dervî hemû taybetmendiyên çêkerê…

***---.:*** Bila Tirkek be, di nav me de Tirk jî hene.

***Ab.:*** Ev cuda ye Serokê min. Tirkbûn tiştekî cuda ye. Ji çêkerekê qutbûn tê wateyek din, taybetmendiyên wê yên erênî cuda ne. Çêkerek komkujî pejirandiye û nemaze dibe çêkerek ji aliyê dijmin ve hatiye qezenckirin. Ya din jî xisletên nêvenga tê de hatiye mezinkirin hene. Li Xarpetê ji aliyekî ve MHP, ji aliyê din ve jî komkujiyên ku li ser Dêrsimê girseyek heye. Van herdu aliyan tîne hemberî hev. Yek ji wan çepgire, yek jî Tirkê herî faşîste. Ya rast herdu jî Tirkparêzin, heta dawî bi rastiya çêkera Kemalîst ve girêdayî ne. Wisa herdukan tînin hemberî hev, bi awayekî sexte dem bi dem bi hev re dixin nav pevçûnê û bi vî awayî herdu çêker bi heve dane girêdan. Di encam de kesayetiyek tê zanîn taybetmendiyên kesayetiya ji aliyê pergala 12’ê Îlonê ve hatiye pêgihandin heye. Bi taybet li ser ciwanan, ji hemû nirxan dûr, ji xwe û ji civakê bêgane û dijmin hatiye afirandin. Hema bêje ne di ferqa çawa dijî de ye. Kesayetiyek xwe ji tiştekî berpirsyar nabîne.

***---.:*** Dibe nûnera girîng a kesayetiya ciwanên ji aliyê 12’ê Îlonê ve hatiye afirandin û bi asanî tê rêvebirin.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Ev hinekî di hundirê me hemûyan de heye.

***---.:*** Ji rastiya xwe ya dîrokî hatiye qutkirin, bi giştî qurbana terora spî ye, bi taybet jî pir zêde ketine nav jiyana ciwanên ji aliyê 12'ê Îlonê ve hatine afirandin û ew jî ber bi jiyana partiyê ve veguhestiye. Di vê wateyê de ji aliyê polîtîk ve dikare çawa bê nirxandin, di nav me de kîja wateya polîtîk rave dike?

***Ab.:*** Bi sekna xwe ya niha, rastiya pergala serdest rave dike. Hinekî xwe bi ropêşa çepgiriyê pêçaye û rastiya Kemalîzmê rave dike.

***---.:*** Bawerim bi asta rêveberiyê jî lîstiye. Di dema borî de bi taybet di rêveberiya Zelê de derketina dervî gêrîla, derketina dervî pîvanên partiyê pir cih girtiye û wisa hatiye.

***Ab.:*** Ji bo wê nêvengek guncaw çêbûye, ji bo kûrkirin û jiyankirina vê jî di nav hemû xebatan de cih girtiye.

***---.:*** Jidil tevlîbûye yan jî pir zêde eleqeya wê li beramberî vê hebûye.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Bawerim, di xebatên vir de jî hewl daye di astek polîtîk ya cuda de xwe nîşan bide. Bi vî rengî ketiye nav nêzîkatiyek bikaranîna xalên sereke yên rêveberiyê, otorîteyê û hêzê. Wisa texmîn kiriye ku dê bi asanî bikare bikar bîne û ji vê re cesaret kiriye. Başe, dema ku ji vê re cesaret kiriye, wekî din xwestiye kîja behremendiya xwe bikar bîne?

***Ab.:*** Hêza axaftinê ya ku ji pergalê fêr bûye.

***---.:*** Hêza axaftinê bikar tîne, wekî din?

***Ab.:*** Taybetmendiyên xwe yên pîrektiyê bikar tîne.

***---.:*** Hêza jinê, teybetmendiyên pîrektiyê bikar tîne, wekî din?

***Ab.:*** Taybetmendiyên sereke ev in Serokê min.

***---.:*** Di astek pêş de berê xwe daye vê?

***Ab.:*** Ev ji bo wê bûye şiklê jiyanê Serokê min. Wê bi xwe jî gelik deman bêy ku fêm bike pêdiviya jiyana ku di nav de ye wisa kiriye. Hêza axaftinê û bi şêweyên din jî pir zana ye.

***---.:*** Me ev xeterî çawa girtiye nav xwe û ewqas daye jiyankirin?

***Ab.:*** Ji welat tevlî bûye. Li wir jî tevlî pratîkê bûye. Ev xebata wê ya dahûrînê ye. Ya rast ji bo pêşxistina hêza dahûrîna partiyê sûdmende.

***---.:*** Wek leşkerek dijmin ketine nav û bawerim derfet dîtiba, wê li ser bingehê dek û dolaban, xwe naspêre kedê, ev derketinê polîtîk hene, wê li ser wê bingehê rist lîstiba.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Bawerim hinekî ketiye nav ceribandina vê, xwe daye bawerkirin ku dê ser bikeve û zimanê xwe jî ji bo vê bikar tîne. Bawerim pîrektiya xwe jî rast bikarnayîne.

***Ab.:*** Li ser vê bingehê hêzeke wê ya bandorkirinê jî heye, ew jî ji jiyanê fêr bûye.

***---.:*** Di jiyanê de baş fêrî vê bûye? Ango wê zilaman çawa bandor bike baş fêm kiriye yan jî ezmûna vê girtiye?

***Ab.:*** Bi hêza ziman, xîtaba xwe jî wisa pêş xistiye.

***---.:*** Bi hêza ziman jî. Herdu têkildarî hevin û hinekî bi vî alî ve xwe daye jiyankirin. Lê dîsa jî di pratîka Zelê de xwe daye jiyankirin, li vir jî ketiye nav wê ferasetê, lê dema ku nêvengek wisa nedîtiye bertek û xwe başvekêşanekê dijî, ne wisa? Hewayek qerisînê dijî.

***Ab.:*** Jixwe ew hatiye xişikandin û hatiye Serokê min. Dema hatiye jî pir zêde di tevlîbûna tevgerê de ne bi xwestekbûye. Berevajî li ser esasê dijberiyê tê, bi bandora hinekî din hatiye nêvengê. Dema ku ji bo xwe jî nêvengek guncaw dîtiye gotiye, "*PKK, ev e"* û ew jiyan heta dawî…

***---.:*** Bi temamî mînakek kêrnehatî ye. Hatiye xişikandin? Ji xişikînê zêdetir, bawerim tevlîbûnek xirabe, tevlîbûnek macerapereste.

***Ab.:*** Di wê wateyê de min got.

***---.:*** Dikare biçe di cihê xwe de jî rûnê. Ma naxwaze vegere jiyana xwe ya kevn jî?

***Ab.:*** Naxwaze Serokê min.

***---.:*** Me di vê mijarê de gelik dahûrîn kirin. Naxwazim van dubare bikim, lê di zanîna vê rastiyê de ji aliyê her kesî ve fêde heye. Vaye kêliyek beriya niha di derbarê hatina fermandariya hevalan de me hinek daxwuyanî pêşkêş kirin, teqez herkesî fêm kiriye. Ev şêwazên kesayetê, bi taybet bi jinê re –şajin jî be- bi rêbazên dijmin heta dawî komplovarî, bêrehm, her ku diçe ji nirxên mirovî qut dike. Belê, dixwaze di asta gel de, dixwaze di asta rêxistinê de, heta dawî ruxînere, dikare bi hemû qûralên jiyanê bilîze, lê nizanin bi raveya cewherê jiyanê durist girêdayî

bimînin. Ev binemaleke, ya rastî coreke. Ji dîrokê heta roja me ya îro jî bi giranî tê jiyîn.

Di civakê de dibe ku mirov wisa bibin du beş. Ev jî corekî binemalê ye, ya din jî duriste, lê dema ku di nav refên kedê de pir şer kir, wê kesayetiya xwe bibîne yan jî heman tişt di nav PKK'ê de tê jiyîn. Ya ku veguheziye nav PKK'ê jî cewhereke, yên ku dixwazin durist, li ser kedê pêş bikeve, dixwaze bijîn, ya din jî fêlbaziyên civakê, çêkera kesayetiyên taybetmendiyên burjiwaziya biçûk girtine ye. Vaye şêwazê feodal! Di tevahiya dîrokê de şêwazê mêtinger, şêwazê çewsîner, yan jî şêwazê hişyar yê ku derdikeve pêş her tim di dîroka mirovatiyê de heye.

Ya din jî li ser vî bingehî xwe PKK'yî dîtin heye, ev hinekî di asta pêş de ye. Ji ber ku li ser neyêniyê xwe diteyîsînin, bi rastiya PKK'ê, rastiya rêxistinê ya rast, rastiya şerê rast re rûbirûyî hev hat. Tengav dibe, lê ji niha û şûnde dikare biçe kîderê? Ji ber ku ciwane, dibe ku nû nû polîtîkayê bibîne. Ger otorîtê, dîsa kesayetiya jin divê ji nû ve çawa derxe holê bibîne, îhtîmalek dê bikeve rêya rast. Mînakek wisa heye, em naxwazin bixapin. Bila nebêjin; "*Bi qasî em dixwazin dikarin tevlî bikin, bi qasî dixwazin dikarin ferz bikin*" Di derbarê we de hem xalên bingehîn, hem siyasî û hem jî rêxistinî bi hêz hatine diyarkirin. Di rastiya artêşa me, heta jiyana partiya me de divê her kes çawa bijî, kêm zêde niha dizane. Vekirîbûnek mezin heye.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Her ku çû pêşket.

***---.:*** Bawerim ger bixwazin di nav refên me de fêrbûnên kevn bidin axaftin jî, wê zêde nêvengê nebînin.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Partî di vê mijarê de amade ye.

***---.:*** Belê, Partî pir amade ye û bi tevdîre. Çi bi zimandirêjiyê, nizanim bila şexsî be, çi jî bi pîrektiyên xwe tu kes nikare zêde xwe ferz bike, ji ber ku me rastî bi zelalî danîne holê. Jiyana rast, pêwendiya rast û jinbûyîna rast, zilamtiya rast, bi baldarî hat destnîşankirin.

***Ab.:*** Encamên dahûrînên dawî heta dawî ronîkerin.

***---.:*** Vekiriye, bêgûman uslûb jî pir vekiriye, ne uslûbê tûj, ne jî uslûbê demogojî, ne uslûbê giryokî nikare cihê uslûbê rast yê PKK'ê bigire.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Bi vî awayî dubare tevlîbûna wê ya nav refên me çêker erê dike? Di kîja astê de tevlî dibe, di asta civakî yan jî siyasî de?

***Ab.:*** Di asta siyasî de Serokê min.

***---.:*** Di asta siyasî de, lê belê jiyana civakî jî, jiyana siyasî jî bi armanca li ser bingehê nû jiyankirinê ye. Ger bi armancê re nakok be; cezayê tê pêşdîtin her ku diçe diyarker dibe û tê sepandin.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ango bi vê wesîleyê rastiya hiqûq derdixe zanînê.

***Ab.:*** Raste Serokê min. Pergala me ya hiqûq diyare.

***---.:*** Me di vê mijarê de pergala xwe ya hiqûqê careke din ronî kir?

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Heta em derbasî qonaxek dîrokî bûn. Heta dawî hiqûqekî veguherîner û afirînere; em ê ji niha û şûnde hiqûqa şoreşgerî û darêzê pir baş bisepînin. Teqez em ê vê darêzê li ser hemû çêkera partiyê bisepînin. Ango ji niha û şûnde wê kes nikaribe ji dervî xetê, dervî qûralan û hiqûqê xwe ferz bike û bisepîne. Nerînek wê ya cuda heye? Dubare girtina wê ya nav refê me guncawe? Hûn zanin, meselek tenê ne keseke, ev beşeke, çandek û şêwazekî jiyanê ye. Me hinekî perwerde kir, hem jî darizand, hem jî dubare tevlî dikin, gelo em tên xapandin? Yên ku nerînên xwe yên cuda hebin hene? Di derbarê pêkanînê de yên ku nerînên xwe yên cuda hebin hene. Heval bixwe, niha pêvajo fêm kiriye, tevlîbûna xwe li ser vî bingehî çawa dibîne û bawerim ew jî lixwe mikur hat.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Lixwe mikurhatina wê berfireh bû?

***Ab.:*** Gelik berfireh bû Serokê min. Paşê devkî jî soza xwe da.

***---.:*** Bingeha wê ya dîrokî jî heye? Aliyê siyasî û dîrokî jî danî holê?

***Ab.:*** Ji aliyê dîrokî û siyasî ve.

***---.:*** Bi bandorên li ser rêxistinê.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Tu niha xwe çawa dibînî? Dikarî di nav refên me de bimeşî? ?

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Vebêje, em xalên sereke yên ji niha û şûnve ji devê te bibihîzin.

***Zı.:*** Serokê min, rewşa min a heta niha, li dijberî dijmin…

***---.:*** Uslûbê te bihêze, wê demê bi hêz biaxive, vî uslûbî ji bo gel bikar bîne.

***Zı.:*** Rewşa min a şer û nirxên netewî wateyek xwe ya wisa heye. Heta niha di nav refan de mayîna min, li beramberî dijmin bi hêrs nebû, heta li beramberî dijmin kedîbûnek min mijara gotinê bû.

***---.:*** Kedîbûn.

***Zı.:*** Wisa bû Serokê min.

***---.:*** Wekî din?

***Zı.:*** Ji ber vê sedemê pêwîstiyên partiyê, di fêmkirina pêdiviyên jiyana partiyê de, hîskirin, di nêzîkatî ji van re kirinê de ez pir seranser mam. Dîsa bi fêrbûnên xwe yê jiyanê derketina pêş, ketina nav hewldana bi fêrbûnan îdarekirinê, ev li ser nêvengê ferzkirin, dîsa perwerdeya partiyê ne li ser esasê derbaskirina van, di ziravkirinê de bikaranîn, ango burjivaziyek biçûk a bê ked di nav partiyê de jiyankirin. Rewşek min a eyarkirina vê jî mijara gotinê ye. Bi taybet ji perwerda Rêbertî re jî nêzîkatiyek min a wisa xelet çêbû.

***---.:*** Li gorî te derfetên bilindbûnê hebûya, tu pir polîtîk bibûya, heta em bêjin te hêzek polîtîk jî qezenc kir, pir pir pêşket, tê bişibiya kê, ger em di nav pîvanên dîrokî û rojane de bigirin dest?

***Zı.:*** Serokê min, jixwe taybetmendiyên sereke yên kesayetê kesayatiya provakasyone, xwe birêxistinkirinek wisa heye, hem jî…

***---.:*** Tenê ne ew e. Tu dikarî mînakê şênbertir nîşan bidî? Ango tu wisa nebûyî, em wisa texmîn bikin tu bûyî û di nav me de hinekî din jî diceribînin. Ango tenê ne provakatîf, mesele hêza desthilatdariyê ye. Bawerim di vê mijarê de azweriya wê jî hebû ye û xwestiye bibe desthilardar.

***Ab.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ji bo bikaranîn û di destê xwe de girtina vî hêzî tu tînî berçavê xwe ku tê xwedî hewldanek çawa be? Bi erzanî destê te wê biketa xwîna kê yan jî ji ber vî şêwazî, vê polîtîkayê gelo tê çima û çawa winda kiriba, tu qet hesab dikî û li ser vê fikirî?

***Zı.:*** Serokê min, jixwe di encam de pratîk derketin holê. Di pratîka Zelê de kesayetiyek wisa dê rê li ber encamên çawa veke derket holê. Nêzîkatiyên erzan ji çêkerê re, ji rêveberiyê re, lewazî û ferasetên xwe dayîna jiyankirinê derketin holê. Di demên pêş de hêza ku dê bihata destxistin û berevajî bikaranîna vî hêzî dê encamên pir xirabtir bi xwe re derbixista holê û wê ez jî rûbirûyî partiyê kiribama.

**---.:** Dev ji partiyê berde, em bêjin ku te hêz qezenckir, bi qasî kralekî li ser gel, li ser derdorê bibandor bûyî, tê wê demê çi kiriba?

***Zı.:*** Min ê ji bo xwe bikaranîba Serokê min.

**---.:** Teqez tê ji bo armancên mezin bikar ne anîba ne wisa? Ev vekiriye. Îhtîmalek mezin kesên ku te ji wan hez nekira, xweşiya te neçûna tê wan bi rêbazên xirab linav bibira. Jinbûna xwe jî bi taybet li ser vê bingehê û bi armancê siyasî bikarbaniya?

***Zı.:*** Raste Serokê min.

**---.:** Bi qasî fêm dikim hêza te ya ziman, hêza xîtabkirinê, jî tê li ser vê bingehê bikar anîba. Herweha ez dibêjim li ser esasê gel bikar bîne. Tu bi rêk û pêkî nikare biaxive jî û ez jî ji te re dibêjim hêza xwe rast bikar bîne. Wêrekiya te jî nîne, çima?

***Zı.:*** Li beramberî nirxên netewî ya ku dijîm…

**---.:** Tenê ne netewî, hem netewî, hem çînayetî û heta tu naxwazî li gorî taybetmendiyên sereke yên mirovî jî bijî. Bêgûman di bin terora spî de mezinbûna te bi vê re pêwendîdare. Dîsa bandora 12’ê Îlonê heye, bandora fêrbûnan heye, bandora şêwazê hatina nav PKK’ê heye û pêwendiya xwe bi wê pratîka PKK’ê ya erzan a Zelê re heye. Ev hemû hevgirtîne û têkilî hev pêşketina van bawerim li vir jî hinekî te diyar dike. Te hewl da hinekî wisa bimeşî, lê hat fêmkirin ku tê nikaribe wisa bimeşî, ne wiha?

***Zı.:*** Belê Serokê min.

**---.:** Û hat dîtin ku tê çawa bijî, niha jî tu gihişt asta darizînê. Ji aliyê siyasî, ji aliyê rêxistinî, ji aliyê civakî ve jî tu bi hêz najî. Bêgûman te ev qadên bihêz ên PKK’ê fêm nekir, te nezanî bikar bînî, lewra bi tenê bi xwe re ma. Niha bi vê rewşê em çi ji te bikin? Asta jiyana me bi asanî dê xweşiya te neçe. Bi vî şêweyî tevlîbûna te ji me re zahmete, ger em te bişînin cihekî din jî, bawerim ji dervî partiyê tu cihekî din naxwazî?

***Zı.:*** Serokê min, dixwazim tevlî jiyana partiyê bibim.

***---.:*** Tu di vê mijarê de xwedî bawerî ye, duristî?

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Netirse, ger tawanê te yê herî mezin jî hebe, me bi cezayekî ji rêzê derbas kir. Hinekî cezayekî ji bo tu xwe û kedê nas bike bû. Tevlîbûna siyasî îdayek cidî ye, ger mîna berê be, tê nikarî sax jê derkevî. Ango bi xwe jî nelîze. Ger ji te re pir giran tê, hêdî hêdî xwe ji nav derxe, em ê çavê xwe ji vê re bigirin. Tu çi dibêjî? Ango em bi zorê şoreşgeriyê bi tu kesî nadin kirin. Lê tê dizanî, nêveng diyare. Xwe wek nexweşiya zirav weremê jî li ser me ferz neke, ev ê heta sîxuriya objektîf jî biçe. Ger tu tevlîbûnê di çarçoveya ku me diyar kir de bikî, bila soza te soz be. Mesele hêza te ya bi pir zilam, pir jin û pir rêxistinan lîstinê heye, ango niha ji rêzê û bi safî tu dibêjî "*Ez dixwazim tevlî partiyê bibim"* jî, başe ger tu van taybetmendiyan li serê me, li derdora xwe bike bela wê çi bibe? Em çawa baweriya xwe bi te bîninîn.

***Zı.:*** Serokê min, min berê ev taybetmendî, weke ku pir zêde ravekirin min bizanebûn ne disepandin. Niha encamên vê zanim û bi vî rengî disa naxwazim bidim jiyankirin.

***---.:*** Ango tu teqez bawerî tê bikarî bi me re, bi partiya, heta bi gelê me û rastiya me ya netewî re jiyan bikî, tê bikarî vî hêzî raber bikî?

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Wê tu yê netirsî. Jixwe rewşeke wisa mirov jê bitirse jî nîne.

***Zı.:*** Na Serokê min, pêvajoya ku jiyan kir ez tenê wek pêvajoyek ceza nagirim dest.

***---.:*** Perwerde.

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Ne ceza, pêvajoyek perwerdê bû. Ji aliyekî ve jî bêhnvedan bû, lê aliyê li pêş perwerde bû. Ev pir vekiriye. Ango te hîn ji aliyê polîtîk ve cezakirin nedîtiye. Ger tu bi aqilbî tê fêm bikî. Ji ber ku hûn ji aliyê polîtîk ve di asta pêş te tawanbariyê bikin û cezayê vê girantire û tê nikaribî encamê rakî. Qet nebe ji niha û şûnde di jiyana xwe de encamên wanegir derxe û bide derdora xwe. Bawerim tê bikarî vî hêzî raber bikî. Xwe veguherîne darizandinek baş û bila derdor jî ji te ezmûnan bigire.

Mesele bila ev keç û kurana ji te ezmûn bigirin û bi şêwazekî balkêş fêr bibin.

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Ango tê berevajî ya kevn bikar bînî. Di vê mijarê de zanebûna te heye, qîmeta partîbûnê, qimeta hêza ziman, qimeta jinbûnê divê çawa bê bidestgirtin, divê ku tu hertim di ferqa vê de be û rast bigire dest. Tevlîbûna te li ser vî esasî ye. Wekî din tu dixwazî çi bêjî?

***Zı.:*** Serokê min, ez ê ji niha û şûnde di bin xizmeta gel û partiyê de bim û divê mijarê de jî bixwestekim. Ez vê wek naçariyekê jî nagirim dest.

***---.:*** Tu di vê mijarê de pir bi xwestekî. Tu dide diyarkirin bi coş û azweriye.

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Çawa ji dilê te tê wisa biaxive. Teqez tê ji gel hez bikî û tê ji gel û xebatê hez bikî. Tu pir ji dilî, ne rastiya dîsîplînek zûwa ye jî, ne wisa?

***Zı.:*** Na Serokê min.

***---.:*** Kelecan û coşa te jî heye.

***Zı.:*** Heye Serokê min.

***---.:*** Herwerha di vê çarçovê de naxapim û naxapînim.

***Ab.:*** Jixwe di vê çarçovê de ew jî di rewşa fêmkirinê de ye.

***---.:*** Ma dibe ku em pir saf bin? Ne bawerim. Te ez çawa ditîm, li gorî te dibe ku ez pir saf bim? Mesele me biraderê me yê li wir hinekî nirxand, ger bi min re bê qeyaskirin tu dikarî çi bêjî? Ji bo ku heval jî jê ders derbixin dibe sûdmend be. Vekirî bêje.

***Zı.:***Serokê min, ji ber ku hewldaye xwe û Serokatî cuda nîşan bike di vê mijarê de rewşek divê kes pê nehizire derdikeve holê.

***---.:*** Em bi te re hinekî xisletên Rêbertiyê nîqaş bikin, ji ber ku te xwest hinekî li ser rawestî, divê ku te xwe gihandibe hinek encaman. Qeyas bike û vekirî bêje. Dê pir sûdmend be.

***Zı.:*** Nêzîkatiya sereke ji Rêbertî re…

***---.:*** Na, tenê xwe ne nirxîne. Ango ez di wateya waneyên giştî de divê ku jê bên derxistin de diyar dikim. Divê mijarê de lêhûrbûnên te hene, wer bawerin dê ji bo hevalan jî sûda xwe hebe.

***Zı.:*** Serokê min, di qada ku em bêrê lê bûn de di nêzîkatiyên ji ferd re, rewşa xwe bi kedê, ango bi başiyê xwe dayîna qebûlkirinê nebû. Bi fêrbûnan min ên heyî û taybetmendiyên pîrektî…

***---.:*** Tu dev ji xwe berdî ez bi giştî dibêjim.

***Ab.:*** Nikare fêm bike Serokê min. Rêbertiya partiyê ji bo qeyaskirin bi asta rêbertiyê Zelê re diyar dike.

***---.:*** Bi Zelê re qeyaskirin, bi biraderê me yê li wir re, bi Ebû Cehîl re qeyaskirin. Ma tu ne alîkarê wî bû? Cemal Zedayî, Min agahî şand, tu alîkarê wî ye. Wek Ebû Cehîl îlan kir, Ebû Cehîl ne wisa?

*Ce.:* Belê Serokê min.

***---.:*** Tevlîhev nakim. We bi Ebû Cehîl re qiyas kir û wisa got. Yek ew qeyaskirin heye, ya din jî ger em bi xetên giştî bêjin, niha wek Rêbertî ez di rêya rast de me. Ango dibe ku hinek aliyên min ên xeter hebin? Vekirî bêjin, bila di vê mijarê de tu fikarên we nebin. De îca yên weke we ger şabanû bin jî, tiştekî wisa zêde ez jê bitirsim nîne. Jixwe tu kesek pir lewaze. Lê biqasî hûn dixwazin dikarin biaxivin, pêwîste em çawa bên fêmkirin? Ji ber ku te hinekî serê xwe li ser westand, ji bo wê dibêjim. Li wir hûn bi me re di nav şer de bûn. Mesele ne ji cihe, bi taybetemendiyên xwe, fêrbûnên jiyanê li wir hinekî bi me hat lîstin ne wisa?

***Zı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Li gorî te ev lîstin girîng bû? Ger neyê dîqatkirin dê encamên wê pir xeter bibin?

***Zı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Ango bi qasî xwe ji şerê taybet ê Enqerê re pêşkêş bike dev ji xwe berdaye. Qaşo em bi rêberiyek nû re rû bi rû ne. Jixwe nîşane jî hene û di vê mijarê de xwe da dest. Jibîr neke ku tu te bi vî re li hev kir.

***Zı.:*** Raste Serokê min.

***---.:*** Çima ewqas bertekên wan li beramberî şêwaza min a jiyanê pêşket? Pêwendiya taybet jî, pêwendiya xizmatiyê jî bi şêwazakî xedar bikaranî û kir.

***Zı.:*** Belê Serokê min. Bi hêza Rêbertî bi Rêbertiyê re şer dike.

***---.:*** Mînak, ger ez derebegek bûma û ew jî derebekek dibe ku mafê wî yê bikaranîna vê hebûya. Lê zêde ne serkeftiye û herî

dawî biqasî ku gêrîla bîne asta radestiyê kesekî xwe linav biriye, ma ne wisa? Lê heta niha rewşeke min a xwe radestkirinê nîne, ez hêjî hêza gêrîla pêş dixim. Ez niha vê ji bo yên din jî dibêjim, mafê tu kesî li ser navê biratî yan jî hevbeşiyê yê linavbirina navenda me û dabeşkirinê nîne. Lê cesaretî vê kiriye.

***Zı.:*** Belê, ber bi li ser tiştên ku di vê qonaxa şer gihiştiyê de yên hatine afirandin bi feraseta êdî em bi erzanî bijîn dev ji şer berdan û bi her tiştî re li hev kirinê ve dibe. Bi pergal û mêtingeriyê re lihevkirin, bi nokeriyê re lihevkirine.

***---.:*** Diyare ku heta dawî xwe ji vê re vekirî ye. Jixwe rê li wê lihevkirinê neyê girtin cihê ku bigihêje, heta Enqerê çûyîne.

***Zı.:*** Belê Serokê min.

***---.:*** Bêgûman, dixwazim bêjim we baş pê re lihevkir. Em heta niha jî vê bandorê nikarin ji ser gelik hevalan rakin. Bi xisletên pergalê re bi awayekî lez lihevkirin rewşek tê fêmkirine. Û ya herî girîng jî bawerim wisa dibê ku bi vê ferasetê min jî bandor bike. Bikaranîna çi?

***Zı.:*** Bi pergalê û feraseta jiyana pergalê, bikaranîna feraseta xwe ya oportonîstî Serokê min.

***---.:*** Em ji bikaranîna xalên sereke yên civaka komînala seretayî bigirin heta malbatgeriyê, dîsa taybetmendiyên feodal ên noker û dema herî zahmet a rêxistinê, kêliya herî zahmet a têkoşînê bikar tîne. Wekî din?

***Zı.:*** Bikaranîna hinek aliyên dijmin heye. Hinekî jî encamên ku dê dijmin biafirîne hesab dike.

***---.:*** Ev nirxandina dema hestyare, wê hesab dike û bawerim di vê mijarê de pir bi pîlane, di nav xwe de jî bi hesab tevdigere.

***Zı.:*** Belê Serokê min. Ev feraset hatiye avakirin.

***---.:*** Hatiye avakirin. Ev bûyer û yên din jî wisa dikarin bên destgirtin. Li gorî te divê ez çawa bêm fêmkirin? Li beramberî min gelik ceribandin hatin kirin û me ew jî li vir pir zêde vekirin. Ez di vê qonaxê de dişibim kê Ab.? Ev û yên din ne cidî ne? Ferzkirinên xatûnê, xwe ferzkirinên xatûnê û yên din hemû li berçav bên girtin, rewşa min hûn dikarin bişibînin ya kê? Herweha ya din jî nivîskarê pirtûka; “*Ayetên APO heye”* Min dişibîne kê, dişibîne çend kesan?

***Ab.:*** Ji despêka dîrokê û vir ve…

***---.:*** Çend kesên wisa hene?

***Ab.:*** Bawerim Sezar e.

***---.:*** Sezar. Em di derbarê vî Sezarî de çend gotinan bikar bînin. Em kêm an zêde Stalîn, Hîtler nas dikin, lê Sezar nas nakin. Di nav we de yên ku di derbarê Sezar de pirtûk xwendine hene? Yên ku di derbarê Sezar de eleqeya wan heye hene? Gelik heyfe! Di derbarê Sezar de tu zanyariyên te hene?

***Ab.:*** Serokê min, ew împaratorekî Roma ye, tişta wî ya herî mezin gotinek kiriye.

***---.:*** Çiye? Ango gotine; "*Ma tu jî Brutus?"*e.

***Ab.:*** Ji piştê ve xencerkirina wî ye. Ew bi xwe jî di qesrê de tê xencerkirin.

***---.:*** Di vê mijarê de yên ku hinekî Sezar binasin hene? Belê Re?

*Re.:* Serokê min, ya rast Sezar nûnertiya bizavekê dike. Mirov dikare wî ji damezrînerê yekem ê dewlet û sazîbûnê bihesibîne.

***---.:*** Di dîrokê de çanda Sezar û rastiya Sezar çiye?

*Re.:* Serokê min, rastiya Sezar bi dewletê re tê bibîranîn. Taybetmendiya wî ev e.

***---.:*** Ma wisa ye?

*Re.:* Dewleta sazîbûyî ye.

***---.:*** Ma dewleta sazîbûyî rave dike?

*Re.:* Belê Serokê min.

***---.:*** Wekî din, yên ku taybetmendiyên wî yên cuda nas dikin hene? Demek beriya niha min hinek beşên wî di navberê de temaşe kir. Dîsa min li wir çend gotin guhdar kir. Ev camêrana hinek tiştên rast dibêjin, ango Sezar camêrekî pir mezine. Bûyîna wek Sezar pir bi heşmete. Ligel vê, wisa bûyîn ango nebûyîna me zêde ne girînge. Madem me dişibîninê, dê vekirina vê sûdmend be. Berî her tiştî Sezar fermandarekî mezine.

***Ab.:*** Dibe împarator Serokê min.

***---.:*** Hem jî bi keda xwe ya taybet, hîn di temenê xwe yê ciwan de pir dixebite, bi pevçûnên mezin dibe împarator. Li gorî min şayanî lêkolînkirinê ye. Ger em derfet bibînin divê ku di derbarê Sezar de hinek pirtûkan bixwînin. Em bikarin bi gelik aliyan ve jiyana Sezar lêkolîn bikin. Dibe ku hinek aliyên bişibin

derketina me, girêdan hebin. Nabêjim ji hemû aliyan ve, lê em dîqat bikin.

Li wir çend xalên ku bala min dikişînin hene, xwezî zêdetir bihata zanîn. Texmîn dikim, Misirê dixe bindestê xwe. Çîrok li Misirê derbas dibe. Qralîça Misirê Kleopatra vê seansê dide. Bêgûman li Misirê pergelek koletiyê ya mezin, pergala çar hezar sal a Fîrewn û Qralîça dawî Kleopatra heye. Lê li beramberî Roma nikare li ber xwe bide, Misirê nikaribe xwe ji bûyîna walîtiya Romayê rizgar bike. Wê Sezar bê û Misirê bike bajêr, Kleoparta jî Misirê biparêze û wê hewl bide Misirê di destê xwe de bigire. Vaye du kesayetên ji bo vê dê rastî hev bên.

Biqasî ku min fêm kir, ev êdî şer dike. Nizanim Sezar meziniya xwe çawa didomîne. Hevpeyvînên wan çêdibin, di nav qesrê de yek şiyarî dide Sezar û dibêje; “*Dixwaze felaketekê bîne serê te.*” Li şûna wî bawerim yekî din, Tûteleme ye, navê wî çiye nizanim. Di dîrokê de yek ji qralîçeyên ku pîrektiya xwe bikartîne û bi vê navbange. Bi rêya wê buxtanekê li Sezar dikin. Sezar dibêje; “ *Ya rast ew ne wek tê dîtine, wisa fêlbaze, kompkogere”* Sezar jî dibêje; “*Ez hemûyan dizanim, ji te hez nakim, ji wê jî hez nakim.”* Kleopatra vê dibihîze, yek ji kesên ku taybetmendiyên wê yên komploger li pêşin. Cariyek wê heye, bi rêya vê cariya xwe komployekî baş birêxistin dike. Kêrekê li sînga cariya xwe dide û dikuje. Cariye ewqas pê ve girêdayî ye, jê re dibêje; “*Ger ez nekujim ez ê rûyê te nebînim.”* Tevî ku kole û cariyeke gotina wê ya ku ez ê careke din li rûyê te nenêrim, mezinbûna soza wê dide diyarkirin. Bi rastî jî tevî ku camêrekî bibandore jî, bi awayekî hostane xwe birêxistin dike û wî dikuje. Encax bi wî rûyî derdikeve pêşberî Kleopatra. Demekî xwedî otorîte ye.

Ya rast Sezar camêrekî mezine. Bawerim hemû lîstokên îktîdarê zane. Hêz pêk aniye, gelik qad xistiye û kesekî walîtî damezrandî ye. Ma wê nikaribe Misirê fêm bike, Kleopatra fêm bike. Dikare vê jî fêm bike. Ji hemû tiştên ku jê re dibêjin, dibêje; “*Belê, dizanim.”* Lê aliyê herî ecêb yê vî karî, tevî ku Sezar dizane Kleopatra komplogereke û derfet bibîne wê her tiştî bi wî bike jî tiştekî biçûk jî nake, heta qralîçetiya wê jî jê nagire. Ji yê ku li xwe mikur tê jî re dibêje; “ *Tiştên ku tu dibêjî dizanim.”*

Bêgûman Kleopatra lîstokek din jî dike, fermandarê herî bibandor ê Romayê bi xwe ve gire dide. Vê jî îtîraf dike. Ev

Antoniûse. Hinek peyvên ku Sezar dike hene, bi taybet dema ku ji wir cuda dibe, hewl dide zilamê Misirê jê re bihêle diyar bike. Navê wî nizanim lê nasnavê wî Kalkane, ango kalkanê Sezare.

Zilamekî din hebû, ji Brîtanya. Sezar dixwaze kesê bi navê kalkan bihêle. Ew dibêje; “*Na, ez naxwazim zêde li vir bimînim.”* Herweha ji bo Sezar bibêje; “*Dibe ku li Romayê xeterî hebe, ger em wisa bimînin dê baştir be.”* Sezar jî dibêje; “*Na, tu bimîne. Dê wek yekî Brîtanî û aligirê wê bimîne.”* Van wisa dihêle û dibêje; “*Dibe ku ez careke din venegerim vir.”* Misirê mezin, lê wisa dihêle û diçe. Tam jî Kleopatra ji wir derdikeve û dibêje; “*Qralîçe tê.”* Begûman çîrok balkêşe.

Sezar camêrekî giran û têgihîştiye. Ya din jî şêwazê derbaskirina cenewariyên qralîçê dizane. Tevî vê jî, Sezar ne camêrekî xerckere, dixwazim vê bêjim. Hemû fêlbaziya kleoparta qaşo bikaranîna rêzdarî û hezkirinê ye. Herweha ev ji bo Sezar girîngin. Lê Sezar dizane ew ne kesek ji dile, lê tevî vê jî dema ku ji wir vediqete, dibêje qralîçeyeke û rêzdariyê jê re raber dike. Ew jî rûçikê xwe dadiliqîne. Vaye en fêlbaziyên tên zanîn, fêlbaziyên pîrektiyê dike. Sezar hêvî nake û jê re dibêje; “*Eman rica dikim, qet nebe dema ku diçim ji min re bêje oxira te ya xêrê be.”* Dibêje; “*Nazê xwe neke. Pêwîst nake tu riçikê xwe tirş bikî.”* Bêgûman ew ditirse, şerm dike, lê di rastî de Sezar kesekî kamile û wê wisa dev ji wê berde. Qaşo jineke Sezar bandor kiriye. Sezar jê re dibêje; “ *Binêre, ger tu rast tevbigerî, ez ê wî zilamê ku tu pir pê ve girêdayî ye ji Romayê ji te re bişînim.* Ew jî dibêje*; “Eman Sezar”* û Sezar himêz dike. Sezar jî dibêje; “*Ez ê Antonîûs ji te re bişînim.”* Piştî wê jê re dibêje; “*Bi xaritê te”* û diçe.

Sezar camêrekî wisa ye. Bawerim gelik tevgerînên wî yên wisa hene, ger bê dîqatkirin, paşê Sezar ji aliyê zirkurê xwe ve li Romayê ji aliyê Brutus ve ji piştê ve tê xencerkirin. Camêrekî hêza mezin bi kedek mezin bûye împarator. Bêgûman dibe ku dewlet jî bi sazî kiribe. Ya rast tevî ku zirkurê wî ye jî, li gorî ku Brutus xiyanet kiriye dibe ku Sezar kesekî pir mezintir be. Dîsa di astek mezin de Sezar bi seferan re mijûl dibe û Misirê herî mezin dixe destê xwe. Lê li Romayê jî dek û dolabên mezin hene.

Îhtîmalek mezin ew kesên ku dek û dolabên mezin digerînên vê dibêjin; “*Kleopatra, Antonîûst hefteyekê şer kir, êdî wê biroj şer bike, bi şev jî bi şerabê, wey em ê heta sibê têra xwe*

*şad bibin.”* Meyla ku derdikeve holê ev e: Kesên dek û dolaban dizîvirînin hene, hûn di ferqê de ne. Bi rastî împaratoriyê bi sazî dike, - Sezar niha li Romayê navekî mezine- ya rast dewletê pêk tîne û hemû şerên girîng qezenc dike. Lê fêlbazî jî li Romayê pir zêde ne. Bawerim şebekeyekê rêxistin dikin. Jixwe li Misirê jî dek û dolabên Kleopatra dibîne. Heta li Roma yek ji kesên ku komplo li beramberî Sezar pêk anîbe dibe ku Antonîûs be jî. Min baş lêkolîn nekiriye, nizanim, lê tevî ku her tişt di destê camêr de ye li Misirê tiştekî nake. Tevî ku zirkur jî di nav vî karî de cihê xwe girtiye demekî camêrekî yekane û mêrxase.

Ger Sezar bixwaze dikare serê hemûyan jêke û wan darve bike. Kesayetiyekî berevajî Nerone. Kesayetiyekî bi hêza xwe ya camêrê dewletê kiriye malê dîrokê ye. Kesayetiya Kleopatra, piştre bi Antonîûs re çi dike û çawa xwe bi mar dide gezkirin em fêm dikin. Dîsa em dizanin ku Antonîûs kesekî tolgire.

Niha ya ku divê li vir bê fêmkirin ev e: Ya me ne bûyerek serdestiyê ye, karekî mîna şivantiyê ye. Ger îlehî tê xwestin bi kesayetiyên dîrokî re bê şibandin, qet nebe dibê mirov hewla fêmkirinê bide. Ger dixwazin komplogeriyê bikin, divê rêxistinkirina komploya ku li Romayê tê kirin baş bibine. Hêzeke Kleopatra heye, ne jineke wisa ji rêzê ye, jinek bandorkere. Ger bandorker nebûya, ewqas bi navûdeng nedibû. Naveke di dîrokê de rista xwe lîstiye. Niha tu li yê me dinêre, wisa nabin. Komplogerê we yê herî mezin jî ji rêzê dimîne. Di nav refên me de ji aliyê jinê ve jî wisa ye. Jina ku herî zêde ji xwe bawere jî, nikare xwe ji rewşa herî zêde bêbandor û belengaziyê rizgar bike. Di gel me de di asteke pir paşketî de tê jiyîn.

Ev çîrokên dîrokî di nav me de wisa bi awayekî paşketî jiyankirina wan pir balkêşe. Hûn ê bêjin; “*Çi pêwendiya vê bi şibandina min re heye?”* Ji ber ku nêzîkatiyên dişibin vê di nav me de jî hene. Kêm an zêde meylên wisa di nav me de jî tên jiyîn. Min qet Sezar nexwendiye, lê pê hizirîme. Ango şêwaz heta dawî dişibe ya wî. Îhtîmalek mezin yên ku bi awayekî cidî bi serdestiyê re mijûl dibin wisa dişibin hev. Heman pêvajoyên serdestbûnê, dibe ku taybetmendiyên hewşêwa diafirînin. Lê kesayetiyên aliyên wan ên komploger li pêşin, fermandariyekê çawa bikar tînin, pêwendiyekê çawa bikar tînin ev jî diyar dibe. Ango dema

ku mirow qeyas dike ne gengaze ku kesayetiyên hewşêwe nebîne. Pir balkêşe!

Bêgûman ya me weke ku min got, şerekî leşkerî, siyasî di bin mercên civakî yên cuda de pêş dikeve û mekanekî dîrokî yê cuda ye. Di asteke pir paşketî de ye. Ango serdema Sezar pir mezin û gerdûnî ye, lê dîsa jî em dikarin bêjin aliyê dişibin hev hene. Vaye di dîrokê de mînakên dişibin hev min vegotin. Duristiya Hz. Elî bê nîqaşe, lê wî jî nekarî xwe ji komplo û dev ji şerê dikarî qezenc bike rizgar bike.

Di şoreşa Fransa û Rûsya de kesayetên dişibin vê hene. stalîn hinekî din kesayetiyek cuda ye. Di şoreşa Fransa yê de jî gelik kesayetên dişibin vê hene. Bêgûman divê ku em bi vê zanebûnê jî tevbigerin û ji qanûnên siyasetê fêm bikin. Hinekî jî ji rastiya Rêbertiyê fêm bikin. Ango di nav we de ger hinekî bixwazin pîrektiya xwe bikar bînin hebin, heta Kleopatra be jî naçare xwe rast binirxîne.

Pêwîste mirov baş bizane Kleopatratiyê jî bike. Ger Antonîûsek jî di nav we de hebe, Brutus jî hebe, divê ew jî baş bê birêxistinkirin. Ger ne karîkatorê karîkator be jî divê xwe têkilî vê neke. Ji ber ku dê nikaribe rake. Bûyîna desthilatdarî bûyerek pir cidî ye, siyaset ne karekî ji rêzê yê mehelî ye, her gotina ku tê di dilê xwe de bike, her gava ku tu bavêje watedare û divê ku wisa be. Ango hûn ê van axaftinan jî fêm nekin, ji ber ku pir kêm pêwendî di navbera jiyana we û siyasetê de pêwendiyek pir kêm heye. Bi terbiya desthilatdariyê, dîsa di navbera terbiya we bi xwe de pir kêm pêwendî heye. Dibe ku ev tiştên ku dibêjim qet wate jî nebînin. Lê belê bi rastî jî ger hûn dixwazin siyasî bibin, tevlîbûnê rast pêk bînin û bi zanebûn tevlî bibin.

Tu ji bo çi heye, ji çi re heye? Dema ku hûn gavên xwe davêjin pêwîste ji hemû aliyan ve berê xwe bidin vê. Hêza min jî bi kar neyîne. Dil dixwest ku ji nav we hejmarek zêde Antonîûs û Kleopatra derkevin. Ger derketana dê karê min jî asan bikirana, lê ewqas jî nînin. Lê belê ne pêşnûmeyên wan, ne jî cureyên wan ên komedi, nabe. Bûyîna Sezar bûyerek mezine, ger em bikarin bibin Sezar em ê pê xweşbext bibin. Eşkereye ku pêwîste bi şêwazê me, bi bîrdoziya me û bi xeta me ya siyasî ve be. Ger hûn siyasî bibin, bibin leşker pir başe. Mezinbûna Romayê ji kî derê tê; fermandar û siyasetmedar, xîtabkarên Romayê jî pir bi navdengin û pir

başin. Şêwazê jiyana wan serdeste, heta niha jî xwe negihandine vê serdestiya jiyanê. Di ti welatên emperyalîst de xwe gihandina vê pêk nehatiye.

Çima Roma mezine û eserên wê jî bêmirinin? Ji ber vê ye. Bêgûman em heta dawî raye didin kesayetan, lê divê ku ew jî hinek rastî û pêdiviyan baş fêm bikin. Dinêrim, piraniya we dixwazin bibin leşker û fermandarên baş. Tevlîbûnên nû ji nav refên PKK'ê û qada me re jî hene; hûn ê hinekî be jî fêm bikin mirov çawa dibe leşker û siyasetmedar. Ger hûn fêm nekin, hûn ê henekê xwe bi xwe bikin. Wek jin jî dê çawa bibin jin, hûn ê hinekî vê fêm bikin. Hûn nikarin bibin wek jinên ji rêzê, wek jinek sivik nikarin di nav me de bimînin. Asteke PKK'ê avakiriye heye, hûn ê bizanibin bibin jina xwe gihandiye vê astê.

Çi karê jinên evdal di nav me de heye? Jina neketiye ferqa ajoyên xwe yên sivik heta ne di ferqa nasnameya xwe de ye, nikare di nav me de bijî. Wê demê pêwendiyên jinê xeterin. Cihê zilamê evdal jî di nav me de nîne û nabe. Kesê ku asteke wî ya zanînê nîne, nirxê jiyana wî nîne em çi jê bikin? Em nikarin lêbinêrin, ango hûn dibînin, giraniya siyasî ya rêxistinê girînge. Hûn Rêbertî dibînin, di nav têkoşînek pir dijwar de derbas dibe. Bi wê kesayetiya xwe ya nayê leşkertiya bi pera û koletiyê gelo hûn dikarin bibin çi? Jineke bêhn ketiyê nikare nêzîkî zanistiya me bibe. Ez ji bo bandorkirinê jî nabêjim, ango jina ji hêza xwe bawere, bila hewl bide bandor bike, lê divê kesayetiyek rakêşer be. Divê ku hêz û cazîbeyek wê hebe.

Mînak, gotinek Kleopatra ya pir balkêş ku ji Sezar re gotiye heye û dibêje; "*Sezar ez ê vê carê negirîm, ji ber ku dizanim tu ji girî pir acizî"* Qaşo qralîçe ye, wer xuyaye ku her tim bi fêlbaziya girî hewl dide Sezar mijûl bike.

Vaye piraniya we jî wisa kelogîrîne, şerme!. Girî tenê ne rondik ji çavan barandine, hemû êş û janên we girîne. Ev jî ne şayane. Ev hemû pirsgirêkên girîngin. Ger hûn dixwazin bibin leşker û siyasî bibin. Yên ku dibêjin em xwedî dek û dolabin jî dikare bikeve nav helwestekî saxlem. Komplogerek jî di nav partiyê de heta kêliya dawî divê ku kamil be. Jixwe ne wisa be nikare bibe komplogerekî baş. Ev hemû pir girîngin. Ger hûn bêjin; "*Em Kurdin, hovin, paşketî ne, nizanin wisa bi me hatiye lîstin"* wê demê wek min gotî, dê bê gotin; "*Pihênekî nizanim li kî*

*dera vê bidin.”* û hûn dê bên avêtin. Bêgûman ev jî rewşek ne xweşe. Teqez pêwîste ev bê derbaskirin.

Bi me re çîrok, teorî û bîranîn bi vegotinê temam nabin. Lê ya pêwîst hêza we ya fêmkirinê, terbîye û azweriya we ye. Ji bo ku ev bi we re pêş bikevin ez bûm xwedî hewldanek mezin. Rewşeke we ya di destê xwe de girtin û bikar ne anîna împaratoriyê nîne. Em mîna ku bi derziyê bîrê bikolîn, hinek derfetên serdestiyê derdixînin holê. Hinek diyardeyên jiyana serdest derdixin holê. Lê hûn fêm nakin, nêzîkatiyek rast raber nakin.

Ger ev jî nebe, li ti derê û ti demê dê kes ji we re nebêje merheba jî. Li benda hezkirin û rêzdariyek wisa jî nebin. Ango em bêjin hûn ê nikaribin bibin leşkerekî bi pere, xwedî derfetê koleyekî û karkerekî jî. Ji vê re tê gotin pleptî. Di serdema herî paşketî ya proleteriya Roma yê de hinekî wisa bûye. Vaye niha em proleterên herî paşketî yên cîhanê û yê serdemê ne. Ji her alî ve em yê herî paşketî û yê herî zêde di asta jêr de ne. Niha ev ne rewşek bi asanî bêpejirandin û mirov bi xwe bide pejirandine. Vaye ji bo ku em nepejirînin vê çalekiyê li dar dixin. Ji bo nepejirînin ewqasî hêza xwe raber dikin.

Hêjî hûn dibêjin, “*Me fêm nekir.”* Tevî ku pir vekiriye ev feraseta we ya rêxistinê, ya jiyanê ji bilî belavkirinê ti encamî nade jî, ger hûn bi israr hîn jî ferz bikin, wê komplogerek jî ji we dernekeve. Hûn ji wan jî xirabtirin. Bi dijwarî xwe ferzkirin, di uslûb de hevdu ji taqet xistin, ji edeb dûrmayîn nayê pejirandin. Bi girî û nalînê jî nabe. Ger hûn fêm nekin, ez ê mîna berê we bavêjim.

Dubare li vir we şiyar dikim; yên ku li gorî qûralên kar nexebitin, ez ê ji niha û şûnde nedarizînim, berdimê. Rakêşwarbûyîn, rêzdarî, hezkirin û pêşketin, kêm ango zêde li beramberî dijmin bûyîna xwedî hêz, yên ku nikarin vê bikin, bi usûlên eşîretê –yên ku xwe di vê mijarê de ferz kirin jî we dîtin- bi devê xwe li ezmana çûkan jî bigirin, dê neyên efûkirin. Vaye Kleopatra qaşo xweşikiya xwe, evîna xwe bikar tîne. Vaye Sezar jê re dibêje; “*Ez ê Antonîûs ji te re bişînim”* û pir vekiriye. Ez ji xwe bawerim. Camêrê li beramberî we wisa biçûk bibe, bê çewsandin nîne. Divê ku hûn fêm bikin, ango wê ji Kleopatrayan re Antonîûs, ji Antonîûsan re jî Kleopatrayên din bên dîtin.

Hûn zanin ku ez mirovekî ji sifirê gihîştime serdestiyê. Ma ez bêrêziyê dikim, ma ez li ser encamên ku we bi destxistine hesabên erzan dikim? Na! Kî kê bikar tîne di holê de ye, li ser vê bingehê dê rêzdariya we hebe. Mirov dema ku mîna endamekî partiyê, leşkerekî we dît, wê demê tê wateya ku pêdiviya qûralên vê jiyanê pêk tînin. Êdî ev li gel me merce, ger hûn vî mercî pêk nayînin, çima xwe nêzîkî me dikin?

Em tevgerek siyasî û leşkerî ne. Yên ku bixwazin sîxuriyê jî bikin di dîmen de wê li gorî van qûralan tevbigerin. Ger tu pir vekirî bi qûralan bilîzî, berê xwe bide provakasyonan, wê hema te darve bikin, serê te jêkin. Baldar bin. Ger bi zanebûn tu ewqasî bi qûralên şer bilîzî ez ê ji te re bêjim; “*Bila erd biqelişe û bikeve binê erdê.”* Divê ku êdî şervanên me vê fêm bikin. Ger bêjin; “*Em Kurdin, fêm nakin”* bigire vê kurdîtiyê û bixe binê erdê. Dîsa ger bêjin; “*Em pîrejinin, ji bilî girî û nalînê tiştek ji destê me nayê”* ji berçavê min biçe. Min hîn di deh saliya xwe de dayika xwe ji gel xwe dûr xist, tu li pêşberî min kîye? Ji bo me pênaseya anûr û rûmetê rast hatiye kirin. Ger hêza te têra vê dike nêzîkbe, hêza te têrê nake dûr bikeve.

Di vê wateyê de tiştên ku dibêjim pir vekirî ne. Li ser vê bingehê meziniya pêwîst dikare bilîze û li gel me nirxa hemûyan jî heye. Hûn di ferq û zanebûna vê de ne. Bi qasî ku bijîm ez têvdîran pêş bixim û em jî zanin bibin desthilat. Divê ku hûn bi zanebûna van tevan tevbigerin. Divê ku hûn xafilane nejîn. Weke ku min got, ger hûn bi rêxistinê bilîzin jî, mercên wê hene. Hewce dike ku hûn pêdiviya vê bikin.

Ti tiştek weke tê texmînkirin nikare di nav PKK’ê û refên me yên artêşê de bên jiyîn. Keyfîyeta ku em vekirî behsa wê dikin, xwe xapandine. Hêz rast bikarneanîn, hêz bi şêwazekî ferdî bikaranîn, teqez divê ku her kes bizane dê rojekê hesabê vê bê xwestin. Ger hîn ez dijîm, teqez ew ê wisa be. Hêza min a mezin hesab xwestinê heye. Hûn çiqas başiyê bikin, dê ewqas nirxê ji we re bê dayîn, çiqas xirabiyê bikin dê hem hesab ji we bê xwestin û hem jî bêdayîn. Teqez rastiya Rêbertî ya ku divê tenê kêliyekê jî hûn jibîr nekin ev e.

Ger hûn bi van tevan re jiyan bikin, hûn ê mezin bibin, zana û siyasî bibin, ev jî tiştekî başe. Çima hûn ji mezinbûnê ditirsin, ji bi aqil û edepbûnê xwe şûnde dihêlin? Her tim bi lanet,

îflah nabe, taximê linga, her tim di sînorên bejnkurtiyê de dizivirin, çi wateya wê heye?

Pêwîste her kes bilindbûnê şayanî xwe bibîne. Azwerî li ser vî bingehî pêş bikeve. Ger hûn devê çîna serdest jî bikar bînin, şêwazekî wê jî ya bilindbûnê heye, divê ku hûn vê esas bigirin. Weke ku min got, hinek çawaniyên sereke yên vê rêxistinê hene. Hûn ê bi baldarî hewl bidin ku bi van re nekevin nav nakokiyê. Em tevgerek her ku diçe bi hêz dibe, zana dibe, xwe zelal dike, qûralên xwe diyar dike û dîsa hêza xwe jî ewqas amade digirine. Herweha hûn tên ji bo ku bibin leşkerê vê. Bi we re koalîsyon nayê kirin, tifaq nayê pêşxistin. Em yekîtiya bîrdozî, siyasî û rêxistinî dikin. Ger wateya vê jî rast bê zanîn, li ser vî bingehî hûn derbasbûnên rast bikin, ketinek rast ya eniyan, ketinek rast ya nav gel, ne gengaze ku hûn ser nexin.

Şere, wê hertim şehadet bên jiyîn, lê wisa bê jiyîn tê îtîraza kesî ji me nebe. We li ser vî bingehî şer kir û wateya vê jî hêja ye. Hûn vê dayîmî di hemû pêvajoyên jiyana xwe de bicih dikin. Nirxê we dê li ser vî bingehî qat bi qat zêde bibe û tu kesê jî nikaribe we asteng bike. Ev jî qûraleke. Yên ku li ser bingehê qûralên rast dijîn, şer dikin nirxê wan mezine. Ez jî nikarim van asteng bikim. Tu çiqasî bi pêwendiya taybet, bi vê rêyê, tevî ku ne wisa ye jî tu hewl bide çiqas mezine nîşan bidî jî, dê rojekê rastî derkeve holê û dê bejnkurtî bê fêmkirin. Wisa li pê mezinbûnên sexte nebezin û bila rojekê rastiya we dernekeve holê. Vê jî şayanî xwe nebînin.

Ji van tevan hûn dikarin encamên dîrokî derxin. Dîsa hûn dikevin nav erkan. Heta hûn rojane wate didin perwerdê jî. Li gorî min jî ya herî baş wisa tê destxistin. Vê jî şayanî xwe bibînin. Ez wekî din naxwazin ti kesayetan li pêşberî xwe bibînim. Em zanin ji mirov re xizmet bikin, piştî ewqas xizmetê û şûnde yên ku pêgihîştine jî divê lewazbûna xwe nedin diyarkirin. Doz hevbeşe, parvekirin, her tişt, di her mijarê de hevbeşe û divê şêwazê wê yê kedê jî, yê serkeftinê jî hevbeş be. Kesek ji bilî vê pêwîst nake bê nîqaşkirin. -Ger ev ez jî bim.- çi heq kiriye û ne jî em şayanî xwe dibînin.

Li ser vî esasî careke din yên ku di nav arasteyên navdar de ne, dîsa ji yên ku biçin nav gel re û yên ku tevlî nêvenga me ya perwerdê bûn û nirxek bilind rave dikin re serkeftinê dixwazim.

**31 Cotmeh 1994**